# Ji Rojnivîsa Fermandar Egîd
# MEHSÛM KORMAZ

Ferda Çetîn/Îsmet Kayhan

Weşanên Komîteya Xebatên Şehîdan A PKK'ê

**NAVEROK**

**Nota Yekeya (birim) Çapemeniyê**
**Ya Biryargeha Navendî Ya ARGK**

**Pêşgotina Weşanên Mezopotamyayê**
**(Adara 1997'ê)**

**QASIDÊ HÊVÎ Û BEDEWIYÊ**
**ELÎ MEHMÛD RESÛL**

**"Divê Karên Herî Biçûk jî Bi Plansazî Bin;**
**Dema Vala Ya Şoreşgeran Nabe"**

**"Em Axaftinên Siyasî Naxwazin"**

**Xebatên Avakirina Kampên Destpêkê**

**“Li Ser Feraset û Meylên Şaş”**

**“Divê Ev Not Di Rewşeke Tehlûke De Werin Îmhakirin”**

**LI DIJÎ CUNTAYA 12’Ê ÎLONÊ LÊGERA CEPHEYÊ,**
**CEPHEYA BERXWEDANÊ YA YEKGIRTÎ YA LI DIJI FAŞÎZMÊ**

**Belavoka ku Egîd li ser navê CBYLDF’yê nivîsandibû**

**CIVÎNA KU DI DÎROKA 3’ê Nîsana 1983’AN DE HATIYE LIDARXISTIN**

**“Rewşa Me Ya Malî Ne Baş E”**

**“Rapor Hewcadariya Berpirsiyariya Li Hemberî Rêxistinê Ye”**

**“Şert û Mercên Zehmed Kesên Biqewet Derdixe Meydanê”**

**NÎQAŞA DIJWAR A DI NAVBERA MEMED KARASUNGUR (XALIT) Û EGÎD DE**

**ÇALAKIYA LI SER ERUHÊ (DIHÊ) Û ÎLANKIRINA HRK’Ê**
**DESTPÊKİRİNA PÊVAJOYEKE NÛ**

**Armanca Çalakiyê**

**Plana Biserdegirtina Dihê (Eruh)**

**Rêkûpêkiya Koordîne, Bikaranîna Çekan, Tevger û Bimewzîbûnê**

**Kêliya Çalakiyê**

**“Me Dihê Xist, Lê Ji Bo Şerên Cidî Pêwîst e Em Hê Jî Qeweta Xwe Zêde Bikin”**

**“Çalakiya Me Gihiştiye Armancê”**

**DENGÊ KU JI DIHÊ VEDAYE**

**“Halê Leşkeran Ne Tu Hal E”**

**“Ka Bisekinin Em Ê Çi Ji We Bikin!”**

**“Divê Du Kurd Neyên Gel Hev, Eger Werin Gel Hev Wê Dinê Hilweşînin”**

**“Apo’çî Dişibin Bombeyek Ku Ji Bo Teqînê Amade, Eger Biteqin Ê Me Jî û We Jî Tine Bikin”**

**“Ev Baş E Lê Pir Dereng E, Dikaribû Hê Zûtir Jî Çêbibe”**

**“Ya/Ê Amade Ye Bila Destê Xwe Rake”**

**“Tenê Tiştek Ji Me Kêm Bû :**
**Av”**

**“Çiyayên Me Komandoyên Çiyê Dibecandin”**

**“Hêvî Şîn Bibûn Lê Hê Fikar Jî Hebûn”**

**“Kesê/A Li Dawî Bimîne Namîne Heyirî; Tê Xelaskirin”**

**“ÎSABET Û DOMDARIYA Dİ ÇALAKIYAN DE WÊ GEL BIKIŞÎNE NAV ŞER”**

**“Şerê Şoreşgerî Şerekî Êrîşî Ye”**

**“DI XEBATA PRATÎKÎ DE REXNEYA FERASETÊN ŞAŞ Û TERZA XEBATA ŞAŞ”**

**“Berpirsiyariya Teng”**

**“Pratîka Hemalwarî Ya Teng”**

**“Ji Ceribandinan Ders Dernexistin Û Doxmatîzm”**

**“Ferasetên Subjektîf û Sekter”**

**Bêquralî**

**HEVAL MEHSÛM KORKMAZ AN JÎ DI BERXWEDANA NETEWEYÎ DE PARTÎBÛN**

**Û EGÎD**
**MEHSÛM KORKMAZ**

**“FERMANDAR EGÎD TALÎMAT DIDE: HER BI PÊŞ DE!”**

**GOTINA DAWÎ**

**Nota Yekeya (birim) Çapemeniyê**

**Ya Biryargeha Navendî Ya ARGK**

Eger dîrok mihesibê serasera yê raboriyekê be, arşîv jî hefizeya wê ye. Di heman demê de agahî, belge û şahidiya raboriyê ye jî.

Hin seyah (gerok) ji bo ku xwezaya nehatiye xirabkirin tarîf bikin, gotinên wekî "daristana ku bivirpê neketiye" an jî "axa ku mirov pêli nekiriye" bi kar tînin. Pêwîstiya dîroka Kurdistanêû her wiha pêwîstiya dîroka PKK'ê, tevî arşîva wê ya dewlemend, bi pênaseyeke bi vî awayî heye. Niha, dîroka Kurdistanê di arşîvên gelek dewletên emperyalîst de li hêviya derketina li ber ronahiyê ye; lê hêdî hêdî arşîva PKK'ê tê vêkirin. Li gel hejmareke zêde zêde ya analîz û vegotinên Serokatiyê, belgeyên nivîskî jî bi vekirîbûneke mezin ji bo mirovahiyê tê pêşkeşkirin. Vegotinên kadroyên destpêkê, rapor û nirxandinên wan di weşanên cur bi cur de li pey hev tên weşandin.

Arşîvek ku baş hatiye parastinû dest nehatiye danê,şert û merca bêyî wê nabe ya dîrokeke objektîf e.

Arşîva ku dîroka PKK'ê nîşan dide, xwediyê taybetmendiyeke wiha ye. Arşîva raboriya bîst û pênc salan, bi awayekî pir qeyim li cihê xweye.

Tije bi kîsan, belge, rapor, cetvelên maliyeyê, xerîteyên (nexşe) bi destan hatine çêkirin, lîsteyên milîsan, navên ajanan, krokiyên gund û navçeyan, hin caran jîfotoxrafên çilmisiyayî yên reş ûspî…

Her ku belge hatin tevdan wekî ku barekî giran were ûdayne li ser milê mirov. Ji ber ku beşeke mezin a şoreşgerên ku ev belge nivîsandine ûdi jiyanê de pratîze kirine, îro ne bi me re ne. Wan di nav şert û mercên bêderfet ên mezin de, rola ku dîrokê ji bo wan diyar kiribû bi cih anîn. Ya ku nabe pêk anîn û bi xwe jî bûn dîrok.

Ti berjewendîû xemên takekesî yên van mirovên mêrxas nebû. Di her kêliyê de destlêdan (temas) û nefesên van mêrxasan hîs kirin, heqê van mîrate-belgeyên bêhempa dayin, hemwezîfeûhem jî barekî giran e.

Her ku me rûpelên kevin ên ku bi hev ve zeliqîne ji hev vekirin, bêhna ax û rutûbetê nîşan dida da ku arşîvên şoreşê çawa û di kîjan şert û mercan de têne veşartin jî. Nivîsên di nav paketên ku bi nazikîûhesasiyeteke mezin bi caran hatine pêçan û hatine lesqekirin, dîsa jî cih bi cih bi hev ve zeliqiyane; murekeb,li hin cihên ku rutûbet girtiye li ser kaxiza spî hêdîka belav bûye.

Bi qasî ku me ji rojnivîsan fêm kiriye, rojên têhn û birçî derbas bûne ne kêm bûne. Hê HRK'ê nehatibû avakirin. Ji cetvelên maliyeyê, tengasî û hesasiyata ji bo nirxan; ji mesrefên bi awayê*"benûştek"*, *"nenûkbirek (tirnak makası)"* an jî "baxek baxdenûz" di lîsteyan de cihê xwe digirin mimkun e.

Ev belge bi ruh, kêfxweşîû bandorên 15'ê Tebaxê hatine amadekirin. Fermandar Egîd van çalakiyan bi coşeke mezin dinirxîne. Bandor û kêmasiyên çalakiyê jî bi awayekî zelal nivîsandiye.

Mehsûm Korkmaz ku pêşengê vê pengava dîrokî ye, pêşeroj bi detayên xwe yên herî zirav fikiriye û planê wê daniye. Plansaziyên li ser rojê, notên ji bo mîtanan heya bi mesrefên (lêçûn) rojane her tişt hatiye nivisîn. Mixabin e ku ev belge ji hev qut in. Ev not, tevî ku li gorî sîstemekê nehatine girtin cidîbûneke mezin nîşan didin.

Egîd, yanîMehsûm Korkmaz ji hevalên xwe yên ku ala wî rakirine re bi destxeta xwe mîrate û nirxandinên zêrîn pêşkeş dike. Carina rexne dike û carina jî rexneya xwe dide.

Dema hûn nivîsên Wî dixwînin, hûn ê hem Wî hê ji nêz ve nas bikin ûhem jîhûn ê di beşeke dîrokê ya ku Wîjê re şahidî kiriye, bi xwe di nav de bûye û Wî pêk aniye de rêwitî bikin û roja me ya îro hê baştir fêm bikin.

**Pêşgotina Weşanên Mezopotamyayê**

**(Adara 1997'ê)**

Jiyan bileza baû bi hezar zor û zehmetiyan derbas dibe. Kurdistan, weke di hin qonaxên bi hezaran salan de bûyî, dîsa dibeqada bûyerên ku qedera cîhanê biguhere. Mirovên wê yên ku wekî xwezaya wê bêrehm, wekî xwezaya wê kêfxweş, wekî xwezaya wê fêmkirina wan zehmed e  di nav şerekî tine kirin û afirandinê de ne. Mirov li vir ji nû ve, ji ax û heriya bi xwîn a Kurdistanê tê afirandin. Rastiya heyî, li vir bi şûrekî ji her cih û demê hê tuj li nakokiyan cuda dibe. Li aliyekî mirovê ku di nav çalakiya afirandinê de digihîje asta xwedayîbûnê,di nav agir û dukel,qêrînên binkeftin û binxistinê de bilind dibe; Li aliyê din ketibûneke kûr û giran ku dîrokêjê re şahidî nekiriye dîtin jîmimkun dibe. Her tiştîû her kesî destpêkiriye, qedera xwe ji wê sekinîbûna gunditî ya demên kevin bi lez derxe, hin caransedemên mehkumbûna xwe ya nêz dide hev û hin caran jî hewl dide kuji bo darizandineke dîrokî, delîlan bîne gel hev.

Ev, hesab pirsîneke bi heybet e. Paşeroj û pêşeroj, di nav çalakiya rojane ya mirov de wekî ku bi hêsanî were dîtin, ji hev hesab dipirsin. Şer, di kêliyekê de û bi awayekî ku ti car qut nebe, pir bilez û bi awayên ku lê neyê bawerkirin derketiye holêû hê berdewam e: Di kêliyekê de û bi awayekî ku ti car qut nebe... Her kes di nav vê kêliyê de ye. Ji her kes û ji bo her tiştî wendakirina şerê ku êdî her ku diçe ne mimkun dibe, ji bûn qedera (çarenûs) kesan derdikeve û digihîje asta çarenûseke yekpare. Ev, çarenûsa gelekî ye. Ev, ji bo gelekî, afirandina qedera xwe bi xwe ye. Û niha diafirîne jî.

Dema em îro li vir, li bilindahiyên van çiyayên bi heybet, ku gelê Kurd çarenûsa xwe diqîre, li raboriyê dinêrin, me kariye siya kesên ku ji vê bahozê re pêşengî kirine bibînin. Dikare tenê ji aliyê kesên di nav mij û morana vê bahozê de hema bêje bêyîsekinîn, lê tenê şer dikin, û aliyê şer ê ku mirovan diafirîne di xwe de kifş dikin û pratîze dikin ve ew werin dîtin. Ew, vaye li wir, bi pirek ku bi bedenên şehîdan û bi ewireke ji çavên çiyayan têçêbûye,paşeroj û pêşerojê digihînin hev. Ji bo yên ku şer bi heybet û tevî her tiştî dimeşînin, ew timî, li asoyan (ufuk) li cihekî disekinin û pêkhatina jiyanê ya bi awayekî zor ûzehmed dişopînin. An jî, ji bo yên ku hê şer dikin ev peykerên (heykel) ji şewqê yên paşeroj û pêşerojê, di rewşek ku timî tên dîtin de ne. Di nav dîrokê de di rewşeke timî hatin dîtinûhatin bihîstinê de bûn, asteke hebûnê ye ku tenê wan kariye xwe bigihînê. Ma pêwîstî pê heye mirov behsa berdelên ku di nav dîrokê de timî hebûneû xwe gihandina rastiya peykerên ji şewqê bûnê bike? Hema bêje her kes dizane ku ruxînerîû afirîneriya şer tê çi maneyê jî. Lê hin rastî hene, tenê ew dema tên jiyîn dikarin werin fêmkirin. Ji derveyê vê, tew li

van rastiyan nayê nêrîn jî. Ji ber ku mirovên mezin û li ser dîrokê bandor kirine, dişibin çavkaniyeke şewqê ku her tişt di nav de dişewite. Bi nêzîkbûneke ji rêzê, hewldana fêmkirina rastiyeke wekî şerê li Kurdistanêîro dimeşe, bi piranî kujêr e. Ev dişibe, dema kesekî ku çavên wî/ê fêrî şewqê nebûyî, ji nişka ve bi çavkaniyeke bihêz a şewqê re rû bi rû bimîne kor bibe. Tenê yên ku dişibin agir, dikarin rastiyên ji agir fêm bikin. Vaye, ji van rastiyên ji agir a ku herî sotîner û herî bêman e jî Egîd e. Bi fotoxrafê xwe yê bi heybet, ku di 15'ê Tebaxê de di çapemeniya şoreşger-welatparêz de derketiye, destekî wî bi lûleya keleşê girtiye û li asoyan dinêre, tê nasîn. Hê ji niha de stranên ku hejmara wan ne diyar e hewl didin da ku wî vebêjin. Dîsa çiyayê Gabarê, beyî navê Egîd nayê bîra kesîû nayê ser zimanê kesî. Ew, bûye mijara helbest û çîrokên ku hejmara wan ne diyar. Hema bêje her şervan rûyê Wî jiber kiriye an jîfotoxrafê Wî her li gel xwe hildigire. Şervanên ciwan dibêjin, *" em bi Egîd ûSerokatiyê bawer in"*. Ji bo her kesî/ê efsaneyeke cuda ye, semboleke cuda ye Egîd. Tenê yek rastî heye, ku ji bo her kesî/ê nayê guherîn ew jî baweriyeke bi vî awayî ye; Ew di nav şerê ku hê berdewam dike de her xwe diafirîne û ava dike.Ji derveyê vê, hin caran ne mimkune ku mirov texmîn bike ka Ew di evqas zêde dil û mejiyan de gihiştiye asteke çawa ya hebûnê.

Belê, di jiyana me ya Kurdistaniyan de, ku bi şer ketiye nav bahozekê, yê ku pêk tê Ew bi xwe ye. Ev şervanê mezin ku hema bêje hemû şehîdan di kesayetiya xwe de temsîl dike, her diçe yên dijîn hemûyan jî, di asteke diyar de, bi hebûnek ku bi vî awayîtimî ye temsîl dike. Ev, tiştên ku îro em dijîne. Lê belê gavên vê yên destpekê, di serî de Serok APO ji derveyê hevalên Wî yên nêz ên qada leşkerî, hema bêje di ti bîr û hefizayan de nemaye an jî pirsa gavên destpêkê yên wiha kîjanin, di nav bahozên berfê yên jiyana rojane de, wekî ku bi perdeya spî ya jibîrkirinê hatiye nuxumandin.

Beriya ku ji hoparlora mizgefta Dihê (Eruh), roja 15'ê Tebaxê ya sala 1984'an, ew bangawaziya biheybet belavîli çar aliyên Kurdistanêû her ku çûye belavî cîhanê bibe, çi tişt çêbibûn? Ev kêliya çawa hatibû bidestxistin? Riya ku diçe dilê hemû gel çawa hatibû dîtin û gavên ku di vê riya zor ûzehmed de hatin avêtin, di berdêlê çi tiştan de pêk hatibûn. An jî her tiştê paşê di vî şerî de bihatana jiyîn, di detayên jiyana Wî de dîtin mimkun e. Sinyalên destpêkê yên hemûêş û hemû kîn û rika şerêîro tê jiyîn, di gerîlatiya Wî ya demkurt de dîtin mimkun e. ku ji rastiyeke gelekî ku di dîrokê de hatiye parçe parçe kirin her tiştê kariye rizgar bibe, helbet di rafîneya dehaya fermandarê Wî re, Serok APO, ku di wan rojan de bi awayê embriyon bû derbas bûye, hatiye di şexsiyeta Wî de bûye yek û ji nû ve wekî tovekî teqiyaye.

Dîsa, pêwîstî pênîne careke din em bêjin; her tiştê di Wî de pêk hatiye, çawa ku wê paşê jî pêkhatina xwe berdewam bike, pêwîstiyeke hevaltiya bi Serok APO re bû ku hema bêje ji bo me hemûyan jî xwe gihandina wêhevaltiyê ne mimkun e. Çawa ku Egîd ûSerok APO, hevalên xwe yên di zindana Amedê de ku dijmin nekariye teslîm bigire û çûyine şehadetê, bi jiyankirina 15'ê Têbaxê hê serbilintir kirine,Serok APO jî şehadeta Egîd, pêngava 15'ê Tebaxê bi gihandine asteke jor a jiyanê; bi afirandina Akademiya Mehsûm Korkmaz ku tê de bi deh hezaran şervan saet bi saet perwerde kirinê pêşwazî kir û ev berdewam dike. Ev hevaltiya bêhempa, hê îro jî bi hemû aliyên xwe ve li ber çavên me hemûyan berdewam dike. Dikare bêgotin ku; eger, tevî her tiştîSerok APO hê dijî, ji bo pêkanîna pêwîstiyên vêhevaltiyê ye. Dîsa, dikare were gotin kuSerok APO, wekî hemûhevalên xwe yên mezin ên ku di temena xwe ya pir ciwan de bûn, wekî peykerekî ji şewqê ku ji yekbûna hemûyan pêk tê, hebûna xwe berdewam dike.

Ev hemû, wekî yekparetiyeke jiyanên ku ketine zik hev, îro li ser vê axajê re Kurdistan tê gotin, şerekîpir giran ku belkî jî li ser qedera (çarenûs) hemû cîhana me bandor bike dimeşînin .

Ji ber vê yekê, ji beriya ku Serok APO bê fêmkirin, fêmkirina Egîd ne mimkun e. Dîsa li gel çalakiyên şehîdên din bêyî ku çalakiya Egîd rast were fêmkirin, fêmkirina Serok APO jî ne mimkun e. Ev rastî, wekî goşt û neynûkê bi hev ve ( ew hevaltiya bêhhempa, têkiliyên hevaltiyê) girêdayine.Ti ji van, nikare bi tena serê xwe hebin, ji ber ku dîrokeke yekpare (bütünlüklü) ye, pêvajoyeke yekpare ye.

Ev peykerên ji şewqê yên dîroka bi heybet, qet jî wiha bi awayî şayik-kirîû hatiye boyaxkirin pêknayên. Armanceke herî girîng a pirtûka ku di dest we de ye jî, bal kişandina ser vê ye. Birastî jî, rastiyên hêmû pêşeng û şehadetên mezin, rastiyên ku ewqas zêde dişibin yên hemû şervanan in ku hin caran ji hev nayên cudakirin. Tenê yek cudahiya wan heye; girêdana pir qeyim a bi armanca xwe ve ku hedefa jiyan û şerê wan ev armanc e. Divê maneyê de kêliyeke wan ji kêliyên wan ê din ne cuda ye, ji bo gihiştina hedefê wekî zincîrekê bi hev ve tên girêdan. Wan, hemû hest û qebiliyetên xwe ji bo ku bigêhin armancê xistine tevgerê. Ji derveyê vê, heya asta dawî dişibin kesên nas, tên fêmkirin û zelal in. Ew fêm nekirin , girêdaye bi asta fêmkoriya me ve. Maneya van hemû rastiyên xwerû ( sade), bi awayekî herî ber bi çav di her tiştê ku li pey Egîd maye de dîtin mimkun e. Dîsa jî wekî hemû şehadetên mezin ên din, tiştên ku ji şehadeta Wî bi şûn de mayine, ji tişt û nivîsên taybetzêdetir, pêvajoya hê didome ya şerekî afirandinê ye ku em hemû dikarin rojane pê bihesin. Di

vê maneyê de di jiyana îro ya her Kurdistaniyî de bandorên wan ên herî diyar dîtin mimkun e.

Me, li rêzên jor, Egîd, wekî yek ji afirînerên gelekî,bi awayê peykerekî ji şewqê, ku bi hemû aliyên xwe yên wekîîxanet û girêdayîbûna kûr, raborî (geçmiş) û roja me ya îro ronî dike û li ber çav e, bi bîr anîbû. Di encam de, ev pirtûka di dest we de aliyekî biçûk êfotoxrafê vî peykerî ye. Ji bo mirov karibe hemû peykerê ji şewqê bibîne, ya pêwîst e jî, hê zêde xwe nêzî Gabarê kirin û pêre yek bûne.

Foto: Fermandar Egîd (sf 19 scaner)
Foto: kimlik Fermandar Egîd ( sf 20 scaner )

## QASIDÊ HÊVI Û BEDEWIYÊ
## ELI MEHMÛD RESÛL

Mehsûm Korkmaz jî wekî gelek hevalên xwe, dilê xwe li çiyayên Kurdistanê hiştibûû ji bo demekê derketibû derveyê welêt. Derbasî qada Rojhilata Navîn bibû, ji bo demekê bû; lê dîsa jî pêwîstî bi nasnameyekê hebû.

Ji bo nasnameyêfotoxrafekî reş ûspî dabûn bi nasekî. Kesê nas, piştî çend rojan di dest de bi nasnameyê derket hat. Li ser nasnameyê, li rasta fotoxrafêMehsûm, nivîseke bi awayê*“bi navê xwedê”*hebû. Ya rast, ne bi temamî nasnameyek jî bû. Karteke nasandinê, belgeyeke nasandinê bû. Navê kod ê duyemîn êMehsûmê piştî ji *“Egîd”* jî balkêş bû: Elî Mahmûd Resûl.

Elî di maneyê*‘bilind’* de bû. Mehmûd dihat maneya *“nirxdar, biqiymet”*.Du maneya Resûl jî hebûn; yek ji van navê( sifat) pêxember bû, ya din di maneya *“qasid”*de bû.

Tu dibêjî qey, kesê ku nasname çêkiribû, dizanî ku ev taybetmendî di Mehsûm de hene û texmîn kiribû ku wê her ku sal derbas bin, maneyên wan navan li ser xwe

bar kiribû hê bi awayekî zelal werin dîtin. Xwestibûbi vê belgeyêîsbat bike ku Ew qasidê hêvîû baweriyê ye.

Elî Mehmûd Resûl, bi vê nasnameyê qederekê geriya. Perwerde dît, tevli nîqaşan bû, plansazî (planlama) li dar xistin.

Dîroka stendina nasnameyê 5'êÎlona 1982'an bû. Nasname, ji aliyê Partiya Sosyalîst a Kurdistana Iraqê ve hatibû dayin. Pêvajoya ku ev belge derbas bibûna sê meh bûn. Di belgeyê de dihat xwestin ji bo Elî Mehmûd Resûl alîkarî jî were kirin. Mehsûm Korkmaz, bi nasnameya Elî Mehmûd Resûl li Lubnanê, li Filistînê ma. Demeke ji sê mehan hê dirêjtir ev nasname bi xwe re hilgirt, dema hat welêt jî dil nebir ku biavêje an jî bişewitîne, veşart.

Di van fotoxrafênreş ûspîû rengavêtî yê Egîd de Mezlûm jî hebû. Ji ber ku; mamosteyêEgîd yê destpêkê bû ku ew li Êlihê bi şoreşgeriyê ve dabû naskirin, *"rêû rêbaza"* (reçete)qezenckirina Kurdan, Kurdistan û azadiyê pêşkeşî Wî kiribû. Mezlûm, di axaftinên bi Mehsûm re kiriye de asta Wî ya kûrbûn, baldarîû xwestekê tesbît kiribû. Mezlûm, demaji Kemal, Xêyrîû hevalên xwe yên din re behsa Wî ( Egîd) dikir, gotibû; *"hevalekî zêde zêde biqebiliyet, hewdêr (girişimci) û bixwestek e. Dikare bibe fermandarekî baş, pêşengekîbaş ê gel"*

Mehsûm Korkmaz, taybetmendiyên xwe yên wekî hezkirineke mezin ji welêt , baweriya bi azadiyê, baweriya bi xwe ûgel, ku di kesayetiyêde pir zelal bûn, ev taybetmendiyên xwe yên xweşik biplan û perspektîfên Serok APO re kire yek û veguhezand fermandarekî mukemmel. Ev pêvajoya ji derveyê welêt bi taybetî, wekî polabûnê bi nav kirin gengaz (mimkun) e.

***"DivêKarên Herî Biçûk jî Bi Plansazî Bin;***
***Dema Vala Ya Şoreşgeran Nabe"***

Di nav destxetên notên Egîd de di destpêka yên herî balkêş de, plansaziyên rojane û heftane cih digirin. Hema em ji rêwîtiyan bigirin heya xwarin xwarinê, nûçe guhdar kirinê, perwerde, nîqaş kirin û bêhn vedanê her saeta rojê bi awayekî zêde bi baldarî tê bikaranîn. Di van notên ku nivîsandiyê de bi awayekî pir eşkere xuya ye ku Ew di aliyêbikaranîna demê (wext) de heya asta dawî 'dest lê girtî' (cimri) ye.

Egîd, bi tena serê xwe jî be, li gel grubên biçûk jî be, plansaziya xwe ya rojane ji êvarê de amadekirin, ji xwe re kiribû fêrbûn. Du-sê kes jî bibûna bi misogerî perwerde dihat dîtin. Bi misogerî her roj tiştek ku bihatana xwendin peyda dikir. Di salên ku Egîd jiyan bûye de,ji destxetên hemû gerîlayan eşkere xuya ye ku wan

plansazî amade kirine û ev derbasî rojnivîsê xwe kirine. Roja 17’yêKanûna 1983’ê plansaziya rojane ya Mehsûm wiha ye:

*“8. 00: Rabûn*
*8. 10: BCC, Taştê*
*12.00: Nivîsandina notan û xwendina rêziknameyê (tüzük)*
*2.50: Xwarin hat xwarin*
*3.30: Rêzikname hat xwendin*
*5-9: Bi cîranan re axaftin, guhdarkirina nûçeyan û beşeke nivîsara li ser partiyêhatiye xwendin.*
*9.15: Nûçe*
*9.30: Razan”*

Egîd, tevî ku fermandarê grubê bû,yê ku xebata koordîne û plansaziyê dimeşand ew bû, di nav vê tempoya giran de li hêncet nedigerî, her karê ku hevalên dikir Wî jî bi hewldaneke zêde, dixwest temam bike. Dar dişikandin, nobet digirt, xebata lêkolînê dimeşand.

Vaye plansaziya dîroka 9’ê Çileya 1993’an: *“7:30 rabûn 7:30-8:00 taştê, 8-11 xebata lêkolînê, 11-12 şikênandina daran, 12-13:30 xwarin, bêhnvedan, 13:30-17:00 xebata lêkolînê, 17:30-18:00 xwarin, 18-2:.00 li gel hevalan û bi Abbas re axifîna mijarên cûr bi cur, 23:30 razan, 03-4:30 nobet, 4:30 razan.”*

(Belge no 2 Egîd’in el yazısı)

*“Em Axaftinên Siyasî Naxwazin”*

Li Başûrê Kurdistanê, hedefa sereke ya kadroyên destpêkê yên PKK’ê, peyda kirina binkeyên (üss) ku karibin tê de perwerdeyê bimeşînin bû. Li gel vê jî bi Kurdên Başûr re pêşxistina têkiliyek ku li ser demê belav bûye dihat plankirin. Wan, Kurdên li vî parçeyê, Kurdên Başûr jî*“partîzanên PKK’ê nedizanîn, nas nedikirin.”*Lê diviyabû ev awayêtêkiliyê bihata guherîn û her ku diçe bihata pêşxistin. Ji ber ku yek ji rêgezên esasî ya di programa PKK’ê de jî hedefa *“Kurdistana Serbixwe, Yekgirtî, Demokratîk”* bû. Wê demê nedibû ku ji bogelê li Başûr xemsarî bihatana kirin.

Mehsûm Korkmaz di dîroka 18’êKanûna 1982’an de di rojnivîsa xwe de vandi bîranînên de xwe ku karibe wekî destpêka van têkiliyan were hesibandin, wiha vedibêje:

*“Em wekî grub ji Rojanê di ser Zêvê re di seat 11: 30’an de gihiştin Şinoyê. Piştî ku me li meqereya PDK’ê firavin xwar, ez û “Fîraz” derketin sûkê. Dema em hinekê bi derengî vegerîn, em bi gilîû gazincên xwediyê erebeya ku em bibirana gundê li ser sînor li hêviya me bû re rû bi rû man. Piştî hewldaneke demkurt a îqnakirinê, bi rêwîtiyeke kurt ku 30 deqîqa berdewam kiriye, erebeya me gihişt gundê Şemzurfê ku meqereya PDK’ê lê hebû. Û wekî ku şofêrê me hatiye tembîhkirin, em teslîmî berpirsiyarê pêşmergeyan hatin kirin.Me, israra nedayina 500 tumenên ku xwediyê erebeyê dixwest ( tevî ku zêde bû ), ji ber ku me zerera zilam li ber çav digirt, di cih de nedît. Ji ber ku rojeke xwe dabû me. Li meqereyê bi axaftineke sohbetê ya kurt, heval Selîm hewl da ku rewşa şênî, coxrafya û civaka Kurdistana Tirkiyêû rewşa Seroktiyêîzah bike.*

(*)Fîraz: Emîn Sarık, di dîroka Tîrmeha 1985’an de li gundê Ebûbekra ku ser bi Perwarî ve ye di pevçûnek ku bi hêzên dijmin re ketiyê de şêhîd ket.

*Pêşmergeyan… bi awayêêrênîkirina gundiyan zêde elaqeyek jê re nehate nîşandayin. Serhêjandina berpirsiyarê pêşmergeyan û bi awayekî bêîrade ji her tiştî re bersiva “belê, wiha ye” dayin. Piştî ku me şîv xwar em hatin rêkirin mizgefta gund ku ji bo karwanan hatibû veqetandin. Axaftinên me yên ku wekî sohbeta di navbera min û Selîm de dest pê kirin, bi mijara pevçûna di navbera her du PDK’yan de ûli ser rewşa îro ya civaka Kurd a li Îranê berdewam kirin. Di mijarên wekî paşverûtî de… wê hêzeke bi çi awayê bingeh were girtin, têkiliyên PDK’ê, rewş û cihê wêû hwd. Ji ber ku nîqaş bi awayekî seresera û bêrêbaz dihatin meşandin, bi nedîqatkirina me ya her duyan, dema nîqaş hinekê gihiştin asteke dijwar zêde nehat berdewamkirin. Paşê dema ji bo nimêja eşayê gundî tejî mizgeftê bûn, Selîm xwest em bi gundiyan re biaxifin. Min jîjê re got, ew bi xwe an jî hevalên din dikarin biaxifin. Di wê navberê de Fîraz çû gel civateke gundiyan. Li mercên bi wan re axaftin û nîqaşkirinê seh kir ku ka rewş çi ye. Lê belê ji ber ku gundiyekî got, “em naxwazin axaftinên siyasî guhdar bikin” bi şûn de hat gel me. Selîm ket nav hin hewldanan. Dema tam jî mercên axaftinê derdiketin holê, di kêliya ku Selîm axaftin bir ser taybetmendî, welatparêzîû hwd. Yanî propagandaya parçeya me, gundiyan axaftin ber bi aliyê dînîû nepêwîst ve kişandin. Dest bi hanekan kirin. Tehlûtirşbûna Selîm feyde nekir.*

*Gundiyan dest bi belavbûnê kirin. Gundiyekî dema di derî re derdiket, bi hanekî gotineke zêde nedihat fêmkirin kir û derket ji der ve. Dema Selîm ji min pirsîû got, “wî go çi”; min got, “ji ber niyeta we ya baş hanekên xwe bi we dike”. Selîm jî got, “ev,*

*rebentiya wî nîşan dide". Bi vî awayî, bêyî ku em bi hevalên derdora xwe bifikirin, em, bi dengekî qederekê şidandî ketin nav nîqaşekê. Me, şeva xwe bi nobetê derbas kir.*

*Rojên 19'yêKanûna 1982, 20'êKanûna 1982'an dîsa em li benda ketina rê ne. Me hewl da em bi gundiyan re têkiliyên hê germtir pêş bixin. Bi awayê ku ji girseyekê re were axifîn, min ji wan re axaftinek kir. Min hewl da ku bi kurt û cewherî bi wan, van mijaranbidim fêmkirin: Nêzîkbûnên wan ji bo me sar in, pêwîst e hestên wan ên ji bo PDK'ê yên dijminatiyê ne ji bo hemû gel bin, binkeftina wan (PDK) nayê maneya xelasbûna pirsgirêka Kurd, têkoşîna me û pêwîstiya me bi birayên me û hwd. Bi awayekî sergirtî giliyên xwe dan diyarkirin."*

**Xebatên Avakirina Kampên Destpêkê**

Ji bo ketina Bakur û di demeke diyar de ji bo temamkirina perwerdeya leşkerî-siyasî, neçar bû ku li Başûr baregehek (üss) were avakirin. Lê belê ev pirsgirêk, pirsgirêkek wiha nebû ku bi hêsanî jî were çareserkirin. Diviyabû PDK, YNK û PKI (partiya komînîst a İraqê) li dijî derneketana, jê ecz nebûna. Ji ber ku li qadên PKK'ê dixwest kamp ava bike, kampên van hêzan jî hebûn. Di wan deman de hêzên behsa wan tên kirin, bi zextên (çewisandin) Sedam re rû bi rû bûn. Lê belê ew, li gorîPKK'ê xwediyê derfetên hê mezintir bûn, tengasiya wan a çekan nebû. Pêwîstiyeke pir mezin a PKK'ê bi çek û cebilxaneyê hebû. Pirsgirêkan wan a pereyê nebû. PKK'yî, hema bêje neçar bûn bi nanoziko debara xwe bikin. Van rêxistinan, bi awayê ku wê demê bi nav dikirin *"partîzanên PKK'yî"*ne cidîdigirtin ûne jî jê hez dikirin. Li gorî wan, PKK jî wê wekî gelek rêxistinên din di dawiyê de an teslîm bibûna an jî wê hêdî hêdî biqediya.

Lê kadroyên PKK'ê, bi nêrîneke wiha demîû berjewendîperest li têkiliyan nedinêrîn. Hemû hêzên li qadê, hem cidî digirtin ûhem jî hewl dida ku bi wan re têkiliyên mayende û hev pêşxîner çêbike.

Yekeya ku Egîd fermandarê wê bû, di encama hewldanên dûrûdirêj de dibin xwediyê cihê kampa ku jê re*"Laq 1"* tê gotin. Qadeke li perava Zapê ku li her du aliyên wê tahtên asê heyî… lê dîsa jî, avakirina kampek ku ya wan e, grubê kêfxweş dike. Ji ber ku wêêdî karibe bi awayekî kûr û giran karûxebata leşkerî-siyasî were meşandin, bi awayekî rêkûpêk perwerde were dîtin. Ya herî girîng jî, gelek çalakiyên wekî çalakiya Dihê-Şemzînan ku wê di pêşerojê de encamên girîng biafirandana li vê kampa destpêkê, nîqaş û plansaziyên wan hatin kirin.

**Û Perwerdeyê Dest Pê Kir**

Egîd di zivistana 1983'yan de di rojnivîsa ku nivîsandiye de timî behsa *'xebata plansaziyê yaji bo perwerdeya kadroyan'* dike. Bi dehan hevalên Wî yên ku di tevlîbûna têkoşîna şoreşgerî de bi dudilî tevnegerîne, tenê dikarîn bi perwerdeyeke kûr û giran bigihîştana taybetmendiyên *'kadro'*.

Ji ber vê yekê pêwîst dikir ku taybetmendiyên kadro wekî dersê destpêkê bihata dayin û bi kûrahî li ser bihata nîqaşkirin. Egîd, mijarên ku wê rojekê paşê di dersê de li ser biaxifiya bi dîqet û heweseke mezin li ser deftera xwe dinivîsand.

***"Taybetmendiyên Kadro***

*a-Formasyon*
*zanebûn*
*Ceribandin, qebîliyet*

*b-Qebîliyet*
*hesta fedakariyê*
*hesta berpirsiyariyê*
*giradayîbûna bi wezîfeyê re*
*xwediyê coş, moral û biryar bûn*
*zinditîû timî di tevgerê de bûn*
*fedekarîû baldarî*
*hişyarbûn*

*e- Terza Xebatê*
*Înîsiyatîf*
*Hişyarî-kêrhatîbûn*
*Analîz kirin, lêkolîn kirin, şîrove û şopandina pêşketinan*
*Plan û program çêkirin*
*Kolektîf bûn*
*Sîstem ava kirin*
*Encam derxistin*
*Di çarçoveya rêgezan de tevgerîn*
*Afirîner(yaratıcı) bûn"*

Egîd, paşê li ser keviya rojnivîsa xwe taybetmendiyên din jî zêde kirine. Birastî jî, wexta ku ev not tên xwendin mirov dibîne,ne ku kesek van taybetmendiyên kadro nizane an jî kesek fêr nebûye;jixwe, mijar jî ne ev e. Di serî de Egîd, şoreşgerên wê rojê,bêyî kêmî û kurtî van taybetmendiyan hemûyan tînin cih. Egîd, taybetmendiyên din bi vî awayî rêz dike: Dilnizmî, kîn û serbilindiya çînî, xwerû(sade) bûn, destlêgirtî(tutumlu) bûn, hezkirina ji gel ûçanda gel, qebîliyeta bi gel re bûn yek, pirsgirêkên gel di ser guhê xwe re neavêtin.

Piştî ku van hemûyan tesbît dike, li ser kesayetiya(tîp)model a kadroyê li Kurdistanê jî disekine fermandar Egîd. Piştî ku derbara pêkhateya çandî ya civakê, rewşa dijmin, taybetmendîû cewhera têkoşînê agahî hatine dayin, pênaseyeketemama kadro ya polîtîk û leşkerî hatiye kirin û di bin sergotara *“meylên şaş û taybetmendiyên diyar ên van meylan”* de beşeke cuda jî hatiye nivisîn. Mehsum Korkmaz, di bin mijareke bi serenavê*“li ser feraset û meylên şaş”*, made bi made bal kişandiye ser hin mijaran û di perwerdeyê de bi dîqet hewl daye ku van mijaran vebêje û derxe meydanê.

### *“Li Ser Feraset û Meylên Şaş*

***1-*** *Berpirsiyariya teng-zêhniyeta memûrwarî*

***2-*** *Xeta Partiyêû talîmatên Partiyê li gorî niyeta xwe ya subjektîf nirxandin û pêkanîn*

*(Belge 6 buraya gelecek)*

***3-*** *Xebata hemalwarî, nebûna xwediyê perspektîf, nebûna xwediyê plan*

***4-*** *Hewandina taybetmendîû girêdanên herêmî*

***5-*** *Encam dernexistina ji ceribandinan*

***6-*** *Helwestên sekter*

***7-*** *Li pêşberê zehmetiyan nîşan nedayina berxwedêriyeke têrê dike*

*a-Bêrêgezî (kuralsızlık)*

*b-Bêdîsîplînî*

*c-Helwestên egoîst*

*Di aliyê xwe li tiştan qelibandinê de zeîfî*

*a-Di xebat ûtêkiliyên nav gel de*

*b-Di pêşîgirtin û çareserkirina pirsgirêkên cur bi cur de*

*c-Di çalakiyê de”*

Egîd wexta ku van taybetmendiyên milîtanan vedibêje, lê bawer dikir ku herî zêde pêwîst e ew bi xwe bibe xwediyê van taybetmendiyan. Diviyabû fermandarekî, beriya pêşin ev taybetmendî di xwe de bidana destpêkirin.

**Lenîn Fêr Kiribû**

Ji demên ku fêrî sosyalîzmê bibûû li ser sosyalîzmê lêkolîn kiribû pê de tiştê Lenîn gotiye ji xwe re kiribû guhar. ***“Lenîn digot,*** *“ bi rapora ku milîtanek wê bide jora xwe, tê pîvan ku wezîfeya xwe pêkaniye an na”*

Egîd, ev axaftin di perwerdeyan de pirî caran dubare dikirin. Wî, bi xwe jî tenê rojekê jî nivîsandina rapora xebata ku kiriye paşguh nedikir, û her wiha jî ji bo ku di wextê de van bigihîne cih dîqet dikir. Bi awayê nameyên kurt be jî, bi misogerî dinivîsand. Li Lolanê di dîroka 22’yê Adar’a 1983’an de raporeke ji 12 rûpelan pêk dihat nivîsand; piştî ku kar û xebata grubê, made bi made nirxand, rapora xwe ya şexsîjî bi madeyek ku behsa rewşa xwe kiribû nivîsandibû.

*Wiha digot Fermandar Egîd: “tevli xebata kampê bûna min zeîf û nebes bû. Ez tevli beşeke biçûk a civînên nirxandinê yên heftane û grubên xwendinê bûm. Ji bo ku ev civîn hê bihêztir bibin zêde destekeke min çênebû. Di seransera jiyana kampê de li gel min seknek temaşevan û di halê xwe de mayî hakim bû. Min nekarîbû vê pêvajoya sê mehan di aliyê xwe de jî binirxînim, jê sûd wergirim. Di aliyê xwendin û lêkolînkirinê de, ez li pey tempoya giştî ya kampê mam. Tevî ku nivîsa semînerê ku di aliyê naverok de ne xirab bû, di aliyê bi awayekî rehet kûrkirina mijaran de kêm ma. Di*

*Beşeke girîn a mijarên ku min girtiye dest de li ser maheke derbas bûyî… min pratîk û terza xwe ya xebatê kir mijara lêkolîn û rexneyê.*

*Li pêşberê xebatên giştî wekî temaşevan mayina min, ji bo şexsa min bi xwedi asteke bêarmanc û nebes de ne ma. Min sedemên ku pratîka me ya boriye ji ber çi bêrêxistinbûn, bêplan û hem jî timî sernekeftî bûye bi zelaliyeke hê safî dîtiye. Û min, avakirina sîstema terza xebata rast û têgihiştina rêbazên vê; nakokîû rastiyên di navbera kêmasiya pratîzekirina destpêkê de derxist meydanêû ji bo ku ez vê vê çareser bikim, min xîret nîşan da. Bi min baweriya min tam e ku ez ê vê derbas bikim.”*

(Belge no 7 buraya gelecek)

Egîd, bi wî şiklî xwe rexne kiribû. Wî li gorî xwe evqas kêmasî jiyankiribû, û xwe *"sûcdar"* didît. Li beranberê hevalên xwe, li beranberê gelê xwe di asta herî dawî de dilnizm û nerm, lêli beranberê dijmin jî bi qasî wê dijwar û bêrehm. Wexta ku vê ji xwe re wekî rêgezên jiyanê qebûl dike jî ji bo kêmasîû şaşitiyên ketiye nav li bahaneyan nagere, lê bi misogerî ji bo derbaskirina wan riyekê peyda dike. Di wan deman de mekanîzmaya rexneû rexnedanê di nav PKK'ê de bi qasîîro ne xurt bû. Bi taybetîji bo ku stûna rexnedanê xurtir bike hewl dide û vê di şexsiyeta xwe de dide destpêkirin.

## "Divê Ev Not Di Rewşeke Tehlûke De Werin Imhakirin"

Egîd bi grubên li derdorêû bi ***"jor"*** ve bi awayekî bi rêkûpêk di nav têkiliyeke danûstendin a agahiyan de ye. Ev têkilî hê bêhtir bi riya not û nameyan tê domandin. Direwşên girîng de jî rapor tê nivisîn. Niha, em ji van yekê bixwînin:

*"Ji bo heval Cemal/01.11.1982*

*Derbara çarçove, şikl û hedefên xebata ku hûn ê ji leq-1'ê ber bi welat ve bimeşînin jixwe, li cihê ku hûn hatine wezîfedarkirin we talîmata pê hewce girtiye.*

*Em ê di dema pêş de karibin talîmatên hê berfireh ji we re bişînin, hûn di heman demê de li gel me jî (Lolan-Kaşan) têkilî çêdikin. Hûn dikarin di derbara rewşa hêzên Iraqûtêkiliyên me yên bi wan re de ji hevalên li gel xwe agahiyên destpêkê bigirin. Di vê pêvajoyê de hêzên ku em herî zêde û bi berfirehî li gel wan têkilî datînin PDK, PKIû PSKI (Partiya Sosyalîst)e. Hûn, hewl bidin ku têkiliyên xwe yên bi hêzên wan ên li wir in re di rewşeke baş de bigirin. Divê mirov ji helwestên ku berpirsiyarên PDK'ê biqewet bike xwe bide aliyekî.*

*Divê riya hatin-çûnê ya di navbera Sûriyêde timî vekirî were hiştin, û hûn hewl bidin ku riyên cuda vekin. Diviyabû, cihê ku grub lê dimîne ji sînor hinekêli wî aliyî bibûna. Eger hê nehatibe çêkirin, wexta ku şertûmerc destdayî dibin hewl bidin çêbikin.*

*Divê di derbara gruba Kenan wan de bi misogerî encam were girtin. Li gundên Iraqû Tirkiyê, gundên nêzî cihê bûyerê lêkolîn bikin. Pêwîst e, di vê mijarê de PDK alîkariya we bide. Li gel wan biaxifin.*

*Kenan: Şahîn Klavûz

Li vir; 8 gerîlayên HRK'ê û 5 pêşmergeyên PDK'ê ku sala 1982'an li qiraxên ava Hêzil ji aliyê hêzên dijmin ve hatine xistin kêmînê û şehîd bibûn tên vegotin.

*Her du paketên ku em dişînin û zilamê ji rêxistineke din e di demeke herî kurt de û beyî ku bidin sekinandin, bi awayekî pir saxlem û pê bawerî dibe, tavilê bişînin …'ê. Ji paketan di ya biçûk de agahiyên pir girîng hene. Divê bi şiklekî bimosegerî were parastin, di rewşeke tehlûke de jî were îmhakirin. Pêwîst e bi ti şiklî nekeve destêdijmin.*

*Di meqereyek ku li nêzî we ye de gruba Delîl dimîne, bi wan re eleqadar bin. Eger weşanên nû hebin ji wan re bişînin.*

*Silavên Şoreşgerî*
*Egîd"*

**Xebatên Kampê**

Di destpêka sala 1983'an de, di 6'ê Çileyê de hêdî hêdî xebatên kampê jî digihîjin asteke bi rêkûpêk. Egîd di rojnivîs û notên xwe de bi şiklekî hûr û kûr plana vê xebatê daniye.

Bi şiklê sernivîsan xebatên kampê bi vî awayî ne:

*"Mijar*

*1- Nirxandina rewşê*
*a- Şertûmercên heyî (bi giştî, bi taybetî)*
*b- Şiklên xebatê (taybet)*
*c- Kêmasî*
*d- Pêşniyar*
*2- Xebata di nav gel de*
*a- Şiklê xebata îlegal: li bajar û merkezan, li herêmên çolterê(kırsal)*
*b- Qad û amûrên xebata îlegal*
*c- Birêxistinkirina girseyên gel*
*d- Meylên şaş ên di xebata girseyên gel de derdikeve meydanêû rêû rêbazên derbaskirina vê*
*e- Li beranberê girseyên gel ên cuda, polîtîkayên di pratîkê de werin meşandin*
*3- Birêxistinkirina Cepheyê*
*a- Şikil*

*b- Têkiliyên hêzên cepheyê bi hev re*
*c- Têkiliya Cephe û Partiyê*
*d- Têkiliya cephe û hêzên çekdar*
*4- Talîmat*
*5- Li Kurdistanê şer*
*a- Teknîk*
*b- Şikl û taybetmendiyên şer*
*c- Terza bicihbûn û tevgerê ya gruban*
*d- Qural û qaîdeyên hundir û derve*

*Gruba Nîqaşê Ya Kampê*

*Emîn, I. Elî, Yaser, A. Qedir, Musa, Îsa, Sadan, A. Haydar, Şerîf, Ridvan, Hesen, Zekî, Şewqî.*

*Programa Xebata 15 Rojan A Gruba Nîqaşê Ya Kampê*
*1- Terza tevgerê ya Yêkîneyên Propagandaya Çekdarî (YPÇ);*
*a- Şiklên di herêmên … de bicihbûn û xwe bi xwedîkirinê*
*b- Tewdîrên ku di meşê de werin girtin*
*c- Tewdîrên ku di pevçûnan de werin girtin*
*2- Plansazî(planlama)*
*a- Çalakî, plansazîû tesbîta hedefê*

*Bedran: Memed Sevgat*
*Qadir: A.Qadir Hançer, di sala 1985’an de şehîd ket.*
*Musa: Çetîn Akkurt, di sala 1985’an de şehîd ket.*
*Îsa. …Çalışkan, di sala 1985’an de şehîd ket.*
*A.Haydar: Di sala 1985’an de li Dêrsimê şehîd ket.*
*Samî: Ji Ereban (qezaya Dîlokê) e, di sala 1985’an li Şîrvanê dîl dikeve destê dijmin.*
*Hesen: Emîn …ji Hîlwanê ye; di sala 1986’an de şehîd ket.*
*Şewqî: Memed Înan. Di sala 1987’an an jî di sala 1988’an de şehîd ket*

*b- Plansaziya xebata nava gel û perwerdê*
*c- Plansaziya perwerdeya hindurîn*

*3-　Birêxistinbûn*
*a-　Pêkhateya(bileşim) grubê*
*b-　Li gel rêxistana Partiyê awayêtêkiliyê*
*c-　Birêxistinkirina girseyên gel, şikl û amûrên wê*
*d-　Bi hev re têkilîû danûstendin  çêkirin, qurye*
*e-　Agahî ji hev stendin*
*f-　Hêz û qebiliyeta şer a yêkîneyan*
*a-　Faktorên heyî (xwezayî, çêkirî)*
***b-**　Çavkanîû riyên pêşxistina faktoran*

Egîd, beriya ku bikeve welêt li ser axaftinên dîrokîû analîzên kûr ên kuSerok APOli ser nirx û maneya vegera li welêt kiribûn difikirî. Ya din jî Mezlûm û hevalên xwe yên din tenê kêliyekê jî, ji mejiyê xwe dernedixist. Diviyabû berxwedana Mezlûm bihata gihandin çiya.

Ev hemû berpirsiyarîû wezîfe jî encax dikariya ku bi îrade, fedekarî, xwestek û plansaziyeke mezin bihatana pêkanîn. Mehsûm Kormaz ji ber vê yekê hewl dida ku bi misogerî maneyekê bide her kêliya rojê, her deqîqaya rojê manedar bike. Ji ber vê yekê, wanbi dîqeteke mezin xebatên kampê bi rêkûpêk kirin.

(Belge No. 10)

“Tenê yên ku dişibin agir, dikarin rastiyên ji agir fêm bikin.” (bu söz bir sayfa olarak düzenlenmiş)

**LI DIJI CUNTAYA 12’YÊ ÎLONÊ LÊGERA CEPHEYÊ,**
**CEPHEYA BERXWEDANÊ YA YEKGIRTI YA LI DIJI FAŞIZMÊ**

Wexta ku sal bibû 1982, cuntaya faşîst a li Tirkiyê bi awayekî ji xwe piştrast pê mijûl bû ku planên xwe pêk bîne. Bi taybetîli beranberê bertekên raya giştî ya ji derve û dewletên Ewrûpayê, cuntayê gavek avêtibû. Wekî gava destpêkê ya derbasbûna

demokrasiyê, wê*“di şertûmercên demokratîk de”* hilbijartin bihatana kirin ûmakezagon ku cuntayê dabû çêkirin, wê pêşkeşîrefarandumê bihatana kirin.

Di vê merhaleyê de PKK jî vala nedisekinî, ji bo ku pêngav û planên cuntayê pêşwazî bike, bi şiklekî kûr û berfireh dixebitî. Armanc ew bû ku hemû hêzên li dijî hêzên faşîst şer dikin, di nav cepheyeke şirîk de bîne gel hev. Ji ber vê yekê, hem li Ewrûpayêhem li Rojhilata Navîn û hem jî li Kurdistanê li gel rêxistinên mijara axaftinê hevdîtin berdewam dikirin. Ji gelek rêxistinan gelek şoreşger, di kampên PKK'ê de dihatin *‘pêşwazîkirin’*û li gorî derfetan alîkarî dihat dan. Ji Bakûr dihatin derbaskirin Başûr, ji Başûr dihatin derbaskirin Bakûr û ji wan re quryetî dihat kirin.

Di vê pêvajoyê de xebata herî diyar û pêwîst e cidî were girtin xebatên *‘Cepheya Berxwedanê Ya Yekgirtî Ya Li Dijî Faşîzmê’* ye. Mehsûm Korkmaz jî bi xwe di nav van xebatan de cih digirt û bi navê PKK'ê pir hevdîtin çêdikirin. Di encama van hevdîtinan de, gelek rêxistinan ji ber ku di aliyê rêgez de qebûl dikirin cephe ava bû.

Cuntaya faşîst plan dikir di 7'ê Mijdarê de hilbijartinekê çêbike; bi vê, pratîka xwe hê rehetir bidomîne û planên xwe yên bi qirêj *“rewa bike”*.CBYLDF'yê(Cepheya Berxwedanê Ya Yekgirtî Ya Li Dijî Faşîzmê)jî biryar dabû ku maneya rastîn a van hilbijartinan bi gel bide fêmkirin ûkampanyaya dijber bi rêve bibe; ji bo vê xebat dimeşand.

## Belavoka Ku Egîd Li Ser Navê CBYLDF'yê Nivîsandibû

*“Jigelên Tirkiyêû Kurdistanê re!*

*Cuntaya 12'ê Îlonê ya Tirk a dagirker-faşîst a dest bi xwîn, dev bi gilêz, ku ji aliyê DYE'yê ve tê birêvebirin û xwediyê pratîkeke faşîst e, ji du salan e vir de li dijî gelên me şerê tepisandin ûîmhayê dimeşîne. Di encam de cilê wê yên şer tev biqirêj bûne. Ji ber vê yekê hewl dide, bi ser van cilên bi qirêj de cilên spî li xwe bike. Dixwaze, bi vê, xwe rewa bike. Ji bo karibe vê sazîbûnê rewa bike û talan, dagirîû pêkanînên zilm û zorê bi riya makeqanûna ku çêkiriye bi rêbaza domdarkirinê li ser civakê hakim bike, ev referandûma ku rêbazeke bûn xwediyêîradeya gelan e û ew îrade bikaranînê ye pêş xistiye.*

*Cuntaya faşîst ku bi rêveberiya xwe ya du salan ji bo gelên me yên kedkar bûye sedema feqîrtî, zehmetiya ekonomîk, bêkarî, talan hema ji ber ku xwediyê hesteke biçûk a welatparêzîû demokrat e bûye sedema ketine zindanê, êşkişandin û barandina rondikên çavên bi sedhezaran însanên me, ji bo karibe rê vebike da ku burjuwaziya komprador-tekdestdar ji krîza ketiye nav xwe rizgar bike, kedxwarîû*

*feydeyeke(kar)bêsînor pêkaniye. Emperyalîzma DYE'yê li ser herêmê xebata xwe ya êrîşê bi riya hêzên herî aktîf ên bi navê "hêzên bilez" dimeşîne û hewl dide herêmê ji vê hêzê re bike binke(üss). Ji bo ku vê yekê pêk bîne, ji ti tiştî xwe nade aliyekîû ti dudilî najî. Ji ber vê yekê jî bi cesareteke mezin amadekariyên leşkerî tên kirin ku ev rastî,qasî ku jê guman nebe ji aliyê serokê cuntayê Kenan Evren ve di gerên dan naskirina anayasayê detên anîn ziman.*

*Têkoşînên kedê yên çînên karker û kedkar, mafên wan ên ekonomîk, sosyal û demokratîk ên ku di seranserê dîroka wan de bi darê zorê ji burjuwazî hatine girtin, bi talîmatekê ji binî de jê hatiye girtin, bi ti awayî derfeta xebata sendîkal, grevêû peymana topyekun nehatiye hiştin. Li febrîqeyan di bin siya çekên qomandoyan de, bi rêbazên eşkere kolekirinê yên di serdema Almanyaya Hitler a faşîst de bi maaşeke kêm, karker anîne ser kar.*

*Ji ber aramîû di halê xwe de mayina hilberînê(üretim) ûîflasan her roj gelek kargeh tên girtin; bi hezaran karkerên li van deran kar dikin tên avêtin kolanan ûtevli arteşa bêkaran dibin.*

*Wisa lê hatiye ku gundiyên feqîr ên ku nikarin debara xwe bikin, tehnû birçîû pêrîşan, neçarî jiyanek ku jê re nikare jiyan were gotin bûne.*

*Karsazên biçûk û navîn û esnaf her roj bi îflasê re rû bi rû dimînin û çawa ku nikare ji dewletê heqdestê xwe yê tiştê ku firotiye bistîne herwiha jî ji ber ku nikare vergîû lêçûnên hilberînê bide bi ser de jî deyndarê dewletê dimîne.*

*Ji ber ku maaş ûqeweta kirînê ya memûran kêm bûye, bi hezaran memûr neçar maye dest bi amaletî, hemaltîû karên hwd kirine. Bi deh hezaran jî ji ber ku ji wezîfeyê hatine derxistin, her roja derbas dibe di aliyê debara xwe kirinê de dikevin rewşeke xirabtir.*

*Di dibistanan de li gorîîdeolojiya faşîst-şoven û çanda jirêderketî ya emperyalîzmê ciwan tên mezinkirin ûperwerdeya bingehîn tê dayin. Nerazîbûneke herî biçûk a xwendevanan ji aliyê cenderme-polîsên ku li dibistanê hatine bicihkirin ve bi şîdet û darê zor tê tepeserkirin.*

***Belge no 9 bir sayfa***

*Li ser çapemeniyê bi tamamî xizmetkarîû tirşikçîtiya cuntayê tê ferzkirin. Bi giştî, ji bo ku pêş bikeve ji ti beşên civakîû saziyên siyasî re derfet nayê dayin. Civak, di nav şertû mercên reş û tarî de tê ragirtin, bi ti awayî ji bo kombûn an jîtêkiliyeke civakî derfet nayê dayin û hewl tê dan ku têkiliyên navbera şexs û civatan were qutkirin.*

*Li Kurdistanê bi operasyonên girtinê, nêçîra şoreşgeran tê domandin ûkuştinên hovane li pey hev tên çêkirin. Malbata ku ji aliyê gelê me ve saziya herî pîroz tê hesibandin, tê texrîbkirin û hema bêje wekî tê xwestin ji bo jiyana li Kurdistanê werin poşmankirin, bi koçberiyê re rû bi rû tên hiştin. Gelek gund hatine hilweşandin û şewitandin, neçar kirine ku gundî bi destên xwe tiştên pê debara xwe dikin, malên xwe tine bikin. Feraseta namûsê ya gelê me hatiye binpêkirin û jinên me ji bo leşkerên artêşa faşîst hatin pêşkeşkirin. Li zindanan li ser kadro û sempatîzanên PKK'ê yên ku teslîmeyetê qebûl nakin îşkence berdewam dikin. Li beranberê serî netewandin û heybeta girêdana ji bo gel û Partiyê ya hevalên me yên berxwedêr, cuntaya leşkerî-faşîst ku tirs ketiye dilê wî, ji bo bi riya îdaman van şexsan bibe mirinê cesaret nake û ji ber vê yekê jî rêbaza bi hovanê kuştinê didomîne.*

*Cuntaya faşîst-dagirker ku li ser serê gelên me yên cefakar van tiştan dimeşîne, makezagona dixwaze bi we bide qebûlkirin 'dîsa li demokrasiyê vegerin' ji dereweкê cudatir ne tiştekî din e. Tiştê ku jê re dibêje vegera li demokrasiyê, wê kêrî nuxumandina rûyê rastîn ê dîktatoriya faşîst-leşkerî were; ji bûn şiklên rêveberiyên faşîst-sivîl cudatir nebin tiştekî din. Asta ku kapîtalîzma Tirk a tekdestdar xwe gihandiyêû di şert û mercên krîzê ku tê de dijî de ji bo ku karibe jiyana xwe bidomîne neçar e faşîzmê biceribîne. Nikare bifikire ku ji vê riyê paşde gav biavêje.*

*Parlemento û hikumeta ku bi makezagona nû çêbîbe wê domdariya siyaseta ekonomîk a burjuwaziya komprador tekdestdar (tekelci ) pêk bîne, pratîze bike û her yek jê ji saziyek ku sîstemê pratîze dike cudatir nebe tiştekî din. Wê niha hemû rayêûqeweta siyasî-edlî di destê Saziya Ewlekariya Milî ku ji endamên konseya cuntayê ve tê pêkanîn de kom bibe, ev deste wê bibe cihê herî bilind ê biryar girtin ûqanûn çêkirinê. Makezagona cuntayê ya ku dixwazin bidin qebûlkirin, azadiya çapemenî-weşanê, heqê grev-peymana komî (toplu sözleşme), mîtîng, meş çêkirinê, komelgehû sendîka avakirinê di asteke mezin de hatine astengkirin, û hatiye xistin bin kontrola dîkdatoriya faşîst. Bi qanûnên hatine çêkirin pêşketina ekonomîk, sosyal û siyasal a beşên civakî yên kedkar û navîn hatiye sekinandin, ji bo ti muxalefeta ekonomîk a vekirî jî destûr nayê dayin. Pêwîst e ji qanûnên hatine çêkirin û meşandina wan were fêmkirin; rêvebiriyek ku di ser vêmakezagona ji aliyê dîkdatoriya faşîst a leşkerî re hatiye amadekirin, wê di ti maneyê de ji ya kevin cudatir nebe. Wê ji tufana kedxwariyê, zilm û zora harbûyî tiştek kêm nebe; berevajî hê jî zêde bibe. Wê nirxên madî yên dawî yên di destê gelên me de jî, bi riya xesp û talanê ber bi tinebûnê ve were birin.*

*Dîktatoriya faşîst a leşkerî ji ber vê yekê hewceyî pê dibîne ku 'derbasîrêveberiya sivîl' be: Li hundir heta di nav beşên civakê yên burjuwa de ûbi taybetîjî nerazîbûna di raya giştî ya Ewrûpayê de zêde dibe kêm kirin, pêşîgirtina li bênavber xirabûna arteşa faşîst: wekî ji axaftina dawî ya Kenan Evrenku li Antalyayê kiriye bi şiklekîeşkere tê fêmirin, li beranberê pêşketinên pêşverû yên li herêmê bi armanca destwerdan ûêrîşê, vê artêşê amade dikin.*

*Piştî ku cuntayê beşa plana hindur a ji xwe re kiriye hedef pêk aniye, wê hewl bide, beşa vê planê ya ji derve kuDYE'ê plan kiriye û tevgerên leşkerî yênli herêmê dihewîne pratîze bikin. Cuntayê di van demên dawiyê de van armancên xwe hê zelaltir nîşan daye. Kampanyayek ku şovenîzmê dîn û har dike daye destpêkirin, hewl dide ku raya giştî ya Tirkjehr bike ûhedefan bide şaşkirin. Belê, cuntaya faşîst dixwaze ku hedefên xwe yên di hundir de bi dan qebûlkirina makezagonê bi dawî bike û dest bi maceraya xwe ku ji gelên me re hilweşîn ûêşeke mezin bîne, bike. Di gera dawî ya Kenan Evren de, şiyarên ku ji aliyê wî ve jî hatine avêtin ên wekî "Tirkiyeya mezin" ji bo vê niyetê delîlên eşkere ne.*

*Ev makezagon, makezogonekefaşîst a wisa ye ku wê ji bo gelên me yên Tirkiye, Kurdistan û gelên herêmê were maneya zordestî, kedxwarî, kuştin,parastina berjewendiyên burjuwaziya tekdestdar, noker û hakimiyeta vê çînê heya bi hucreya dawî di nav dewlet û civakêde berfireh kirinê; wêdi encam de bi şiklekî bi sîstem pêşxistin û saxlemkirina nîrê dagirîû kedxwarî ku li ser gelên me heye hêsantir bike, ti maf û azadiyên me yên bingehîn nas neke, hemû kedkaran neçarî xizmetkariya kulmek dewlemendbike û hê jî girantirkirina asîmilasyon û çewisîna neteweyî bike armanc.*

*Divê ji bo vêmakezagonê ku wê di 7'ê Mijdarê de were xistin dengdanê, bersiva me 'na' be.*

*Ji bo gelên me yekane riya rizgariyê ew e ku hemû hêzên şoreşger, demokrat, peşverûû welatparêz di nav Cepheya Berxwedanê Ya Yekgirtî Ya Li Dijî Faşîzmê de bi têkoşîneke şirîk bi şoreşê, faşîzmê hilweşînin!*

*-Bimire dîktatoriya faşîst a leşkerî!*

*-Em ê bi têkoşîna berxwedanê ya yekgirtî ya gelên me bi ser bikevin!*

*-Her bijî Cepheya Berxwedanê Ya Yekgirtî Ya Li Dijî Faşîzmê!*

*BerdevkiyaCBYLDF-PKK'ê ya Îran-Îraq"*

Mehsûm Korkmaz li ser navê CBYLDF'ê bi xwe ev belovak nivîsand. Ji beriya ku referandûma ku di 7'ê Mijdarê de bihata çêkirin, di radyoyê PDK-I'ê de hate xwendin.

Belge no 10(bir sayfa olarak düzenlenmiş)

## Civîna Ku Di Dîroka 03.03.1983'an De Hatiye Lidarxistin

Di wê zivistanê de li kampê gelek civîn hatibûn lidarxistin, gelek hevdîtin hatibûn çêkirin û agahî hatibûn bidestxistin. Kadro jî li gorî şert û mercên heyî perwerdeyeke baş dîtibû.

Di civînê de mijarên wekî nirxandina rewşa siyasî, nirxandina li ser talîmatan, xebata rêkûpêkirinê ya karûbarên ser sînor, li ser xebata kifşên nû plan çêkirin hatin bidest girtin û li gel vê, mijarên rojeva taybet ên wekî*"rewşa Silêman, nirxandina xwesteka hatina gel me ya hevalê*[(1)]*A"*jî hebû. Silêman,Bakî Karerê ku wê paşê ji şoreşgertiyê dest berdaya bû. Li beranberê zor û zehmetiyan, li beranberê pirsgirêkan nedikariya ku helwesteke şoreşgerî nîşan bida, û zehmetî dikişand. Herî dawî pirsgirêk gihîşt ber destê rêxistinê jî. Û di nav notên ku Egîd nivîsandiye de cihê xwe girt.

Di nav notên ku Egîd ji beriya vê civînê girtiye de beşeke girîng li ser xebata kampê bûn; yanî li ser kampa merkezî ya Lolanê bûn. Egîd, li gel behsa kêmkirina hejmara hevalên li kampa Lolanê kirinê, behsa pêwîstiya bi cihbûna li kampen ku PDK jî nizane dikir.

[(1)]*Abbas: Duran Kalkan*

Burası ıı Ji bo karûxebatên nav welêt jî tesbîteke bi şiklê, '*bi awayekî destdayî bi belavbûna seransera li ser sînorên welêt û piştî ku ev dever wekî cepheyên paş lê hatin kirin dikare her ku diçe bilind be'* kiribû. Wî, ev nêrînên xwe di civînê de jî anîn ziman.

*"Cephêyên paş, bi qasî ku cepheyên pêş pêş ketine û bihêz bûne, digihîn îstîqrarê. Bêyî ku ev were kirin, cihên cepheyên paş ên ku demeke dirêj werin bikaranîn peyda kirin wêzehmed be. Dibe ku li gori rewşa hêzên cur bi curû nakokiyên wan ên bi dijminên me re, bi qasî tesîrbûnên ji pêşketinên neyînî hin cihên xwediyêîstîqrar hebin.*

*Cunta hewl dide da ku herêmên ku em wekî cepheyên paş bi kar tînin tengav bike. Pêwîst e em li dijî van hewldanan jî, hin tedbîr pêş bixin. Ji van tedbîran ya herî girîng jî ew e ku em xebatên xwe yên di nav welat de bicihbûnê bilez bikin."*

Wekî ku bi şiklekîeşkere ji vê notê jî tê fêmkirin, Egîd welêt û karûxebata di nav welêt de esas digire. Balê dikişîne ku pêwîst e herêmên cepheya paş li şûna xebata esasî neyê bicihkirin. Di vê civînê de wexta ku li ser "plansaziya karûxebata hundir" nîqaş tê kirin analîzên bi vî şiklî pêş dixe:

*"Hedefa destpêkê ya plansaziyê ew e ku di sêgoşeya Hekarî, Sêrt û Wanê de xebatên binkeyên (üss) siyasî yên îlegal werin çêkirin. Divê sewq ûîdareya xebatan li ser sînorêIranû Iraq were lidarxistin, divê yekeyên(birim) merkezî derfeta bicihbûna di nav qadêû birêvebirinêde biafirînin. Dikare ev sêgoşa bi vî şiklîji hev were cudakirin:*

*1- Xetek ku destpêka wê, herêma Gerdî ya Şemzînan e û bi rojhilata GeverêûsînorêIran didome.*

*2- Qadek ku ji herêma Oramar-Dostkîû heya bi rojavaya Geverê digire nava xwe.*

*3- Derdora aliyê bakûr ê merkeza Çeleû merkeza Hekariyê*

*4- Qada ku ji Qilaban pêde ber bi bakûr ve merkeza Beytulşebab digire nav xwe.*

*5- Herêmek ku di nava sînorên Şirnex, Dihê(Eruh) û Berwarî(Pervari) de dimîne*

*6- Wekî ku Elkê (Başkale) di navenda wê de be, li bakûr Gurpinar û li aliyê başur heya bi sînorên Geverê herêmek.*

*Divê ev tevgera berbelavbûnê ku bi şiklê şeş grubên ji sînorên Iraq ûIranê dest pê dikin û ber bi van herêmên xebatê ve berfireh dibin, wekî pêla destpêkê ya pêşketinê were nirxandin. Cihê ku divê hemû grub bikevin tevgerêû lê hev bibînin, derdora bakûr û rojava ya merkeza Hekariya ku naverasta coxrafyaya sêgoşê ye. Ev nuxte bi taybetmendiyên xwe yên wekî, di nîvinga herêmê de cihgirtinê, bi kar nehatina riyên wê yên hatin û çûnê, araziya wê ya ji bo tevgera gerîla destdayî, di herêmê de ji bo tevgera veşartî nuxteyeke herî destdayî ye.*

*Ev nuxte ku wê ji aliyê şeş herêmên sînorên wan li jorî hatine diyarkirin ve were dorpêçkirin; çawa ku wê karibe rêvebirîû kontrola karûxebatan bike, herwiha jî xwediyê wê derfetê ye ku wê karibe ji operasyonên dijmin ên dorpêçkirin û tecrîdê xwe xelas bike.*

*Wexta ku ev gundên di nav şeş herêman de ne ji rêxistintinbûnê re hatin vekirin û ji bo afirandina nuxteyeke wiha ya ku di merkeza vanherêman de ye wexta ku şert û*

*merc hatin amadekirin, wê were hesibandin ku merhaleya destpêkê ya berbelavbûnê hatiye temamkirin.*

*Dikare li gel van xebatan li ser xeta ku navçeya Qerqelî (Özalp)-Muradiye xwe digihîne sînorêIranê, ji bo kifşê grubek were wezîfedarkirin. Dikare xeteke hatin-çûnê ya ku ji ser Mako, Çaldiran, MelezgirûQopê (Bulaniq) ve xwe digihîne Gimgim (Varto). Dikare ji bo hatin-çûnêxetek ku ji ser Leq-I, Şirnex, Eruh, Bayqan û Kozlukê ve xwe digihîne Sasonê were amadekirin. Dikare ji bo derdora Sasonê grubeke kifşê were derxistin.*

*Ji bo ku li ser xeta Iran, Aralık, Tuzluca, Digor, Qers û li ser sînorê Erîvanêtêkilî çêbike ûxeteke kifşê amade bike, dikare grubek were rêkirin. Di merhaleya destpêkê de li gel wezîfeyên werin pêkanîn, di herêmên hatine diyarkirin de wê karûxebatên kifşê jî werin domandin; dema ku ev xebat tên temamkirin xebata pêla duyemîn, ku di merkezê de Muş, Çewlîk û Qers heyî de xebata bicihbûnê(üslenme) û wezîfedarkirina tovên rêxistina teng wê were destpêkirin. Wexta ku her du merhaleyên xebatê hatin temamkirin, divê ji bo ku endamên kadro û şervan werin derxistin û di kampên cepheyên paş de werin perwerdekirin,hejmara yekîneyên propagandaya çekdarî were zêdekirin.”*

Egîd, ku planê ketina welat bi awayekî evqas berfireh derxistiye meydanê, hesab dikir ev plan di dawiya havîna 1983’an de dikare were temamkirin.

Di roja 20’ê Adara 1983’ê de civînek hat çêkirin. Mehsûm Korkmaz bi raporeke berfireh tevli vê civînê bibû. Dema ev plansazî li dar xistibû, ku wê bi çend hevalan bihata meşandin, rewşa kadroyên heyî li ber çav girtibûû plansazî çêkiribû.

Li gorî vê divê hejmara gruban di navbera 3 û 5 kesan de bibûna û ji bo ku di yekîneyan de taybetmendiyên endaman ên wekî şexsî, pratîk û siyasî hev temam bikira bihata dîqetkirin. Pêwîst e kapasîteya propaganda, tevger ûînîsiyatîfê bilind were ragirtin.

Egîd, rewşa di zindanên wê demê de li ber çav girtibûû di vê mijarê de jî pêşniyarek pêşkeş kiribû: *“ji bo kuştin ûîdamên di zindanan de bi armanca bersivdanê, ji bo çalakiyên li ser qereqolên ku ewlekariyên riyên esasî digirin ên ji dûrî herêmên sînor divê amadekarî werin kirin.”*

***“Rewşa me ya malî ne baş e”***

Egîd û hevalên wî bi coşeke mezin berê xwe dabûn welêt;moral, coş û xwesteka serkeftinê ya wan temam bû. Xebat jî her diçû saxlemtir bi cih dibûn. Wexta ku cetvelên malî yên di wan rojan de hatine girtin tên lêkolînkirin, xerckirin û

malzemeyên hatine kirîn dema tên dîtin tê fêmkirin ku di merhaleyek çendîzehmed de hatiye jiyîn, rêxistin di tengasiyên malî yên di çi astê re derbas bûye. Pere, di çantayê ku Egîd li gel xwe radike de dihatin parastin.

Roja 13’yê meha 12’ê di notên ku Egîd nivîsandiye de pereyên Partî, ku biqasî 86 Lîrayên Tirkan û 10 hezar Tumen e bi vî awayîderbasî ser kaxizê bibûn:

*“Derfeta me ya malî ya li vê qadê pirsgirêkeke qederekê cidî ye. Ji bo çareseriya vê pirsgirêkê em fikirîn bi hin grubên biçûk çalakiyên şelandinê pêş bixin. Lê belê ji ber ku em fikirîn; ev yeka wêqada em lê dixebitin ji dema wê zûtir deşîfre bikirana, bala dijmin bikişandana li ser van deran ûli ser gelê van deveran zêde zilm û zor bihatana kirin me tiştekî wiha pêş nexist. Lê di aliyê malî de zêde tengasiyên me hene. Serok got ku pêwîst e em di vê mijarê de derfetên xwe biafirînin ûewê nikaribe alîkariya me bide. Di demên raborî de hin xebatên me kêm man. Me ji rêxistinên vir alîkarî xwest, lê belê ti ji van zêde alîkar nebûn. Yanî ev pirsgirêk li benda çareseriyê ye.”*

Egîd ji bo mesrafan lîsteyek girtibû. Divê lîsteyê de her tişt pêdiviyeke herî acîl û bêyî wê nabe bû. Ne mimkûn bû ku mirov rastî tiştekî ne pêwîst ê herî biçûk an jî “luks” bihata: dukîlo bizmar, 4 camên fanusan, 8 defter 40 kalem, 6 pêlavên lastik, 10 gora, 2 çantayên piştê, 7 cixare… û hwd.

Egîd, piştî ku rewşa malî bi vî awayî bi kurtahî vegot çareseriyê jî pêş dixe: *“Di merhaleya pêşiya me de diyarkirina çavkaniyên madîû cihê peyda kirinê diyar e. Çavkaniya esasî ya şerê gel, gel bi xwe ye. Bi heman awayî di esasê çavkaniya hatinên Tevgera Rizgariya Neteweyî de alîkarîû destekên madîû manewîû bi rêkûpêk û tîmî yên gel hene.”*

Egîd bi berdewamî tehlîleke bi vî şiklî pêş dixe:

*“1- Ji ber sedemên wekî; di vê merhaleyêde texrîbûna rêxistina me ya li welêt, di demên derbasbûyî de li herêmên ku dikevin qada xebata yekeya me zeîfbûna têkiliyên tevgera me bi gel re û bi ser de jî ji ber ku têkiliyên sînordarên hene jîciwantiya rewşenbîr e, pêkanîna zexteke mezin ji aliyêKT ve li ser van û di bin tengasiyeke mezin de bûna ji van beşeke mezin a bêşên civakî, ji bo ku tevgera me were fînansekirin ev dever wênikaribin bi roleke aktîf rabin.*

*2- Ji Hêzên dost jî wê li vê qadê ti alîkarî neyê peydakirin.*

*3-.Tevî ku riya bi awayê destdanîna ser çavkaniyên dijmin, tevger fînanse kirin riya herî rast e ev bijartek jî ji bo niha giradayî bi tesadufan ve ye.*

*Pêdiviyên madî yên têkoşîna me di esas de wê bi derfetên me werin afirandin. Lê belê ji ber ku demsala em tê de zivistan e, ji ber barîna berfa zêde nebûna derfetan û*

*dîsa di demên borî de li vê qadê nebûna ti derfetan, yeke (birim) neçar e ji rêvebiriya merkezî alîkarî bistîne."*

***"Rapor Hewcadariya Berpirsiyariya Li Hemberî Rêxistinê Ye"***

Girîngiya ku Egîd dida raporêû hesasbûna wî ya di vê mijarê de me li jor dabû diyarkirin. Di nivîsa xwe ya bi dîroka 11'ê Adara 1983'ê de fikrên xwe yên li ser girîngiya raporê wiha tîne ziman: *"Rapor dayin dibe sedem ku merkez nirxandinên rast bike û li gorî wê biryaran derxe, rê nîşanî yekeyên jêra xwe bike, birêveçûna rêxistinê saxlemtir bibe. Kadro û yekeyên ku xebata xwe di dem û wexta ku hatiye diyarkirin de bi detayên wî karî ve bi şiklê rapor nekarîne pêşkeş bikin, tê hesibandin ku berpirsiyariya xwe ya li hemberê rêxistinê bi cih neanîne û wezîfeya xwe nekirine. Ev, mijarek ku Lenîn jî bi girîngî bal dikişîne ser e. Tevî ku girîngîû pêwîstiya wê tê zanîn, bi mehan rapor nedayîn pir caran pêş ketiye. Rapor, di hemû partîû rêxistinan de ewqas girîng e ku bi karanîna wê ti car nayê paşguhkirin. Derketina vê astê ya paşguhkirinê, di nîşandana asta cidî ya bêberpirsiyarbûyînê de mînakeke herî sereke ye. Di şert û mercên kompleks, zor ûzehmedû dîqeteke mutleq jê re divê de rênîşandan û kontrola merkezî, ji her dem û wextê zêdetir pêwîst e. Rapor nedayin wê bibe riyeke vala derxistin û xetimandina merkezîbûnê."*

**"Şert û Mercên Zehmed Kesên Biqewet Derdixe Meydanê"**

Zehmedû giranbûna şert û mercan û li beranberê vê sînordarbûna derfetan çiqas tengav dike bila bike, Mehsum Korkmaz timî wê axaftina Serokatî, ku dibêje "*Şert û Mercên Zehmed Kesên Biqewet Derdixe Meydanê"* wekîstûneke esasî di bîra xwe de digire. Egîd, wexta ku xebatên avakirina kampêû grubên biçûk şandina welêt li gel hev dimeşand, pirsgirêkên giran ên ku pêre rû bi rû diman jî, bêyî ku binepixîne û li ser zêde bike li deftera xwe dinivîsand. Wexta ku wî li ser wê deftera xwe ya biçûk û nazenîn not dinivîsandin, her çendî ji ber girtî mayinê pel bi pel çilmisîû rêng lê çûyî be jî, gelo Wî bîr dibir ku ew defter ê bigihîje van rojan? Yek ji ewliya û pîrên herî mezin,ê zor û zehmetî bi bin xistinê jî fermandar Egîd bû.

Herî baş Wî dizanî ku geliyên dûr û dirêj, bi dehan çiyayên li pey hev rêzbûna di nav saetên hejmara wan diyar de bimeşe. Wexta ku hem bi gir û tepeyan de hildikişt, hem arwaz derdiketin û hem jî nişûv dadiket di nav xwêhdanê de dima. Bêhn lê diçikiya, binê lingên wî weke bidirin diêşiyan.

Belge no 5( Türkçe belge)

Lê, Wî ev rewş ti car nekir bahane û her wiha neanî ziman jî. Di nav deftera xwe ya pelên wê jê qetiyane de vê rewşê tenê bi yek hevokê tîne ziman; *"êşa di çongên min de nedihişt ez bimeşim"*. Wexta ku ji bo herêma Berzan meşek dihat lidarxistin ev nivîs hatiye nivisîn.

Lê belê ya ku diêşiya ne tenê çongê Wî bû. Dema ku dimeşiya ti car li paş nedima. Eger grub çawa bimeşiya, ew jî bi wîşiklî dimeşiya. Lê, gelek hevalên Wî jî rewşa lingên wî nedizanîn. Egîd 'düz taban' bûû ji ber vê yekê zehmetî dikişand.

Belge (belgenin numarası çıkmamış Mehmet Karasungur-Egîd)

**Nîqaşa Dijwar A Di Navbera Memed Karasungur (Xalit) û Egîd De**

*"Grubên destpêke yên ketina welêt ên"* PKK'ê yên ku di nav sînorên İraq ûÎranê de xebat dabûn destpêkirin, di navbera dîrokên 6'ê meha 12 û 12'ê meha 12 1982'an de civîna xwe ya destpêkê çêkirin. Civîn şeş rojan berdewam kir. Ev civîna ku li Rajanê hatibû lidarxistin[1]Egîd, Xalit, Hesen û Cemal tevli wê bibûn. Ji bo ku civînê bimeşîne Xalit û ji bo ku axaftinên li civînê tên kirin binivîsîne jî Cemal hatin hilbijartin.

Rojev; ji madeyên wekî van pêk dihat; vegotina bi devikî ya xebatên ji Nîsana 1982'yan vir de li qadê hatine meşandin, xwendina talîmatên jiB. M. (birêvebirina merkezî-di pirtûka Tirkî de M.Y'ye) hatine, ji aliyê Cemal ve bi devikî vegotina talîmatên ji Rêvebirina Merkezî hatine, bi rêxistinkirina plan talîmata ku afirandin û rêxistina yekeyên tovik ên partîûyekeyên propagandaya çekdarî dihewîne, vesaziya nû ya kampêû çêkirina grubên perwerdê, pirsgirêka çavkaniyên malîû karbeşiya ji bo navxweyî ya yekeyê.

Yên tevlê civînê bibûn qederekê bi amadekarî hatibûn. Her ku civîn bi pêş diket hê jî ev rewş baş dihat fêmkirin.

[1]**Xalit:** Memed Karasungur, di 2'ê Gulana 1982'yan de şehîd ket.
**Hesen:** Sebrî Ok
**Cemal:** Terzî Cemal

Xebata ku ji Nîsana 1982'ê vir de li qadê dihate meşandin ji aliyê Memed Karasungur (Xalît) ve bi kurtahî hate vegotin:

*"Wexta ku Egîd hat vê qadê, wê bi şiklê du gruban xebata xwe bimeşanda. Grubek, wê li Laq-1'ê bimana. Ya din jî wê li … bi cih bibûna. Lê belê paşê ev hatiye guherîn. Grupa Zafer ji … hatiye şandin nava welat. Dema ku ez hatim Îranê Egîd bi pirsgirêkên perwerdeyêre yên hevalên li wir mijûl bibû. Hewl dabû taybetmendiyên pêvajoyê bide fêmkirin. Dîsa li gel hin rêxistinên Kurdistana Iraq û Kurdistana Iranê hevdîtin hatibûn çêkirin. Wexta ku ez hatim min got, hewce ye ez û Egîd li gel hev tevger bikin. Me bi hev re biryar girt ku em têkiliyên ji derve pêş bixin û li gel vê,têkiliyên bi welêt re jî pêş bixin. Di navbera Savaşê ku berê li Geverê berpirsiyar bûû Mehmet de ji ber nakokiyek ku derdikeve Savaş ji Mehmet re dibêje tu ajan îû ji wir dûr dikeve. Me xwest em pêre têkiliyan pêş bixin, me not şand, lê belê nexwest were. Li gel birayê mezin ê Savaş, yê bi navê Nejdet Hevdîtina me çêbû. Ji ber girêdana wî ya bi têkiliyên eşîrî, mijulahiya me ya bi wî re encam neda. Cîhangîr axa ajanê MİT û SAVAK'ê ye. Ev kes hewl dide da ku tesîra xwe ya berê kêm bibû, di merhaleya nû de li ser eşîra xwe ji nû ve pêk bîne, ji bo paşverûtiya li herêmê xwe bike palpişt.*

*Me bi Qersê re têkilî çêkirin. Me karîbû pênc hevalên ku dijmin li wan digeriya bikişînin gel xwe. Hevalên ku qederekê xwe pêş xistine. Eger karibûna di wextê de derketana, dibe ku li gel xwe gelek sempatîzan jî xelas bikirana.*

*Tevî hemû hewldanên me, me nekarîbû bi Agiriyê re têkilî daynin. Li Varto û derdora wê, girseyeke me ya diyar heye. Bi taybetîsempatîzanên me yên ji beşa civakî ya burjuwaziya biçûk matmayina xwe ya di mehên destpêkê yên cuntayê de ji ser xwe avêtiye. Ji Vartoyê du heval hatin qada ku em niha lê ne. Ji van yek li gel hevalê ku niha li Vartoyê xebatê dimeşîne di nav têkiliyê de ye. Danûstendina me ya nivîskî jî çêbû.*

*Li Şemzînanê derdoreke me ya teng heye. Me xwest em li gel van têkiliyan pêş bixin û van bikişînin vê qadê. Lê belê ji ber ku pir paşde mayîbûn (ji derveyî yekî/ê) ti kesî nexwest were. Yê/a ku hatiye jî piştî mehekê bi şûn de paşde vegeriya.*

*Li Başkaleyê sempatîzanên me hene. Me, weşanên wekî rojname û hwd. şandin. Me xwest em du hevalan bikişînin. Lê belê HDK-Î ji ber ku rê li me girtin têkiliyên me qut bûn.*

*Li gorî baweriya min, divê ji bo xebatên welêt ecele neyê kirin. Ji ber ku tecrubeyên di demên derbasbûyî de derxistiye meydanê, ku gavên bi lezgînî tên avêtin bûye sedema gelek wendahî dayina me. Ji ber vê yekê ez ne di wê baweriyê de me ku hevalên di pêvajoya nû de diçin wezîfeye di asteke têrê dike de wezîfeyên xwe*

*bi ser bixin. Ji sedemên wê yek jî ew e ku di demên derbasbûyî de tevgera me li van deveran di asteke têrê bike de xebat nemeşandibû.”*

Bi xelasbûna axaftina Xalit re Egîd mafê axaftinê dixwaze. Cemalê ku axaftinên li civînê not digire, ji bo karibe pêre bigihîne qederekê zehmetî dikişîne, ji ber ku yên diaxifin qederekê bilez diaxifin.

**Egîd:**“(weke ku di notên di civîne de hatine nivîsîn)*wexta ku em hatin şandin vê qadê, di axaftinên ji me re hatine kirin de li ser tiştê hewce ye were kirin çarçoveyeke giştî hate diyarkirin. Li gorî vê, diviyabû ev qad weke binkeyeke (üss) paş a têkoşîna me ya demdirej lê bihata kirin. Dîsa di nav çarçoveyê xebatê de, li gel herêmên bi me re cIran in têkilî danîn û ji van qadan endamên nû derxistin û perwerde kirin,grubên biçûk şandin herêmên sînorjî hebû.*

*Tevî bêderfetiyan, nebesbûna têkiliyên bi hindûrê welet re, hinekê jî çavkaniya xwe ji me digirt. Mînak , her çiqas sînordar jî bûna diviyabû çendek grub ji bo xebatê bihatana şandin. Hetadi vê mijarê de di navbera min û Xalit de hin nîqaş çêbûn, bi israra min yek-du hewldanên me çêbûn. Demaku em hatin vir, têvî ku rayeya me her duyan wekhev bû piştî ku hûn(xalit)hatin vir,helwestû terza tevgera we, weke ku hûn berbirsiyarê esasî bûne pêş ket.*

58 de ki foto

*Li gorî min, dikarîbû ji bo hindûrê welêt xebat bihata kirin. Lê belê demeke dirêj li derve mayin esas hatibû girtin. Lê Lubnan bi roleke bi vî awayî rabû.*

*Eger em werin ser mijara raporê; rexneya hevalan bi temamî di cih de ye. Lenîn dibêje, “mijara ku kadroyekê/î wezîfeya xwe kiriye an na, bi rapora ku pêwîst e bide jora xwe tê pîvan”. Wexta ku min got, em rapor bişînin we got, hewce nake”. We got,“min beriya du salan agahî dan, rewş nehatiye guherîn.” Li şûna ku em reaksiyonê nîşanî rexneyên li ser me tên bidin, divêem bi awayekî cidî xwe di ber çavan re derbas bikin. Em ti car li gel yek, bi rêxistinî nexebitîn. Te her tişt bi xwe re sînordar kir, we, hema bêje bi wezîfeyeke teng, ez sînordar kirim. Û wezîfeya min bû perwerdeya 7 kesî. We, li şûna rêxistinê her tişt di xwe de kom kir. We xwest vê jî her kes bibîne. Ya rast di pratîkê de di navbera me de ti hevbeşiya kar nebû. We, bi vê helwesta xwe rêxistin neafirand. Lê em kesêkî/ê ji rêxistinê mezintir nas nakin em fêrîvê bûne. Ev yek ji sedemên neserkeftinê ye. Bi qasî ku xebat tê kolektîfîzekirin şensa bi serkeftinêzêde dibe. Ji bo ku kesek bi rola xwe rabe, divê rêxistinên mayinde*

*ku nayên nayêne hilweşandinbiafirîne. Ronahiya ku weke agirê ji kayê tê hilkirin zû gurî dideû ditemire, derewîn e û mirov pê dixape.”*

Ji ber ku ev axaftina Egîd gelekî dijwarû bi ecizî çêbibû, vê carê Xalit pêwîstî pê dibîne ku bersivê bide:

*“Ez vê hema bêjim rewş ji rastiya xwe cuda tê nîşandan. Lê dema ku ez nû hatim vê derê, di civîna ku me kirîbû de min bi xwe got rayeya me her duyan yek e. Heta min got tekîliyên bi merkezê re hûn çêbikin.”*

Vê carê Egîd bêyî ku heqê axaftinê bixwaze dikeve navberê: *“Na, berevajî, we ji min re got ez êtêkiliyanbi merkezê re çêbikim. Heta we got, “em bi hevalan re li ser vî esasî axifîn.”*

**Xalit:***Wê demê ez ê tiştên din neynim rojevê. Ji ber ku em nikarin bi vê terzê encam bigirin. Me li ser gruba ku ji ser Geverê re bihata şandinnîqaş kir. Ez, wê deme ji ber rewşa PDK’êû Cîhangîr axa li dijî pêşniyara we sekinîm. Ji derveyê vê me timî bi hev re biryar digirt. Yanî di her biryarê de min fikra hevalan digirt.*

**Egîd:***“Mamoste, hûn naxwazin bêyî we ti heval biçe derekê.”*

**Xalit:***“Mînak di mijara raporê de min ji we re notek şand. Xebatên ji bo hindûrê welat tu binivîse, di mijara karê dervê de jî ez ê binivîsim.”*

**Egîd:**“*Di mijara raporê de ji destpêkê de terzeke seqet û şaş hate şopandin.”*

**Xalit**: “*Piştî ku pirsgirêk hatin xistin vê nuxteyê encameke rast dernakeve meydanê.”*

**Egîd:**“*Wê demê em encamê binirxînin. Me çima rapor neşandin?”*

**Xalit:**“*Niha du ferasetên dijberê hev hene. Yanî têîdîakirin wexta ku ez hatime vir, weke ku hevalan ez kirime berpirsiyarê esasîez tevgeriyame.”*

**Egîd:**“*Ti fikrên min nehatin guhdarkirin. Bêyîku ji we musade were girtin we nedixwest kesek biçe cihekî. Dema ku em hinekê diaxifîn em dibûn* ***çepger****.”*

**Xalit:**“*Wê demê, min çawa hûn bêînisiyatif hiştin?Wê bêjin.”*

**Egîd:**“*Heya ku du grub hatin şandin welêt me çi zehmetî kişandin. Çiqas niqaşên dijwar hatin çêkirin.”*

**Xalît:**“*Bi rêxistinî hat xebitîn lêhin peşniyarên ne di cih de hatin pêşxistin.”*

**Egîd:**“*Wê demê ma gelo xeta Partî ne di cih de bû? Ji ber ku bi welat re têkilî, talîmata Partiyê bû”.*

**Xalit:**“*Pirsgirêka şandina gruba Hesen, ji ber ku berê PDK-I riya hevalanqut kiribûû ji wan re gotibû ji ber ku hûn li gel dijminên me di têkiliyê de ne em wekî ku hûn jîdijmin in dihesibînin, ez li dijî şandina grubê bûm.”*

**Egîd:** *"Li ser esasê agahiyên ku du hevalên ji beriya 1,5 salê hatine dane me, min got em grubekê bişînin welêt. Hûn li dijî vê derketin û we got; "ez berpirsyariyeke wiha hilnagirim ser milê xwe, biçe eger ti bi xwe dişîne bişîne".*

**Xalit:***"Ez, ji ber xetereya wêriyê li dijî derketim.."*

**Egîd:***"Wexta ku gruba duyemîn hat şandin bi çi bawerî hebû? Eger wê demê bi gotinên min hatibe kirin, ma me di 8 mehan de grubek şandiye?"*

**Xalit:***"Dema ku ez hatime vê derê, em ê bi awayê du komîteyan bixebitîna. Kemal, Hesen, Alîû em herdu. Û min ji hevalan re pêşniyar kir da ku em xebatên vê yekeyê(birim) merkezî bikin. Lê ji ber helwesta neyînî ku Kemal û Hesenpêş xistin ev pêk nehat. Diviyabû van hevalan li herêma Agirî, Qersê xebat bimeşandana û ya sêyemîn jîdiviyabû heya bi Laq-1'ê rê hatiba vekirin: ya çaremîn diviyabû hewl hatibana dan ku riyên sereke werin vekirin. Ev wezîfeyên me yên acîl bûn."*

**Egîd:***"Dîsa diviyabû li gel eşîretênherêma 5. Têkilî bihatana pêşxsitin."*

**Xalit:***"Ev hatin tesbîtkirin. Di vê navberê de ez çûm Tehranê. Me her duyan ev biryar girt; hat gotin ku em li gel rêxistinên Iraqêtêkiliyan çêbikin.*

*Paşê gruba *Delîl hat, merkeza me bar kir Şixonê. Egîd çû kampa nezî sînor. Ez li vir mam.*

*Paşêez çûm kampa ku heval lê dima. Em demekê bi hev re man. Heval ji min re got, li cihê ku em ê lê bi cih bibin em kêliyekê zûtir bi cih bibin. Min jî ji heval re got, na, em li benda bicihbûna PDK'ê bisekinin. Ji ber ku em girêdayî wan in. Em li hêviya gruba ku me şandibû welat man; paşê dema me ji welêt encamên êrênî nestend, me biryara ku em li gelrêxistinên Iraqêtêkilî pêş bixin girt. Di vê navbera de Heval Egîd, ji bo ku pirsgirêka lê mayine ya hevalên li* ***Laq-1'ê*** *were çareserkirin li ser esasê hevdîtina li gel Mesûd çû merkeza PDK'ê. Wexta ku çû min jê re got zû bizivre( dinava rojekê de). Ji ber ku me wêligel rêxistinên Iraqê hevdîtin çêbikirana, partiya Sosyalîst em ê bibîrana Iraqê. Jixwe hevalê Egîd dereng ma. Ji ber ku erebe ne amade bû, min nekariya li benda heval bisekinim û çûme Iraqê. Vê hevdîtinê 1,5 mehê berdewam kir. Û dema ez hatim jî, heval Egîd çûbû Lolanê."*

**Egîd:***"Berpirsiyariya me şirîkhebû. Em li gel hev axifîn û me teslaxeke xebatê ku me bi hev re çekiribû derxist. Paşê rewşa me ya bicihbûnê derket meydanê. Em hatin wêmerhaleya ku biryarên me girtinê em pratîze bikin. Di vê navbera de heval li Rejanê bûn. Me bar kir wir. Min got xebatên nêzîk, xebatên hindûrê welêt ez ê bimeşînim. Em ê li ser vê esasê ji hev biqetiyana.*

*Hevalê Xalit got ku xebatên jibo hindûrê welat li wir nikare werin meşandin, ev xebat li Îranê, li qada ku ew bi xwe li wir e wêbên meşandin.*

*Di vê navê de min ji heval re mektubek nivîsand, ji bo ku hin amadekarî werin kirin. Ji ber ku zivistan nêz dibû. Li ser mektûbê heval hate qada ku ez lê bûm. Bi hatinê re got, ez ê biçim cihê lê bicihbûnê bigerim.*

*Dîsa min jêre got pêwîst e em karbêşiyê bikin. Min bi bîrê xist ku em her du jî bi rêxistinan re hevdîtin çêdikin lê ev dibe sedema wendabûna wexta me. Ji ber vê yekê ji min re got,"tudi xebatê de merkezîbûnê naparêzîû bi helwesteke anarşîstane tevdigerî".*

*Dîsa dema ku min got, em gruban bişînin welêt.Wî bi xwe got, "na". Tevî ku ev wezîfeyek ku Partiyê ji bo me diyar kiribû, lê heval got 'qet jî ne acîl e.'*

*Evqas em çima bêencam mane niha ez bi vê şîrove dikim:Ez difikirim ku pirsgirêk ji vir çavkaniya xwe digire; heval dibêje bila her tişt li gorî weke ez dixwazim, weke ez difikirim çêbibe. Bila ez bibim merkeza her tiştî. Ti plan û karbêşî nehate kirin; eger hatibe çêkirin jî nehata pratîzekirin."*

**Xalit:**"*Bûyer ji rastiya xwe zêdetir tê nîşandan!*"

**Egîd:**"*Ne rast e!*"

**Hesen:**"*Bi vê rêbazê nîqaş nayê kirin.*"

**Cemal:**"*Niha li şûna ku bûyer bi vî awayî nîqaş were kirin, divê li ser îdîayê nîqaş were kirin. Heval Egîd diyar dike ku tevî ku biryar bi hev re tên girtin, di pratîkê de her tişt di yek destî de kom dibe. Li vir rewşeke wisa derdikeve holê; heval xwe bêînisiyatîf hiştiye. Heval Xalit jîbi terza xwe ya xebatêev rewş afirandiye.*"

**Egîd:**"*We biryar xwendin (madeya 5.). Daxwaza min ew bû ku ezdi pratîzekirina vê biryardariyê de israr bikim. Lê belê ev nehatiye qebûlkirin. Ez, ji bo ku rewş hê jî nebaş nebe bêdeng mam.*"

**Xalit: "***Niha li ortêîdîayeke wisa heye: Têîdîa kirin ku min heval bêînisiyatîf hiştiye. Tevî ku ev îdîayeke bêbingeh e ezê di xebatên ji vê bi şûn de de vê rewşê li ber çav bigirim. Niha hûn dibêjin we ez bêînisiyatîf hiştime, ji nişka ve hûn çawa li hemberê min wisa diaxifin?*"

**Egîd:**"*Li vir rêxistin heye, em hesab didin. Ez li vir azad im û her tiştî dibêjim.*"

**Hesen: "***Jixwe tiştê ku li vir tê gotin tê nivîsandin. Kar û xebata xwe bêjin.*"

**Cemal:**"*Li ortêîdîayek heye. Li gorî min sedema vê ev e: Hevalê Xalit di destpêka axaftina xwe de wisa axifîbû:* 'ji ber ku di demên derbasbûyî de pir ecele hate kiringelek wendahiyên me çêbûne. Ji ber vê yekê pêwîst e di xebatê de ecele neyê kirin…'*Li gel vê, wexta ku ku rewşa nebûna xebateke cîdi ya tevgera me ji bo vê mintiqayê li ser vê rewşê zêde dibe,ji bo xebatên hindurê welêt bi riyên legal agahiyên destpêkê komkirin, bûye sedem kupratîkeke wekî, xebatên esasî bi giranî*

*wê di ser xebatên derve re werin meşandin pêş bikeve. Eger were dîqetkirin, li vir fikreke diyar û li gorî vê fikrê, terzeke xebatê hatiye meşandin. Fikrên ku bi vê tesbîtê re nakok ketine, nehatine qebûlkirin an jî hatine îqnakirin*.

*Delîl: Velî Yaşar di 1’Nîsana 1988’an de li Bogoke şehîd ket

*Hemû xebatên li vê qadê hatine meşandin li gorî fikra li jor hatiye tesbîtkirin hatine meşandin.*

*Mînak, rewşa ji bo rêvebirina merkezî rapor neşandinê jî dîsa ji heman fikrê çavkaniya xwe girtiye. Yanî giraniya xebatên esasî, bûye xebatên derve.”*

**Xalit:***Ez îdîaya ku min hin heval bêînisiyatîf hîştine(ev îdîa ji aliyê heval Egîd ve hate pêşxistin) qebûl nakim. Û bi misogerî red dikim. Me li vir tiralî nekir. Ez ji bo hevalên yekeyê(birim) pêşniyar dikim ku ji bo wezîfeya ku di dema xebatê ya li pêşiya me de were dayin min, ev tişt were girtin dîqetê, di beşa wezîfeyê de ez li derveyê yekeyê werim erkdar kirin û wezîfeyeke li gorî min were dayin min. Divê ev rewşa min li gel hin kesayetiyên neyînî neyê bidest girtin. Ez daxwaz dikim ku tenê ev rewş li ber çav bê girtin û ez li derveyê yekeyê bêm girtin; eger wisa be baş dibe. Ez di wê baweriyê de me ku nîqaşên bêencam ên weke ‘te wisa kir û min wisa kir’bêsûd in.”*

**Egîd:**“*Em vê bêjin, li gorî min diviyabû bersiva ku heval bide rexneyê ne ev bûya. Li şûna vê diviyabûkarûxebata ku hatibû kirin û gelek rexneyên pêşketibûn bihatana nirxandin. Ez vê fêm dikim, li ortê meylek şaş heye. Ev heval e an jî ew heval e ferq û cudahî nîne. Yanî eger meyla şaş çi be divê ew were derxistin meydanê.”*

**Xalit:**“*Na, şaş hate fêmkirin. Min li jor hin tîp îzah kirin. Yanî kesên ku bi hin mahaneyan revîbûn. Yanî Resûlek heyeya din jî tîpê... Heye. Dîvê ez bi wan re neyêm girtin dest. Yanî pêşniyara min a ji derveyê yekeyê mayinê, ne ji bo ku ez ji têkoşînê birevim, jibo ku wezîfeyeke ji derveye yêkeyê were dayin e.*”

**Egîd:**“*Li ortê pirsgirêka nebaweriyê nîne. Baweriya me ya bi hev jî kêm nebûye. Mijara pêşniyara heval jî divê were rêdkirin! Li gorî min tiştekî ku pirsgirêkê heya wir bibe, li ortê nîne.”*

Tevî her tiştî Egîd di wê baweriyê de ye ku dikare li gel Xalit bixebite û karên serkeftî werin meşandin. Ji ber vê yekê li dijî pêşniyara Xalit derdikeve . Endamên din Hesen û Cemal jîtevli vê pêşniyarê nabin.

Piştî nîqaşan, li ser mijarên wekîbicihbûn, amadekirina binkeyên (üss)leşkerî, rêxistinbûna li bajaran, çêkirina yekîneyên leşkerî yên taybet, amadekirina sixinaq û

depo, propaganda, çapemenî,û karên derve, rewşa malî bi qasîşeş rojan hatiye nîqaş kirin. û bi tevlîbûna hemûyan bûye biryar.

Di vê civînê de düzenleme (vesazî) jî bi vî awayî hat çêkirin:

Berpirsiyarê leşkerî: Egîd

Berpirsiyariya rêxistinbûna siyasî: Hesen û Cemal

Berpirsiyariya karên derve: Xalit

Ji bo ku kar û xebata çapemenîyê were aktîfkirin Hesen û Cemal hatin wezîfedarkirin. Wezîfeya peydakirina derfetên malî jî hat dayin Egîd û Cemal.

Bi vî awayî nîqaşên pir dijwar û dem bi dem jî li beranberî hev, hatibûn temamkirin. Ev nîqaş ji bo çêkirina plana pêvajoyeke nû,lêhûrbûn û kûrbûneke zêde zêde xurt afirandibûû bi düzenlemeyeke (vesazî) li gorî mercên wê rojê bi dawî bibû.

**Çalakiya li ser Eruhê(Dihê) û Îlankirina HRK'ê:**
**Despêkirina Pêvajoyeke Nû**

Di civîna ku 6'ê Adarê dest pê kiribûûroja 12'yê Adara 1982'an xelas bibû de berpirsiyariya plansazî rêxistinkirina kar û xebata leşkerîhatibû dayin Egîd. Wî li gel berpirsiyariyên xwe yên giştî li şert û mercen ku ji bo destpêkeke baş pêwîst in jî digeriya û diket nav lêhûrbûneke zêde zêde.

Hem bi xebatên lê bicihbûna heremên nêzî sînor û hem jî bi çalakiyên bihatana çekirin dikarîbû pêşî li tevlîbûnûnên zêde bihatana vekirin. Piştî lêkolînên dûr û dîrêj biryar hat dayin ku li ser navçeyên wekî**Dihê**, **Şemzînan**û**Şirnex** di heman rojê de çalakî werin lidarxistin. Egîd wêKoordîneya çalakiya serdagirtinê ya Dihê, bikira. Lê belêji bo ku agahî-îstîxbaratê bide, ji beriya çalakiyê li merkeza navçeyê tenê yek mirov jînayê peydakirin.

Di rapora nirxandina çalakiye de vê rewşê bi vî awayî tîne ziman fermandar Egîd: *"Li navenda navçeyê, tenê yek mirovê ku em karibin jêîstîxbaratê bigirin me nedît. Piraniya gundan li beranberê têkoşîna me bi temamî bêagahî ne."*

## Armanca Çalakiyê

*"Armanca çalakiyê ew bû; em, HRK'ê, rêxistina hêzên me yên çêkdar ku ji aliyê partiya me ve hatibû avakirin, hedef û avabûna wê ji gelê me û raya giştî ya cîhahanê re bi dengekî xurt ragihînin."*

66. Sayfada ki resim gelecek

Divê ji bo vê armancê, merkeza bajêr ji bo demekê bihata îşxalkirin, derbe li saziyên dijmin ên leşkerîûîdarî bihatana dayin. Çarçoveya hedefan bi vê armancê hat diyarkirinûplana çalakiyêya şênber û bi detay hat çêkirin. Fermandar Egîd di rapora ku 22'ê Tebaxa 1984'an de nivîsandibû armanca çalakiyê bi vî awayî vegotibû.

## Plana BiserdegirtinaDihê

*"Di encama kifşa hatiye kirin de hat tesbîtkirin ku hemû sazîû nuxteyên ku em bi ser de biçûna,bi awayê komeke teng bi cih bûne ûdi navenda wan de jî hêzeke leşkeri ya di asta bolukê de heye. Hat dîtin ku derfeten planên me yên wekîîşxal, ji gel re propagandaya devikîkirinê, tenê dema ku boluk were bêtesîr kirin mimkun dibe. Ji ber vê yekê,êrîşa li ser bolukê di nav hedefan de di rêza esasîû sereke de hate bicihkirin. Di rêza duyemîn de lojmanên fermandaran û gazînoya leşkerî, di rêza seyemîn de li qehwexaneyan belavok belavkirin, pankart bi dar de kirin (tev bi bombe) û şelandina benqayê,di rêza çaremîn de di hoporlorê mizgeftê de bang li gel kirin, ya pêncemîn; di ketin û derketina bajêr de riya asfal û xeta telefonê qutkirin hat hedef kirin.*

*Çalakî li ser esasê ku saet di nehê evarê de were çêkirinhat plankirin. Wexta ku tê de çalakî bihata lidarxistin wekî saetekê hate diyarkirin. Nuxteya me ya birêketinêwekî Çiyayê Çiravê; xeta me ya paşde kişînê jî wekî Çiyayê Herekolê hate diyarkirin. Hejmara me wekî 30 heval hate diyar diyarkirin.*

*Teslîmgirtina bolukê bû biryar ûvesaziya (düzenlemeya) gruban hate çêkirin.*

*Piştî ku bi kurtahî planê çalakiyê bi vî awayî dinirxîne, Egîd, düzenlemeya (vesazî) grûban jî bi vî şiklî eşkere dike:*

*Ji bo çalakiyê penc grub hatin çêkirin*

***1- Gruba Êrîşê:** Erdal, Selîm, Şiyar, Fîkret, Musa, Haydar, Azad, Ferhan.*

***2- Gruba Li Ser RBC**: Haşim, Baran, Keleş (milîs)*

***3- Gruba Parastinê:** Kazim, Îbrahîm ( milîs )*

***4- Komuta:** Egîd û bi dîktiryofê xwe ve Serdar.*

***5- Gruba êrîş biriye ser gazînoû lojmanên Fermadaran ku di hewşa bolukê de bûn:***

*Bedran, Bijî, Kerimji bo propagandayê, belavkirina weşanê, pankart û şelandina bankayê du grub hatin derxistin.*

***6- Gruba Xîtaba Di Mizgaefte de:** Tewfîq, Omer, Şoreş*

***7- Gruba belavok belavkirin, pankart daliqandin ûşelandinê:** Botan, Cengo, Bozan*

*Ji bo rê birînê du grub hatin derxistin:*

***8- Gruba ku riya Dihê-Sêrt qut kiriye:*** *Hecî, Xelîl, Salih*

***9- Gruba ku riya Dihê-Şirnexqut kiriye:*** *Elî, Cuma, Xelîl (her sê jî milîs )"*

**Sîstema Koordîne, Bikaranîna çekan, Tevger û Bimewzîbûnê**

*"Grubên rê birînêêw êdi heman demê de bir rola grubên ku mewzî bigirin rabin. Ewê di tengavên teng ên hatine diyarkirin de bi awayekî destdayî mewzî bigirin, xetên telefonê bibirin; ji bajêr bi bihîstina dengên çekan re li ser rê keviran daynin û rê li trafîqêbigirin; wexta ku konvoya dijmin tê konvoyê wê mijul bikin.*

*Paşde kişîna van gruban: Wexta ku em ber bi wan ve mermiyên gurî berdin; na eger vê nebînin jî piştî ku dengên çekan ji bajêr nehat bihîstin 30 an jî piştî 45 deqîqayan wê cihê xwe terk bikin. Gruba ku riya Sêrtê dibire wê paşde kişanê bi Çiravê de bike; paşê li cihê ku me biryar girtibû li gel me bikevetêkiliyê. Gruba ku riya Dihê-Şirnex birîbû, wê li hêviya me bisekinin: Ji ber ku aliyê me yê paşde kişînê ber bi wir ve ye. Eger bi xwe di nav pevçûnê de bin wê bi mermiyên gurî berdanê ve mewziyên xwe terk bikin. Eger ev jîmimkun nebe,ji bajêr dengê mermiyan qut dibe piştî 45 deqîqewê li du nuxteyên ku me biryar girtibû li benda taximê bisekinin; eger heya bi saetên dereng bi taximê re hev nebînin wê ber bi aliyê hatibû diyarkirin bi quryê hatiye tesbîtkirin ve paşde bikişin.*

*Hemû grubên din di heman wextê de bi mewzîgirtinê re wê bikevin tevgerêû wê her kes li derdora bolukê mewziyên xwe bigire û bi gule avêtinê re amade be. Rêza belavbûnû gule berdanê bi vî şiklî hate diyarkirin.*

*Gruba ji heyşt kesan pêk tê ya ku êrîşê nav bolukê bike jî, di nava xwe de wê bibe sê grub û di pêşiyê de Erdal, Selîm ber bi nobedarê li ber deriyê avahiyê ye bimeşin û di kêliya wî dibînin de lê bidin û deriyê avahiyê bixin bin kontrola xwe. Gruba RBC ku li pişta avahiyê mewzî girtiye, dengê çekan dibihîze nabihîze wê gule bireşîne ser qatê jor ê avahiya ku cihê razana leşkeran e (koğuş). Piştî ku RBC gule direşîne, Erdal û Selîm ê bikevin salonêû korîdorê di bin agirê guleyan de bihêlin. Şiyar, Fikret û Musayê ku li pişt Erdal û Selîm di tevgerê de ne wê di mewziyên wan de bi cih bibin. Erdal û Selîmku mewziyên xwe terkî Şiyar, Fîkret û Musa kiribûn,ê derkevin korîdorê jor û gulabaranê bi heman awayî bidomînin. Ji nav gruba sê kesî ya ji Haydar, Azad û Ferhan pêk tê ku li pey Şiyar, Musa û Fîkret ketine korîdorê,Haydar û Azad wê bêyî ku bisekinin hilkişin qatê jor û li gel Erdal û Selîm bi cih bibin. Ferhan û Şiyar wê li gel gruba xwe bimînin û bi vî awayî wê li qatê jor û jêr grûbên ji çar kesî pêk tên temam bin. Hevalên li qatê binî wê fermandar û cîhazê bikin hedef, hevalên li qatê jor jî wê*

*odeyên koxuşan bikin hedef ûîmha bikin. Wê li ser deriyên ku hatine kirin hedef gule werin barandin, deriyên bi gulebaranê an jîbi lingan hatine şikênandin wê bi bombeyan werin îmha kirin û bangawaziya “teslîm bin” were kirin. Piştî ku odeyên destpêkê yên bûne hedef bi vî awayî teslîm hatin girtin, wê odeyên din jî bi heman awayî werin kontrolkirin û werin valakirin. Leşkerên hatine esîrgirtin, wê li hewşa avahiyê werin komkirin û di bin parastina dîktîriyofê de li gel hev werin ragirtin.*

*Pêwîst e di meşa destpêkê ya mewzîgirtinê de di navbera gruba Erdal wan a ji heyşt kesan pêk hatiye de gruba RBC cihê xwe bigire; li pey wê grubê, gruba parastinê ya ku meydana bajêr bixe bin kontrola xwe, bi cih bibe. Gruba bi ser gazînoyê de bigire ku ji van her sê gruban cuda bûye ya paş bolukêû gruba komutayê, wê bi hev re li ber dîwarên hewşa ku li başûrê bolukê ye mewziyên xwe bigirin. Gruba lojmanên gazînoyê ku bi dengê guleyên destpêkê yên li nobedar hatine reşandin dihese, wê bikeve hewşêû berê xwe bidegazînoyêû li wir pişta gruba me ya ku êrîşê bolukê dikin bigire saxlemiyê; hewl bide ku fermandaran bigire an jîîmha bike. Grubên şelandin û propagandayê yên li pey van her du gruban cih digirin jî wê berê xwe bidin cadeyên ber bi hedefên wan ve diçin û xwe bigihînin hedefên xwe.*

*Di merhaleya destpêkê de gruba ku destpêkê cihê xwe biguhere, wê gruba RBC’ê be. Ev grub piştî ku guleyeke roketêdiavêjêû sê caran gulebaran li ser koğuşan dikin wê werin nuxteya komutayêû li vir bi cih bibin; bi vî awayî doxtorê me yê ku di nav gruba RBC’ê de ye jî wê li gel komutayê bi cih bibe. Dîsa gruba me ya RBC’ê ku amade ye, eger leşkerên di nav avahiyê de li ber xwe bidin û gruba me ya li hindur bi şûn de biavêjin wê bi fermana komutayê cara duyemîn gula bibarîne. (piştî ku gruba me ya li hindur avahiyê diterikîne)*

*Di merhaleya duyemîn de gruba ku cihê xwe biguhere, wê bibe gruba bi ser bolukê de digire. Ev, wê di her du rewşên wekî serkeftin û ne serkeftinê de jî wê werin nuxteya komutayêû rewşê diyar bikin û helwest ê li gorî wê were diyarkirin. Eger êrîşa hindur neserkeftî bibe wêêrîşa ji der ve were domandin û heya hemû grubên me li nuxteya kombûnê ku li derveyê bajêr e kom bibin, wêêrîşê xwe bidomînin û encax karibe li ser nîşana fermandar derdora bolukê biterikînin.*

*Bi paş de kişîna grubên mizgeft, banka û belavok, RBC û fermandariyê li nuxteya kombûnê ya ji derveyê bajêr, wê ji bo ku ev gruba êrîşê ya esasîtevî gruba parastinê qadên xwe biterikînin şert û merc peyda bin. Eger êrîşa li hindur bi ser bikeve, ewlekariya derdora avahiya bolukê wê were girtin û depoya çekan were valakirin, heval ê bikevin zindan û malên fermandaran ûzindanan vala bikin. Avahiya hikumetê wê were şewitandin ûpostane were hilweşandin. Wê di vê navê de gruba mizgeftê*

*(Tewfîq ê biaxife, Şoreş ê li hindur û Omer jî wê li derve wezîfeya parastinê pêk bînin) wê belavoka me bixwînin û bangawaziya 'teslîm bin' li dijmin bikin, û hewl bidin ku gel sakîn bikin.*

*Ev gruba me ya ku li mizgefta aliyê piştêyê ku deh metroyan dûrî bolukê ye, eger dijmin li ber xwe bide an jî bixwaze ku di pencereyên li dawiya avahiyêde ne bireve, bi destûra ku wê ji komutayê wergire, karibe weke hêza parastinê ji pey re tevli pevçûnê bibe. Paşde kişan wê bi dengê fîrikê dest pê bike û li gel komutayê çêbibe.*

*Gruba heval Botan jî; li sê qehwexaneyan belavok belav bike ku ev erka wî ya destpêkê ye. Di pey vê re wê bikeve mala mudur û veznedarê banqayê, mifteya banqayê bistîne banqayê bişelînin û herî dawî her du pankartên yek jê bomba pê ve ye daliqîne û karibe bi cîhaza biçûk pêşketinên li gel wan çêbûne û paş de kişana xwe ragihîne. Dîsa ew ajanê ji herêmê ku mala wî nayê zanîn lê tê naskirin eger li qehwexaneyan were dîtin wê were cezakirin.*

*Piştî ku ev hemû wezîfe hatine pêkanîn, eger tera xwe xenîmet hatibe bidestxistin wê li erebê bar bikin û ji wir dûr bikevin. Eger ev gengaz nebe, barwê li sê hestirên ku em ê li gel xwe bibin were barkirin û ev hestir êli gel grubê tevger bikin.*

*Eger rewşeke ji binî de têkçûnêû belavbûnê derkeve holêwê nuxteyek ku li quntereyên Çiyayê Çiravê hatiye diyarkirin herî dereng di 1,5'ê de kombûn çêbe; piştî ku ev dem Tije bû ev nuxte wê were terkirin.*

*Di kêliya çalakiyê de bêdestûr ji derveyê plansaziyêwê tevger çênebe, mewzî neyên terikandin; guleyên tên berdan wê bi îsabet û pîvan werin berdan, eger pêwîst neke wê gule neyên berdan; neçar e heval zêde zêde bi dîqet tevger bikin ku li heval û li sivîlan nedin. Wê ji bo talanê hewldan çênebe, paş de kişan wê qademe qademe û bi şiklê hev parastinê çêbibe.Tevî van mijarên bal hatine kişandin qonaxên planê bi caran ji bo endamên taximê hate gotin. Bi şiklekî taybet ji bo wezîfeyên her grubê bi caran bi bîra wan hate xistin.*

*Li ser planê; bi guhdarkirina fikrên hevalan li ser meydaneke rast maketa hedefê hatiye çêkirin û çend caran prova hatiye kirin. Êvara ku prova temam bûye, wê şevê ber bi hedefê bi rêketin çêbûye. Roja 15'ê Tebaxa 1984'an, li çiyayê nêzî hedefê man çêbûye. Bi dûrbûnê bajar, nuxteyên hedef û rê hatin nîşan dayin û bi hevalan dan naskirin. Êvara wê rojê, saet di 19:30'an de ber bi bajêr ve meş çêbû. Saet di 21'an de gihana cihê çalakiyê çêbûû bêkêmasî mewzîbûn û avêtina guleyan dest pê kir. Her tiştî li gorî plansaziyê dest bi herikîna xwe kir.*

**Kêliya Çalakiyê**

*Gulebarana li ser nobedar biserkeftî hate kirin. Û di pey lêdanê re heval çûn ser. Tevî ku RBC hinekê dereng ma li ser nuxteya ku hatiye pêşdîtin bi şiklekî serkeftî gule hatin barandin. Gruba êrîşê ya esasî bi şiklê grubên li pey hev bilez ketin hindur. Û di kêliyekê de gihan hedefên xwe. Gruba ku bi ser gazînoyê de bigirta, ji ber şaşkirina rê dereng gihişt hedefa xwe. Vê grubê nikaribû ku kesekî di nav gazînoyê de gule direşîne ser hevalan asteng bike. Heval Ferhan bi van guleyên tabancaya dijmin, dema ku li ber deriyê bolukê bû, bi guleya ji paş ve hatiye ji tiliya xwe ya destê rastê birindar bû.*

*Gruba me ya ku bi ser gazînoyê de girtiye, gulebarana otomatîk ku pêwîst dikir nekirana kirine. Du zarokên fermandaran di ling û destên wan de bîrindar kirine. Dema li gazînoyêti zilam nedîtine bi derengmanê ketine mala fermandaran. Gruba RBC berdana roket û guleyan temam kir; şûşeyêtije benzîn avêt qonaxa hikumetêû di dema xwe de hat nuxteya ku berê hatibû pêşdîtin. Hevalê li mizgeftê ji ber ku dereng karîbû derî veke, dereng dest bi axaftina xwe kir û pir dereng axaftina xwe xelas kir.*

*Gruba êrîşê ya esasî, piştî pênc deqîqeyan ji gulabarana destpêkê hate nuxteya me ya komutayêû ji rewşa li hindur agahî dan. Rewş ev e: Li hindur berxwedan çênebûye, nobedar hatiye kuştin, leşkerê li ser cîhazê birîndar bûye. Koğûş vala ne û du esîr hatine girtin û hatine anîn. Esîr dan axaftin. Me fêm kiriye ku Yuzbaşi çûye îznê, ji derveyê nobedar û leşkerên wezîfedar, leşker beriya çalakiyê derketine derve û di gulebarana destpêkê de başçawûşê wezîfedar li gazînoyê bûye lê belê reviye û xwe xelas kiriye. Di vê rewşê de dihat wê maneyê ku êdî avahîû bajar di destê me de bû. Ewlekariya derdora avahiyê hate girtin û ketina depoyê çêbûye. Sîlah û malzemeyên ji mala fermandar û depoyê hatine derxistin li derve li ser hev kom bûne. Ji ber ku kombûn pir zêde çêbûye hin heval ji bo erebeû hestiran hatine şandin. Ji Erdal û Bedran re hatiye gotin ku biçin zindanê. Wan gotiye ku wê bi gulebarana nobedar re rû bi rû bimînin. Ji bo îmhakirina postaxaneyê çûne. Lê belê nekariye ku deriyên wê werin vekirin.*

*Di vê vê navbera de Botan ku ji bo peydakirina mudurê banqayê bi pey wî ketibû, di hewşa bolukê de xuya kir. Got ku me mudurê banqayêû veznedar peyda nekir em ê çi bikin? Jê re hate gotin ku pankartan daliqînin û paş de bizivirin.*

*Şiyar û Heyder ku ji bo peydakirina erebeyê çûbûn li qewhexaneyê bi lêgera şofor xwe mijûl dikin. Heyder li qehwexaneyê bi gule barandinê gel dirêjî ser erdê kiribû, xwe bi wan de ecz dikir. Li vê bûyerê dest hate werdan.*

*Selîm, tevî ku ne hewce bûketiye qehwexaneyeke din. Doxtor ji mewziya xwe rabûye û hewl daye ku êrîşê nexweşxaneyê bike.*

*Bedran wan dest pê kirine xwe li tiştên neberkeftî yê wekî gazoz, saet û çaxmax daynin. Hevalê birîndar birine cihekî ku doxtor ne li wir e û li wir li doxtor geriyane, li cihê komûtayê netebitîne hewl dane mudaxileyî derdorê bikinû ketine depo.*

*Hevalê me yêku li ber deriyê mizgeftê nobedar bû qederekê piştî dengê sîlehan qut dibe, tevî ku qet pêwîstî pê nebû, li piştê ber bi pencereyên bolukê gule barandiye; tewfîqê ku berpirsiyarê wî bû jî ji mîkrofonê dest berdaye û ber bi avahiyê ve dest bi gulebaranê kiriye; gruba parastinêku li heman kolanê bû tevî ku qet pêwîst nedikir ew jîtevli wan bûne û dema ku gruba şelandina banqayê jî berê xwe daye heman kolanêûtevli wan bûye, hevalên me ber bi avahiya vala ji milê piştê ve gule barandineû dîmena pevçûneke nûafirandine.*

*Di wê navbera de hemû çekên di avahiyê de ji aliyê me ve dihatin derxistin. Li ser rewşê destwerdan çêbû, hemû grub bi fîrikê hatin komkirin. Li erebeya ku dereng hatiye anîn çek û malzeme hatin barkirin. Telewziyonê gazînoyê, taksiya fermandar û cemseyek hate ruxandin. Şuşeyekî duyemîn ê benzinê hat avêtin avahiya hikumetêû em hemû bi hev re li erebeyê suwar bûn. Du heval hatin şandin gel gruba kerwanêû li gel xwe hestir birin ser pira ku em ê lê peya bûna.*

*Dema ku erebe di rê de bû me dît ku Heyder di şofortiya xwe de ecemîtiyan dike. Em ji erebê peya bûn û neçûn cihê ku hestir hatibûn girêdan, em çûn cihê ku hestir li ser rê hatibûn vegerandin. Lê pêwîst dikir ku em çûbana ser pirê. Ev rewşa hatibû jibîrkirin. Bîst deqîqe vala vala hatin xerçkirin. Dema ku çûna ser pirê çêbû hat dîtin ku barê erebê hatiye valakirin, erebe birine li nuxteyekê hiştine, ji baran beşek li hestiran hatiye suwarkirin; yê mayî di nav kursên li ser rê de cuda cuda hatiye veşarin. Yên ku hatibûn hiştin hatin girtin û em ber bi gund ve ketin ser rê. Ji ber ku hin hevalên ku barê kamyonê vala kiribûn di riyeke din de ber bi wî gundî ve ketin rê, me bi rê de ew heval nedîtin. Dema ku em gihîştin gund quryeyê ku me bigirta gel xwe ne li mal bû. Sibe nêzîk dibû. Wexta ku me ava xwe girt û em ji gund derketin ji dengê kuçikan me texmîn kir ku hestir di pey derketina me re ketine gund û me heval şandin pêşiya wan.*

*Heval Selîm ku li gel hestiran dimeşiya û gundiyan nas dike, riya xwe bi mala quryê dixe lê wî li mal nabîne. Dema dixwaze ji wê malbatê du kes quryetiya me bikin, gundîdibêjin me du kes wekî qurye dane hevalên we û li ser vê yekê ew jî dibêje qey me qurye ji wê malê girtine, bêyî ku kesî bigire gel xwe ji gund derdikeve. Heval Tewfîq ku ji bo wan pêşwazî bike derketibû jî, beyî ku li ser mijara quryê biaxifin hatin gel me. Û ji bo serê sibê jî kêm ma bû. Diviyabû em ji derdora gund dûr biketana. Me derfet peyda nekiribû ku em hevalan cara seyemîn ji bo quryê bişînin.*

*Belê, ji gund qurye hatibû girtin. Lê belê ne me; gruba ku rê qut kiribû, qederekê beriya me çûbûn gel û bêyî ku li hêviya me bisekine qurye girtibû çûbûn. Ji Selîm jî bû ku me qurye girtiye.*

*Me li gel hemû xenîmet, sê hestir û hemû hevalanşeva destpêke û roja duyemîn bi saxlemî derbas kir. Du grubên rê yên ku her yek ji sê hevalan pêk dihat, beriya paş de kişana me paş de kişiyabûn û dûr ketibûn. Me, şeva duyemîn ji bo nan, av qurye û hestirên zêde bînin grubek heval şand gundê ku em li nêzîkî wê bûn. Me îhtimala ku li gund leşker hebin hesibandibû, ji ber vê yekê heval wê bi tewdîr biketana gund. Wexta ku gruba me ya kifşê nêzî gund dibin, leşkerên ku gund dorpêç kirine bi wan dihesin. Ji ber vê yekê heval neçar man vegerin gel me.*

*Me 29 mawzer ku ji barê sê hestiran zêdetir û, smînofek, 2 teybên stero yên mezin li wir veşart, têhn û birçîû bê qurye, em bi aliyê ku me texmîn dikir ve bi hestirên bar kirî ve xwe li teh û zinaran da. Ji ber ku me re dernedixist û barê hestiran giran bû me karîbû kêm rê biçin. Ji ber têhnbûnê ne di me de û ne jî di heywanan de halmabû ku em bimeşin. Gundekî ku em nêzî dibûn ji bo av û qurye em peyda bikin me grubek şandê. Heval bi av û du gundiyan ve paş de zivirîn. Piştî ku li gel wan hinekê meşiyan em neçar man gundiyan bi şûn de bişînin. Ji ber ku di maneyekê de bi darê zorê hatibûn. Eger neçûyana dibû ku malbata wan agahiyê bide leşkeran. Dîsa jî eger wan malbatanaliyê ku em ê pê de çûbana nizanîbûna me dê ew kes rojekê li gel xwe bihiştana. Lê belê li gel malbatan hevalê Tewfîq aliyê ku em ê pê de çûbana eşkere kiribû. Piştî ku me gundî şandin, me karîbû saetekê bimeşin. Ji ber ku sibê dibû. Me xwe gihande nava teht û zinarên li derdora riya ku em tê re dimeşiyan û me barên xwe veşartin. Ji ber ku hevalan hestir biribûn û li hemberê zomên ku berê xwe li nuxteya me bûn girêdabû, dema sibe bû gundiyan hestir dîtin. Û hatin gel me. Em ji gundiyên hatine gel me fêr bûn, leşkeran bi ser wî gundê ku me jêêvarê qurye girtibû, girtine. Ber bi êvarê wexta ku me haziriyên ketina rê dikir, me dît ku gelek leşker ketine di riyaku em bi şev tê re meşiyabûn, dimeşin û nêzî nuxteya me dibin. Li hemberê nuxteya me sekinîn.Me fêm kir ku ji dews û quryeyên me bi şev girtine gel xwe, aliyê me pê de tevger kiriye û nuxteya me tesbît kirine. Di vê rewşê de çavên hevalan jê negirt ku gelek tiştên xenîmetê ku li pêşberê leşkeran bû bînin bar bikin û tev bi vî barî li gel dijmin bikevin pevçûnê. Eger em bi hestiran ve ketibana rê, diviyabû em ketibana ser riya ku ew lê ne. Bêyî ku em êrîşî leşkeran bikin jî derbaskirin ne mikûn bû. Me 32 G-3, daktîloyeke mezin, sîlehên Azad û Fikret ku di çalakiyê de bi kar anîbûn, 2000 lib guleyên G-3'yan û tiştên di çalên di nav de veşartibûn ûkelûpel, tevî hestiran hiştin;ber bi gundê ku em nêzî wî ne ûtêkiliyên me li*

*wir hene û ji wir pê de heya nuxteya ku em riya wê dizanin, me di erdeke teht û kevir de dest bi meşê kir.*

*Beriya ku leşker were nuxteya me, me hevalên Şiyar, Bijî, Azad û Omer ji bo kifşê şandibûn vî gundê me diyar kiriye da ku bizanin ka li vî gundîleşker hene an na. Dîsa wê pêdiviyên me jî peyda kiribana. Ji van, du hevalan wê li derdora gund li hêviya mesekinîbana û li ser rewşê agahî dabana me. Wexta ku em nêzî gund bûn, me tenê Şiyar dît. Li gorî agahiyên ku me jê girtine,di encama xebata kifşê de fêm dikin ku li gund leşker tineye û gruba ji çar kesan pêk tê dikeve gund. Du heval ji bo ku pêdiviyên me peyda bikin mijûl dibin û Bijîû Omer ji bo ku me pêşwazî bikin tên destpêkê gund. Wexta ku grub dibe du parçe û Şiyar û Azad ji bo ku pêdiviyên me peyda bikin mijûl dibin, gundî dibêjin leşker dikeve gund. Û Şiyar û Azad li gund hev du wenda dikin û bi vî şiklî derdikevin derveyê gund. Me Şiyar li ser rê dîtlê belê Azad, Bijîû Omer peyda nekir.*

*Buraya Türkçe de ki belge no: 11 gelecek*

*Me Şiyar û gundiyek girte gel xwe,em li dora çiyayêku li pişta gund bû zivirîn û me bi vî şiklî di ser leşkeran re qewast. Destpêk û dawiya geliyê ku em di nav de bûn hatibû girtin. Me ber bi sibê xwe avêt bextê şuneke pê bawerî heye. Me bi roj tevgera dijmin şopand. Bi fikra ku em ê nekaribin di heman şevê de çemberê biqetînin, di hewa û bejahiyê de heya bi êvarê li nav çemberê geriyan. Me karîbû encax şeva 18'ê Tebaxê bikevin binkeya xwe (üss). Piştî ku me li vê nuxteya xwe rojeke aram û sakîn derbas kir, li gundê destpêkê yê ku me riya xwe pêêxistiye, em fêr bûn ku beriya me bi du saetan bi grubên 100 kesî li gund û daristanê lêgerin pêk anîne.*

*Di vê rewşê de ji bo ku em li derveyê çembera operasyon û teqîbatê bimînin xwe hildina erdeke pê bawerî heye me di cih de dît. Em bi kifş û komkirina îstîxbaratê re mijûl dibin. Li hin qereqolên biçûk ên ku me karîbana bi ser de girtiba zêde zêde leşker hatiye bicihkirin. Me hedefên nû diyar kirine û kifşa hin cîhan pêk aniye. Me biryar girt ku kêliya paş de kişanê em êrîşî aliyên bêparastin ên dijmin bikin.*

*Em fêr bûn ku heval Bijî, Azad û Omer xwe gihandine qadên ku binkeyên (üss) me lê hene. Ji grubên rê qut kirine sê hevalên milîs gihiştin qadê. Gruba duyemîn a rê qûtkirinê ya ku ji Hecî, Xelîl û Îbrahîm pêk dihat hê negihîştin me. Em hewl didinxwe bigihînin hevalên ku xwe gihandine binkeyê*me. Heval S. û heval C. Beriya çalakiyê li ser esasê ku em li vê binkeyê hev bibînin em ji hev qetiya bûn; me hê jî bi hev re têkilî çênekiriye."*

Sih kesî bi ser Dihê de girtibûû bêyî ku wendahî bidin li gel Tije erebeyek sîleh û xenîmet paşde zivirîn. Ev çalakiya di raya giştî ya Tirkiyêû cîhanê de bi rojan weke nûçeya destpêkê hat ragihandin. Lê nirxandinên fermandar Egîd ku mîmarê sereke yê vê çalakiyê bû nirxandinên wî cuda bûn, zêdetir nirxandinên leşkerî bûn.

*Qada ku weke binkeyê tê diyarkirin qadên di navbera Besta Şirnexê(kırkağaç) an jî gundê Xirbikê Bestaya Şirnexêû gundên Omyanûsa Berwariyê ye.

**“Me Dihê Xist, Lê Ji Bo Şerên Cidî Pêwîst e Em Hê JîQeweta Xwe Zêde Bikin**”

*“Weke ku ji vegotinên me yên jor jî were fêmkirin, ji ber ku berê,paşde kişîna bi her aliyê xwe nehatibû plansazîkirin bi şiklekî bêrêkûpêk çêbû. Û bû sedem ku em wextê wenda bikin. Wendabûna wextê, bû sedem ku xenîmet bi temamî neyê xelaskirin ûem bi xetereyan re rûbi rû bimînin. Lê ji roja ku biryara çalakiyê gihişt me heya bi roja çalakiyê, biqasî bîst roj wexteke me ya amadekariyê hebû. Gruba Bedran ku li gel heval S. Çûbûn qada Dihê, wê kifş û derdora riya ku me tê re paşde kişan bikirana amade kirana, rê naskirana an jî qurye amade kirana. Dema ku gihiştin gel her du hevalan me dît ku di her du mijaran de jî amadekarî nehatiye kirin. Ji bo lidarxistina çalakiyê pênc roj mabûn, me dikarîbû tenê ji pênc rojan sê rojan bidin amadekariyê. Û di van sê rojan de jî me tenê dikarîbû hevalan bişînin bajêr û bi kifşê re mijûl bin. Jixwe me ev kir.*

*Me di stendina xenîmetan de zêde çavnebarî kir. Û di şeva destpêkê de bû sedem ku em qederekê giran tevbigerin. Ji bo xenîmetê me dikarîbû grubekê cuda bikin. Lê belê em di mijara ku gelo em ê karibin biparêzin de ketin gumanê. Û ji ber ku me bi xwe re rakir jî tevgera me giran kir. Tevî her tiştî me karîbû xenîmetan derxin herêma çiyayîû ji xelaskirina wan re pir kêm mabû; lê belê ji ber ku me hişyarîû baldariya pêwîst nîşan nedabû em bûn sedem ku dijmin me bişopîne. Û me dijmin heya bi ser xwe anî.*

*Di qada çalakiyê de bi coş û morala derbaya despêkê ya ku li dijmin hatiye dan heval ji ser xwe ve çûn. Û her kes ket rewşeke heyirî mayîû her der bû toz û duman. Xwe komkirinê demek girt. Beşeke dema me bi vî şiklî hate xerckirin.*

*Hevalên ku ecemîtiya çalakiyeke wiha dijiyan bi temamî girêdayî plansaziyê neman. Heval di mijarên weke disîplîna gulebaranê ya pêwîst bû, sengergirtinê (mewzî), lez û hişyarbûnê de nebes tevgeriyan. Li cihên ku pêwîst nedikir gule barandin, zêde gule xerckirin û dest bi gulebarana ku hedefa xwe nabîne kirin. Di*

*meşê de, ji bo girtina bar bêdilî pêş ket. Ji ber fêmnekirin û westînê zêde guhnedana disîplînê pêş ket. Ev rewş timî bû sedema hişyarîû rexneyan.*

*Di ruh û feraseta bûn leşker de di asta herî dawiyê de nebesî hat dîtin. Kêmasiyên weke guhdarnekirina talîmat, hişyarî ku ferasetên bingehîn ên leşkerî ne, xwe bi ber bayê pêşketinan re berdan, nehişyarî bûn tiştên timî tên jiyîn.*

*Xwedî derketina li tiştê taybet,weke çek û rext, çênebû. Di seransera rê de ketin erdê an jî wenda bûn.*

*Berpirsiyarê taximê di her mijarê de hewl da li gel rêvêberiya yekeyê biryarên kolektîf bistîne û ev kolektîfiya li qada şer a ne di cih û demê de bû sedema tevgera giran.*

*Li beranberê gel helwestên sekter hatin nîşandan. Helwestên ku ji zêhniyeta talanê re rê vebikin hatin pêşxistin.*

*Tevî şaşitîû kêmasiyên me yên diyar li gel hemû hevalan wêrekî, coş û moral,îrade û girêdaneke temam hebû. Lê belêji bo şerên cidî hê jî pêwîstiya hevalan bihêzkirina hevalan heye.*

**Wendahiyên Dijmin**

*1- Leşkerek hat kuştin û di navbera 6-9'an de jî birîndar bûn.*
*2- Du erebe hatin şewitandin û hatin bombekirin.*
*3- Telewziyonek li cihê bûyerêû yek jî bi rê de hate îmhakirin.*
*4- Avahiya hikumetê hate ruxandin (li gorî texmîna me neşewtiyaye)*

***Xenîmeta Ji Bajêr Hatiye Derxistin***

*1- 31 lib G-3 û 28 lib jarjorên wan ên tije,15 lib qasatura, 24 harbiye, 8 rext û 3863 guleyên wan.*
*2- 2 lib Sîgo'yên portatîf û 10 numere kaleşnîkofên Rûsî, 137 gule, 4 jarjor.*
*3- 2 lib Smînof*
*4- 22 lib mawzer, 120 gule û 2 rext*
*5- 1 libG-1*
*6- 1 lib MP-5 û sê jarjorên wan ên tije*
*7- 6 lib tabancayên taqarof*
*8- 1 lib tabancayên Belçiqî*
*9- 1 lib tabancayên astra*
*10- 1 lib tabancaya Fransî ya bi dehî*
*11- 1 lib cîhaza mezin a piştê(bêsîma mezin)*

*12- 3 lib tifengên qirme û rextekîtije*
*13- 1 lib dûrbîna mezin*
*14- 14 lib çanteyên nan*
*15- 8 lib metere*
*16- 1 lib pusulayên leşkerî*
*17- 1 lib daktîloyên mezin*
*18- 2 lib teybên stero yên mezin*
*19- Taximek cilên subayan*
*20- Taximek cilên leşkeran*
*21- 1 lib baranî*
*22- 1 lib parqa*
*23- 3 lib radyo*
*24- 2 lib palaska*
*25- 2 lib pense*
*26- 2 lib saet*
*27- 3 lib çaxmax*
*28- 3 lib defter û hin qelem.*

*Beşa mezin a xenîmetê bi şiklê çar parçe bi rê de hate veşartin. Beşa yekemîn; cîhaz( bêsîm), sindoqek guleyên G-3 ku ji hezar guleyî pêk tê, sandoqek tije tabanca û gelek kel û pelên ku nehatine tesbîtkirin.*

*Beşa duyemîn: 3 tifengên qirme, parka û tiştên ne hewce.*

*Beşa seyemîn; 20 lib mawzer, yek Smînof û teyb.*

*Beşa çaremîn; 32 lib G-3 ( ji van yek ya heval Azad e ku di çalakiyê de nexebitîbû, klêşa Fîkret ku nexibitîbû 2000 lib guleyên G-3, 1 lib G-1, palaska, qasatura, daktîlo, dûrbîn, cil û berg, baranî, radyoyek ku yê me bû.*

***Beşa Xenîmetê Ku Me Li Gel Xwe Rakiriye:***

*1- 2 lib kleşnîkof, 4 jarjor û 137 gule*
*2- 2 lib Smînof*
*3- 3 lib mawzer, du rextên wê yên tije (pênce guleyî)*
*4- 1 lib MP-5 du jarjorên wê yên tije, bi giştî 59 guleyên wê*
*5- 9 lib tabanca, 8 jarjorên yedek.*
*6- 6 lib metere*
*7- 1 lib G-3, jarjoreke wê ya tije.*
*8- 6 lib çente*

*9- 2 lib radyo*

*10- 2 lib saet, 3 çaxmax, 3 qelem, 2 pêlav, cil û berg.*

*11- 1 lib fenerê destan ê bi floresan.*

*Me ji radyoyê bihîst beşeke xenîmeta ku me bi rê de hiştibû bi dest dijmin ketiye; em texmîn dikin beşa ku G-3 di nav de ne bi dest dijmin ketiye. Em lêkolîn bikin.*

***Malzemeyên Ku Me Di Çalakiyê De Xerc Kirine***

*1- 551 lib gule*

*2- 1 lib roketa RBC'ê*

*3- 7 lib bombeyên destan*

*Ji me ti heval şehîd neketin. Hevalê bi navê Ferhan ji tiliya xwe birîndar bûye.*

***Çalakiya Me Gihiştiye Armancê***

*Çalakiya me gihiştiya armacê, li hindur û derve dengekî pir bilind vedaye, bawerî daye gelê me û kêfxweşî jî daye dostên me; tirs û xof daye dagirkerîû reformîzmê. Derxistina holê yarastiya nepixandî ya dijmin, bûye sedem ku gel weke bûyîû bi rastiya dijmin, dijmin bibîne û bi çavekî biçûk li mirinê binêre.*

*Tevî ku di aliyê leşkerî de wendahiyeke mezin nedaye dijmindi nav refên leşkerî de bûye sedema texrîbateke manewî ya mezin, tirseke mezin xistiye dilê artêşê. Nobeda qereqolan bi gundiyan digirin. Dijmin di helwesta xwe ya li beranberê gel de heya asta dawiyê nerm bûye, hewl dide bi vê rêbazê pêşî li berxwedana gel bigire. Çalakiyê hêz daye pêkhateya me ya şervanan, bûye sedem ku em xwe hê baştir nas bikin. Vê çalakiyê di aliyê leşkerî de li rewşa me ya ku xwe dubare dike û gîro maye dawî aniye, derbeya mirinê li ferasetên rastger daye.*

*Silavên Şoreşgerî*
*22'ê Tebaxa 1984*

*Ji ber ku me zêde acele kir nivîs rêk û pêk û di asteke têrê dike de nebû, lêborîna xwe dixwazim."*

Çalakiyên biserdegirtinê yên Dihêû Şemzînan li Kurdistan û derve, tesîreke pir mezin kiribû, bêdengiya ku çar salan berdewam kiribû bi bombeyeke mezin a hatiye teqandin vegeriyabû'dîlanek' ku bi salan bidome. Çalakiyeke 'destpêkek nû' ku Egîd

ev demeke dirêj e li ser difikire biserkeftî hatibû temamkirin. Lê xewnên wî yên hê mezintir hebûn. Li ser welat, axa welat, azadiya welat difikirîû di vê mijarê de lêhûrbûn çêdikir. Dema ku ev çalakiya dîrokî ku mohra wî bi xwe li ser bû dinirxand jî, psîkolojiya 'serxweşiya serkeftinê"' nedijiya. Ew şoreşgerek bû, tiştên erênî yên Partîû gel bûn. Ji ber vê yekê di rapora xwe de behsa kêmasiyan dikir. Diyar dikir ku girêdayî bi plansaziyê nemayîne. Û xebata xwe didomand, hem jî bêyî ku bêhna xwe berde.

## DENGÊ JI DIHÊ VEDAYE

Beriya biserdagirtina Dihê fermandar Egîd di rojnivîsa xwe de bi mînakên balkêş şert û mercên wê demê, rewşa gerîla, rewşa gel û dijmin, zehmetiyên pêre rû bi rû mane, şert û mercên zivistanêyên giran dûr û dirêj nivîsandibû.

Piştî meşeke dirêj û zor ûzehmed di binkeyên ku xwe nû gihandinê de, kadroyan, di zivistana 1983'yan de bi şiklekî giran ji bo ku di aliyê polîtîk û pratîk de xeta Partiyê bi kûranî fêm bikin dest bi xebatê kirin. Ji bo ku amadekariyên diasteke ji wezîfeyan re destdayî de were kirin di şert û mercên giran ên zivistanê de qonaxa dawî ya ku pêwîstî pê hebû jî hate meşandin û di asteke girîng de jê encam hatin girtin. Di mijarên rêxistinîû teknîkî de taslaxên planan û talîmat hatin pêşxistin û her wihaew demsala zivistanê, bi vî awayî hate nirxandin.

*"Ew zivistan qederekêbi zehmetîderbas bû. Hawîrdor bi rengê spî hatibû xemilandin. Xweza biqasî karibe bêdeng bibû. Berfa xweş lê dikir her ku diçû weke pelên payizê ji daran diweşeû li ser hev kom dibe, li ser hev kom dibû. Li derve ne gengaz bû ku zindiyek xuya be. Hin caran bilindahiya berfê digihîşt du metroyan. Hevalên diviyabû biçin araziyê bi zehmetiyên mezin re rû bi rû diman. Hevalek ku neçar mabû du rojan di berfê de bimeşe, ji neçariyê bi vekirina berfa aşûtê hatibû gel me. Piştî ku xwe gihand gel menexweş ket û panzde rojan nikaribû ji erdê rabe. Zêde zêde qerisîbûû mîdeyê serma xweribû, çi dixwar bi şûn de diavêt derve. Li aliyê din, çavên heval ku li ber şewqa zêde ya rojê xirabibûn li pey hev rondik dibarandin.*

*Dîsa grubek heval şeş rojan li ber berf û baranê dimeşin û li malek ku di quntaraya çiyê de rastî wê tên şeva xwe derbas dikin. Xwedanê malê roja din ji hevalan re dibêje cihê ku biçinê nêzîk e û dibe sedem ku heval bi rê bikevin. Lê dema digihîjin cihê zilam tarîf kiriye tiştekî nabînin, fêm dikin ku hatine xapandin. Ji ber ku wê nikaribin paşde bizivirin, bi erzakê rojekê, du rojan temam dimeşin û xwe digihînin gundekî hatiye terikandin ku ji aliyê rejîma Iraqê ve hatiye hilweşandin. Piştî ku şevê li*

*derve derbas dikin, bêerzaq derdikevin rêwîtiya roja sêyemîn. Ji grubê du heval piştî demekê bêqewet dikevin, çavên wan dest bi korbûnê dikin û nikarin bimeşin, li ser vê yekê hevalê sêyemîn bi dorê her carê ji wan yekî li pişta xwe dike. Lê dema êvar dibe her sê jî bêhal dikevin erdê. Di vê rewşê de bi fikra ku dibe ku hin li derdorê hebin, çend guleyan berdidin hewa. Gundiyên li nêzîk ku dengê çekan dibihîzin, beriya heval bicemidin wan rizgar dikin.*

*Em bawer in ev her du mînak têrê dikin were fêmkirin, zivistana ku me derbas kiriye di kîjan şert û mercan de hatiye jiyîn.*

***Halê Leşkeran Ne Tu Hal E***

*Bi hatina biharêû dest bi helînê kirina berfê rehewl hat dan, yeke bernameya xebatê ya asgarî ku wê li herêmên biçinê bimeşînin fêm bikin. Mizgîniya biharê ku bi dest bi helîna berfêkirinê re dest pê kiriye, ji bo hemû şervanan bibû çavkaniya kêfxweşiyê. Ji bo xebata ku bimeşînin heyecan û coşa xwe gihandina herêmên ku biçinê dest pêkiribû. Ev xebat ji bo hemû yekeyan qederekê sûdmend bû. Bal hat kişandin ser giraniya esasî ya xebatan, terza xebatêû tewdîrên ji bo xetereyan werin girtin. Bi vî şiklî kadroyan di aliyê fikrî de xwe gihandin asteke hê zelal. Gruban, Bi temamkirina amadekariyên dawî re jî, xwe gihand zanebûna wezîfe û berberpirsiyariyên giran; bi destpêkirina biharê ku jiyaneke nû dibişkivand, bi hezar rengî xwe dixemiland re ber bi Bakûr ve xwe li riyan girtin.*

*Li pêşberê amadekariyên me, dijmin jî vala nedisekinî. Qeweta xwe li ser sînor kom dikir û dixwest me li vir bixe nav pevçûnê, pêşî li derbasbûna me bigire û gruban îmha bike. Li gorî ku dihat fêmkirin taktîka me fêm nekiribû, li gorî şerê artêşan (şerê nîzamî) xwe amade kiribû. Li Bakûr li ser sînor bi firehiya sed kîlometre nuxteyên stratejîk girtibû, cihên derbasbûnê yên girîng xistibû bin kontrola xwe. Bi vî awayî pişta cepheyê pêş saxlem kiribû. Dema ku dijmin ev amadekarî pêk dianîn hemû yekeyên me derbasî hindur bibûn û li Başûr rewşa me pir baş bibû.*

*Dijmin sibeha 27'ê Gulanê sînor derbas kiribû pênc kîlometre ji Başûr ketibû hindur(1). Ji hêzên herêmî re gotibûn hedef ne ew in, ji bo ku li dijîAPO'çiyan şer bikin hatine. Lê belê di demeke kurt de bi zeîfiyên xwe hesiyane û dest bi paş de kişînê kiribûn; ji ber ku halê leşkeran ne tu hal bûû li çiyayên me yên asêû bi heybet ku li pêşberêvediciniqîn bi şerê gerîla re rû bi rû man qet jî li xweşiya wan nediçû. Di vê navbera de her hal fêm kiribûn ku hêzên me li Bakûr belav bûne, ji Başûr dest bi kişînê kirin û li herêmên li ser sînor dest bi operasyon û teqîbê kirin.*

*Em jî, ji ber ku em li benda îşxalê bûn zêde matmayî neman. Dema ku dest pê kir hêzên li Başûr paşde bikişin, me grubek heval biryar girt ku em derbasî Bakûr bin. Me li gel quryeyekî ku me tesedufî dîtiye xeta îşxal û sînor derbas kir û me xwe gihand gundê quryeyê xwe*[(2)]*.*

***[(1)]Dîroka behsa wê dibe 27'ê Gulana 1983'an e. Artêşa Tirk di ser herêma Qilaban-Çelê re derbasî Başûr bibû. Egîd îşaret bi xebat û bûyerên wê demê dike.***

***[(2)]Quryeyê ku Egîd behsa wî dike Xalit Öncü'yê ji gundê Böjeh kugirêdayî Qilaban e. Di zivistana 1985'an de li gundê Dêrahînê bi du subayên dijmin re rastî hev hat. Dema ku li wan zivirîbû di piştê de lê dan. Di wê rewşê de du subay kuştin. Ew bi xwe jî ji ber ku xwîna wî zêde çûbû, mir.***

*Gundiyên ku bihîstine em hatine, di rewşeke zêde zêde veşartîû dizî de hatin cihê em lê, bi mereq û fikar pirsa rewşa li Başûr kirin. Piştî ku me xwarina ku wan aniye xwar, ji bo bersivdana pirsên wan pirsîne, me hewl da ku em îşxalêû encamên ew êbiafirîne îzah bikin. Gundiyan, tevî ku tesîra îşxalê dijiyan hewl didan xwînsariya xwe jî biparêzin. Piştî ku me axaftina xwe xelas kir, gundiyan em jî girtin gel xwe û birin cihên veşartî yên ji bo xwe amade kirine. Ev der bi rastî jî cihekî pir saxlem bû."*

***"Em Di Kendalên Bêbinî Re Hilkiştin Û Meşiyan"***

Piştî du rojan di vî cihî saxlem û veşartî de man, fermandar Egîdû hevalên wîjîdu ciwanên gundî bi xwe re radikin ûbi rê dikevin:

*"Dema me quntarayên asêûzehmedên çiyayan qut kir; em di nav daristaneke têrdar re hilkiştin girekî, me dît ku li aliyê hember, qereqolekî dijmin ê ku pir jî ne dûr e heye. Piştî me bi dûrbîna xwe kontrol kir, me biryar da ku em di ser pirek ku hê jî dijmin negirtibû re derbas bin. Û me bi lezgînî xwe ji quntarê çiyê berda xwarêû em nêzî nuxteya kemînê bûn. Piştî ku du hevalan kifşa pirê kirin û agahî dan ku pir serbest e, bi şiklê ku di navberê de mesafe hebe bi bezê me cîhe bi xetere derbas kir. Ji ber ku em ji nav du cihên dijmin derketibûn em hinekê vehesîbûn.*

*Li ser kaniyek ku me xwe gihandibûyê me navbera îstîrahatê da û me şîva xwe ya ku ji nan û pênir pêk dihat xwar. Me paşê jî li gel ciwanên gundî hinekê sohbet kir. Di wê dema germ a îşxalê de jîtişta difikirîn teneew bû ku em kêliyêkê hê zûtir muxbîr û ajanan ceza bikin. Hê di wê kêliyê de ji me re gotin, ew dixwazin li gel me tevger bikin*

*lê ji ber ku di wan şert û mercan de derfetên vê nebûn, em li gel wan axifîn û me ew îqna kirin.*

*Piştî ku me hinekê bêhna xwe veda dîsa em bi rê ketin û em hê çend rojên din di kendalên bêbinî re hilkiştin ûmeşiyan. Di dawiyê de li qadek ku me nas nedikir di şert û mercên zor ûzehmed debi alikariya gel bi xêr û xweşî me xwe gihandcihê ku me ji xwe re kiribû hedef. Hemû kesên ku me li ser riyan dîtine û em bi wan re axifîne, pirsên li ser "şerê" Başûr ji me dipirsîn. Gel, di derbara pêşeroja xwe de fikrên reşbîn û hêvîdar di zikhev de dihewandin. Di beşa civakê ya bi temen de jî, bîranîna komkujiyên ku dewleta Tirk berê pêk anîbû zindî bibûn, tirsa ku ew roj wê bi şûn de werin hebû. Bi gelemperî gel ewlehiya jiyana xwe, bi mayina li ser piyan a rêxistinan ve girêdida."*

***"Ka Bisekinin Em Ê Çi Ji We Bikin!"***

Ber bi nîvînga meha Hezîranê ve tesîra îşxala li Başûr dest bi belavbûnê kir. Leşkerên Tirk sînor bi temamî vala kiribûn û ji tirsa xwe yekîneyên sînor ên kevin jî rakiribûn. Hêza xwe ya ku kişandibû hindur jî bi şiklê çend qolan dimeşand û hewl dida ku qadên me yên xebatê dorpêç bike. Dema ku li hin qadan li ser gel zêde zordarî dimeşand, li ser beşên civakî yên ku ji bo wan li benda berxwedanê bûjî siyaseteke nerm dimeşand. Heta cil û berg, pêlav, şekirê zarokan jî belav dikir. Li pêşberêwêjî dixwest, ku alîkariya APO'çiyan nekin, çekên xwe teslîm bikin û mehkum û qaçax jî, werin xwe teslîm bikin. Dema ku nedikarî pêşberê van xwestekên xwe tiştekî bi dest xwe bixe jî, bi şiklê " ka bisekinin em ê çi ji we bikin" gef dixwar û diçû. Li aliyê din xebatên yekeyên me jî neketibû tesîra vê operasyon ûîşxalê.

Fermandar Egîd û yekeya wî, ji bo ku li ser îşxala Başûr a ji aliyê KT'ê ve hatibû lidarxistin û tesîrên ku vêîşxalê afirandine nîqaş bikincivîneke heftane li dar xistibûn; fermandar Egîd encamên vê civînê bi vî şiklî derbasî rojnivîsa xwe kiribû:

*"Îşxal li gel DYE'ê hatiye plankirin, hedef ew e ku li hêzên herêmî yên pêşverû gef bixwe û cuda jî ji bo destwerdaneke dema pêş prova bike. Dewleta Tirk jî weke hedefa sereke îmhakirina PKK'ê ji xwe re diyar kiriye lênekariye xwe bigihîne vê hedefê. Şert û mercên ku karibe xwe bigihîne jî tineye. Ji ber ku hêzên me xwe kirine gelek parçe û bi şiklê yekeyên cuda cuda xwe rêxistine û li araziyeke pir berfireh tevli gel bûne, bi şiklê veşartîû bi tevger in. Dijmin ji alîkariya gel bêpar maye, li araziyê biyanî ye û di çêkirina kontrolê de zehmetî dikişîne. Ne gengaz e ku vê kontrolê çêbike jî."*

Fermandar Egîd û hevalên Wî bi van nirxandinên ku kirine û encamên xwe gihandinê, ya rast jî ew e ku hê di wê demê de di îmtihana xwe ya destpêkê de li beranberê dijmin bi ser ketine.

*“Karûxebata me ya rêxistinî bi bandora bûyerên nû, hê jî bilezû bêyî ku kêmasîû navber bikevê, berdewam dikir. Dest pê kiribû encamên kifşê were girtin, biyanîbûna ji araziyê re hêdî hêdî hatibû derbaskirin û nuxteyên destdayî hatibûn diyarkirin. Li qadên ku ji bo binke çêkirinê destdayî hatine dîtin, giranî hat dayin karûxebat rêxistinîû teknîkî.*

*Dema ku me taybetmendîû pêkhateya civakîya gelê herêmê lêkolîn kir, me fêm kir ku em bi rastiyeke zêde zêde xweser re rû bi rû ne. Çawa ku hilberîn û şert û mercên jiyanê yên mirovan cuda bûn, şert û mercên xwezayê jî cuda bûn.*

*Beriya ji her tiştî li holê pêkhateyeke rêxistinkirî ya civakî hebû. Eşîrên li ser esase tovikê qebîleyan çêbûne û konfedarasyonên Eşîran ku li ser wan xwe bi rêxistin kirine dihatin dîtin. Lê konfedarasyon ne zêde xwediyê roleke pratîkî ya kêrhatî bûn. Seroktiya eşîrî, weke otorîteyek ku xwe dispêre bidilbûn û rêzdarbûnê ya ku li ser esasê xizmetê çêdibe, awayekî tîpîk ê serokatiya di klanan de bû. Ev serokatî, bi taybetmendiya xwe ya ku bi şiklekî berfireh bûn xwedî mal û milk û heqê talankirinê ve nêzî çînên serdest dibû. Lê hê jî di navbera çînên jêr û pêşengtiyê de nakokiyên pêşketî jî nebûn. Nakokiya herî giran a tê zanîn, nakokiya li ser mergan û dozên xwînî yên ku çavkaniya xwe ji talan hwd. û nakokiyên cuda digire bûn. KT nekaribûye bikeve nava pêkhateya civakî, li vê qadê zêde nekaribûye texrîbata ku li herêmên hindur çêkiriye çêbike. Ji ber vê yekê, civakê girêdayî bi nirxên xwe yên neteweyî li ser piyan girtinê, kariye dînamîkbûna xwe biparêze û taybetmendiya mirovên bihêz pêş bixe. Ji ber yekparetî û hevkariya eşîrî hesta bi xwe baweriyê serdest bûye, mirov di bin barê giran ê dagirkeriyê de neperçiqîne û belav nebûne. Ev jî ji ber hilberîna ku di şert û mercên zor ûzehmedên xwezayê de tê kirin û kevneşopiya berxwedanê ya ku mêtingeriyê nekariye xelas bike qezenc kiribûn. Ziman û çanda neteweyîû pivanên neteweyî, ji tesîrên biyanî dûr, dîmeneke safî derdixist holê. Wexta ku cilên neteweyîbi çekan dihatin xemilandin, tîpekî wihazindî û çalak derdiket holê; ev dibû sedem mirovjêre rêzê bigire.*

*Li vê herêmê hesret û xwesteka zanebûna neteweyîû rizgariyê, rayên xwe pir kûr diajotin. Girêdan û hezkirina bi eşîra xwe re hê jî dişidandin û saxlemtir dikirin û bi her şiklê têkoşîna neteweyî rewa didîtin. Beriya vê jî, tenê ji ber Kurdbûna xwe, salên dûr û dirêj rakirina barê giran ê têkoşîna li Başûrê Kurdistanê qebûl kiribûn. Lê ji ber nêzîkbûna neteweperestiya seretayî ku tevgera neteweyî asê dikir, dixist nederê jî*

*nerehet bûn. Ji wê bi şûn de dema ku bi alternatîfeke cuda re rû bi rû nediman, hêvîû xwestekên wan ên  rizgariya neteweyî dest bi zeîfbûnê dikir.”*

***“Em Bi Navê ‘Yên Me’ An Jî Bi Navê ‘Heval’ Dihatin Nasîn”***

Her çendî ev pêkhateya civakê ku gerîla pê re rû bi rû mane rewşeke erênî dida xuyakirin jî, ji ber ku kes ji îradeya azad bêpar bûn û beşeke jê venabe ya pêkhateya xwezayî ya eşîrî bûn, dibû sedem ku gerîla û fermandar Egîd bi hin zor û zehmetiyan re rû bi rû bimîne. Ji ber vê yekê jî, ji roja destpêkê pê de xebatek ku hemû eşîrê bigire nav xwe, xwe ferz kiribû.

*“Eşîran, dêstpêkê, ji bo me nas bikin û fêm bikin zehmetî kişand. Hê bêhtir, bi neteweperestiya sexte û rêxistinên sexte yên ku çavkaniya xwe ji Başûrê Kurdistanê digirtin re hev nas kiribûn, di bin tesîra zêde zêde ya nerênî ya ku van ava kiriye de ji bo her hêza siyasî ya ku nû dihate gel wan helwestên bi pêşdarêz nîşan didan. Ne weke pêşeng an jî hêzeke rizgarker, bi nêrînek ku weke ew hêz dixwazinwanbi kar bînin û ji wan sûdê bistînin, li hêzên siyasî yên nû hatine dinêrîn. Ji ber ku me çavkaniya vê helwesta nerênî dizanî, me karîbû di demeke kurt de ew vê helwesta xwe biguherin.*

*(Burası için s. 92 De ki resim gelecek resim bir sayfa olarak ayarlanmış)*

*Gelek hêzên burjuwaziya biçûk û neteweperestên seretayî ev herêm vegerandibûn qada rekabetê; heya ku bi pere û sîlehan zilaman bikişînin gel xwe, pêş de çûbûn. Zerera herî mezin ya ku vê feraseta ‘bikaranîn û jê sûd wergirtinê’, şikênandina îtîbara têkoşîna neteweyî-siyasî bû. Lê gel bi nefret û eczîli her du aliyên vê rewşê diafirînin dinêrî, pêşengiyek ku berjewendiya welat esas bigire hêvî dikir û dixwest.*

*Hêdî jî be xebatên me dest pê kiribû berhema xwe bidin ûîtîbara têkoşîna me ya neteweyî di kesayetiya PKK’ê de dubara dest bi bilindbûnê kiribû.Ji dema ku dest pê kir taybetmendiya pêkhateya pêşengiya paşverûû rêxistina eşîrperest, ku pêşî li tevgera neteweyî digireya neteweperestiya seretayîji aliyê gel ve were fêmkirin, gel, bi van hêzan re têkilîû girêdanên xwe yên heyî jî di asteke girîng de qut kirin. Tiştê ku herî zêde bêhna gundiyan vedikir terza me ya tevgera veşartî bû. Tevî şert û mercên giran, em li gundan nediman û tenê di demên destdayî de em diketin gundan an jî derdiketin; dema ku gundiyan maneya vê fêm dikir ji bo me minetdar dibûn. Em hêdî hêdî diketin dilê gel.Êdî em ne weke du biyaniyên ku bi şik û guman li hev dinêrîn,*

*weke dostên sediq; bi gotina wan 'yên me' an jî weke 'heval' dihatin naskirin. Ev jî rewşek kubêhna şoreşgerekî/ê vedike û tê hêvîkirin bû.*

*Piştî ku em di tevahiya rojê de dimeşiyan û diwestiyan, ji aliyê malbatekê ve bi eleqayeke germ û sempatiyeke germ hatin pêşwazîkirin, dîtina ku tiştê em diaxifin bi eleqadarî tê guhdarkirin, dibû sedem ku di kêliyekê de hemû westan û ecziyên me ji ser me rabe.*

***'Divê Du Kurd Neyên Gel Hev, Eger Werin Gel Hev Wê Dinê Hilweşînin'***

*Pirsgirêkên ku em di nav gel de herî zêde pê re rû bi rû diman, alîkariya ji derve û pirsgirêka di şer de debaraya malbatan bû. Pevçûnên navxweyîû parçebûnên li welatê me ji sedan sal e vir de didomin, dibûn sedem ku ji bo çêbûna yekitiyê, bêbawerî pêş bikeve. Digotin li gorî baweriyê muqaderat bi vî şiklî ye; 'divê du Kurd neyên gel hev, eger werin gel hev wê dinê xira bikin'. Her çendî van axaftinan rewşeke bi reşbînîû stuxwariyêîfade dikir, rastiyek ku dihate jiyîn jî dida der.*

*Dijminên Kurdistaniyan, dema Kurd bibin yek hêza ku ew derxin holê baş hesab kirine û ji bo ku yekitiyê ji hev bixin bi sedsalan mekanîzmeyeke belavker xistine dewreyê. Hem di raboriyê de û hem jî di roja me ya îro de gelek mînakên ber bi çav ên ku vê rastiyê piştrast bikin di bîra me de zindîbûna xwe diparêzin. Neteweperestiya seretayî ji ber ku ji rêgeza 'hêza xwe bi xwe' bêpar e, li benda firsendekê yan jî li hêviya parastina dewletekê ye. Ev feraseta ku bi gelê herêmê jî dane pejirandin, bi xwe bêbawerbûn pêş xistiye û bala gel ji têkoşîna heyî dûr xistiye. Bi heman şiklî gelek hêzên ku tên zanîn hatine û sozên gelek baş dane gel û gel bi rêbaza qeyidkirinê kirine endamên rêxistinan, li ser lîsteyan nivîsandine û ji van lîsteyan gelek jî bi destê dijmin de berdane. Ev rastiya ber bi çav jî di gelê me de bi şiklekî xwezayî bûye sedema bêbaweriyê. Vaye hê doh lîsteya 400 kesî ku Ömer Çetîn (DDKD) pêşkeşê polîs kiriye, lîsteyên ku KUK, Partiya Îslamîû yên din dane mînakên eşkere ne. Di heman demê de helwestên wan ên li dijî gundîû koçeran jî, ji ber ku eşqiyawarî bûn gel nikare van ji hev derxe."*

Egîd, helwest û bûyerên ku ji aliyê hêzên Kurd ên reformîst ve hatine pêşxistin jî, bi mînakên cur bi cur bi vî şiklî dinirxand; *"kesên ku van hêzan bi navê kadro berdane meydanê, riya koçeran qut kirine û ketine nav pezê wan û pezê ku xwestine nîşan dane û bi gotina 'ev malê hizbê ne' kom kirine û birine. Bi talîmatê bi şivên pez dane serjêkirin ûxwarine, bi navê Qur'anê bi civanên gundî sond dane xwarinû navê vê jî sonda şoreşê lê kirine.*

*Em dikarin ji bo van kirinên ku di raboriyeke nêz de hê jî dihatin lidarxistin, mînakeke şênber ji gundê Aval (Tünekpınar) ku girêdayî bi Dihê ve ye bidin. Kesek ku jê re Xurşo tê gotin û weke berdevkê KUK'ê tê naskirin, qedexeya bi şevê derketina kolanan îlan dike û hin ciwanan jî, dike nobedar û bêexlaqî dike. Dîsa kesekî din jî li gundê Reşîne bi navê ku civîna me heye, banî ciwanan dike û paşê jî, bêr û qazmeyan dide wan û bi wan karên xwe yên înşeatê dide kirin. Kesên bi vî şiklî di heman demê de piştî 12'êÎlonê xizmeta cuntayê jî kirine. Mînak kesê jê re Xurşo dihate gotin ji ajanên bi nav û deng ên herêmê yek bû, û li ser xwesteka gelê herêmê di Mijdara 1984'an de ji aliyê partîzanên HRK'ê ve bi mirinê hate cezakirin.*

*Ev hemû yek bi yek dubare dikirin û digotin "ên ku me ji wan re pêşmergeyên me digot û xwe gorî wan dikir, bi vî şiklî nêzî me bûn". Dema ku rastî me dihatin jî şik û gumana ji bo me, bi demê re ji ser xwe avêtin û dest pê kirin ji hev re bêjin, "ev ji hemûyan cudatir in".*

*Ji bo ku em pirsgirêkên bingehîn ên rizgariya neteweyîû riyên wê yên çareseriyê, ku li gorî fikrên Partiyê dihatin diyarkirin, bi gel bidin fêmkirin me zêde zehmetî nedikişand. Ji ber ku zanabûn û tecrubeyên gelê me ji azmûna jiyanê derxistibû, tiştê me ji wan re digot piştrast dikir. Encamên ji pratîka jiyanê derxistibûn, fikrên wan ên belawela ku mixabin heya wê rojê misogeriyek bi dest nexistine, bi saya tiştê me vegotine dihatin warê fikrên bipergal û zelal. Bi taybetîli dijîîxanetê hişyarbûneke mezin bal dikişand ser xwe. Ev, ewqas zêde pêş de çûbû, xaîn ji xwe re dikirin hedefa sereke, kîn û nefreta ji bo wan raber dikirin ji ya li dijî mêtingeran zêdetir bû. Pêwîst e mirov di aliyekî de vê helwestê mafdar bibîne. Ji ber ku di dîrokê de timî kelha ji nav hatine fethkirin. Süleyman ku yek ji van e û ji aliyê gel ve tîmî navên wan tên gotin, ji bo leşkerên … deriyên çiyayên me yên bilind vedike(Tatarên li Şirnexê rûdinîn). Emînê Perîxanê (Ramanî) ku birayê xwe yê ku sêrî hildabû bi dar xistibû. Alîxan Tatar ê Kurê Silêman axa ku li herêmê ji bo şefên leşkerî yên mêtinger şewirmendî dikir. Ahmet Biryanêji bo ku zilamêçek li ser girtiye serbest berde, weke berdel keça wî xwestiye,û bi jandarma re bibû yek. Xolayê[1]Hacî ku weke berpirsiyarê gumrîkê li ser derî radiweste, kesên ku bacê nadin dixe kêmîna jandarmayan û dibêje "kesên ku ji dewletê re dijminî dikin dijminên min in jî", Casim Casimê ji ber ku ji ber rejîma Iraqê reviyaye ji aliyê gel ve tê hembêz kirin û jandarmayan dişîne ser jinên gund û dest dide avêtin namûsên wan û hê pir kesên wekî van derketine meydanê, dihate gotin ku ji bo liv û tevgera herî biçûk jî derfet tineye. Digotin beriya ji her tiştî " pêwîst e ev ji holê werin rakirin". "eger ne ji wan bûna dijmin wê riyên me, şikeftên me, mal û*

*numaraya çekên me çawa zanîba, divê dijmin were kor û ker kirin ku em karibin lê bidin."*

*Her ku xaîn dihatin îmhakirin te digo qey zincîrên wan tên qutkirin, keştiyên wan vala dibin û bendên li ber wan hildiweşiyan Egîdîû fikrên hatine veşartin, hestên hatine çewisandin dibişkivîn, tarî ronahî dibûn. Dest pê kiribû ku gel ji belayê herêmî xelas dibû, bi navê'Kara Bela' yüzbaşıyekî faşîst ku digot 'yek dayika min heye û hezar bavên min hene, li ezmanan Xweda heye û li erdê jî ez'û belaya xwe difirot derket holê. Ev bermayiya faşîst ku li ser serê gel bibû bela,êrîş dibir ser gundan û hemû jinên gund dixist qereqolan û di nîveka zivistanê de bi rojan di ava cemidî de radigirt, ji zarokan çekên bavên wan dipirsîûbi şivikên ji hesin li serê tiliyên wan dida, ji extiyarên ku ji mizgeftê derdikevin re digo "ne ji bo Xweda, ji bo min nimêjê bikin" û leşkerên ku baş li gundiyan nadin bi xwe li wan dida, jinên ku tazî kirine di nav sûkê re dibir qereqolan, bi çekan dida pey mirovan êdî jiyan li ber çavê gel reş kiribû. Û gel jî rojekê got edî bes e û ew elçax bi mirinê ceza kir."*

***(1)Xoleyê Haci di zivistana 1994'an de li gundê Böceha girêdayî bi Qilaban ve ji aliyê gerîlayên ARGK'ê ve hate cezakirin.***

**"Ava Şaristaniyê Aram Û Şipûşîn Diherikiya"**

Êdî 1984 jî nêz dibû. Zivistan zêde xirab derbas nebibûû ji ber vê yekê jî gerîla hineke din pêş de çûbûn ûbibûn xwediyê derfeta xwe gihandina heya bi herêmên nîvînga welêt. Egîd li gel grubek heval rewşa heyî nirxandû biryara ber bi aliyêrojavave pêş de çûnê stendin.[1]

*"Her ku em ber bi rojava ve pêş diketin, me çiyayên bilindên tije berf jî li pey xwe dihîşt û em bi baranê re rû bi rû diman.*

*Êdî em nêzî Dîcleyê dibûn. Ava şaristaniyê aram û şipûşîn diherikiya. Li keviyên wê, di şkeftên ku di nav tehtên nerm ên weke dîwarekî bilind dibe hatine çêkirin de bajar û gund hatibûn avakirin, ji Amedê heya bi Misûlê karwanên kelekan li ser xwe hilgirtibû, erdên berhemdar ên li derdora xwe av dabû.*

*Ev herêma, ku ji nijadê mirov ê destpêkêû ji avabûna şaristaniya mirovahiyê re bûye dergûş, di nav xwezaya ku ji aliyê ava Dîcle û Botanê ve dihate pêkanîn de dima. Ev herêm ji tesîra mêtingerî hatiye parastin, nirxên neteweyî yên xwezayî di nav vê bazinê de karîbûn li ser piyan bimînin. Sînorên Rojava û Rojhilat; çiya û deştê ji hev diqetînin, bibûn sînorên berxwedan û teslîmiyetê jî.*

*Diviyabû em beriya ku bigihîjin avan demekê bisekinîna. Di vê navê de me riya xwe bi malbateke koçer ku di konan de jiyan dikir xist. Di rewşeke şeperze de dijiyan. Tevî heywanên xwe ji ava sarincê vedixwarin, ji wê avê xwarina xwe çêdikirin û bi wê avê xwe dişustin. Hindurê van sarincên ku bi axa ji baranêşûn de dima û bi pîsatiya heywanan tije dibû, havînê jîtije qirmik dibû. Koçer havînêbi xwe li vir nediman, lê hevalên ku li vê herêmê diman neçar dibûn vê avê bi kar bînin. Ji derveyê gundan av li çiyê peyda nedibû. Her hal ji ber bikaranîna vê avêû timîxwarina pênirê bêrûn bû,bi hevalên li vir dimînin re ruh nemabû. Reng li wan çûbûû qederekê zeîf bibûn. Lê morala wan li cih bûû li ser xwe bûn. Têkiliyên wan bi gel re jî pir baş bû. Baweriya gel bi xwe anîbûn.”*

**[1]Fermandar Egîd di zivistana 1984’an de di ser Botan, Sêrt û Êlihê re heya bi Sasonê çû. Li gel Wî hevalên bi navê Erdal (Mustafa Yöndem), Hacı (İbrahim Durmaz) û Haydar hebûn.**

*“Bûyerek ku ji vê re bibe mînak jî li vir vegotin wê di cih de bibe: hevalê Cemîl ku gelê herêmê jê hez dikir û jê re rêz digirt (hevalê Kerim Baytar ku di Îlona 1984’an de ji aliyê xaînan ve bi bêbextî hatibû kuştin), gava ku rojekê li çiyê dimeşe çend jinên koçer di pey re digihîjin. Dema ku heval dixwaze rê bide wan, ew bi van gotinan baweriya xwe ji bo hevalan eşkere didin xuya kirin; na, em bi hev re bimeşin li van deran berê ji ber eşqiyayê li çiyan me nedikarîbû rehet bimeşin. Ya rast, dema ku hûn jî nû hatin em dîsa tirsiyan, me xwe nêzî we nekir, lê tevî ku ji salekê vir de hûn li derdora me dimînin me ji we tu xirabî nedît. Em êdî we weke xwîşk û bira û zarokên xwe qebûl dikin. Vê mînakê jî nîşan dida ku êdî ji derdorê baweriya hewce dikir hatibû girtin.*

*Di konê ku em rûdinîştin de serokatiya malê di destê pîrejinê de bû. Hevserê wê yê extiyar li ser nivîna xwerûnîştibûû eleqa xwe bi tiştekî nedianî. Jinê jî li aliyekî teşî dirêst û li aliyê din jî bi me re eleqadar dibû, hewl dida li gel me biaxife. Dema ku me jê pirsî ew xebatên me çawa dinêrxîne, bi vegotina bûyerekê bersiva xwe da.*

*Serokê çeteyekî yê bi navê Hamo(2), ji wan bi darê zorê pere û heywanan distîne, tevî çeteyê xwe her sal li serê wan dibe bela û jin û bûkên ciwan ên ku çav berdidê, bi darê zorê direvîne çiyê. Carekê jî, li bûkek ku li pêşberê wî li ber xwe dide, dixe û wê dikuje. Ji dema ku hevalên me xwe gihandin herêmê vir de eşqiyayan riya xwe bi wir nexistiye. Baweriya wan a bi hevalan qederekê zêde bû lê hê jî baweriya wan a bi serxwebûnê qeyim nebibû.*

**[1]Heval Kerim Baytar li Spîvyana ku gundekî girêdayî Şirnexê ye di encama gulebarana çeteyan de şehîd bû.**

**[2]Hamo û kurê wî ku ji herêma Îdîlê bû dema ku di 1984'an de sînor derbas dike, ji aliyê leşkerên Tirk ve hate kuştin.**

*Em heya bi êvarê li wir man û paşê heval Kerim em rakirin birin sixinaqê. Li wir jî hevalên din hebûn. Hejmara hevalan zêde bibû. Piştî ku em bi hev re li ser pêşketinên siyasî axifîn û me nîqaş kir, wan kar û xebata rêxistinî ku meşandine anîn ziman. Li gorî tiştên wan gotiye, xebatên amadekariya ji bo berxwedanê pêşketinên girîng çêkiribûn. Di beşeke berfireh a herêmê de têkiliyên alîkariyê hatine çêkirin, hejmareke zêde ya şervanan hatiye tesbîtkirin, depo bi alîkariyên gel hatine dagirtin, li cihên cuda sixinaq hatine çêkirin û araziyeke berfireh hatiye naskirin. Ji bo destpêkirina berxwedanê amade û bi xwestek bûn. Helbet tevî gelê Dihê.*

*Dotira rojê em ji bo terikandina herêmê bi rê ketin. Piştî ku me çem derbas kir ev çend sal bûn me cara yekemîn pêli deştê kir. Li pêşiya me meşeke sê rojan a deştê ya ku ji ber heriyê derbasbûna wêzehmed bû, hebû. Ya din jî nuxteyên ku me wê li wir bêhna xwe vedana jî zêde ne bi ewlehî bûn. Ji ber ku em salên dûr û dirêj li çiyê mabûn hestek ku ji deştê re biyaniye pêş ketibûû her wiha me zêde nediwêriya ku dest bi vê meşê bikin. Lê di dawiyê de bi terzeke cuda jî be, em gelek caran bi tehlukeyê re rû bi rû hatin û me karîbû vê mesafeyêbi xweşîû selametî derbas bikin.*

*Li herêma çiyayê ku me xwe gihandiyê operasyoneke berfireh hebû. Jandarmayan bi ser mala eşqiya lê diman de girtibû, di pevçûna ku derketiye de li sê leşkeran dabûn. Ji ber vê bûyerê hêzên mêtinger hemû giraniya xwe dabûn ser herêmê. Bi helîkopteran leşker datanîn gundan, girtin ûêşkenceyên girseyî berdewam dikirin. Gundiyekî extiyar ku ji operasyonan direve û xwe dispêre şkeftê, ji sermayê miribû;yek ji mirovên mehkuman jinek û du kes hatibûn tazîû rûtkirin û bi vî şiklî gund bi gund gerandibûn û paşê li pêş çavên gundiyan gule reşandibûn ser wan. Gel tevî ku ji ber tesîra bûyerêdi nav panîkê de bûn, ji hev re behsa mêrxasiya mehkuman dikirin û pesna wan didan.*

*Piştî ku em demekêtevli xebata hevalên li herêmêbûn, tevî çavderîû destkeftên girîng riya ku em tê re hatibûn me şopand û me dest pê kir em bi şûn de bizivirin. Diviyabû me xwe zû bigihandana nuxteya ku hedefa me bû. Rexmê ku zivistan bû şert û mercên zivistanê nebûn asteng."*

**“Apo’çî Dişibin Bombeyek Ku Ji Bo Teqînê Amade, Eger Biteqin Ê Me Jî Û We Jî Tine Bikin”**

Piştî meşeke dirêj ku senzde rojan berdewam kiribû fermandar Egîd û yekîneya Wî di dawiyê de digihîjin nuxteya ku binkeya wan e. Hema li wir, bêyî ku bisekinin dest bi amadekariyên xwe yên ji bo xebata demsalê kiribûn.Êdî her ku diçû dîroka 15’ê Tebaxê jî nêz dibû. Ji bo wan rojan fermandar Egîd di rojnivîsa xwe de ev tişt nivisîbûn: *‘APO’çî dişibin bombeyek ku ji bo teqînê amade ye, eger biteqin ême jîû we jî tine bikin.’*

*“Piştî civîn ûnîqaşên giran û girîng hatine meşandin di dawiya biharêde potansiyela heyî, bi şiklê vesaziyeke nû hatiye birêxistinkirin û dest pê kiriye ji bo herêmên xebatê werin rêkirin. Dijmin bi vê xebata berfirehbûnê, hesiyaye û li seranserê sînor hêzên xwe yên giran xistibûn tevgerê. Berê jîgelek ajan şandibû derdora kampên me ûhewl dabû agahî kom bike lê me ji van çendek girtibûn û em armanca wan fêr bibûn. Tevî hemû tewdîrên li ser sînor, dijminê ku nikarîbû pêşî li derbasbûnan bigire, xwe amade dikir ku me li hindur pêşwazî bike. Li ser riya me li nuxteyên girîng yekîneyên leşkêrî hatibûn bicihkirin, hêzên herêmîhatibûn teqwiyekirin û yekîneyên komando bi nav gundan ketibûn hema bêje weke ku propagandaya çekdarî dikirin. Ji gel re digotin “APO’çî ne Kurd in, Ermen in û dijminê dîn ûîmanê ne û hwd.” û dixwestin me ji gel tecrîd bikin lêgel kenê xwe li wan dikir. Dijmin ev kenê gel wekî ku gotinên wan qebûl dikin fêm dikir û ji ber vê yekê ji gel re teklifa hevkariyê dikir.*

*Her çendî subayan di civînên ku dikirin de digotin; ‘APO’çî dişibin bombeyek ku ji bo teqînê amade ye; eger biteqin ême jîû we jî tine bikin’ û xwestibûn di gel de bibin sedema fikaran jî ev hewldanên wan vala derketibûn.*

*Her roja derbas dibe gerîla hê jî bi eleqadarî dihate pêşwazîkirin û hêdî hêdî riya çavkaniya alîkariyê vedibû. Bi rêzê li Qilaban, Şirnex, Elih û Ferqînê derbeyên li ajanan hatine dayin bibûn sedema coş û moralê. Lê gel bes nedidît û hê zêde dixwest. Qada xebata siyasî qederekê berfireh bibû. Ciwan ji ber xwe dihatin û dixwestin tevli têkoşînê bibin, hin ciwanbi tena serê xwe bi rê diketin û dixwestin perwerde bibînin. Yên ku malbatên wan destûra tevlîbûnê nedidan ji bo ku bi şûn de neyên şandin hema bejê li ber me digeriyan. Yek ji ciwanan ji bo ku tevli me bibe deh rojan ji malbatêxwe veşartibû, herî dawî em dîtibûn lê dema ku me ew dubara teslîmî malbatê kir digîriya û maneyek nedida helwesta me.*

*Li gelek herêmên xebatê pêşketinên dişibin vê hebûn. Êdî van pêşketinan ferz dikirin ku wezîfe û hedefên di çarçoveya amadekariyan de werin derbaskirin û taktîk*

*were berfirehkirin. Diviyabû tevgera berxwedana çekdarî ya berfireh bi plansaziyeke navendî hatiba destpêkirin. Hemû kadro tevî gel ji ber vê yekê ecz bûn.*

## Ev Baş E Lê Pir Dereng E, Dikaribû Hê Zûtir Jî Çêbibe

*Di dawiya Tirmeha 1984'an de hevalekî/ê berpirsiyar tevî gruba qerebelix hate herêma me. Ji terza hatina wan, me lê derxistibû ku biryarên girîng anîbûn. Piştî şîvê gava ku me destpêkir bi gundiyan re biaxifin weke timî dibe, gundiyan dîsa mijar birin ser pirsgirêka ku berxwedana çekdarî ji bo çi nayê destpêkirin. Ji ber ku em timî bi vê pirsê re rû bi rû diman ji dana heman bersivan û ji dana bersivên dûrîîqnayê ecz bibûn. Min xwe li hêviya hevalê/a ku nû hatibû ragirt ,da ku ew bersivê bide. Helbet di dilê xwe de ez tevli gundiyan dibûm. Wexta ku heval jî got 'amadekarî' gundî bêdeng bûn. Ji ber ku beriya vê gelek caran heman bersiv bihîstibûn.*

*Dema ku me di derengiya şevê de grub komî ser hev kir me dît ku qederekê hejmara me qerebelix e. Ji ber ku gundiyan cara yekemîn grubeke ewqas qerebelix didîtin ew jîmatmayîmabûn. Wan jî texmîn kiribûn, wê hin tişt biqewimin û ji hev re digotin "vê carê temam e". Em çûn daristana ku em ê şevê li bimana û em bi şiklê çend gruban bi cih bûn. Ji ber min texmîn dikir em ê vê sibê nûçeyên xweş bibihîzin, minwê şevê ti tişt nepirsî.*

*Em sibê zû rabûn û me bi pêxarina ku gundiyan anîbû taşteya xwe xwar. Me bi hevalê/a berpirsiyar re xwe da goşeyekîû ez di nav mereqê de li benda axaftina wî/ê mam. Piştî ku min axaftina heval guhdar kir derket holê ku ez şaş nefikirîme. Bi çalakiyên ku li çendek herêman bihatana lidarxistin wê avabûna HRK'ê bihata îlankirin.*

*Vaye, ji çar salan e pê de, bi gerîna li gelek welat û sînoran, roja ku ev ji demeke dirêj e li hindûr em amadekariya wê dikindi dawiyê de hatibû. Ez pê hesiyam ku dilê min rehet bûû weke bersiv destpêkê ev axaftin ji devê min derket; baş e lê pir dereng e, dikarîbû hê zû çêbibe. Tevî her tiştî ev agahiyek ku em pir kêfxweş kiribûn bû. Min di dilê xwe de digo, divê ez hema ji nişka ve vê ji hemû hevalan re îlan bikim, lê ev nedibû. Hevalan encax bi çend rojan ji beriya 15'ê Tebaxê ev agahî bihîstin. Ji ber ku qural û qaîde ev bû.*

*Piştî ku em li ser şikla plana li qada me bihata pêkanîn û hin amadekariyên din axifîn, me dest bi amadekariyan kir. Ji bo kifşkirina hedefa ku me tesbît kiriye me yekeyekçêkir. Piştî ku me hin amadekarî kir, hin cih amade kir û endamên yekeya were avakirin anî gel hev em bi rêketin. Me karîbû lûtkeyên çiyayên bilind bişopînin û xwe bigihînin nuxteya hevalên li benda me bûn. Ev der cihekî li ser hemû herêmê*

*hakim bû. Arazî heya asta dawî destdayî bû. Dema em li gel gruba ku li benda me bû re bûn yek, me xwe di nav rewşeke bi ewle de hîs kir. Her kesîfêm kiribû hin tişt wê çêbin, bi coş û heyecan bûn. Kêfxweşî, bi beşirînê dihate îfadekirin.*

*Piştî ku me amdekariyên dawî jî xelas kirin, me yekîneyame ya ku paşê navê**Yekîneya Propagandayê ya 14'ê Tirmehê** bigirta kom kir ûbi xwendina danezanêavabûna HRK'ê ragihand:"*

## Danezana Avabûna HRK'ê

Danezana avabûnê ya HêzênRizgariya Kurdistanê ya ji aliyê MK-PKK'ê ve hatiye amadekirin a bi dîroka 15'ê Tebaxa 1984'ê ji aliyê fermandar Egîd ku fermandarê YekîneyaPropagandayê ya 14'êTirgmehê bû ve grub hate komkirin û danezana avabûnê ya HêzênRizgariya Kurdistanê hate ragihandin.

Danezan bi vî şiklî bû:

**"Ji Gelê Kurdistanê Yê Welatparêz Re!**

*Ji sedan sal e vir de serdest, dagirkerû mêtinger ji bo ku welatê me bikin bindestê xwe û ji bo ku gelê me bikin kole xebitîn. Di hejmareke bêdawî de planên komkujîûîmhakirinê pêk anîn. Burjuwaziya Tirk ku ji van a herî dawî bû di navbera salên 1925-40'î de planên herî hovane yên komkujîû polîtîkayên surgînêli her aliyê welatê me pêk anîn. Pêkanînên komkujiyê li gel polîtîkayên asîmîlasyonê kirin yek û hewl da bi îmhakirina hebûna neteweyî ya gelê me, welatê me ji xwe re bike welat. Dest danî ser bi her şiklê jiyana me ya aborî, civakî, siyasî neteweyîû çandî: bi karanîna darê zorê yêeşkere ji xwe re kir hedef ku pêşketina serbixwe ya civakan rawestîne û her awayê nirxên me ji bo xwe bi kar bîne.*

*Mêtingeriya Tirk a barbar bi darbeya leşkerî ya faşîst-ya 12'yêÎlonê karektereke faşîst qezenc kir û dest pê kir polîtîkayên çewisîn û qetlîamê di asteke herî bilind deû bi rêbazên herî hovane pêk bîne. Her aliyê welatê me herêma leşkerîîlan kir. Hewl da ji nû ve gund bi gund, tax bi tax welatê me îşxal bike. Bêlêpirsîn û bêlêkolîn mirov dan ber guleyan bi darxist, xeniqand û şewitand, bi sedhezaran kes şewitand û xist zindanan: hewl da bi nirxên me yên neteweyîû rumeta me ya mirovbûnêbilîze. Ev hemû hovîtiya xwe li ser gelê Tirk ê kedkar jî pêk anî.*

*Pêkanînên çar salan ên mêtingeriya faşîst li ber çav in. Mêtingerîû talana ekonomîk heya asta herî dawî hatiye bilindkirin. Bi her şiklê çavkaniyên*

*dewlemendiyê yên welatê me tên talankirin, her tiştê gelê me tê talankirin û ji dest tê girtin. Her tişt hatiye xistin bin xizmeta kulmek tekdest-burjuwa û feodal. Bêkarî, bihabûna tiştan, tinebûn û feqîrtî heya asta bilind hatiye bilindkirin, gelê me bi tehlukaya birçîbûnê re rû bi rû hatiye hiştin. Di jiyana civakî de bi pêşxistina bêslîtiya feodal burjuwa û bêxlaqî hewl hatiye dan civaka me were pûçkirin. Terza ku li ser jiyana siyasî hakim, bi şiklekî herî qebe ûeşkere zordestiya leşkerî bikaranîne. Rewşa şer ku mêtingeriyê hewl dida ser binixumîne eşkere bûye û li dijî gelê me şerê faşîst-mêtinger hatiye pêşxistin. Li Kurdistanê her tişt ji aliyê hêzên leşkerîve û bi şer tê meşandin. Pêkanînên weke çewisîn, reşkujî, operasyon, êşkence, girtin û zordestî bûne pêkanînên rojane. Ji gelê me yê welatparêz bi sedan kesên me hatine kuştin, bi sedhezaran hatine xistin zindanêû bi dehezaran jî bi êşkenceyê re rû bi rû maye. Li Kurdistanê ti kesê ku bi van pêkanînan re rû bi rû nebûye nemaye. Ev hemû, li Kurdistanê, pêkanînên rojane yên mêtingeriya faşîst e. Eşkere ye ku ev pêkanîn didomin û heya ev rejim hebe jî wê bidomin.*

*Armancên mêtingeriya faşîst û pêşeroja ku ji bo gelê me pêş dibîne eşkere ye: bi koletiya mêtinger weke netewe û gel îmha kirin, Kurdistan û gelê Kurd kirina parçeyeke ji Tirkiyêû neteweya Tirk, bûn sedema ku gelê me weke koleyên xizmeta axayên xwe dikin bijîn; ji bo karibe vê pêkbîne bi hovanê pêşxistina çewisîn, tevkujî, asîmîlasyonê. Ev hemû, tiştên di asta herî dawiyê de eşkere ne. Di bin nîrê serdestiya faşîst-mêtinger de pêşeroja gelê me ya neteweyîû civakî di tehlukê de ye. Dixwazin koletiyê bikin qedera gelê me. Li Kurdistanê derfeta jiyana weke mirov û jiyana bi rumet nemaye. Îro ji vê rewşê re bes gotin, wezîfeya mirovahiyê ya herî misoger û li pêş e. Derfet hene, pêşeroja ku mêtingeriya faşîst pêş dibîne were berevajîkirin, rizgariya neteweyîû civakî were pêkanîn û riya bi şiklekî azad pêşketina civaka me were vekirin. Ev jî li her qadê li dijî mêtingeriya faşîst ji bo rizgariya neteweyîû civakî bi destpêkirina têkoşîna berxwedanê ya topyekûn mumkîn e. Têkoşîneke bi vî awayî bi tevgera PKK'ê dest pê bûye û hatiye pêşxistin. Tevî hemû zor û zehmetiyan îro jî tê meşandin. Gelê me bi awayakîeşkere nîşan daye ku alîgirê vê têkoşînê ye. Li dijî terora faşîst pêşxistina têkoşîna berxwedanêîro bûye neçariyek ku bêyî wê nabe. Di şert û mercên şer û tevkujiya ji aliyê mêtingeriya faşîst tê meşandin deji destavêtina çekêû ji pêşxistina têkoşîna çekdarî cudatir ti riyên din nemane.*

*Vaye di van şert û mercan de ji bo ku li dijî mêtingeriya faşîst, rizgariya neteweyîû civakî ya gelê me were pêkanîn, pêşeroja wî ya serbixwe û azad were pêkanîn û her wiha ev têkoşîn bi rêbaza çekdarî were meşandin Hêzên Rizgariya Kurdistanê (HRK) hat avakirin.*

*Armanca HRK'ê ew e ku bi çêkan têkoşîna serxwebûna neteweyîûcivaka demokratîk ûazad, yekîtiya ku gelê me bi pêşengiya PKK'ê li dijî mêtingeriya Tirk a faşîst û xizmetkarên wan ên herêmî dimeşîne, bidomîne. Ji ber vê yekêwê li dijî terora mêtingeriya faşîst şîdeta şoreşgerî bi kar bîne, hêza şoreşger a gelê me wêdi vê qadê de jî derxe holêû bi rêxistin bike. HRK, hêzên gelême yên çêkdar ên şoreşger in. Li ser dîroka berxwedanê ya gelê me ku ji qehremaniyan çêbûye û li ser mîrateya têkoşîna bi heybet a şeş salan a PKK'êxwe ava dike. Hêza xwe, ji pêşengiya şoreşger a PKK'êûji zanista wê ya siyasî-leşkerî, ji dînamîzma gel a şoreşger-welatparêzji baweriya wî ya kûr ku bi serxwebûn û azadiyê heye, û ji pêkhateya xwe ya xwediyê zanebûn û bi rêxistî distîne.*

*HRK, di şert û mercên ku terora faşîstên dagirker bi şiklekî herî hovane tê meşandinû li dijî vê têkoşîn tê dayin de çêdibe. Xwînxwarên faşîstên dagirker, zordestên siyasîû leşkerî, neyarên gel wê bibin hedefa çalakiyan. Û ev yek wê bibe sedem ku pêşî li pêşketina şoreşgerî vebe. Dema ku li Kurdistan û Tirkiyê platfoma şoreşgerî ya têkoşîna pratîkî ava bikeû di asta ku bi tevlîbûna gel tê meşandin de têkoşîna li dijî terora faşîst bilind bike, wê xwe bigihîne hedefên xwe yên esasî.*

*HRK, di her kar û xebata xwe de pêşxistina zanebûna neteweyî-demokratîk a gelê me, afirandina rêxistinbûna rizgarîxwaz û yekitiya neteweyî esas digire. Ji ber vê yekê ji xwe re dike hedef ku ajan, hevkar, sîxur û pêkhate û hêzên ku pêşiya rêxistinbûna berxwedêr a neteweyîû yekîtiya gelê me dibin asteng, bi dijmin re hevkarî dikin belav bike û bêtesîr bike. Kar û xebata xwe, propagandaya siyasîû ajîtasyonê bi şîdeta çekdarî re dike yek û van her duyan bi hev re dimeşîne.*

*Gelê me bi pêşengiya PKK'ê têkoşîna serxwebûn û azadiyê ku herî demokratîk, xwediyê heq û serbilindiyê ye dimeşîne. Têkoşîna HRK'ê jî beşek ji vê têkoşînê ye ku jê nayê cudakirin. Di çarçoveya cîhanî de mirovahiya pêşverûû gelên herêmê li dijî hovitiya emperyalîst, mêtinger û faşîst têkoşîna serxwebûn, demokrasî, sosyalîzm û aşitiyê dimeşînin. Têkoşîna me jî, lingê li Kurdistanê yê vê têkoşînê ye. Ji ber vê sedemê HRK dixwaze ji mirovahiya pêşverû re, ji vir, vê ragihîne: gelê me xwediyê biryar e; li dijî mêtingeriya Tirk a faşîst ji bo serxwebûn, azadîû demokrasiyê tê bikoşe. Xwediyê wê biryarê ye ku li pêşberê her zor û zehmetiyê bi ser bikeve û heya ferdê/a xwe yê/a dawî têkoşîna xwe bimeşîne. Ev têkoşîna gelê me, bi temamî mafdar û demokratîk e: Di vê têkoşînê de alîkarî dane gelê me û li dijî hovitiya mêtinger a faşîst derketin, pêwîst e bibe wezîfeya hemû mirovahiya pêşverû.*

*Têkoşîna HRK'êû têkoşîna berxwedanê ya ku gelê Tirk ê kedkar li dijî hovitiya faşîst dimeşîne, her du jî parçeyên yek têkoşînê ne. Her derba HRK'êli mêtingeriya faşîst bide wê bibe derbeyek ku li Tirkiyê li faşîzmê hatiye dayin.*

*Ji ber vê sedemê:*

***Hemû Şoreşger Û Demokratên Tirkiyeyî Û Gelê Tirk Ê Kedkar!***

*HRK bang li we dike ku hûn li dijî hovitiya faşîst, ku jiyan û pêşeroja we tarî dike têkoşîna berxwedanê bilind bikin û vê têkoşînê li gel têkoşîna rizgariyê ya ku gelê Kurd dimeşîne bikin yek; alîkarî bidin têkoşîna gelê Kurd û li têkoşîna berxwedana li zindanên faşîst û çiyayên Kurdistanê bilind dibe xwedî derkevin!*

***Gelê Kurdistanê yê Welatparêz!***

*Ev bisedan sal e; mêtingerî dixwaze, weke netewe û gelekîme tine bike. Wexta wê hatiye; em li dijî vê mêtingeriyê têkoşînê bilind bikin; em hesabê çewisandin, êşkence û zordestiya bisedan sal e tê domandin ûbi taybetî jî di çar salên dawî de bi hemû hovitiya xwe tê pêkanîn,ûli xwîna ku me herikandiye xwedî derkevin. Ev, erk û wezîfeya her welatparêzê/a Kurdistanî ye. Li doza rizgariya welatê me û afirandina pêşeroja me xwedî derkevin! Di oxira rizgariya neteweyî de ji bo têkoşîna berxwedanê hêza xwe bikin yek! Li dijî zordestên mêtingerên faşîst derkevin, destûrê nedin ku ewladên we tevli artêşa faşîst bibe û xizmeta wê bikin! Li gel Hêzên Rizgariyê hewl bidin ku dijminê mêtinger ê faşîst tine bikin û welêt xelas bikin!*

*(108 de ki foto)*

***Ewladên gelên kedkar, gelên Tirk û Kurd ku di nav artêşa faşîst de ne, leşkerno!***

*Berê çekên xwe nedin gelên Tirk û Kurd û Hêzên Rizgariyê, bidin rêvebirîû subayên xwe yên faşîst! Talîmatên subayên xwe guhdar nekin, zordestiyê li gel nekin, li dijî Hêzên Rizgariyê çekên xwe bi kar neynin! Li dijî faşîzm û mêtingeriyê bi Hêzên Rizgariyê re bibin yek, tevli Hêzên Rizgariyê bibin!*

*Xort û keçno, Ciwanên Kurdistanî!*

*Li dijî zordestiya mêtingerîya faşîst, bi awayekî çalak tevli têkoşîna rizgariya gel bibe! Neçe leşkeriya di bin emr û talîmata artêşa faşîst de, jê fîrar bike, tevli Hêzên Rizgariyê bibe! ji bo ku tu dijmin tine bikîû welatê xwe rizgar bikî,tevî Hêzên Rizgariyê bi cesaret şer bike.*

***-Em êji Zordestên Mêtinger ên Faşîst û ji Xizmetkarên wan hesab bipirsin!***

***-Beyî ku em xwe jê şunde bidin û çavê me jê bişkên , em di Riya Rizgariyê ya ku PKK'ê Ronî Kiriye de bimeşin!***
***-Em tevli Hêzên Rizgariyê bibin û alîkarî bidinê!"***

## "Ya/Ê Amade Bila Destê Xwe Rake"

Piştîbelavok hate xwendin û hevalê/a ku biryar ragihandiye axaftina wê/î ya li ser taybetmendîû wezîfeyên pêvajoyê ye hat guhdarkirin, fermandar heval Egîd wekî berpirsiyarê yekîneyê**Rêvebirnameya Propagandaya Çekdarî** xwend û wexta ku ji devê wî axaftina, *" bila ya/ê amade destê xwe rake"*derket bi leza ba û brûskê hemû dest rabûn hewa.

*"Kesekî neamade tinebû. Min got naxwe em sonda şoreşê hemû bi hev re bixwînin û di wê kêliyê de li gel kulmên rabûne hewa pelên dengekî bilind, ji bilindahiya çiyan belavî her derê bû. Piştî ku talîmat jî hatin xwendin her tişt temam bibû. Mijarên wekî navê yekîneyê, yekbûyiya wê, terza wê ya tevgerê, hedefên wê, qural û qaîdeyên meşandina wêû terza wê ya xebatê bi temamî zelal bibûn. Di dest me de biqasî ku em karibin bêjin zêde ye malzeme û du çekên me yên giran hebûn.*

*Em di rewşek ku karibin bikevin liv û tevgerê de bûn. Me hê jî cihê ku em avabûna HRK'êîlanî gel bikin ji hevalan re eşkere nekiribû. Di 13'yê Tebaxê de me kifşa dawî ya qada çalakiyê temam kir û em vegeriyan gel yekîneyê. Me, weke rêvebirî xwe da goşeyekîû plansaziya çalakiyê çêkir. Plan ne xirab bû. Hesabê hemûîxtîmalan hatibû kirin, di ti nuxteyan de tiştekî nediyar nehatibû hiştin. Diviyabû ji sedî sed çalakî biserkeftî encam bibûya. Ji ber ku wê bibûya çalakiyeke destpêk û dîrokî.*

*Dema me plan çêdikir, axaftina Lenîn ku dibêje, "beriya ku hûn qumaş qut bikin heft caran bipîvin" di bîra me de bû. Piştî ku me şiklê dawî da planê, me li ser erdeke fireh û rast maketa çalakiyê çêkir. Wexta ku me yekîne bir vê qadê, me ji wan re hedef eşkere kir. Li ser armanc û girîngiya çalakiyêû taybetmendiyên hedefê agahî hatin dayin, û paşê plan hate eşkere kirin ji nîqaşê re hate vekirin. Di encam de bi erêkirina giştiyê dengan hat qebûlkirin. Piştî ku me çend caran prova kir, em di saetên evarê de bi rê ketin. Ji bo ku em erzaqê xwe û çek û tiştên dijmin ên ku em êdest daynin ser, lê bar bikin me çend hestir jî girtin gel xwe. Me hesab kir ku em wê demeke dirêj nekaribin bi derve re têkilî çêbikin û li ser vê esasê me di mijara ku pêwîst e em bi îdare tiştê xwe bi kar bînin de li hev kir. Diviyabû me rojê bi nîv nanî an jî bi çaryek nanîîdare bikirana.*

**Vaye Hedefa Me**

*Em, piştî meşa deh saet ber bi sibê gihan nuxteya ku me berê tesbît kiribû. Bi şiklekî guncaw em di mewziyên xwe de bi cih bûn û me hewl da em razên, lê bayê sar ê ku dihat nedihîşt em razên. Piştî ku tav derket, min Dihê'ya sê kîlometro dûrî me nîşan da û got,vaye hedefa me.*

*Her hevalî/ê hewl da bi dûrbînê hê baştir herêmê nas bike. Û em li pey rojek ku bi me re pir dirêj hatiye, beriyaêvar bibe li hev kom bûn. Me, destpêkê grubên ku rêû dîrekên telefonan qut bikin şandin. Demabû tarî, bi meşek ku li gorî grûbên di çalakiyê de cih bigirin, piraniya hevalên di yekîneyêde dest pê kirin ber bi bajêr ve dakevin.*

*Di demeke kurt de me xwe gihandibû kolanên bajêr. Hevalên li pey hev bi rêz bûne, kolan dagirtibûn. Ji boluka dijmin re sed metro mabû erebeyek derket holê, lêji ber ku me bi lez xwe avêtibû mewziyan em ferq nekir. Bi astengiyeke mezin re rû bi rû nemana me, şenseke mezin bû. Piştî ku demeke kurt me meşa xwe berdewam kir, em bilez û bez li sê gruban cuda bûn ûbilez ber bi hedefên ku me tesbît kiribûn meşiyan. Em di kêliyekê de gihabûn avahiya bolukê, gazînoya subayan, qehwexane, benqa û mizgeftê. Bi guleyên destpêkê, nobedarê li ber deriyê bolukêbêtesîr bibû, li pey wê bi navberên kurt, ketina nav gazînoyê dest pê kiribû. Bi avêtina li ser hev a gule û bombeyan di kêliyekê de avahiya leşkerî ya du qatî ketibû destê me. Guleyên dijmin ên ji aliyê gazînoyê dihatin, hevalekî ku ji deriyê bolukê diket hindur, ji tiliyên wîbirîndar kir. Lê di cih de gulebarana dijmin hat sekinandin. Di vê navê de du zarokên fermandarê bolukê, ji derveyêîradeya me, ji zend û lingên xwe birîndar bibûn. Ji wan lêborîn hate xwestin û li gel dayika wan, ji cihê şer hatin bidûrxistin û hatin birêkirin nexweşxaneyê. Ji dagirkirina bolukê bi şunde leşkerên dîl hatine girtin li hewşa bolukê hatin komkirin û armancên HRK'ê ji wan re hat ragihandin. Beşeke leşkeran kêfxweş bibûn: yên ku digotin, 'we em jîxelas kirin' jî hebûn. Me nexwest leşkerên dixwestin tevli me bibin bigirin.*

*Li aliyê din di hoparlora mizgeftê de danazana HRK'ê dihat xwendin. Hevalê ku belavok dixwend, dema ji kelacanê nikarîbû xwe bigire, hevokên şiîrekê jî di nava belavokdanezanê de dixwend. Di vê navê de depoyê bolukê hatibû vekirin, hevalan çekên leşkeran ên ku hatine bidestxistin ji derve kom dikirin.*

*Min piştî ku li bolukê hin çavdêrî kirin, riya xwe bi qewxaneyek ku hevalan di bin kontrolê de digirt xist. Hevalekî gundî, ji ber ku xumar dilîstin, gel rexne dikir. Ji ber ku ev helwest qebe û ne di cih de bû, me ji wan lêborîna xwe xwest û min ji wan re got,*

*rehet bin, em ji bo we şer dikin. Li ser vê, yên qehwexaneyê hemû bi hev re ji cihê xwe rabûn û xwestin me hembêz bikin. Cixare, çay, av îkramî me kirin. Piştî ku me qedehek ava wan vexwar û ji wan re armancên xwe vegotin, dema ku me ji wan pirsî; ma em deriyê zindanan vekin?'hemûyan bi hev re gotin, 'dê haydê'. Li qehwexaneyêdengê şiyarên 'bijî PKK'ê, bijî Serok APO' dinê xira dikir.*

*Piştî ku li qehwexaneyan karê belavkirina danezan û daliqandina pankartan hat temamkirin, li ser sinyala hatiye dayin, di nav şerîda ewlehiyê, ku li derdora bolukê hatibû çêkirin de hemû grubên erkdar hatin gel hev û encamênwan hatin girtin û kontrol hat çêkirin. Qet ti wendahiyên me nebûn. Ji dijmin kuştiyek û şeş birîndar hebûn. Doxtorê me mudaxeleya destpêkê ya hevalê birîndar kiribû. Jixwe birîna wî/ê zêde ne girîng bû. Çek û amûrên ji dijmin hatibûn bidestxistin qederekê zêde bûn. Zehmed bû ku ev bar bi hestiran were hilgirtin. Tenê dikaribû kamyonek vî barî hilgire. Me kamyoneke YSE'yê girt û dest bi barkirinê kir. Me di vê navbera de tiştên li pey mane jî texrîb kirin. Heykelê Atatürk hat îmhakirin. Du telewziyonên li garnîzonê, taksiya fermandar, cemse, avahiya hikumetê, postane û benqa hat şewitandin. Lê belê me paşê fêm kir ku zêde xweş agir negirtibû van cîhan.*

*Piştî ku me bajar çend saetan di dest xwe de girt, me dîsa berdabû. Em êdî li quntaraya çiyê, bi pirsgirêka barê ku me ji erebê vala kiriye hilgirtinê re rû bi rû bûn. Li gel barê sê hestiran her hevalî/ê li gel çeka xwe sê çek radikirin. Tevî vê, me dîsa jî beşeke çek û tiştên hatibûn desteser kirin li wir hiştibûn. Me hewl dida çiyayê bilind û berpala wîku tî ye di bin barê giran de bi hin caran hilkiştinê derbas bikin. Ji têhnbûnê di çongê me de derman nemabû. Lê coş û morala serkeftinê hêz dida me. Me li ser kaniyek ku riya me pê ketibû demekê bêhna xwe veda û ronahiya bajarêku me li pey xwe hiştibû temaşe kir.*

*Di wê navê de ez xwe bi xwe difikirîm, min digo; "Dihê ku navçeyek gelek kes ji hebûna wê jî ne agahdar e, êdîwê bibe cihekî ku her kes ji nêz ve nas bike û ji ber vê sedemê jî navê Kurdan jîwê li dinê were axifîn.*

**Tenê Tiştek Ji Me Kêm Bû:**

**Av**

Piştî çalakiyê, fermandar Egîd û yekîneya wî qederekê westiyabûn. Barê ku li gel xwe hildigirtin qebiliyeta tevgerê ya yekîneyê zêde zêde kêm dikir. Ya herî girîng jî ji ber tinebûna avê qebiliyeta tevgerê ya yekîneyê hê jî kêmtir dikir. Fermandar Egîd bi vî şiklî rewşa piştî çalakiyê şîrove dikir:

*“Dema ku em gihiştin nuxteya li araziyê ya bi ewle, kêm mabûbibe sibe. Cihê me, pir zêde baş bû. Me dikaribû, li vir, li dijî dijmin bi her şiklê şer bikin.*

*Ava me ya ku hebû, hê saet pêncê sibê xelas bibû. Me çek û tiştên dest danîbû ser, hejmartû bi şiklekî rêk û pêk ji hev veqetand. Şêst çekên mezin,neh tabance, çarhezar gule, cihaza mezin, radyo, daktîlo, metereyên avê, qasatura, işildaqên elektronîkû gelek kel û pelên cuda hatibû desteserkirin.*

*Helîkopter û balafirên jet pir zêde di ser me re difiriyan lê tevgera wan nikaribû me ji cihê me bileqîne. Me zêde guh nedida wan. Ji ber ku tiştekî ku wan kiribana tinebû. Ne mimkûn bû ku em bidîtana. Ji ber ku çiyayên me guncaw bûn.*

*Êvarê, ji bo em dîsa bi rêbikevin me dest bi amadekariyan kir. Bilezgînî, em bi av û qurye hewce bûn. Derfeta hevdîtina li gel qurye, ji ber ku me bi sedema bêşensiyekê berê ji dest xwe berdabû em bêqurye bûn. Me xwest, ji bo ku pêdiviyan peyda bikin hin hevalan bişînin gund. Lê belê wexta çûbûn, li gund rastî leşkeran hatibûn û bêyî ku tiştekî bigirin bi şûn de vegerîbûn. Di vê rewşê de, cudatir ji berdewamkirina meşa xwe, ji bo me ti riyên din tinebûn. Ber bi aliyê ku me texmîn kiriye, me xwe li araziya bêşiverê da. Lê ji ber hestiran ev sê roj bûn av venexweribûn, di araziya bi şikêrû tev kevir de bi zehmetî dimeşiyan. Ji demekê bi şûn de ji ber têhnbûnê, li gel me hemûyan hêza meşînê qederekê kêm bibû. Ji ber ku ava me tinebû, me nedikaribû xwarin jî bixwun. Li cihê ku me navbera îstirahatê dabû, me bi alîkariya kifşa arazîû xerîtaya ku di destên me de, tesbît kir ku li nêzî me gundek heye. Piştî ku em bi zor û zehmetî arwazê hilkişiyan em nêzî gund bibûn.*

*Lê belê ji ber ku berê li wî gundî li gel ti kesîtêkiliyên me tinebûn me di cih de nedît em biçinê. Me, ji bo ku av û qurye peyda bikin çend heval şandin gund û em li benda wan man. Wexta ku vegeriyan, li gel xwe zêde zêde av û du jî qurye anîbûn. Piştî ku me ava xwe vexwar, me hinekêîstirahat kir. Gundiyan agahiya çalakiyê girtibûn kêfxweşiyeke li gel ecêb mayinê têkilhev jiyan dikirin. Çek û tiştên me ji dijmin desteser kiribûn, dibû sedem ku çavên wan biteyise. Piştî ku li gel me hinekê meşiyan, me, ew bi şûn de şandin. Ji ber ku bênderên xwe li pey xwe hiştibûn û hatibûn.*

*Piştî ku em di şivereyeke sererast de biqasî saetekê meşiyan, ji ber ku dikira bibe sibe, li ser esasê ku em roja xwe lê derbas bikin li cihekî ku me guncaw dîtibû em sekinîn. Ji bo her kesî qedehek av û nîv nan hat dayin. Ew roj qederekê sakîn derbas bû. Lê belê piştî nîvro jin û du ciwanên ku heywanên me ferq kiribûn hatin gel me. Li gel xwe du metere jî av anîbûn. Dema hatibûn gel nobedarên meji wan re gotine ku leşker bi ser gundê wan de girtiye, li gundiyan êşkence kiriye û dibe ku bi vî aliyî de jî*

*were. Gava ku me xwest em wan sakîn bikin me fêm kir ku pêwîstiya wan bi vê tineye. Hê zêde ji bo me fikarên wan hebûn. Wexta ku helîkopteran dest bi gera xwe kirin, jinê piştî kucihê xwe guherîû saxlem kir, axaftina xwe domand. Ji me re digot, "we pir baş kiriye". Hineke din axifîû paşê ji bo ku ji me re hê zêde xwarin û av bînin paşde vegerîn.*

*Beriya bibe êvar, min dît ku ji şiveriya jêra me yekîneyeke leşkerî ya qelebelix ber bi me ve tê. Li pey hev rêz bibûn û dews dişopandin. Me, li ser vê yekê bi hatina pozîsyona pevçûnê, mewziyên xwe girtin. Hewl didan ji gundiyên ji gel me çûne agahî bistînin. Lê belê herhal nikaribûn agahî bistînin, berê xwe guherîn û ber bi gundê ku em ê jî biçûnê ve riya xwe domandin. Me dixwest ji beriya wan, xwe bigihînin gund. Ji ber ku gund nuxteyeke derbasiyê ya li boxazê hatibû avakirin bû. Eger kê berê ew der girtiba, nedihişt yê din derbas bibe. Ew ji ber ku di şiveriyê re dimeşiyan ji beriya me gihîştin boxazê.*

*Dema em nêzî gund bûn, yên li pêş yekîneyê dimeşiyan agahî dan me, ku leşker li gund in. Bi alikariya hin gundiyên em rastî wan hatine, me gelî di berpala wê ya asê re qut kir ûherêma bi xetere li pey xwe hişt. Dema me, xwe gihand cihê saxlemiyê nûdibû sibe. Piştî ku me cihê xwe amade kir, me civîneke kurt li dar xist. Me bal kişand ku; divê em sîstema tevgera xweku dest bi sistbûnê kiriye derbas bikin û ji bo kutakîba dijmin were şikênandin pêwîst e em ji pevçûnên nû re amade bin.*

*Me, bi roj dema ku gund kontrol kir dît ku yekîneyên teqwiye yên nû jî dikevin gund. Leşker ji germê westabûn û beacîbûn, li bin siya daran xwe diavêtin erdê. Helîkoper û balafirên şer ên jet, wê rojê qet ji ser qada ku me terikandiye kêm nebûn. Ji wan bûku me boxaz qut nekiriye û em di nav qada dorpêçkirî de ne. Me, ber bi êvarê veew û dorpêça wan li gel hev hişt û em bi halê xwe yê birçî di daristana têrdar û bi şikêr de bi rê ketin. Me wê rojê piç û pariyên nanê xwe yên dawî jî xelas kiribû.*

*Piştî ku em hinekê meşiyan çavên me dest pê kir tarî bibin. Çongên me dilerizîn û laşê me enerjiya xwe xelas dikir. Tevî vê me bi zora xwe meşa xwe domand. Piştî demeke kurt em rastî çend konên zozanan hatin. Ji ber ku me ew nas dikirin em çûn gel wan. Em bi kêfxweşî pêşwazî kirin. Bi jin û mêrê xwe ve dest bi kar kirin û têra me bi dan xwarin û vexwarin. Wexta ku em ji wan qetiyan êdî bêtaqatiya me ya bêrê tinebû. Me dest pê kir bi lezeke zêde em ji çiyayê bilind dakevin xwarê. Piştî çend saetan em hatibûn ser çiyayê di ser cihê ku em karin jê re bêjin binkeya me ya siyasî ya veşartî yere bilind dibe. Hema weke ku bi me re bask çêbibûn me bilez xwe berda jêr. Dema me xwe gihandibû daristanêbibû berbang jî. Me ew roja tev bi gundiyan re bi kêfxweşî derbas kir. Me qada binkeyaxwe pir baş dizanîû tenê yek kesê me nas*

*nedikir jî tinebû. Ji ber vê yekê me xwe wekîkelheyan didît. Di gelê binkeyê de kêfxweşiya cejnê hebû. Hemû xwarinên xwe pêşkeşî me kirin. Me dest pê kir em, enerjiya ku me wendakiriye bi şûnde bistînin.”*

## “Çiyayên Me ‘Komandoyên Çiyê’ Dibeacandin”

Ew û yên ku li gel, ji meşeke dûr û direj bi şûn de hatibûn nuxteya ku lê bisekinin. Hema gihan nuxtêû negihan nuxtê, civîna nirxandinê ya biserdegirtina Dihê tê lidarxistin. Hema bêje coş û morala hemû hevalan qederekê bilind bû. Destkeft û tiştên hatine wendakirin yek bi yek tên nirxandin:

*‘’Wexta ku me xwe gihand binkeya leşkerî ya veşarî, me ji bo nirxandina çalakiyê civînek li dar xist û serkeftin û kêmasiyên xwe girtin dest. Ji bo ku destkeftên me werin parastin diviyabû qonaxa ku kar û xebata siyasîû leşkerî gihiştibûyê, hê zêde pêşde bihata birin. Eşkere bû ku çalakîwê encamên siyasî yên girîng biafirîne. Hemû endamên yekîneyê, di hemû mijaran de xwediyê nerîneke hevbeş bûn. Li ser esasa ku rapora nirxandin û encamê were amadekirin, civîn bi dawî bû. Ji bo ku amadekariya çalakiyên nû were kirin xebatên îstirahat, perwerde û kifşê hatin destpêkirin.*

*Li gel hemû hevalan coş û moral, wêrekîûîradeya ku çalakiyê careke din derxistiye meydanê hebû. Di vê mijarê de hevalê me yê gundî yê bi navê B. ku mînak bû, nûtevli xebatên polîtîk bibû. Taybetmendiyên gundiyên me yên wekî welatparêzî, berxwedêrîû têgihiştî bi şiklekî pir baş dida der. Ji bo hemû amadekariyên çalakiyê xizmetên aktîf raber kiribûûdi çalakiyê de li gel hevalên li herî pêş ketine avahiya dijmin bi qehremanî şer kiribû. Di paşde kişanê de di binxistina zehmetiyên ku em pê re rû bi rû mane de alîkariyên girîng dabû. Tevî endamê herî bi temen ê yekîneya me bû, ji me hemûyan zindîû çalaktir bû. Beriya ji çalakiyê dema ku min pê re ji bo kifşê avahiya dijmin dişopand, min jê pirsî ku divê biserdegirtin çawa were lidarxistin. Wî jî bi vî şiklî bersiva min dabû;* ‘eger em nekevin avahiyêû çekan ranekin nabe’*. Belê, vaye gundiyê me wisa bû. Gundiyên din ên di çalakiyê de cih girtine jî, hêza xwe ya cesaret û kêrhatinêîsbat dikirin. Pêşengiya rast û hêza gundiyên Kurdistanê, bi hev re, wolqana şoreşê pêk dianîn. Ev hatibûîsbatkirin.*

*Piştî çalakiyan, dijmin xwe diavêt ber lingê gundiyan û digot:* ‘dewleta me heyf e, guneh e,nekin, em ê ji we re, rê, av, elektrîkê bînin, em ji yek dînê ne’*. Gava ku me ji gundiyan ev rewşa dijmin guhdar dikir, axaftinên ku berêsiyasetmedaran li ser kursiyên hilbijartinê dikirin dihatin bîra me.* ‘Artêşa Tirk a mezin’ *a bi heybet biqasî ku bikeve rewşa siyasetmedarên reben, biçûk bibû. Ev rebeniya wan di nav gel de bibû pêkenok. Digotin,* ‘wexta ku lêdan xwarbiaqil bû, fêm kir ku em feqîr in, bira ne’*.*

*Dijmin, ji bo ku prestîja wenda kiriye ji nû ve qezenc bike, dest pê kiribû komandoyên çiya bîne û bi wan êrîşî gundiyan bike. Vê carê jî leşkeran dest pê dikir û digîriyan. Digotin, 'ji teskereya me re kêm maye û em dixwazin jiyan bikin'. Çiyayên me 'komandoyên çiya' ji hal dixist. Dijmin taburên taybet ên zilm û zorê yên ku ji komando, jandarma, polîs, kontrgerîla pêk dihat xistibû dewreyê,piraniya qereqolên xwe rakiribû. Yên ku li cih hatine hiştin,hejmara wan sê qat hatibû zêdekirin û nobedariya her leşkerekî bibû sê-çar saetan. Tevî vê ewlekariya xwe têrê nedidîtin, li pey hev ji partîzanan re silav dişandin. Yekîneyên operasyonê, herî kêm bi fîloyên ku ji bîst helîkopteran pêk dihatin di heman demê de leşker datanîn hemû gundan, lê belê di demeke kurt de dubare li merkezên diyar kom dibûn; bi şiklekî veşartî operasyon li dar dixistin.*

*118 de ki fotoxraf*

*Ewqasbêxîret û qerebelexbûn, hatina wan ji berê de fêm nekirin ne mimkûn bû. Manewrayên kombûn û belavbûnêku bi vê tarzê bi caran hatine lidarxistin, bêencam man û ji bilî ku ew zererêbibînin kêrî tiştekî din nehat. Hin fermandarên mêtinger ev rewş pir baş îfade dikirin.*

*Mînak bînbaşiyekî li pêşberê gundiyan ev gotibûn:* 'eger li pêşberê me artêşek hebûya di rojekê de an ew an jî em tine dibûn. Lê ev ( partîzan) ji nişka ve li me didin û diçin û dema ku em dixwazin bi pey wan bikevin, riya ku ew di du-sê saetan de diçin, em encax di deh saetan de diçin'*.*

*Belê, fermandar rast digot. Bal dikişand ser zeîfiya esasî ya artêşa burjuwazî ya nîzamî. Subayekî din ê ku di van şert û mercan de ji jiyana xwe ecz bûye, wexta ku bi hezar belayî bi alîkariya şivê ku xwe spartiyê xwe digihîne gund, dibeje* 'ka li ku derê ne ev APO'çî, bila werin guleyekê berdin min û min ji vê azabê xelas bikin'*. Ji ber ku dengêguzên bi şevê ji darê diketin tirs û xof dixist dilê wan û ewvediciniqandin, darên mezin ji kokê ve qut kiribûn, bi sedema ku porala nedayibûn bêhejmar heywan kuştibûn. Mêtingerên faşîst ku dijminê her zindiyê bûn, li xişexeşeke herî biçûk ku bi şevê derdiket heya sibê gule dibarandin. Baweriya xwe wenda kirine, ji bo gundiyên ku ji xwe re dikirin nobedar dibêjin ev milîsên APO'çiyan in û dest pê kirine van gundiyan biqewitînin. Kesên ajan di pêşberê agahiyên dayine de bi lêdanê dihatin xelatkirin; ji ber ku ew ber bi xeterê ve kaş dikirin."*

**"Hêvî Şîn Bibûn Lê Hê Fikar Jî Hebûn"**

Fermandar Egîd, piştî çalakiya biserdegirtina Dihê di rojnivîsa xwe de rewşa psîkolojîk ku dijmin ketiye nav û dîsa coş û morala gel bi mînakên dayine bi şiklekî pir baş dianî ziman. Lê tevî van hemû destkeftan Egîd dizanî, nabe ku pêşketinên heyî bes werin dîtin. Û nota li rojnivîsa xwe nivîsandibû pir girîng bû: *" hêvî şîn bibûn lê hê fikar jî hebûn."*

*"Ev rewşa ku dihêle dijmin dîn û har bibe, bibû sedem ku ew gelek tiştên neaqilan bike, bi tevahî pêkhateya artêşê kiribû rewşeke bêdîsîplîn. Li gorî gotina leşkrekî ku me dîl girtibû[1], ji bo ku dîsîplîna xirabûyî ji nû ve ava bikin, li qereqolan, her şevê li leşkerekîêşkence dikin.*

*Rêvebirên faşîst ji bo ku rewşa cidî ya pêş ketiye ji holê rakin ji despêka meha Cotmehê (Kewçêr) pê de dest pê kirin li ser herêmê bihêwirin. Lê barebar û qîrên wan bêbersiv neman; di encama bersivên girtine de dîtin ku ev sawar bi kevir e jê pê de bêdeng bûn. Bi rêzê hatina Kenav Evren, Turgut Özal, Serokê Fermandariya Giştîû rayedarên din,partîzanan bi çalakiyên Şemzînan, Çelê, Bêşebap û Şirnexê, ku gelê me ji van çalakiyan kêfxweş bibû, pêşwazî kir.*

*Rayadarên faşîst li şûna ku rewşa xwe ya heyî biparastana, prestîja xwe jî wenda dikirin. Ev jî pir bi wan zehmed dihat. Ji bo ku prestîja xwe jî xelas bikin, biryar wergirtin çek li ser gel belav bikin. Lê bersiva gel neyînî bû. Digotin,* 'dewletek ku nikare xwe biparêze em nikarin biparêzin'. *Bi gotina* 'çekên ku hûn ê bidin me jî,wê di çend rojan de bi dest APO'çiyan bikevin' *ew dixistin rewşeke jêneder. Mêtingerên ku li belavkirina çêkan li ser gel poşman bûne, rakirina balafir û helîkopteran jî kêm kirin. Dijmin ku ji hemû lîstokên xapandin û ber dilê gel xweşkirinê dest berdabû, ji pêkanînên çewisînê kuji mal şewitandinê bigire heya bi êşkenceya vekirîû heya bi mirovkujiyê pêş de biribû jî nikaribû ti feydeyê bistîne.. Hemû dehaya wî ya leşkerîû teknîka wî ya pir mezin kêrî tiştekî nehatibû.*

***[1]Di dawiya sala 1984'an de di çalakiya serdegirtina qereqola Gundikê Melê de leşkerek dîl hatibû girtin. Di vê çalakiyê de sê leşker mirin. Heval Çetin Akkurt şehîd ket.***

*Subayên payebilind weke ku malumatên xwe yên teknîkî ji bîr kiribûn, ji bo parastina qereqolan serî li malumatên gundiyên me didan. Dema bînbaşiyek ji gundiyekî ku li tenişta wî ye fikra xwe ya bi şiklê, heya bi derdora qereqolê dîwarek lêkirinê, eşkere dike û jê dipirse* 'gelo ev çawa dibe?'*; gundî jî vê bersivê dide wî;* 'eger

hûn vî dîwarî lê kin wê nobedar ji derve bîmininû bibin hedef'. *Ya rast mirov dikare gelek mînakên weke vê bide lê em ê bi vê qîma xwe bînin.*

*Dîsa, ji dijmin bû ku tabûr cihên wan ên rehetiyê ne; lê dema ku çend gule hatin berdan taburên wan jî, rehetiya wan a li vir jî herîmîbûû heya sibê bi şiltaqan (ışıldak) hewîrdora xwe ronî dikirin. Herku gel zeîfîû bêçarebûna dijmin dîtibû, dest pê kiribû ji şaşîû xefletên xwe dûr bikeve. Birastî, ew qas jî ji dijmin hêvî nedikirin. Gundiyan êdî wekî ku pêdiviyên madîû psîkolojîk ên êrîşên hê mezintir pêşwazî bikin xwe amade dikirin.*

*Hêvî şîn bibûn lê hê fikar jî hebûn*

**"Kesê/a Li Dawî Bimîne Namîne Heyirî; Tê Xelaskirin"**

Hêzên dijmin ji ber ku li pêşberê gerîla nikaribûn tiştekî bikin, fikareke mezin bi wan girtibû. Di nav rewşeke bêçaretiya mezin de bûn. Dijmin êdî hemû hêviya xwe li zivistanê girêdabû. Her ku zivistan nêz dibû kêfxweşiya wan zêde dibû; her gundê ku diçûnê lê gef dixwarin û digotin, *'em ê di demeke nêz de hev bibînin'*. Fermandar Egîd wan rojan bi vî şiklî tîne ziman:

*"Zivistan nêz dibû. Gel li van herêman ji ber ku zor û zehmetiya zivistanê dizanî, dilnerehet bû. Hin caran berfê gulyên darên berûyan derbas dikir. Bi misogerî her salaşût ûbahoza berfê dibû sedema mirina mirovan. Ji me jî ji şehîdbûna heval Abdulezîz Kanat re bûyereke aşûtê bibû sedem.*

*Ji ber ku çend salan e vir de me jî ev şert û merc jiyan dikir, me zehmetiyên wê dizanîn. Ya rast, piraniya hevalan perwerde û ezmûna xwe ya zivistanê li geliyê Bimzorî derbas kiribûn, fêrî şert û mercên zivistanê bibûn. Geliyê behsa wêtê kirin cihekî wisa bû, sal tineye ku bêyî mirina mirovan derbas bibe. Mirov neçar dimîne ku riyeke di gelî de bi qasî 14 saetan didome, di nav berfa heya li singa mirov dide de bimeşe. Eger mirov bixwaze rûnî jî, reşahiyek dîtin ne gengaz e. Tenê kêliyekê sekinîn jî, dibe sedem ku mirov bikeve xewa berfê. Dîsa ji ber ku di her kêliyê de xetereya bagera berfê heye, neçar e ku mirov bi qeweta xwe ya heyî bimeşe. Eger mirov di nav bagerê de bimîne, xwe xelas kirin zehmed e, mirov nikare gav jî biavêje, mirov dixeniqîne. Di sala 1982'an de 6 kes xeniqîne, di sala 1983'an de 20 kes ji ber ku riya xwe şaş kirine bi xetereya qerisînê re rû bi rû mane û lingên wan hatine qutkirin. Di meha Mijdarê ya wê salê de rêwiyê ku suwarê hespekî bû ji ber qerisînê miribû; di meha 11. a sala 1984'an de newala ji qaşeyê ya di gelî de bibû sedema mirina du kesan. Ji bo ku ev newal were derbaskirin, mirov neçar dima heya navikê li avê bide. Paşê, dema ku şiverê hate vekirin, mirov tenê carekê li avê dida.*

*Li herêmê, ji ber şert û mercan axaftineke bi vî şiklî hebû; 'yê/a ku li dawî bimîne, dimîne heyirî'. Lê hevalên me ev axaftin guhertin û kirin; "kesê/a li dawî dimîne namîne qerisî, tê xelaskirin". Di rêwîtiyên bi şiklê grub dihatin kirin de gelê herêmê pir baş dizanî kes li bendêkesê/a li dawî dimîne nasekine. Hevalên me, di rêwitiyên bi vî şiklî de çawa ku kesên di gruba xwe de li paş grubê diman xelas dikirin her wiha kesên ji grûbên din li paş diman jî xelas dikirin. Ji bo kesên ku bi vê riyê de biçin, şîretên wekî'li gel karkeran rêwîtî bikin'êdî zêde zêde dihate kirin. Mirovên ku bi sedan sal e di van şert û mercan de jiyan dibûn, li pêşberê xweragiriya van kesên ku gelekan ji wan berf nedîtine û ji cihên germ tênmatmayî diman. Ji wan bû ku ev qeweteke neasayî ye. Li vir, hêza mezin a îradeyê jî hatibû pişrastkirin. Gundiyên Bimzorîyên ku ev rewş ji nêz ve didîtin digotin,* 'vayeew îrade û xwediyên wê yên ku me rizgar bikin ev in'.

*Û zivistanê dest pê kir. Hem jî zivistana herî giran a pêncî salên dawiyê bû ev. Pêvajoyek ku du hêviyên cuda li beranberê hev şer dikirin dihat jiyîn. Dijmin hêvî dikir ku me îmha bike û nehêle em gav biavêjin biharê. Lê ya ku têkçûye ûîmha bûye, bû hêviya wî. Li aliyê din em jî weke netewe dest bi jiyaneke nû dikin.*

*Newroza 1985'anweke rojek ku hêviyên gelê me xwe nû kirine li ser rûpelên dîrokê tê qeydkirin. Ji ber ku îro bi biesilbûna qeweta îradeya gel ku mezin dibe û bi dîrokîbûna wezîfeyê*n *hêza ji vê re pêşengiyê dike, îlana Eniya Rizgariya Neteweyî tê kirin. Roja Newroza 1985'an rojek ku ketîbûn tê derbaskirin, hêviyên mezinbûn û biesilbûnê derdikevin asta herî bilind e. Û ji bo gelê me wê ji nû ve bibe cejn. Ji ber ku em dikevin sala qezenckirina her tiştê ku hatiye wendakirin, em ê her nirxê ku mirovî, civakîû neteweyî ye dubare bi dest bixin. Dijmin dixwaze vê zivistanê li me bike jahr lê em ê jî, ji vê rojê pê de vê zivistanê bikin pêvajoya amadekariyê ya destpêkirina qonexek nû ku destkeftên mezin û biesil bîne. Û ji bo vê jî emvê zivistanê bi kêfxweşîû rehetiyeke mezin derbas dikin.*

*Em, sala 1985'an, bi Newrozê, weke salek ku hêviyên gelê me ji nû ve şîn dibin pêşwazî dikin. Gelê me, hemûqewetû derfetên xwe bi kar tîne li ber xwe dide û ji ber vê jî kêfxweş e. Hewldanên serbilind ên Partiya me, kêda ku hatiye xerckirin û tê xerckirin û xwîna şehîdan vala neçûye. Em li derdora van hemûyan bi şiklekî şidandî destê xwe didin hev û ti hêzeke faşîst a paşverûwê nekaribe destkeftên me ji destên me derxe."*

**"Îsabet û Domdariya Di Çalakiyan De Wê Gel Bikişîne Nav Şer"**

Roja 21'ê Nîsana 1985'an li Başûrê Kurdistanê civînek hate lidarxistin. Selim, Ebubekir, Şêxmûs, Ali, Ömer, M. Ali, Cafer û Halil Hoca beşdarî civînê dibin.

Civîn, ji civîneke plankirina çalakiyekê zêdetir ji bo ku pêşketinên siyasî yên dawî werin nirxandin, hin tesbît û encam werin bidestxistin tê fikirîn.

Rojev ji mijarên weke, pêşketinên siyasî, bûyerên dawiyê, kar û xebata dijmin, çûyînên ji bo welêt, rewşa bajaran û rewşa xaînan pêk dihat.

Axaftina destpêkê Egîd kir. Pêşketinên siyasî yên dawî nirxand. Ne axafitineke pir dirêj bû. Xîtaba Wî, leşkerî bû. Bi vegotineke zelal, misoger, rasterast û kurt rewşa emperyalîzm û KT'ê, pêvajoya ku tevgerên çep ên Tirk di nav de ne û li ser rewş û tewazinên di leha PKK'ê de çêbûne, li ser feraseta şer û binkeyan (üss) sekinî. Wiha digot:

*"Pêşketinên li hindûr diqewimin, li derve tesîreke girîng dikin. Di encama vê de gelek hêz ûqewet neçar dimînin helwestên xwe yên li pêşberê me biguherin.*

*Sosyal demokrasiya li Ewrûpayêû di helwesta hêzên pêşverûên cur bi cur ên li herêma Ereban de ji bo nermbûyînek û rewşeke lêgera li gel me têkilî çêkirinê heye. Di vê de rola hema bêje ji nav çûn û rizina hêzên ku heya niha li dijî me hatine bikaranîn jî heye. Rewşa dawî ya 'Özgürlük Yolu'û'Dev-Yol'ê bi vî şiklî ye. Dev-Yol li ber deriyê hîpîbûnê ye, Özgürlük Yolu jî di manaya siyasîû rêxistinî de belavbûnê jiyan dike. Ji Komîteya wan a Merkezî çar kesên din jî cuda bûn. Di helwesta Swêd û Fransayê de nermbûn heye. Ketina vê rewşê ya reformîzmêû jiyan kirina vê rewşê ya di aliyê me de erênî ye. Helwesta erênî ya Yewnanîstanê mijara axaftinê ye. Ji ber ku Tirkiyê li Bulgarîstanê "pirsgirêka Tirk" sor dike, girêdayî vê pirsgirêkê Bulgarîstan dixwaze ku pirsgirêka Kurd bîne rojevêû vê weke amûrekê bi kar bîne. Lê belê ev feraset hat redkirin.*

*Dîsa li herêmên cuda, yên dixwazin werin nav têkoşînê pir in. Her ku diçe hejmara van zêde dibe. Li Ewrûpayê li ser esasê nakokiyên kêmnetewe, mezheb û dînî li dijî Tevgera me ya Şoreşgerî hewldan hene. Bi taybetî di vê kar û xebata ku di nav Dêrsimiyan de zêde dibe de hewldanên Semîr jî hene. Lê derbaya ku li wî elçaxî hatiye dayin ew zêde zêde gêj kiriye. Ji ber vê yekê ji binî de dîn û har bûye. Herî dawî ji bo ku îtibara Serokatiya Partiyê bixe, serî li derew û dujinan dide.*

*Kar û xebatên bi vî awayî, şerê taybet ê dijminê emperyalîst û mêtinger li dijî me dimeşîne temam dike. Dîsa kar û xebata TîKKO û "Pêncan" jî di vê çarçoveyê de ye.*

*Lê kar û hamleya şoreşgerî ya ku me di nav welêt de pêş xistiye, ev kar û xebat vala derxistin. Girêdayî vê, tasfiyegeriyêhewl da ku li dijî me bi şiklê çekdarî derkeve*

*meydanê. Di bin tesîra Partiya Komînînst a Iraqê de civînên ku Samî[1], KUK û Pêşeng li dar dixe û biryarên tên girtin tên vê maneyê.*

***[1]Samî: Samî Abdurrahman***

*Kurt û cewherî, pêşketinên li Rojhilata Navîn jî bi vî şiklî ne:*

*Di nav Filîstîniyan de cephebûnek çêbû. Ev cephebûn li ser esasê, li Lubnanê bi cih bûn, li hindûr têkoşîn pêş xistin, nêrîna li hêzên pêşverû-şoreşger ên herêmêû tevgera rizgariya neteweyî, pêşxistina têkiliyan li gel sîstema sosyalîst e. Helwestên Cepheya Nîdal û Cepheya Şabîe erênî ne. Lê belê hê negihiştiye asta alîkariyeke madî. Li gel Cepheya Demokratîk têkiliyên me tinene. Lê ji bo çêkirina têkiliyan hewldan hene. Em bi başî niyetê wan nizanin. Lê zêde hewldan hene.*

*Hewldanên Pêşeng, KUK,Harekata Kızıl ku nû derketiye holêû Semîr hene. Li Libyayê di TÎKKO'yê de belavbûn û jihevketin çêbû. Gelek ji wan dixwazin li dijî me şer bikin.*

*CBYLF(Cebheya Berxwedanbê Ya Yekgirtî Ya Li Dijî Faşîzmê) hebûna xwe dide domandin. Acil û SVP jî di domandina wê de bi biryar in. Platformek e, di berdewambûna wê de feyde heye. Îlana ERNK'ê hê bêhtir wê li hindûr tesîreke erênî çêbike. Ewrûpayê ranegihand. Tenê Emerîkayê ragihand. Emerîka vê bi zanebûn dike. Hewil dide weke hêzeke zêde bi xetere me nîşanî Tirkiyê bide û hê zêde Tirkiyê li xwe girêbide. Dixwaze hê zêde tawîz bistîne.*

*Helwesta Îranê rojane ye, demkurt û girêdayî pêşketinan e. Çewisandin û gefxwarinên dewlata Tirk zêde zêde ne.*

*Helwesta PDK'ê piştî15'ê Tebaxê ji binî de hate guherîn, neyînî bû. PDK dixwaze li Rojavayê Bakûrê Kurdistanê bi destê TKDP rêxistineke girêdayî xwe ava bike. Lê hêzên dixwaze ku xwe bispêrêû birêxistin bike, kesên bi MÎT'ê re têkildar in. Hedefa KT'ê jî ew e ku bi destê van rêxistineke mîlîsan ava bike. Têgotin ku li Diyarbekir li gel MÎT 'ê civînek li dar xistine. PKI(Partiya Komînîst a Iraqê) jî, ji berê de li dijî mekar û xebat dimeşîne. Dixwaze, eşkereeşkere têkoşîna me asteng bike.*

*PDK, ji ber em hêzeke pêş dikeve ne bêyî kuji binî de têkiliyan qut bike, dixwaze di asta herî jêr de li gel me têkilî çêbike.*

*Celal her ku diçe ji rewşa tecrîdbûnê xwe xelas dike. Hewl dide li gel hêzên ku bi PDK'ê re têkiliyên wan hene re têkilî çêbike. Ev rewş PDK'ê nerehet dike. Di derbara têkiliyên bi Celal re PDK û PKI'ê naxwazin raseriyê bi destê wî re berdin. Me di bûyerên dawî de jî ev dît. Li dijî PDK'ê bertekên gel hene. PDK'ê pêşî li vê digire.*

**Şerê Şoreşgerî Şerekî Êrîşî Ye**

*Li ser pirsgirêkên rêxistinî-pratîkî nirxandin hene. Nerehetiyeke giştî heye. Ji ber ku biryarên Partiyê nayê pratîzekirin gilîû gazinc hene. Tevî ku şert û mercên siyasî, rewşa gel û dijmin potansiyela me ya heyî guncaw e, têra xwe nayê pêşxistin. Rewşeke wisa heye; em, xwe sînordar û teng dikin ûînîsiyafê bi kar nayinin. Tevî ku xeta Partiyê bi awayê leşkerî fêmkirin jî, têrê dike ku di înîsiyatîfa şoreşgerîû şoreşgeriya têrê dike de astek were girtin, ji aliyê kadroyan vê di asta ku tê xwestin de ev nikare were nîşandan. Piştîpêşketina di astekê de, her xwe li benda talîmatên jor ragirtin pêş dikeve. Di rewşeke bendewariya pasîf de mayin pêş dikeve. Ev rewş ji wendahiyên girîng û pêşneketinêre dibe sedem. Pêwiste bi misogerî ev were derbaskirin. Û tê xwestin ku em xwe sînordar nekin. Ji bo ku em xwe bigihînin hedefê, divê çalakîû raperînên hê mezin li pêşiya xwe ti astengan nas nekin. Pêwîst e xeta Partiya me bi dîtineke mekanîk neyê fêmkirin. Astengên bi vî şiklî tinene. Eger şert û mercê wê hebin, sûda wê heye kuji bo çalakî, raperîn û îşxalan hewl were dayin. Eger bi binkeftinê jî encam bidin, bi misogerîwê hêzeke madî ya pir mezin derxin meydanê.*

*Gilîû gazinc hene ku di mijiara jihevagahîgirtinê de zeîfî hene. Rexne tê kirin ku telefon, têkiliyên quryêû hwd. riyên dan û stendina agahiyan nikare ku têra xwe were birêxistin kirin, bi şiklekî guncaw derfet nayê bikaranîn. Dîsa rexne tê kirin ku di navbera xebatên çiya û bajaran de têkiliyeke rast nikare were avakirin û xebat bi şiklekî mekanîk û monoton tê meşandin.*

*Em şerekîêrîşê dimeşînin.* ***Şerê şoreşgerî, şerekîêrîşê ye.*** *Ji gelek yekeyên me agahî nayên girtin. Pêşketin û çalakî nayên çêkirin. Rewşa ku elaqa xwe bi tiştekî nayne û xwe dike qalikê xwe, xwe direwşa parastinê (pasîf) de radigire heye ( li cihên wekî Semsûr, Sason, Mêrdîn, Qers û hwd.)*

*Rewşa ji gotina "amadekarî" şaş fêmkirinê heye. Feraseteke bi vî şikî şaş e, em ji bo şer gel amade bikin, gel perwerde bikin û bizanebûn bikin , gel birêxistin bikin û paşê jî ji bo çalakiyan rakin ser piyan. Ya rast gel şoreş û şer dixwaze.* ***Di çalakiyan de îsabet û domdarîwê gel bikişîne nav şer.*** *Ji derveyê çalakiya Bêşebabê, çalakî di cih de ne. Ya rast ew e ku hemû rayedarên leşkerî, ajan û muxbîrên ji aliyê kontr-gerîla ve tên birêxistinkirin kesên ku ji aliyê MİT'ê ve tên erkdarkirin û endamên MİT'ê ne*

*Çalakî li ser gel tesîreke erênî dikin. Ji eşîrekê 40-50 kes qezenc kirin, tê maneya ew eşîr rakirin ser piyan. Li herêmên sînor rewşeke wisa heye. Ji Botanê wê de jî, pêwîst e, bigiranî dayin rêbazên cuda, bi giranî dayina xebata bajaran çalakiyên şoreşgerî werin pêşxistin.*

*Divê feraseta binke girtinê were guherîn. Pêwîst e di binke girtinê de mayendebûn pêş bikeve û hemû yekîne di tevgerê de bin. Eger hewce bike divê li gorî demsalan were guherîn. Texrîbat û wendahiyên demî zêde ne girîng in, dikare bi çend çalakiyan ev ji nû ve were afirandin.*

*Helwesta me ya li beranberê reformîzmê, li hindur ew e ku em alîgirên wan kaşî gel xwe bikin. Ji van yên bi navê Pêşeng, KUK û T-KDP rêxistineke milîsan e. Rêxistinên bi şiklê UNİTA ûBalli Kombetas, yên ku di bin kontrola Tirkiyê de ne. Hêza lêdanê ya tifaqa fireh a qada navdewletî PKI'ê ye.*

*Xeta ji Dêrsîmê heya bi vir, xeta me ya şerê şoreşgerî ye. Pêwîst e bi misogerî şer di vê xetê de were pêşxistin. Û divê em şer li vir giran bikin. Pêwîst e em bi rêû rêbazên cûda û çalakiyên cur bi cur bi misogerî gel rakin serhildanê.*

*Pêwîst e têkoşîna siyasî were pêşxistin û em timî di rewşa êrîşê de bin. Divê em kar û xebata xwe bigihînin asteke merkezîû mekanîzmeya xwe ya biryarêûînîsiyatîfa xwe bigihînin asteke mukemel.Mînak Diyarbekir ji Zaxo birêvebirin zehmed e. Gihandina raporan 6-7 mehan digire. Ji bo ku kurt û kêmasiyên ji vê rewşê pêş dikevin ji holê werin rakirin, divê em hêza biryarê bigihîn wan deran, li wan deveran bi cih bikin.*

*Tiştên di mijara binke girtinê de hatine gotin rast in. Diyar e; dijminê me bibiryar e ku bostek ax nede me. Lê ji bo ku şerê şoreşgerî di astên pir mezin de were rêxistinkirin şert û mercên welatê me destdayî ne.*

*Wisa lê hatiye ku '**çalakiyên ku em li dar dixin çi bin, têkoşîna me jî ewqas e'**. Di bingeha pêşketinên bi her şiklî de ev heye. Divê em karibin hêz û mekanîzmaya xwe ya rêvebiriyê li gorî vê rêk û pêk bikin.*

*Bi qasî çalakiyan, pirsgirêka ku ew veguherandina hêza rêxistinî jî girîng e. Weke li Başûrê Kurdistanê bûyî, li her gundî berdevk û komîte birêxistinkirin, rêxistinên îdeal afirandin dibe ku zehmed be. Tenê dikare li bajar û herêmên çiyayî yên li pêş,ev şiklên rêxistinan werin pêşxistin. Lê ji ber ku ev bi vî şiklî ye jî pirsgirêka rêxistinbûnê dereng nayê xistin."*

**Di Xebata Pratîkî De Rexneya Feraset Û Terza Xebata Şaş**

Fermandar Egîd dibêje;*"bêyî ku asta kadroyên têgihîştîû kamil were girtin ti pêşketin nayê çêkirin"* Û berdewam dike, *"di serkeftinê de pîvana bingehîn a ku esas were girtin ew e; kê di çi astê de berhemên mayinde afirandine?"* Ev nirxandina Wî ya

teorîk ku di 17'ê Adara 1983'an de nivîsandiye, îro jî bi hemû rojevbûna xwe ve li pêşberê me disekine. Dema ku li ser mijara *"ji bo çi gelo şoreşgerên bicoş ên wekî Egîd, Kemal, Heqî dernakevin"* tê fikirîn, bi rastî jî ev niha hê baştir tê fêmkirin. Vaye, nirxandina hevalê Egîd a dîrokî kuya milîtanekî PKK'êye û ji îro re jî dibe ronahî:

*"Di roja me ya îro de, ku em ê bi pêngavên nû li dijî mêtingeriya faşîst têkoşînekê bimeşînin amadekariyên vê têkoşînê hema bêje bi dawî bûne, wezîfeyên giran û girîng yên li benda hemû kadroyên Partîû berendamên kadro ne hene. Ev wezîfe zelal in, ev, ji bo ku di bin çewisandina rêveberiya faşîst de rizgariya neteweyî were pêkanîn, xebata afirandin û pêşxistina amûrên bingehîn e. Bêguman,wê bihêsanî wezîfe neyê pêkanîn. Em ê di her gava biavêjin de bi zehmetiyan re rû bi rû bimînin ûwê karibe bi berxwedêriyeke dijwar ev bêbibinxistin. Tê zanîn; diyardeya zehmetiyan ku pêşî li biserxistina karekî hatiye destpêkirin digire, li gorî naveroka wî karî diguhere. Em bi karekînormal re mijul nabin, em şerê bibinxistina dijminekî zalim û bêrehm dimeşînin ku zilm û zora çewisîner ya gelên din di têkoşîna xwe ya rizgariyê de pê re rû bi rû mayine qat bi qat derbas dike. Mêtingeriya Tirk a faşîst ku di seransera dîrokê de bi barbartiya xwe, ji bo gelan heta ji bo gelên parzemînên din bûye sedema esaret, hilweşandin û qirkirina wan, bi van taybetmendiyên xwe yên hilweşîner (yıkıcı) bi awayekî ji kûr ve di aliyê nerênî de li ser dîrokê tesîr kiriye; bûye mîrasdarê çînên hakim ên barbar ên Tirk û şopdarê wan, di roja me ya îro de ku bi zordariya xwe ya har û dîn, bi çînên kedkar ên Tirkiyêû gelê me xwînê dide vereşandin, li dijî hemû gelên Rojhilata Navîn bi xeyala ji bo emperyalîzmê bûn hêza êrîşêûîmparatoriya bi heybet a bav û kalên xwe, taybetmendiya wê ya fetihkar her ku diçe zêde dibe û bi vê xeyalê jiyan dike. Ev têkoşîna ku em dimeşînin jî têkoşîna hilweşandina mêtingeriya Tirk a faşîst e. Têkoşîn wê gelê Kurd ku dîroka bindestiya wî diçe nav hezaran sal, bi rewşa xwe ya bêpêşeng belawela, bi cehaleta xwe ya kor û lal, bi kêm hatin dîtina xwe ûêş kişandina xwe ve hebûn û tinebûna wî nediyar e, bigihîne yêkîtiya ji pola, fikra şaraza û rewşekê dînamîk. Gelê me yê ku xwe bigihîne vêqewetê, wê hakimiyeta mêtinger hêdî hêdî ber bi ruxandinê ve bibe, bi derbeya dawî ya ku lê bidebi hengame û qerebelixeke mezin laşê mezin ê kevnareparçe parçe bike. Wê di nav van xirbeyan de hêviya me ya welatê serbixwe û azad pêk were, ev belaya ku li ser serê gelên din bûye bela wêwere qewitandin û tola bi milyonan kesên hatine kuştin ku ji gelên mezlûm in wêwere girtin.*

*Wezîfeya me girîng e. Ji ber ku bi rizgariya gelê me wê sûdên mezin bigihîne mirovahiya bindest. Em şerekî pîroz dimeşînin, giran e; ji ber ku me cesaret kiriye, em li dijî dewleta Tirk a bi artêşeke êrîşkar ku hejmara wê digihîje milyonekêû bi amûrên*

*herî modern ên serdemê hatiye amadekirin, li herêmê temînata herî bihêz ya emperyalîzmê ye û emperyalîzm ji bo berjewendiyên wê ji derbeyê jî xwe nade aliyekî, serî hildin.*

## Cesaret Destpêka Kar Û Xebatê Ye

*Heya ku cesaret bi zanebûnê re, zanebûn bi rêxistinê re û rêxistin jî li gel çalakiyê nebe yek, fedakariyên mezin werin nîşandan jî, her hewldana were raberkirin, weke di dîroka gelê me de bi hezaran mînakên wê hene, mehkûmî sernekeftinê ye. Sernekeftin wê binkeftinê; binkeftin wê bi xwe re tevkujiyan bîne. Gelê me bi mînakên vê re kêm rû bi rû nemaye ûêşa vê kêm nekişandiye. Her çendî rêbertiya çînên hakim ên Kurd sebeba encamên binkeftina ku hatiye jiyîn bibin jî, ev rewş tenê nikare ji taybetmendiyên bûn çîna hakimçavkaniya xwe bigire. Weke çîn xwe negihandin asteke xurt a rêxistinbûnê jî bûye sedemeke girîng.*

*Şert û mercên objektîf ên rizgariya neteweyî li Kurdistanê, bi derketina holê ya proletaryayê çêbûye. Lê rastiyek e ku ev bi tena serê xwe ji bo rizgariyê ne bes e. Proletaryaya Kurdistanê hê bi temamî di aliyê taybetmendiyên civakîû siyasîde kamil nebûye û xwe negihandiye rêxistinbûneke girseyî. Ne mijjara axaftinê ye ku tenê di pêvajoya pêşketina xwe ya xwezayî de jî van taybetmendiyên xwe pêş bixe. Tenê di pêvajoya rizgariya neteweyî de wê mimkûn bibe ku pêşengiya çînî ji çarçoveya îdeolojîk derkeve û bi çalakiyên çînî yên şênber jî xwe pêk bîne.*

*Ji ber pêkhateya civakî ya civaka me, gundîtiya feqîr hejmareke mezin eû li gorî beşên civakî yên din nasnameya xwe ya neteweyî hê zêde parastiye, li gel van sedeman li gorî pêwîstiya stratejiya şerê gel, ji ber ku me çoltere û şêniya li vir weke hêza rizgariyê ya esasî hilbijartiye jî neçar dihêle kuxebatên me yên polîtîk rêxistinîû leşkerî giraniya xwe bidin vê beşê. Gundîtiya Kurdistanê ku zêde ji bo fikra modern û pêkhateya rêxistina modern ne vekirî ye wêzehmed bibe ku zûka feraseta têkoşînê ya partiya proletaryayêû rêgezên wê fêm bike ûwê sebireke dûr û dirêj hewce bibe. Lê belê dema ku karektera şerker a têkoşîna me û taybetmendiya şerker a gundiyên me li ber çav were girtin wê were fêmkirin ku em ê bi potansiyeleke şerker a berfireh hereket bikin.*

*Sayfa 134 foto. Komut Agid ve Abbas yoldaş*

*Ev jî  ji bo ku em xwe bigihînin serkeftinê temînateke diyar a di destê me de ye. Zehmetî, ne tenê ji ber bihêzbûna dijmin zêde dibe, ji ber ku dînamîka civakî ya*

*modern zeîf e û dijmin dixwaze vê parçe parçe bike jî zêde dibe. Gelekî ku rizgariya neteweyî ji xwe re kiriye hedef, di destpêka çekên giran ku ji bo binxistina dijminê xwe bi kar tîne de rêxistina partiyê tê. Rêxistina Partî ku bi xwe ji nav dilê netewe û çînê derketiye, pêkhateya herî fedakar û di nav zor û zehmetiyên têkoşînê de bêyî ku riya xwe şaş bike xwediyê wê hêzê ye; berê hêz û enerjiya hemû neteweyêbide hedefa şirîk ku ji qeweta pêşeng û kadroyên pêşeng çêbûye, bêyî ku bi terzeke girêdayî wezîfe û erkên xwe ve ye xwe birêxistin bike ne mimkûn e girseyên berfireh perwerde û birêxistin bike û bixe tevgerê. Yekîtiya herî berfireh a neteweyê di eniya rizgariya neteweyî de pêkanîn û wezîfeya avakirina artêşê ku hêza rizgariyê ya esasî ya gel e girêdayî vê ne.*

*Her sê amûr jî, bêyî ku şerekî demdirêj were meşandin wê neyê pêkanîn û her wiha nikare were gotin ku wê ev ê bi misogerî di pêvajoyên cuda de ji hev serbixwe pêş bikevin jî.*

*Di pêvajoya me ya ku hê ti amûr nehatine avakirin de, li ser zemîna polîtîk ya ji aliyê têkoşîna me ya derbasbûyî ve hatiye amadekirin, potansiyela me ya kadro kuli benda pratîkê ye, tovên pêşeng ên her sê amûran in.*

*Pirsgirêka kadro ku ji vê taybetmendiya têkoşîna me pêş dikeve, bi bûn milîtanê polîtîk-leşkerî ku di zanebûna van de ye û gihiştiye wê asta amadekariya kukaribe her şiklêtêkoşînê bimeşîne ve wê çareser bibe. Hevalan ev nêzî sê sal in, ji bo ku xwe bigihînin taybetmendiyên milîtan ên ku hatine diyarkirin perwerde dîtine. Pêşketinên ku pêwîst e biçûk neyên dîtin hatine pêkanîn. Bidestxistin gihiştîbûna ku hatiye hedefkirin, helbet wê bi tena serê xwe bi perwerdeya teorîk ku bi pratîkêre nabe yek, gengaz nebe. Kadro û şervantiya milîtan bi xwe di pêvajoya kar û xebata pratîk-rêxistinî de saxlem dibe û pêk tê. Lê di ceribandinên me yên ku di têkoşîna me ya derbasbûyî de çêbûne hene û ji bo rexneyê, dersên girîng pêşkeşî me dikin. Rastiya diyar ku bi awayekîeşkere xuya dibe ev e: ji bo ku feraseta şoreşgerî were fêmkirin û pêre yekbûn çêbibe û pêwîstiyên wê yên rêxistinî werin bicihanîn, ji bo ku çalakiyên pratîkê bi çalakbûn û perspektîfeke berfireh were bidest girtin, bêyîku asta kadroyên têgihiştîû bi amadekarî were girtin wê ti pêşketin neyê çêkirin.*

*Wext hatiye ku hevalên perwerde dîtine bi awayê tovên pêşeng werin birêxistinkirin. Em ê bi pêkhateyeke xwediyê rêxistin dest bi pratîka li welêt bikin. Awayê rêxistinêwê ji erk û wezîfeya ku wê were bicihanîn pêş bikeve, wezîfe di nivîsandinên cur bi cur de hatine eşkerekirin û her heval vê dizane. Tiştê ku divê timî were dîqetkirin û neyê ji bîrkirin, pîvana ku di rol û serkeftina şexsî de esas were girtin ev e; kê di çi astê de tiştên mayînde pêş xistiye? Eşkere ye ku ji bo afirandina rêxistinê*

*pêşengiyeke pêşketî hewce ye. Wê demê, divê ji amadekarîû perwerdeyêev were fêmkirin. Bi ceribandinên ku ji têkoşînên şoreşê yên çîna karker û gelên bindest hatiye fêrbûn, taybetmendiya kadroyên kominîst gihiştiye cewhera xwe ya gerdûnî. Têgihiştina taybetmendîû cewhera gerdûnîwê têrê neke, divê,ev, bi fêmkirina zagonên şoreşa Kurdistanêû bi qebiliyeta karanîna wan were temamkirin.*

*Li gel me di xwe gihandina rewşa kadroyên şoreşê yên pêşeng û yên milîtan de şaşîû kêmasiyên ku dibin asteng hê jî bi temamî ji holê nehatine rakirin û weke pirsgirêk rewşa xwe ya di rojevêde bûnê didomînin. Tevgera me bi girîngî van digire dest. Lê belê, tevî ku ji bo derbaskirinê hewldanên mezin tên dayin, beşek ji hevalan, hê jî ji nav lepê van xelas nebûye. Ev kêmasiyên ku weke nexweşî werin binavkirin, ji hin mêylên ji rê derketî ku bi piranî ji ber cudahiya teorîk û rêxistinî pêş dikevinçavkaniya xwe nagire. Ev, bi şiklê xeta teorîk-rêxistinî pratîze nekirinêû bi awayê xwe negihandina kesayetiya polîtîk a pêşketî ya şoreşê xwe dide xuya kirin. Hin kes di şaşiyên xwe de israr dikin ûbi awayekîcidî nikarin xwe binirxînin. Dibe ku ev heval neynin bîra xwe jî, hewldana parastina kesayetiya ku wan girtine tê maneya li pêşberê ya pêşketî tiştê paşketî parastinêûdi nav partîû têkoşîna proletaryayê de kevneşopiyên burjuwaziya biçûk berdewamkirin xwestinê; lê rastî ev e. Wexta ku ew bi vê rastiyê hatin hesandin destpêkê tiştê ku dibêjin, pirsgirêka şeref û rûmetê ye. Belê, şeref û rumeta yên ku nikarin vê pêşkeş bikin nikarin ku şeref û rumeta wê jî hilgirin.*

*Eger li van şaşiyên ku bi şiklê ferasetên şaş tên domandin pêşî neyê girtin û neyên derbaskirin, ev dibin meyla diyar. Her diçe jî dibe ku xwe bigihînin asta ferasetên jirêderketî. Li gel me her çendî ev nehatibe asta ku qeweta rêxistin û têkoşînê kêm bike jî, ev feraset û helwestên şaş ku destpêkê bi şiklên hêsan dest pê dikin, di dîroka şoreşê de hatiye dîtin ku ev bi demê re ziviriye birîneke mezin ku her roj kûrtir dibe.*

*Di demên derbasbûyî yên rêxistinê de sedemên texrîbat û krîza ku çêbûye, destpêkê weke amatorîû seretayîbûnê hatibû diyarkirin. Di destpêka her şoreşê de jiyankirina amatorî û seretayîbûnê neçariyeke; ev, dibe ku êşeke pêşketinê ya wisa be û jê xwe dan aliyekî ne mimkûn be. Derbaskirina wê, bi xwe gihandin, tecrûbe û zêdekirina zanînên teorîk dibe. Em di qonaxa derdorên amator de ku li wir fikrên şoreşgerî dest pê kirine nû nû derkevin, hewl dide fikrên hene bi şikleke dereng mayî hêdî hêdî fêm bike ûjiber xwe pêş dikeve, jiyan nakin. Me di nav beşên civakî yên cur bi cur de xebata îlegal-legal meşandiye, bûne şahidê curên çalakiyên çekdarî yên şexsîû girseyîû me kar û xebata profesyonel meşandiye. Eger ev weke tecrube û*

*ezmûnan werin dîtin û werin lêkolînkirin, nikare were gotin ku em bêtecrube ne. Dibe ku hin heval ji ezmûn û tecrubeyên şexsî bêpar bin. Lê divêji bo xweji şaşîû kêmasiyên ji aliyê tevgerê ve hatine tesbîtkirin encam derxe û bibîne ku her bûyera tê jiyîn îfadeya sentezên ku di encama bi pîvanên rast hatin ceribandinê de hatine bidestxistin in.*

*Ev nêzî sê sal in xebatên teorîk bi xebateke zêde û piralî tê meşandin. Ev xebat ne ku bi şikleke nebes û kêm, fêrîteoriyêbûnêdimeşe. Berevajî, lêkolînkirina ceribandinên zanista Marksîst-Lenînîst û têkoşînên rizgariyêbi sîstem û bi berfirehî, qonax bi qonax hatiye kirin û di her qonaxê de programên li gorî wê hatine pêkanîn. Sedemeke girîng ku dihêle nêrîna polîtîk berfirehtir bibe jî, li cihên cuda cuda gerîn û cihên cuda dîtin e; ev derfet çêbûye û em bûne şahidê pêkhateyên rêxistin û têkoşînê yên gelên din, perwerdeya teorîk û pratîk a hunera şer ku di encama keda gelek mirovan de hatiye sîstematîzekirin hatiye dîtin. Tevî vê em nikarin qebûl bikin ku perwerdeya me xelas bûye. Ji ber ku têkoşîn timî şert û mercên nû diafrîne, her pêvajo pirsgirêkên cuda derdixe pêşberî meû ji bo pirsgirêkên nû pêwîstiya bi taktîk û rêbazên nû derdixe meydanê, di hemû pêvajoya têkoşînê de,perwerdeya me, wê nekareweke ku hatiye temamkirin were hesibandin. Her ku kompleksbûna têkoşînêû zehmetiya erkên pratîk zêde bû, pêwîstiya bi xebata teorîk wê hê zêde bibe û xebata teorîk wê di wê astê de pêş bikeve. Lê dema ku pirsgirêka perwerdeya teorîk bi şert û mercên demê fêmkirinêû li wezîfeyên wê xwedî derketinê hatin şênberkirin, nebesiya li gorî şert û mercan tevger kirinê, aliyên me yên li gel kadroyê Partiya proletarya û şervantiya rizgariya neteweyî re nakok in bi vî şiklî xwe nîşan didin:*

**Berpirsiyariya Teng**

*Kêmasî, pir caranli gel beşeke girîng a hevalan li pêşberî xebatên rêxistinîû polîtîkayên giştî bêberpirsiyariyê helwest û axaftinên bi vîşiklîpêş ketine;* 'bi qada wezîfeya min re têkiliya wê tineye'*an jî '*hin kesên din berpirsiyar in'*. Ev kes, berpirsiyariyê tenêdi çarçoveya wezîfeya xwe ku li pêşberê berpirsiyarin de teng digirin dest an jî şexsiyeta kesên berpirsiyar teng digirin dest.Ji xebat û pêşketinên ku rasterast wan eleqadar nakin dûr disekinin û jê re çavên xwe dineqînin. Bi piranî sedema ku didin pêş ew e ku naxwazin îradeya kêsên berpirsiyar binpê bikin. Ev rewş çavkaniya xwe ji fêmnekirina feraseta rast di mijarên weke di nav pêkhateya rêxistinê de têkiliya parçe û giştî bi hev re, ji şoreşê berpirsiyar bûn û li pêşberê şaşitiyan mudaxale pêşxistinêan jî li ser bûyerên heyî fikirîn û hêza helwest pêşxistinê di xwe de nedîtinê distinê. Xeta polîtîk a partiyê ya rêxistinîû pratîkî ji aliyêîradeya piraniyê ku*

*di kongereyê de gihiştiye hev, dibe biryar û endamên beşdarî kongereyê dibin, li pêşberî xeta li vir pêş ketiye berpirsiyar in. Ev endam wexta ku biryar tên pêkanîn jî, bi çalakiyên xwe bêşdarî vê pêvajoyê dibin. Ji ber vê yekê pêwîst e hemû aliyên pratîkê bişopîne; li pêşberî nebesiyan û şaşitiyan bi hestên berpirsiyariyê tevgerîn, pêşketinên hindur û derve ku biryarên partiyê yên polîtîk û pratîk eleqadar bike şopandin pêdiviyeke serwextbûna polîtîk e. Berjewendiya Partîû têkoşînê jê heye ku her endam ji organên jorî xwe re li ser yekparetiya Partiyê nirxandin, rexne û pêşniyarên xwe pêş bixe. Şoreş, ji aliyê girseyên ku zehmetiya wê bi zanebûna xwe têgihiştine ve tê meşandin; partî ku hêza pêşeng a meşandina şoreşê ye, ji kesên ku ji bo çareseriya pirsgirêkên şoreşê hewl dide û giraniya wê li ser milên xwe hîs dike, ji beşên herî dînamîk, herî hişyar û herî bijarde pêk tê. Kêsên ku endamên partiyekê ne ji bo ku îdealên şirîk pêk bînin hewldanên şexsî pêşkeş dikin. Rêxistin ku hewldana şexsan bi şiklê çalakiya giştî rêk û pêk dike, her çendî ji ber pêwîstiya karbeşiyê wezîfedariyên taybet derxistibe holê, pêwîstiya bi koordînasyon ûrêvebireyêû hebûna organên merkezî afirandibe jî, ji ber vê pêkhateyê nayê maneya ku rola berpirsiyariya şexs nemaye. Berevajî, tê maneya ku hedef ew e ku berpirsiyariya şexs hê manîdar û zêde bibe, bigihîje asteke bilind a afirîner. Pêwîst e neyê jibîrkirin; berpirsiyariya wezîfedariya taybet, ji xebata memurên ji rêzê yên di nav burokrasiya dewletê de ji bo debara xwe ya rojane xebatê dimeşînin cuda ye. Şoreşger ji beriya her tiştî ji şoreşê berpirsiyar e. Tiştê şoreşgeran dike berpirsiyarê wezîfeyeke taybet, girêdayina wan bi şoreşê re ye. Wê demê ji ber berpirsiyariya li pêşberî partîû şoreşêû pêwîstiyeke girêdayîbûna ji bo şoreşê, ji bo ku ew bi şiklekî herî baş werin parastin û jiyan bikin rêgeza merkezparêziya ademî (ademî-merkeziyetçilik)ku şiklê hewildana şexsî ye pêwîst e were pêkanîn.*

*Divê ji mudaxileyê ev were fêmkirin; bêyî ku asta wê wezîfeyê li ber çav were girtin li dij feraset û helwestên şaş berjewendiyên partiyê parastin, tiştên ku bawerî pê heye di wan de feyde heye pêk anîn û ev tişt dan kirin. Eger mudaxile di çarçoveya rêgezan de were çêkirin, pêşî li tiştên neyînî yên ji berê de hatine hîskirin û hê negihiştine asta xetereyê tê girtin; na eger ne di çarçoveya rêgezan de bi şiklê reaksiyonên serasera were kirin, ji rewşên berewajî re rê vedike, kesê ku mudaxile dike û pê re rû bi rû dimîne ji vê zererê dibîne û li şûna ku bibe sedema sererastiyê dibe sedema tevliheviyê. Pêwîst e di civînên berpirsiyar de, şaşî, bi sedemên wê re were eşkere kirin û ji bo ku were derbaskirin pêşniyarên di cih de were kirin. Eger berdewam bike, rewş têîzahkirin û di wextê de ji bo organên jor weke rapor tê şandin. Li şûna vê, hin heval bêrêbaz li dijî vê derdikevin. Û tevî ku ya rast diparêzin,*

*şaşitiya di şiklê dijî derketinê de, di encamê de wan dixe rewşeke neheq. Her wiha, mudaxile, dibe çavkaniya aloziya zererê dide erk ûtêkiliyên hevaltiyê. Hin heval li beranberê neyîniyên zêde ku berê xwe nadin şexs û qadên wan ên wezîfeyê, bi xweşbîniyeke zêde zêde bêhelwest dimînin. Dema ku zêdegavîrastî wan tê wê demê dikin qîrîn û hawar û li ser navê partîû gel bang li her kesî dikin ku werin hewara wan û ji bo şerê pîroz ê ku dimeşînin alîkarî dixwazin. Ev, nîşana şirîk a kesayetiya bêxem û muhefezekar e. Ferasetên girêdayî partîbûnê lê berpirsiyarî ranekirinê jî di nav xwe de nakok in. Li gel hin hevalan ev feraseta şaş, wekî rewşeke taybet heye û tê domandin.*

## Pratîka Hemalwarî Ya Teng

*Alimandinên xebatê yên ji dema derbasbûyî hatine girtin, li cem gelek hevalan tên parastin. Eşkere ye ku pratîkeke nezindîû bêperspektîf wê bêberhem be. Têkoşîn riyek ku çarçoveya wê timî berfireh dibe û bilind dibe dişopîne. Di xebatê de ji monotonbûnê ber bi piralîbûnê, ji amatoriyê ber bi profesyonelbûnêû ji çarçoveyeke teng ber bi qadeke berfireha xebatê tevgerîn, merhaleyeke pratîk ku diyalektîk jê re dibe sedem e.*

*Em bûne şahid; li Kurdistanê di şert û mercên ku gelek nakokî li ser hev kom bûne, çewisîn û dagirkeriyê jiyan li beşên civakî yên kedkar herimandiye de bi ajîtasyon ûçalakiyeke di asta sînordar de girseyên gel bi heyecaneke mezin rabûne ser piyan. Ji ber ku di demên derbasbûyî de girseyên gel bêtecrube bûn û bi zordariya eşkere ya dijmin re di vê astê de rû bi rû nemabûn, bi çavsoriya ku çavkaniya xwe ji vir distend zêde zêde di demên derbasbûyî de ketibûn liv û tevgerê. Lêîro girseyên gel bi qasî demên derbasbûyî ne bêzanebûn in: zehmetiyên têkoşînê jiyîne û bêrehmiya dijmin careke din jî dîtine. Tecrubeyên têkoşînê kariye qebiliyeta hest û çavderiyên rast pêş xistinê bi wan bide qezenckirin.*

*Sf 142'de ki Şiyar ve komuta Agit'in foto su.*

*Pêwîst e neyê jibîrkirin ku êdî weke berêbi çend axaftin û çend çalakiyên serkeftî bêyî ku bifikirin wê bi hezaran mirov li pey me neyê. Girseyên gel êdî xwe gihandine wê astê ye ku xebatên rast û şaş, şoreşgeriya bes û nebes di bin derbeyên dijmin de ji hev derxe û kî xwediyê wê hêzê ye ku dikare jê re pêşengî bike, zanibe. Girseyên gel dixwazin hêza pêkanîn û meşandinê ya kêsên ji wan re diaxifin bibînin; asta ji hev girtinê ya axaftin û çalakiyê didin ber hev. Ev pêşketin e; ji ber ku tê maneya xwedî*

*derketina li pirsgirêka xwe û li benda çareseriyê ye. Hewldanên teng û paşde mayî yên pê dernaxin ku mesafeya di navbera pêşeng û girseyên gel de evqas kêm bûye, bila di çi astê de enerjiyeke zêde tê xerckirin were xerckirin jîwê di asteke nebes de werin pêşwazîkirin. Ji ber ku girseyên gel di aliyê polîtîk de kûr dibin, pêwîst e di aliyê wezîfeyan de jî mezinbûnek çêbibe. Kadroyek ku bi xebatên berfireh û kûrtir dibin ên rêxistinîû pratîkî re bi karên sînorê wan diyar û zeîf û ji rêzê ye re qîma xwe tîne wê nekaribe têkoşînê pêşve bibe; wê nekaribe rêxistin rola ava kirin û parastina rêxistinê bibîne û bendewariyên gel pêşwazî bike, hê jî zeîftir bibe û dest pê bike paş bikeve û di encamê de wê ji bûn kadro û yanî ji bûn hêza rêvebirû hêza pêşeng a têkoşînê dûr bikeve. Di rewşa îroyîn de erk û wezîfeya herî hêsan jî bi şert û mercên şer bicihanînêû li gorî rêgezên wê tevger kirinê, dikare were biserxistin. Xebata propagandayê ya herî ji rêzê jî, pêwîst e di vê astê de were bicihanîn. Propagandaya were kirin, bêyî ku bi şîdetê bi xwedî bibe wê nekaribe xwe bigihînehedefa xwe û dîsa yekeya herî biçûk a rêxistinê beyî ku ev amûr were bikaranîn nekare were parastin û were berfirehkirin. Eşkere diyar e; bêyî ku şîdet û propaganda jî bi terzeke rêxistinî were meşandin, nekare cewhera qeweta me were pêşxistin û nekare rêxistina Partî, gel û hêzên çekdarî were avakirin. Ev hemû, îfadeya çi ne? Nîşan dide ku awayên cuda yên têkoşînê ketine zikhev. Destnîşan dike ku wezîfe û erk bi şiklekî hê zêde şidiyayî li hev hatine girêdayin. Têkoşînek ku xwe gihandiye van taybetmendiyan nîşan dike ku pêwîstî bi wezîfeyên berfireh û piralî heye; yanî pêwîstî bi kadroyên kêrhatî yên xwediyê agahî, tecrube û azmûnên piralî heye. Ev, şervanê rizgariya neteweyî ku îfadeya xwe di kadroyên polîtîk-leşkerî de dibîne, hêza vê ya rêxistinkirin û pêşeng e. Li gorî me gengaz e ku ev hemû taybetmendiyên hatine diyarkirin li gel hev û di yek kesî/ê de bêne dîtin. Ji bo ku nebe ti sedem tineye. Bi fêmkirina zanista ku rê nîşan dide, bi encam derxistina ji çalakiyên xwe, bi derxistina zanebûnê ya cesaret û fedakariyê, bi zindî girtina di mejiyê xwe de ya îdealên xwe, mirov dikare timî vê biafirîne. Gelek kadroyên Partiyê xwediyê wan tecrube û perwerdeya dewlemend e ku dikarin pê xwe bigihînin van taybetmendiyên hatine diyarkirin; neçar in li ser esasê berxwedana bêhempa tevger bikinû ji vê jî hêz ûîlhamê distînin.*

*Gelek heval bi enerjiyeke mezin xebatên pratîkî dimeşînin, lê belê bêyî ku asta berhemdariyê dîqet bikin û bêyî ku li ser pêkanîna hedefên stratejîk-taktîk ku armanca xebata rojane ye, bi awayekî cidî baweriya xwe pê tînin ku xebatên pir mezin bi ser dixin û li ser vê esasê bi xîreteke mezin dixebitin. Lê belê weke tekela arabayê ku bi lezeke mezin dizivire lê ti car pêş de naçe, ketiye nav gerekêû li dora xwe dizivire tevdigerin. Bêyî ku fêm bikin çi tişt ji bo çi tê kirin dixebitin. Pêşiya xwe*

*nabînin, pêşeroja xwe nizanin, bi şiklek ku ketiye nav nedera xebata pratîkî ya rojane, dem û enerjiya xwe vala xerc dikin. Plan çênakin, li gorî girîngiyê karên xwe naxin rêzekêû texmîn nakin ku wê çi tiştî kengê bikin, têkiliya wezîfeyan bi hev re çi ye fêm nakin û her wiha ji bo ku xwe bigihînin hedefên xwe, gavên destpêkê navêjin. Pratîkeke bi vî şiklî digihîje ku derê? Dîsa wekî ku me di pratîka xwe ya derbasbûyî de dîtiye, gêjbûn û paşketin çêdibe. Rêgez tên jibîrkirin, bi ber bayê jiyana bêrêgez dikevin; bêaramîû hêrsokîbûn pêş dikeve. Nebûn yek li gel hevalan dibe rewşeke asayî. Sedemên sernekeftina jênerev a di xebatên xwe de bi xwe re nabîne. Dest pê dike derdora xwe sûcdar bike. Gilîû gazincan dike ku jê re derfet nayê dan. Dixwaze bibe xwediyêînîsiyatîfê. Eger qada wî/ê ya xebatê nav gel be, dibêje "ev kêrnayên" û xwe jê dide aliyekî. Xiyalên mezin dike û wezîfeyên biçûk nikare bi ser bixe. Ecz û çavtirsandî dibe. Di dawî de dikeve rewşek ku pêwîstiya wê/î bi alîkariyê heye. Korbûna van hevalên ku dikevin vê rewşê, dibe sedem ku mejiyên wan bisekine, ew bêkêr bibinû baweriya wan a bi wan têk diçe. Tempoya têkoşînê zêde yeû li wan derbas dibe, pêş de pir pêş de diçe. Ji van hin kes di bin vê herikînê de diperçiqin. Beşek ji yen ku ji perçiqînêrizgardibin, dema ku tevliheviya di mejiyên wan de bi dawî dibe, li xwe difitilin û xwe di ber çavan re derbas dikin, bi kêmasiyên xwe dihesin û hewl didin ku xwe nû bikin. Beşeke din jî, xwe bi xwe difikirin ku wan di demên derbasbûyî de gelek zehmetiyên têkoşînê kişandine, di destkeftên hatine bidestxistin de roleke wan a diyarker heye û psîkolojiyeke wekî ku ber dilê xwe bi demên xwe yên ciwantiyêxweş bikin, ji ber bîranînên wê demê ji xwe razî ne dijîn, timî behsa bîranên xwe yên demên derbasbûyî dikin. Ji esareta bîranînên xwe, xwe nadin aliyekîû şert û mercên tê de dijîn nabînin, ti car nakevin ber zehmetiya fikirandina li ser pêşerojê. Bi sekna serbilind a kesên piştî ku karekî mezin û girîng kirine, bawer dikin ku bêhna xwe vedanheqê wan e zêde zêde dilrehet in.*

*Li aliyê din, hêzên berpirsiyar ên şoreşê, dest pê kirine xirbeyên demên kevin bi ser hev ve bînin û nexweşiyên ku dibin sedema xirabûnê teşhîs kirine û dest bi tedawiyê kirine û ji bo ku xwe bigihînin rewşeke bi tendirustî serî li hemû rêbazan didin. Di vê de bi biryar û hêvîdar in. Ti astengî nas nakin. Her tiştî ji nû ve digirin dest. Bi coşa kêliya destpêkê ewirên wan li asoyan digerin û hesabê gavên werin avêtin dikin û hewl didin ku her kesî ji vê re bikin şirîk. Sekinîna di mejî de ya ku xebata hemalwarî ya teng bûye sedem, bi qasî ku hin kes nekaribin tiştên tên kirin bibînin û mane bidinê, wan kor û bêmereq û bêlegerîn bike.*

*Tewdîra li dijî alimandina xebata hemalwarî ya teng, bi pêşketin şopandinê, karîn bi analîzeke objektîf bûyêr şîrove kirinê, ji bo ku jiyana rojane û mijûlahiyên*

*rojane di çarçoveya planê de werin meşandin bi qebîliyet û çarçoveyeke fikrî qezenckirinê dibe.*

*Divê çareseriya her bûyerê, her kar û serkeftina rojane bi terzek ku karibe xizmeta armancên dema pêş bike were bidestgirtin. Pêwîst e armanc ew be ku derdorên propagandayê çêbike; derdor bibin cihê kadro derxistinêûkadro jîrêxistinê biafirîne. Divê weke pêpilkên hev dişopînin ên merdîweneke saxlem, pêşketin timî pêk bên. Xeta ku were şopandin bi tempoya xwe ya qonax bi qonax û bêyî ku dawî lê were, bi şiklekî ku paş de û pêş de diçe lê dizivire, lê belê zêde zêde berhemdar û nirxan diafirîne, astengan têk dibe tê domandin. Pêwîst e her çalakî di nav girseyên gel de bibe sedema çêbûna sempatiyê; karibe sempatî bêveguherandin alîkariyê. Divê potansiyela alîkariyê jî bi qasî ku asta hêza şer û rêxistinî di aliyê hejmar û kalîte de zêde bike were bilindkirin. Xuya ye ku ti kar û xebat demên dûrûdirêj ji bo hemanarmancêû yekalîwê nekaribe were meşandin û di hin qonaxan re derbas bibe. Wê ji bo her qonax û merhaleyê jî, li gorî taybetmendiyên wê cih û demeke wê ya diyar hebe. Kadroyekî/e ku bi vê perspektîfê naxebite, eger di kîjan qonaxê de dest bi xebatê kiribe timî di nav wan sînoran de bi şikekî cemidîû atil dimîne. Di nav sînorên tê de ye de hin tişt bi ser xistibin jî, nikare wezîfeyên din diyar bike û di nav bazinekî teng de her li dora xwe difitile û tê de asê dimîne. Di van şert û mercan de dest pê dike, hêz û enerjiya xwe xerc bike. Ya destpêkê, nikare qadên xebatê yên duyemîn tesbît bike û destkeftên xwe yên berê di tiştên nû afirandinê de nikare bi kar bîne ûwê ji serkeftin û destkeftan encamê nestîne. Bêprogramî; nikare ku biryar bide wê li ku derê, kengîû çi tişt were kirin. Nikare tesbît bike ku di kar û xebata wî/ê de rêjeya serkeftin û neserkeftinê çi ye. Rêbazan tesbît nake, nikare rêbazên bifeydeû bêfeyde biceribîne, dibe sedema alimandinek ku ji nirxandina berfireh bêpar e. Ev alimandin di xebatê de belawelabûnêû bêtewdîriyê, di polîtîkayê de xwediyê pêşdîtin nebûnê, di têkiliyan de ji rêzêbûnêû paşverûtiyê temsîl dike. Kevneşopiyên wekî; di jiyanê de misrûfbûnê, li pêşberê pirsgirêkan bêeleqadarî, di erk û wezîfeyan de terzeke 'çawa lê hato' diafirîne û pêş dixe.*

*Program çêkirin têrê nake, hemû keramet ji vê hêvî kirin dibe sedem ku şexs ber bi rewşeke atil û neçalak biçe, bibe kesek zimandirêj ku axaftinên mezin dike lê nikare di pratîkê de bibe xwediyê van axaftinan. Di vê mijarê de Lenîn vê dibêje; '*…axaftinên hê kêm mezin û hê zêde karê rojane… kesên ku bi xebata xwe ya berhemdar a bi her şiklî her astengê derbas dike, diguhere, eger zêde negirîng jî be bi misogerî her karê ku dest pê kiriye xelas dike…'*Terzeke xebatê ya bi vî şiklî dibe sedem ku planên tên çêkirin pêk werin.*

*Plansaziya hedefan çêkirin û ev plan bi çalakiyên rojane yên aktîf gihandina hedefa wê, yekirina du terzên xebatê ye; eger yek bêbicihanîn û ya din were îhmalkirin, yekalîbûnek ku bêmaneye pêş dikeve. Encam neserkeftin e, li pey jî têkçûn û jirêderketin tê.*

## Ders Dernexistina Ji Ceribandinan Û Doxmatîzm

*Derbara xeta ku têkoşîn wê li ser pêş bikeve û awayên têkoşîn pê were meşandin, di encama lêkolîna qanûnan de texmîn tên pêşxistin. Ev texmîn, taslixek ku di nav de liv û tevger çêbibe derdixin meydanê. Wexta ku çalakî tê lidarxistin, gelo ev taslixên derketine meydanê jişert û mercên şênber re çiqas destdayîne,çiqas tên ceribandin û rastbûn û şaşbûna tiştê tê fikirîn têîsbatkirin. Rastiyên ku di pêvajoya ceribandinê de xwe ferz dikin weke formûl tên rêkûpêkirin û di fikirîna taslixên nû de weke materyal tên bikaranîn an jî yên hene tên bihêzkirin, tên dewlemendkirin.*

*Her rewş û bûyer nakokiyên taybet ên ku ji bo wan diyarker in dihewînin, di cih û şert û mercên cuda de, rewşên cuda nakokiyên cuda nîşan didin û cudahiya van rewşan bi lêkolînên berfireh û analîzên kûr dîtin girîn e. Her wiha bi qasî wê, ji bo pirsgirêkên ku ew dibin sedem rêbazênçareseriyê yên taybetdîtin jî girîng e. Li gorî vê rêbazê diyalektîkê, rastiya demekê, dibe ku di demeke pêş de şaş be. Ev, qanûna ku di her kêlîû her şert û mercê de derbasdarbûna tiştekî ne misoger e. Hin heval, wexta ku rastiyên şênber lêkolîn dike, bûyer û pêşketinan dinirxîneû ji bo ku di derxistina nexşereya ku rê nîşanî wê/î bide de nekare van rastiyên ku di teoriyê de tên zanîn bi kar bîne an jî nikarin li ber ronahiya van rastiyan pratîka xwe ya jiyîne, lêkolîn bikin û ceribandinên xwe teorîze bikin. Ji ber ku nikarin vê bikin jî, çavgirtî dikevin nav pratîkê an jî nikarin bi alîkariya agahiyên teorîk agahiyên xwe yên kêm, kûr bikin û bi şiklê ku wê tecrubeyên wan ên kêm li her cih û şert û mercê bi kêr werin xwe dixapînin, li feraseta tecrubeya teng asê dimînin.*

*Ji bo mirov karibe derbara qadên xebatê de planeke xebatê ya rast derxe, divê mirov bi rasterast bikevenav qadê, bi lêkolînên ku bûyer û diyardeyan zelal dikin rewşên nediyar daxe asta herî kêm û ji bo ku xwe bigihîne encamên ceribandînî çavdêrîû livûtevgera xwe ya herî hêsan bi şiklekî rastşîrove bike.*

*Ji bo ku mirov karibe di lêkolînan de xwe bigihîne nirxandin û tesbîtên objektîf, şert û merca tê xwestin ev e. Kêmasiyeke me ya girîng ku di rabihuriyê de hebûye û hê jî dem bi dem tê dîtin, bi alîkariya agahiyên nehatine îsbatkirin ên serasera û subjektîf girtina biryaran e. Pirî caran pratîkên şaş ên ku çavkaniya xwe ji vê distînin hatine pêşxistin û encamên berewajî hatine bidestxistin. Di destpêka karekî de*

*derxistina planên xebatê yên li gorî rewşa heye, ji bo ku kar bi şiklekî rêxistinkirî bimeşin rêgezeke dest jê nayê berdan e. Ev gava destpêkê ye.*

*Ya duyemîn, di merhaleya pratîkê de hesibandin û liberçav girtina hin faktorên hindur û derveku berê nehatine dîtin, pê nayê hesîn an jî ji ber pêşketinên paşê çêbûne ûderketine meydanê, eger hin rewşên van ên ku bi hin beşên planê re nakok in hebin, ev beş li gel beşên bi rastiya heyî re li hev dikinguherîn, heta eger xwediyê wê taybetmendiyê bin ku her ku plan pêş de diçe bi tevahiya planê re nakok bikevin, wê demêwê hewce bike ku planeke nû were amadekirin. Bi xebata destpêkê ya li ser planê hatiye kirin qîma xwe anîn, li ser rewş û bûyerên paşê çêbûne bi şiklekî nazik û baldar çavdêrî nemeşandin tê maneya bi şiklekî çavreş tevger kirinê. Ya sêyemîn; divê li dawiya her gava tê avêtin rêjeya destkeft û serkeftinê were tesbîtkirin. Eger ya tê armanckirin nayê bidestxistin divê sedemên wê werin lêkolînkirin û rêbazên di pratîkê de tên bikaranîn di ber çav re bêne derbaskirin. Bêyî ku kêmasî an jî şaşitiya di rêbazê de were dîtin pirî caran nekariye ku hesabên rast li gel rêbazên rast were yekirin; eger hatibe dîtin jî bêyî ku were guherîn, demeke dirêj hewldan çêbûye ku kar bi heman rêbazê were domandin. Di plankirina kar û xebatê de bi qasî rêbazê, wext jî faktoreke girîng e. Tesbîtkirina wexta rast, ji qelîteya (kalite) karê ku were kirin, ji şiklêtêkiliya li gel hedefên din a karê ku were kirin tê derxistin. Eger di wê wexta ku tê tesbîtkirin de xwe gihandina armancê pêk neyê, dibe sedem ku wezîfeyênji vê bi şûn de bên pêkanîn dereng bimînin û ji bo ku hêza dijber bikeve liv û tevgerê derfet çêbibin. Dibe ku ji bo demekê di aliyê ku tê plankirin de pêşketina me were astengkirin û em naçer bibin paş de bikişin. Bi vî awayî ji ber ku pirsgirêk nayên çareserkirin, dibe sedem ku li ser hev kom bibin. Tevî zagonên wan, şert û mercên objektîf fêmkirin û çêkirina planan spartina vêû di qonaxa pêkanîna planê de di çarçoveya rêgezên hatine diyarkirin de liv û tevger domandin, encama xebitîna bisîstem a mentiqa xebata pratîkî ye. Gelek kar û xebat, bêyî ku ev rêgez û qural werin dîqetkirin hatine meşandin. Qural, dibe ku nehatibin fêmkirin û fêrbûn. Eger kesê bi vî karî re mijûl dibe, çalakiya xwe weke tecrube bibîne û bi şiklekî rexnekarîû lêkolînê nêz bibe, di asteke diyar de wê xwe bigihîne hin destkeftan; ji destkeftan xwe bigihîne analîzên hê berfireh û kûrtir. Bi vî awayî, dest pê dike ji tecrûbeyên xwe encam derxe û wan tê bigihîje. Tecrubeyên xwe yên dewlemend dide hev û xwe digihîne doxtrîneke rast.*

*Hin heval, tevî ku tecrubeyên wan ên piralî hene, nekarîn van binirxînin û di xebata xwe de sîstemekê çêbikin. Ji ber ku nikarin li ber ronahiya têgînên teorîk ên razber (soyut) tecrubeyên xwe ronî bikin, nikarin têkiliya teoriya ku dixwînin li gel pratîkê çêbikin, bêyî ku hêza xwe ya teorî lêkolîn kirin û maneyeke pratîkî danê zêde*

*bikin, jiberkirina wê pêş dixin. Di encam de jî, heval nikarinfaktora kuperwerdeyêûzanîna di encama tecrubeyê de tê bidestxistin li gel zanîna teorîk bike yek. Nikarin ku tiştê dixwînin fêm bikin. Ji derveyê duyan dibistaneke perwerdeyê ya din tineye. Kesê ku her du zanistan bi hev re nagire, neafirîner;lê belê bi temamî dibe kesayetiyeke doxmatîk. Bêyî ku bi temamî xwe bigihîne zanebûna diyardeyan wê tevbigere. Nikare bi fikra xwe riya xwe diyar bike ûînîsiyatîfa xwe bi kar bîne. Lê têkoşîna şoreşgerî, li esasê afirîneriya serbixwe pêş dikeve. Kes, li derdora ku lê bikaranîna îradeya xwe serkeftinên mezin bi dest dixe. Kesek ku nikare bifikire da ku çi li ku derêû çawa bike, tiştê jê re tê gotin serasera fêm dike û bêyî ku derkeve derveyê wî qalibî timî bi şiklekî cemidî li benda talîmatên ji jor ve werin disekine. Her çendî karibe tevger bike jî,nikare ji bin barê ku ketiye bin bi serkeftinê derkeve, timî şaş û bi kêmasî dixebite û nikare şaşiyên xwe di ber çav re derbas bike; ji ber ku nikare rêbazên sererastkirinê peyda bike di hewildanên xwe de zeîf dimîne û dîsa bi destwerdana fermandar, xwe komî ser hev dike û gav diavêje. Lê belê di dawî de heman encam xwe dubare dike. Organîzasyonek bi kesayetiyeke endamên bi vî şiklî ne dikare ava bibe û ne jî dikare wezîfeyên xwe tesbit bike. Pêkhateya rêxistin û têkoşîna me, ji destpêkê pê de ji binî de bi pêkhateyeke bi vî şîklî re nakok e. Ji ber ku em şer dikin û bi taktîka gerîla tevdigerin. Gerîla tê maneya zanebûn, afirînerîûînîsiyatîfê. Timî navendparêziya fermandarîmutleq bi tena serê wê qebûl nake, hê bêhtir divê bi gerîla re qebîliyeta bi şiklekî serbixwe xebitînê hebe. Civaka me bi girêka nakokiyan hatiye dorpêçkirin. Ev tevlihev û di zikhev de ne. Ti ji van ji ya din cuda nayê fikirîn, yek li ser ya din rasterast û nerasterast bi bandor dibe. Gelek mutefîqên rasterast û nerasterast ên dijminê me hene. Lêtimî cih û helwesta wan ne yek e, yên dibe ku werin kontrolkirin hebin. Polîtîka û taktîka dijminê me piralî ye. Ji aliyê pisporên ku karibin ceribandinên dij-şoreşên cîhanê kurt vebijin ve bi şiklê plan û program tên rêk û pêkirin. Psîkolojiya civakê heses e; li pêşberê bûyeran hişyar e. Têkoşîn şer e, şer zehmedû kompleks e, êrîşê divê, parastinê dixwaze, pêş de çûn û paş de kişînê dixwaze, timî manewra heye. Şer pevçûneke girseyî ye; çalakiya girseyîrêvebiriya şexsîû rêxistinî di asta herêmîû giştî de ferz dike. Rêvebirî, huner e û nazikî divê. Ev hemû, ferz dikin ku her şervan û kadro hişyar be ji nişkan ve û bifikire bersîva xwe bide.*

*Di dema derbasbûyî de zêde girîngî nedana xebata teorîk, bû sedema paş de mayinê. Niha gelek heval hewl didin vê rewşê derbas bikin. Hin heval ji bo ku vê kêmasiyê bilez derbas bikin bi can û dil xwe didin teoriyê. Bêguman e ku ev rast e û nîşana azmê ye. Ji bo ku mirov rêgezên zanista Marksîzm-Leninizmêfêr bibe, divê mirov hewl bide. Lê belê têrê nake, ya rast ew e kuem li ber ronahiya rêgezên zanistî, civak û şoreşa welatê xwe lêkolîn bikin û nas bikin. Ji bo ku doxtrîna teorîk bigihîje hedefa xwe pîvan ev e. Heval hene ku bi jiberkirina hin rêgezên di pirtûkên Marksîst de qîma xwe tînin û ji wan e ku bi vê, perwerdeya xwe ya teorîk temam kirine. Lê belê ti car xwe nadin ber da ku bi lêkolîn, rêbaz û uslubên xwe şert û mercên welêt tehlîl bikin. Hewldanên heyî, tevî ku pir baş tên pêşwazîkirin, ne di wê astê de ne ku alîkariyê bidin analîzên hene.*

'…Em teorîsyenên çawa dixwazin? Em teorisyenên wisa dixwazin ku pêwîst e karibin pirsgirêkên di nav herikîna dîrok û şoreşê de derketine meydanê li gorî helwest, perspektîf û rêbaza Marksîst û bi şiklekî rast şîrove bikin; pirsgirêkên Çînê yên weke aborî, siyasî, leşkerî, çandîû yên din bi şiklekî zanistî şîrove bikin û di aliyê teorîk de bigihînin asteke zelal.

Ji bo ku mirov karibe bibe teorisyenekî/e bi vî şiklî, pêwîst e mirov cewhera Marksîzm û Lenînîzmê, helwesta wê, nêrîna wê ya li gerdûnê, rêbaza wê fêm bike û bi sedema ku di pirsgirêkên Çînê yên pratîkî de analîzên kûr û zanistî pêş bixe û mijarên bûne pirsgirêk kifş bikevê bi kar bîne.' (Mao)

*Kesê ku tenê qîma xwe bi jiberkirina teoriyê tîne, nikare cewhera tiştên dixwîne fêm bike ûpiştî ji demekê koma pêyvên di bîrê de dimînin ji bîr dike. Jiber kirin dibe sedem ku di aliyê pirsgirêk çareserkirin û bûyerên polîtîk şîrovekirinê de zêde zeîfîû lewazî çêbibe. Hin rêgezên di bîrê de mane bi şiklekî doxmatîk tê şîrovekirin û pirî caran jî, bêyî ku were fêmkirin tê çi maneyê, bêyî ku bûyerên pê re rû bi rû dimîne piralî werin lêkolînkirin, bi lez û bez di çarçoveya rêgezan de teşxîsek tê kirin lê ev teşxîs ji zelalkirina bûyerê pir dûr dimîne.*

*Hin heval di pratîkê de awayê tevgerîna di çarçoveya prensîbên xwediyê rêgez de, şaş fêm dikin. Rêgez, ji bo ku diyarde derkevin meydanê riya helwest, perspektîf û rêbazên rast nîşan didin. Di vê maneyê de, eger rêgezên ku rê nîşan didin li gorî armancê neyên bikaranîn, bi awayê komeke têgînên bêmane, zûha û razber bêkêr dibin. Li gorî taybetmendiyên xebatê, bi prensîbeke bi awayê rêgezên guncaw (uygun) tesbît kirin û ew weke stûnên sîstema ku were avakirin bi kar anînê bi rêgezan dest bi kar kirin, di xebatê de dan jiyîn û encam bi rêgezê pênasekirin, bi wê bi dawî kirin xeta çalakiya pratîk e. Rêgez, li vir amûrek e, ku bi şiklekî rast tevgerînê*

*pêk tîne. Wexta ku lêkolîn û analîz tên kirin jî, li gel rêgezên ku weke amûr werin bikaranîn armancên ku weke formulasyon xuya dikin in. Peyda kirin û weke formul bi rêkûpêkirina rêgeza ku armanc e, di encama lêkolîn û analîzê de tê kirin. Li şûna vê, bêyî dîtina karê ku armanca karê pratîkî ye, tenê rêgez bi şiklekî jiber dane pêş, ew ji nav xebatê dernexistin, naxweşiya "rêgezperestiya" bêmane ye. Ev ê bibe timî li ser wan axifîn, pesna wan dayin, bi wan şabûnê û lê belê li aliyê din jî xistin rewşa pêlîstokên kêr nayên. Di lêkolînê de, ji bo ku formûla lê tê gerîn were peydakirin, li şûna piştî ku vekirin û kûrkirina mijarê temam dibe formûl dayin pêş, bi ew formûl weke serenav rêkûpêkirinê dest bi karkirin; dibe sedema bêyî ku ji razberiyê ber bi şênberiyê daketin çêbibe, bi şiklekî bêmane nivîsandin û axaftin çêbibe.*

*Rêgezên heyî parastin, ew weke kevneşopî lê kirin tê maneya xwe gihandina zanebûna şoreşgeriya bêtawîz. Lê belê ev nayê wateya ku timî û li her cihî û bi şiklekî qebe, bêyî ku li guncawbûna kêliyê were dîqetkirin bi awayên nayê guherîn ev ê were pêkanîn. Rêgez, bi dijwarî parastin têrê nake; ew bi şiklên wê yên piralî, parastin, bi misogerî bicihkirin û pêkanîn, bêyî ku tawîz were dayin bi girtina dîqetê ya şert û mercên rewşa tê jiyîn bi esnekî (esneklikle) xwe gihandin armanca ku tawîz jê nayê dayin esas e. Pir zêde hatiye dîtin ku bi rêbazên şaş, tiştê ku dibe armanc hatiye wenda kirin. Ji bo ku ev rêgez werin parastin bi ecemîtî hewldayin, tê maneya zerera herî zêde dane rêgezan.*

***Ferasetên Subjektîf û Sekter***

*Di hin yekeyên rêvebir ên Partiyê de hin helwestên şaş ku ji fêrbûna xebata bêrêxistinî çavkaniya xwe distînin, di demên dawiyê de xwe gihandine heya asta mêylên subjektîf û sekter. Bi pêkhateyeke rêxistinkirî ku bi hewldanên nirxdar ji demeke direj e vir de amadekariya wê dibe, bêyî ku bi şikl û amûrên nû paş de kişan çêbibe, ji bo ku bi pêş de gav were avêtin wexta wê hatiye. Ev wext, serdemeke avaker e ku esasên hedefên pêş ên tên plankirin tê danîn, dibe ku bi saxlemî an jî bi pûçbûna xwe, di asteke bilind de pêşeroja têkoşînê bandor bike. Ev serdem, serdemeke wiha ye ku hesas e û şaşitî qebûl nake. Bêyî ji şaşitiyên hevalên ku wê bibin rêvebirên rêxistina ku hewl tê dayin di serdemeke bi vî şiklî de were avakirin re çav were girtin. Divê em li dijî van şaşitiyan têkoşînê bidin. Ji ber ku di demên bi vî şiklî de zererên ku ev şaşitî wê bidin, ji yên her demê zêdetir bin, têkoşîna li dijî wan, qatekê hê girîngtir dibe. Ji ber ku di têkiliyên rêxistinî de cih û rayedariya kes di nav yeke an jî grubê de di asteke herî bilind de ye. Ji ber vê yekê, kesê ku rêvebir e eger weke ku li ser grubê xwediyê heq e tevgerîbe, pêwîst e weke berhema feraseteke şaş*

*ku bi helwesta şoreşgerî û têkiliyên rêxistinî re nakok in were fêmkirin. Kesê/a ku dibe xwediyê helwesteke bi vî şiklî, bêyî ku li pêşberî mirovên ji wan re rêvebirî dike bi berpirsiyarî tevbigere, ji bo ku her tiştî bike azadiya bêsînor ji xwe re weke heqekî rewa dibîne. Bêyî ku hesab bike ku yên li gel wî/ê pê re heman armanc û berpirsiriyê parve dikin, weke kesên ku hin karên hêsan dikin wan dibîne, fikrên wan napirse, nake şirîkî biryarên xwe û pêwîstî pê nabîne ku hesabê bide. Ev tê maneya nirx nedayina kadroyan. Tê maneya bi wan bawer nekirinê û ji bo pêşketina wan derfet nedanê. Wê demê, wê rêxistin bi kê û bi çi awayî were avakirin, gelo wê bi kesên ku ji ti tiştî agahiya wan tineye, ji bo erk û wezîfeya ku wê bistîne nikariye xwe amade bike, li pêşberî tiştên hatine kirin timî bêdeng maye û baweriya wî/ê pê pêşneketiye rêxistin bê avakirin? Wateya vê ya herî zelal bêrêxistinbûn e. Gelo bi qasî ku neyê zanîn ku rêxistin ê bi kesên xwediyê kîjan taybetmendiyan in ve were avakirin, ev pirsgirêk kompleks û nediyar e? Li gorî me na. Ev, pirsgirêkek ku safî bûyî ye. Lê belê dibê ku bi şiklê alimandin domandina terza meşandinê ya grubê, ku kevin bûye û paş de maye, ji vê re weke sedem were nîşandan. Ev di serdema grubê de ji rewşa bêrêxistinî û taybetmendiyên din ên wê serdemê pêş diket û dibe ku di wê serdemê de bi xweşbînî hatiba pêşwazîkirin. Lê em ne di wê serdemê de û ne jî di şert û mercên ku em hewl didin hê nû ji wê serdemê derbasî şert û mercên rewşeke birêxistinî bibin jiyan dikin; da ku bi serdema ku nû dest pê bike re weke li hev nekirin û pê re nebûn yek were qebûlkirin. Me, weke pêvajo, qederekê ew serdem li pey xwe hiştin, lê hin taybetmendiyên ku wê serdemê bi me daye qezenckirin, Alimandin û kevneşopiyên ku di têkiliyan de belawela, fermanê didin û di aliyê fikirînê de bêxîret in, li ser me bandora xwe hişt; tenê me di aliyê şert û mercên ji derveyê me tê jiyîn de hin merhale dîtin û derbas kirin. Tê fêmkirin ku di aliyê fikir û helwestê de zêde pêşketin tineye. Feraseta ku hakimê mutlaq ê her tiştî ye û her tiştî dizane, bilî xwe kesî nas nake û muxetab nagire; îrade û înîsiyatîfa kolektîf li aliyekî datîne, ji derveyî xwe ji her kesî qural û îtîatê hêvî dike. Lê biqasî ku nekaribe ev feraset ji nedîtî ve were û ji qamê zêdetir xuya bikin û bi hêsanî ji aliyê her kesî ve werin dîtin merhaleya ku dest pê kiriye ewqas stewyayî û berfireh e. Kesên ku em îro pê re dixebitin, ne di asta girseyên paş de mayî ku rastî û şaşitiyan ji hev dernexe de ne: kadroyên Partiyê yên birêxistinkirinê ne. Ne komeke kesên ku ji her tiştê tê kirin re dibêje 'erê', nikare bifikire û ji heyranên dildar pêk tê; hêzeke rêxistinê ya wisa ye, ku dikarin bi zanebûna xwe bûyeran çareser bikin, bi nêzîkbûneke rexnekarî li diyardeyan binêrin û ji rê û rêbazên xebata rêxistinê agahdar in. Hebûna herî nirxdar û çavkaniya hêviyê ya Partî û gel in. Her rêvebir û berpirsiyarê yekeyê neçar e ku weke hevalên xebat û wezîfeyê li*

*kadroyan binere û li gel xwe cih bide wan. Wexta wezîfeyê, diyarkirina hevalê ku pê re kar bike pirsgirekek pratîkî ye. Hevaltiya kar, bi kolektivîzma xebat û biryaran, bi pratîzekirina têkiliya karbeşî û di karbeşiyê de jî înîsiyatîfeke şidiyayî di jiyanê de û ahenga wan bi hev re çêkirinê şênber dibe. Hemû biryar, têkilî û pêkanîn bi xwespartina mafê rêvebiriyê û bi şiklê ku kesî ji vî tiştî re neke şirîk xwe tengkirin, li ser navê navendperestiyê navendperestiya demokratîk di asta jor de binpêkirin e, ruhê demokrasiyê ji binî de xeniqandin e. Merkez, organa bi erk û berpirsiyariyê hatiye rayedarkirin ku ji kesên dikarin di qada xwe de înîsiyatîfê bi kar bînin an jî ji taybetmendiya yekirinê ya yekêyên rêxistinê rewşa rêvebirbûnê derdixe ye. Kesê ku berpirsiyarî, rayedarî û wezîfeyan tenê li gel xwe kom dike û pê bawer dike ku ev tenê kerametên wî/ê bi xwe ne, wê nikaribe ti yekeyeke rêxistinê ava bike. Li gorî ku wê ti yekeyên rêxistinê nebin jî, wê merkez bibe tenê ji xwe re merkez. Rêjeya berhemdariyê ya kadroyan, ji aliyê qebîliyeta birêvebirinê ku wê şert û mercên jiyanî ku qebîliyet û perspektîfên wan berfirehtir bike tê amadedikin. Riyeke berfirehkirina qebîliyet û perspektîfan jî bi kadroyan bawer kirin û ew wezîfedarkirin e. Pêwîst e ji bo ku kadro wezîfeyên xwe fêm bikin biqasî ku têrê bike daxwuyanî bê dayin û ji bo ku kapasîteya wan derbas neke were dîqetkirin. Bi plan dest bi kar kirin, berhem kom kirin û encam derxistin û ji bo ku sîstemekê rênîşaner ava bikin ku karibin di dawiya pêvajoyên xebatê de pratîka xwe bi kurt û cewherî bînin ziman, dibe sedem ku ew heval bi fêmkirinê karê xwe bikin û şaşitî nekin.. Dibe sedem ku bi dîqet û nazikî tevbigerin.*

Sf. 156 foto

*Bêyî ku bi çalakiya xwe ya rênîşanêr ji kadroyan re bibe mînak û bi helwestên xwe yên ku wêrekiya wan zêde bike, alîkarî bide wan kadroyan, bi şiklekî serasera, timî bi hin karan re mijûl bûyîn dibe sedem ku hem di xebatê de û hem jî di wan de berhemdarî kêm bibe. Di xebatên ku hewldan heye bi vê rêbazê werin meşandin de ji kesê ku bi serkeftinê û meşandina xebatê hatiye wezîfedarkirin mukemelbûn hatiye hêvîkirin. Ji ber ku berhema hatiye hêvîkirin nedaye û li pêşberê kêmasiyên biçûk eczî çêbûye û carcaran ji me hin kes helwestên dilhiştinê û sekter raber dikin. Beyî ku tengbûn û kêmasiya xwe bibîne, sedema neyînîbûnê di têrê nekirina xwe de bibîne, bi sedemên hêsan kadro hatine sûcdarkirin, bi şiklekî qebe û bêsebir ji bo şaşitiyan destkarî çêbûye. Kesê ku li pêşberê vê bêrêbazî û qebetiyê şaşitiyan dike, li şûna ku xwe rast bike ketiye rewşeke psîkolojîk ku xwe bi xwe re sînordar kiriye, di biryar*

*stendinê de bi dudilî, di aliyê pêşniyar pêşxistin û rexnekirinê de çavtirsandî tev bigere. Kesên ku bi vê psîkolojiyê zindîbûna xwe wenda dikin, helwestek ku di aliyê wezîfe û berpirsiyarî girtinê de bêdil, ji rêvebirên xwe nerazî, li pêşberê pirsgirêkên rêxistinê bêeleqadar e pêş dixin.*

*Kêmasiyên cur bi cur ên kadroyan, di nav xebata pratîkî derdikeve meydanê. Tiştê ku kadroyan bi her aliyên wan ve dide naskirin, bi xwe çalakiya rêxistinî-pratîkî ye. Pratîk wan diceribîne, eynikek e ku aliyên wan ên erênî û neyînî nîşan dide. Nebesî û kêmasî dîtin, nayê wateya ku taybetmendiyên wan ên bihêz tinene, tenê tiştê bi kêmasî dîtin û tiştê baş paşguh kirin, wê bibe nirxandineke yekalî. Ev jî dibe sedem ku li pêşberê kadroyan nêzîkbûneke subjektîf pêş bikeve û ji bo helwestên sekter dibe çavkanî. Weke ku di her diyardeyê de pêk tê timî bi misogerî dualiyên dijber li gel hev cih digirin û hebûna wî tiştî pêk tînin. Ji bo her du faktorên dijber, derxistin meydanê û ya baş bihêzkirin, serî li her riyê dan, helwesta rêvebir a ku girîngî û nirxa kadroyan fêm dike ye.*

*Pêkhateya zêde zehmedû kompleks a partiya me, dikare bibe sedem ku di destpêkê de hin kêmasîû zeîfiyên kesan neyên dîtin lê dewamkirina wan a demeke dirêj nayê bexişandinjî. Pêwîst e di xebata pratîkî de çavdêriyeke rast were kirin ku karibe şaşitiyên çavkaniya xwe ji qebîliyet, tecrube û pirsgirêka hesasbûnê digirin ji xeteriyên bi zanebûn ên weke kariyerîst hîzîbperestû ferasetên rastger û çepger in ku heyîna rêxistinê ji xwe re kirine hedef derxe. Divê li pêşberî her duyan şiklên helwest û tewdîrê jî cuda bin. Ji ber pirsgirêka fêmkirina pratîka kompleks di aliyê rêbaz ûhelwestê de şaşitî pêş dikevin. Riya derbaskirina van şaşitiyan, li şûna ku diviyabû bi şiklê ji bo kesên ku şaşitiyan dike ya rast bihata xuyakirin an jî bal were kişandin ser ya rast, bi helwestên bihêrs ên ku ji ber xwe ranegirtina ji tengbûnê çavkaniya xwe distîne, tê gotin 'ev, riya saxkirina nexweşan e'û helwestên ne li cih tên raberkirin.*

*Ji rêvebirên ku kadroyan perwerde nake an jî kadro dernaxe xebateke erênî nayê hêvîkirin. Xebatên erênî, ji aliyê kadroyên ku bi taybetmendiyên erênî xwe kemilandine û bi rêvebiriya rast tê nîşandan. Rêvebirek çiqas xwediyê qebîliyetên xurt be jîû çiqas polîtîkayên rast diyar kiribe û biryarên rast dayibe jî, eger kesên pê re girêdayî ne bêkêr bike, bi bêplaniya xwe, bi nexweşiya xwe ya bêmane ya pêşengî kirinêû bi helwestên xwe yên qebe û bêrêz, ev paşverûtiya di terza xebata wî/ê de wê wî/ê bike kesek ku ya heyî belawela dike, ji hev dixe.*

*Di hin rêvebiriyên yekeyan de li şûna ku rêbazên xet û talîmatên Partiyê pêkanînê pêyda bikin, nexweşiyên bûn lîder demeke dirêj bûye sedem ku xebat şaş were meşandin û bi xwe mijûlkirinên ji rêzê wexta heyî vala derbas bibe. Li şûna ku awayên*

*çareseriyê yên pirsgirêkên demê ji taybetmendiya rewşê derxe, hewl hatiye dayin ku bi riyên tên zanîn û bi şert û mercên wê demê re nakok in ve were çareserkirin.*

*Polîtîkaya giştî ya Partî ya derbara pêşerojê de, bi xwespartina rastiyên rewşa objektîf, hewldanên kesan ên ku çavkaniya xwe ji wê distînin û bi hesibandina encamên ku ji wan hewldanan pêş dikevin, tevî şikil û çarçoveyên wezîfe û pirsgirêkên taybet ên demên stratejîk-taktîk, diyar dike. Rêbaz û amûrên li gorî taybetmendiyên van, li gel yên esasîû talîeşkere dike û weke rênîşanêr pêşkeşî kadroyan dike. Pêvajoya objektîf ku polîtîka li ser wê esasê di jiyanê de pratîze dibe, heya ku guherînên nû yên bingehîn pê re çênebin, wê weke xeta têkoşînê ya rast ku naguhere bê qebûlkirin.*

*Eger pratîk û pêkanîn ,ji bo ku xeta hatiye diyarkirin bi amûr û şiklên hatine pêşdîtin pratîze bikin, xizmetî xeta esasî ya ku hatiye diyarkirin bike û wê bike diyardeyeke madîwê rast werin hesibandin; û li aliyê din yên ku xizmeta vê nekin jîwêşaş werin hesibandin. “Serkeftinên” ku ji bo demekê bi heybet û şatafat bin lê belê di demeke dirêj de bi xeta Partiyê re nakok bin û destpêkê neyên dîtin lê paşê zererên wê xwe bidin pêşwê bibin “serkeftinên” ku kêr nayên. Heta biqasî fikara ku ji pratîkê encam bistîne hişyariya xwe ya heyî paşguh bike, ji ber ku bi bahaneya bi dîqet tevgerînê çavtirsandineke zêde jîwê bibe sedema derengmayinê, herî kêm biqasî ya din şaş e. Bi bahaneya parastina xetê, bi hesasiyeteke zêde ketin şaşitiya “hûr û kûr ajotin”ê, li şûna ku xebat bi amûr û awayên ku hatine pêşdîtin werin meşandin, li yên din geriyan tê maneya ku wê her ku biçe riyên ji derveyê xetêwê bêne ceribandin; ev jî helwesteke pasîf e ku di pratîzekirina xetê de çavtirsandî tevdigere. Dualîbûna ku pêş bikeve jî, bi aliyekî xwe bêbiryarbûna maceraperest û aliyê xwe yê din jî bêbiryarbûna bûn pasîfîst e û ya herî xirab jî ev e. Eger feraseta rast ku navbera her du helwestan e neyê qebûlkirin wê yek ji her du helwestan bibe serdest û ji rêderketina xetê vegere meylekêûwê yan qeweta heyî belav bike yan jîwê texrîbatên neyên sererastkirin çêbin. Şikil û amûr bi rêbazên guncaw û di cih û demênwê de bi karanînê gav bi gav pêş de çûn, li ser her gava tê avêtin demekê sekinîn û bi kûrahîû berfirehî ew bidestgirtin, qeyimkirin û wekî nuxteya gavavêtinê ew bikaranîn feraseta rast a pratîk e. Ev, nahêle qewetên me di heman demê de li ser qadên berfireh werin belavkirinê, derfetê dide ku em qeweta xwe biparêzin, pişta xwe bigirin saxlemiyêû pêşiya xwe vekin. Di dema derbasbûyî de ji ber ku neçar bû em polîtîkaya xwe di çarçoveya welat de bidin naskirin, li gelek deveran grubên hevalbendiyê hatine çêkirin. Di wan şert û mercan de ev şiklê xwe berfirehkirinê, hewce bûû rast bû. Di ser tesîra me ya polîtîk û girseya me ya berfireh re, pirsgirêka*

*daxwaza rizgariyê ya gel veguherandina şerê bi zanebûn di rojeva me de ye. Armanca me ew e ku em di kûrahiya gel de hêza wî ya dewlemend peyda bikinû derxin holêû li dijî dijmin bikin hêzeke çêkdar û bînin asteke xwediyê zanebûn. Pêwîst e di qadên ku xizmeta vê armancê bikin de destpêkêtaktîka me ya destpêkirina pratîkê bi awayê zêde hewldayinê be.*

*Dibe ku di van deman deoperasyon û kontrolên kûr û hûr ên dijmin pêş bikevin û bi astengiyên me re rû bi rû nemînin, karibinqeweta me bi xetereya îmhabûnê re rû bi rû bihêlin. Ji ber vê yekêîxtîmal heye ev bibe sedem; ji alîkariya merkez bide hevalan, ku bi vê alîkariyê wezîfeya xwe bi şiklekî çalaktir bimeşînin, heval bêpar bimînin.*

*Li kîjan qadê dibe bila bibe, heya ku li gel organên berpirsiyar têkilî dewam bikin, ti yeke an jî kes ji derveyê talîmatên Partiyê, nikare wî heqî bi xwe re bibîne ku jixweber hin 'taktîk'ên orjînal kifş bikin û bêyî ku erêniya organên rayedar ên Partiyê bistînin, bi şiklê talîmat rêkûpêk bike; Nikare li ser navêînîsiyatîfa afirîneriya serbixwe ferq û cewaziya rewşên taybet weke sedem nîşan bide û biryarên ji aliyê kongre û merkezê ve hatine girtin biguhere.*

*Di derketina weke partî de yek ji sedemên sereke, navendparêziya tund e. Axaftinên weke 'di pratîkê de dibe ku ferasetên cuda pêş bikevin', li şûna navendparêziyê, xwesteka hewldanên sernuxumandî yên jiyana xweser bicihkirinê ye. Bi berdikeve ku mirov bi dîqet li ser van axaftinan bisekine. Eger em bi nêzîkbûneke hê bi xweşbînî van axafinan lêkolîn bikin em ê bigihên encameke wiha: fêmnekirina xeta partiyê bi tevahî an jîbêparbûna ji qebiliyeta ku ew di şert û mercên taybet de pratîzekirinê. Ji kîjan aliyî derdikeve bila derkeve, ev mêyl li dijî rêgezên rêxistinê ye û zererê dide.*

*Her rêvebirê rêxistinê tê maneyê dînamîzmê, kesek ku hêza xwe ji îrade, rastbûn, ji zanista ku jê guman nabe û ji baweriya serkeftinê digire, ji her tiştê ku pêde diçe encam distîne, ji heqê her astengê derdikeve, bi kokê xwe girêdayî bi dîrokê ve ye û bi berhemên ku afirandiye dibe malê dîrokê. Rêvebirek ku bi pirsgirêkan bi terzekî hêsan digire dest ûbi pêşketinên ji rêzê çêkirinê qîma xwe tîne, nikare were gotin ku ew têkoşînêbi cidiyet dimeşîne. Xebatek ku ne di xizmeta şoreşê de ye,weke ku parçeyek ji hedefên stratejîk e nameşe û ji bo ku xwe bigihîne van hedefan hewl nade bêqîmet e ûwê ti maneya wê nebe. Demên dûr û dirêj bi heman terz û tempoyê, weke ku ji bo pêdiviyên demê nebe bersiv li pey hewldanên ji rêzê xirikandin çêbûye. Ev hevalên ku ji wan e,bi vê karên pir mezin kirine û bi vî awayî xwe dixapînin, helwestên ku ew bêkêmasî ne û rexne qebûl nakin pêş dixin. Bêyî ku kêliyekê jî karê pê rabûye binirxîne, ji nav erkên giştî cihê wan diyar bike; pirsgirêkên ne ecîl kirine rojev û bi*

*sedema vê yên din hatine paşguhkirin. Ji ber ku karê pê re mijûlbûn çêdibe nayê biserxistin,piştî mijulahiyên dûr û dirêj ev hatiye ferqkirin; li meydanê, tiştekî berkeftîû şênber tineye. Pirsgirêk li gorî rêza girîngiya wan nayên tesbîtkirin. Ji ber vê yekê di pratîkê de mijûlahiyên bêmane pêş dikevin. Di encam de, ev rewş dibe sedem ku derfet ûqeweta li gel rêvebir e berhewa bibe. Rêvebirek ku nikare qewetû derfetên bi şiklekî amade jê re hatine dayin ji bo afirandina qewetû derfetên nûbi kar bîne û bi yên nû teqwiye bike; ne ku wê bibe hêza meşandin, hêza afirandin û pêşenga têkoşînê lê tenê dibe mamûrekî/e nekêrhatî ku kar bi rêve dibe.*

*Bêyî ku bi awayekî rast tiştê pêwîst e were kirin were jihevderxistin, ti tişt bi şiklekî sererast nayê pêkanîn. Eger jihevderxistin bi karbêşiyê were temamkirin, dibe ku di heman demê de gelek xebat werin kirin. Rêvebirekî/ê ku nikare di karbêşiyê de biqasî ku hêza wan têrê bike, xebatê li ser hevalan belavbike nikare xebata kolektîf pêş bixe. Wê di bi giraniya karên ku neçar e bi tena serê xwe bike de biperçiqe an jî ji ber ku ji neserkeftin û têrê nekirina karan re rê vedike wêbibeberpirsiyar.*

*Bêyî ku di xebatên xwe de têrê kirin û asta serkeftinê bi armancên esasî yên ku pêwîst e xwe bigihîne wan re pêşberê hev bike û asta wan bizane, bi baweriya ku karên mezin dike, rapora xebatên hatine meşandin, hatine rêkirin û agahiyên ji rastiyê dûr hatine dayin û organên jorîn ên rêxistinê hatine xapandin. Rapor amûrên wisa ne; merkez bi alîkariya van (rapor), dikare nirxandinên rast bike û ji van encaman biryarên rast derbixe, xeta rêxistinên jêr diyar bike; bi van birêveçûna rêxistinê qeyimtir dibe. Kadro, rêvebir an jî yekeyên ku xebata meşandine ûtêkiliyên xwe bi hemû ziraviyên wan û di demên diyar debi şiklê rapor ranagihînin yekeyên jor ê rêxistinê, nayê hesibandin ku berpirsiyariya xwe ya li pêşberê rêxistinê anîne cih û erkê xwe pêk anîne. Ev rastî, mijarek ku Lenîn bi girîngîû israr li ser disekine ye. Lenîn di vê mijarê de vê dibêje; "tenêew dema rapor tên pêşkeşkirin ûtêkilî tên ragihandin, dikare were gotin ku endamê/a partiyê ku ji derdoreke diyar e erk û wezîfeyên xwe pêk anîne".*

***Bêquralî***

*Gelek caran, nikare were gotin ku em di gelek qadên jiyanê de bi şiklekî pir baş rêgezan diparêzin. Kêmasiya ku di vî aliyî de heyî, di bûyerên pratîkî de bi şiklekî hê zêde û hê bileztir derdikevin meydanê. Di hin grubên di tevgerê de bêdîsîplînîû girîngî nedayina qural û rêgezên meşê, xwe nîşan daye. Di vê merhaleya destpêkê, ku me qismî dest bi tevgerkirina rêkûpêk kiriye de, tê hesibandin; dîsîplîn, li gorî rêgezan*

*meş, têkiliyên hevalbendiyêû hevkarî bingeha yekîtî, moral û tevgera gruban e. Di van gruban de li ser van mijaran meşa pêwîst nehatiye kirin; sedema wê jî weke zor û zehmetiya ku heval pê re rû bi rû dimînin hatiye nîşandan. Ev ne rast e. Di roja me ya îro de şoreş bûye diyardeyeke pratîkî; kesên bi zanebûna xwe biryar dane ku wê bimeşînin, di nav çalakiyên pêş bixin de wê bi zehmetiyên dijwar re rû bi rû bimînin. Eger ev kes li pêşberî van zehmetiyan xwe ranegirin, tê maneya ku bi zanebûna xwe re nakok dikevin.*

*Dîsîplîna yekeya şervanan çavkaniya xwe ji armanc û wezîfeyên xwe distîne.Zanebûna mezin a yekîneya polîtîk di nav jiyan û pratîkê de bi şiklê rêgez pratîze dibe û ev jî dîsîplîna wê ya xwe bi xwe ye. Tiştek, weke kêrhatî be di fikir deqebûlkirin, eger di pratîkê de bi pratîzekirina wî tiştî neyê temamkirin, ev encam jê derdikeve ku yên difikirin li pêşberê berxwedêriya dijwar a bûyerên pratîkî bi bin ketine. Ev rewş jî bi taybetmendiya şoreşgeran a li pêşberê ti bûyeran çavê xwe neşkênandinê re nakok e. Şoreşger ew kes e; alîû berê bûyeran diyar dike, înîsiyatîfê bi dest wan ve bernade ûxwediyêîrade ye. Îradeya şoreşgerî xwediyê wê hêzê ye ku bi hêsanî di navbera xwe û her rewşê de hevsengî çêdike. Helwestên heya asta zêdegaviyê pêş dikevin ku rêkûpêkiya grubê xira dikin ên ji ber sedemên weke westîn, birçîtî, têhnbûn û hwd. pêş dikevin, dikare bi zora xwe nedana ser îradeyê, ji ber ecziya ku pêdivî dibin sedema pêşxistina helwesta devjixwe berdanê were îzahkirin. Rêgez û qebîliyetên ku ji bo grub û kesên şoreşger tên pêşdîtin, çavkaniya xwe ji taybetmendiya zor ûzehmed a têkoşînê digire. Li gel me maneya berbiçav a rêgez û qebîliyetên ku tevgerên birêkûpêk ûîradeya liberxwedanê dihewînin, berxwedan e. Ji bo ku rêgez timî werin jîndarkirin, pêwîst e berxwedan hebe. Qeweta zordestiyê ya giran a dijmin, di bin çewisîna derfetên pêşketîû perçiqîner de, dema şer meşandinê yekane qeweta ku em xwe bispêrinê, îradeya li berxwedanêû di çarçoveya rêgezan de tevgerkirin, ti car nayne wê astê ku em ji rêgezên xwe dev berdin an jî nermbûn nîşan bidin. Di ti rewşê de, bi sedem nîşandanê rêgezên tevgerkirinêûînîsiyatîf ji dest nayê berdan. Ev, rêgeza mitleq a gerîla ye.*

*Grubeke çekdar, di her kêliyê de bi xetereya ku bi êrîşên dijmin re rû bi rû bimîne dijî. Rewşên weke nexweşî, westîn û birçîtî dibe ku hin endamên grubê ji hal bixe, ji ber vê yekê; ji bo ku grub hebûna xwe bidomîne mercek jî, hevkariya mitleq e. Hevkarî, fedakarî dixwaze;ji bo berjewendiyên grubê di kêliyên wê yên zehmed de pêwîst dike kes ji hin pêdivîûxwestekên xwe derbas be; pêşdibîne ku pariyê xwe yê dawî bi hevalên pêwîstiya wan pê heyî re parve bike û yên dikevin erdê hilgire. Ev, girêdana hevaltiyê ya raser e ku di nav grubê de kesan bi şiklekî şidayî li hev girêdide,*

*di qada mirinê de ji hevalê/a xwe qut nabe û kokê xwe ji girêdan û baweriya bi şoreşê distîne ye. Bêguman e di seransera rê de li gel piraniya hevalan mînakên vê yên êrênî çêbûne. Lê belê, ji bo hin hevalan, li cihê ku hevkarî bihata pêşxistin, nikare were gotin ku wezîfeya dikeve ser milê wan pêk anîne.*

*17 Adar 1983*

Foto 168

**Heval Mehsûm Korkmaz An Jî Di Berxwedana Neteweyî De Partîbûn**

Analîza ku SerokAPO di Gulana 1986'an deli ser şehadeta fermandarê mezin ku di 28'ê Adara 1986'ê şehîd ketibû pêş xistibû:

*"Me, ji pêşengên qehreman ên gel û Partiya me heval Mehsûm di 28'ê Adarê de dema ku ala rizgariyê ya pîroz a gelê me hildigirt û kêmînên dijminê xaîn derbas dikir, şehîd da. Bibîranîna heval Egîd, tê maneyavegotina têkoşîna Wî, bi rastî jî yek ji lehengên sereke yên têkoşîna rizgariya me bibîranînû vegotina vê destanê. Mêtingerên Tirk ên bêhal mayîû pûçbûyî hewldan ku Wî bi navên weke 'celad û berpirsiyarê leşkerî yê PKK'ê, sekreterê HRK'ê' bidin naskirin û li aliyê din jîli gorî xwe weke ku derbeyeke pir mezin li PKK'ê dane vebêjin û Wîbiçûk bixin.*

*Lê divê dijmin pir baş bizane,* ***Ew, şûrekî tuj ê azadiyê yê gel û Partiya me ye****.*

*Heval Mehsûm di destpêka wan kesên pê bawer dikir,ku pêwîst e ew şûrê bêbextiyê yê bi sedan sal e di nîveka sing, zanebûn û dilê gelê me de hatiye çikandin were derxistin û di nav mejîû dilê dijmin de were çikandin. Heval Mehsûm û van kesan bi hewldan û kedeke bêdawî ev bawerî di şexsiyeta xwe da çandibûn û dîtibûn ku tênê dikare bi vê çekê gel were rizgarkirin.*

*Rast e; me, Ew kesê ku herî zêde navê lehengiyê heqê Wî ye û ji bo Wî me gotibû****şûrê hemdem ê gelê me,****rêberê xwe yê egîd, weke hebûneke fîzîkî, Egîdê xwe wenda kiriye.*

*Lê ma mirov dikare behsa mirin an jî wenda kirina kesên bi esil ku raborîû pêşeroja nijadpak a gelekî an jî çînên wî bi şexsiyeta xwe re kiribe yek, bike?*

*Heval Egîd taybetmendiyên gelê me yên pêvajoya rizgariyê ku wê di Partî, cephe û artêşê de werin jiyan kirin, zanebûna ku pêwîst e were bidestxistin ûîradeya ku pêwîst e xwe bigihîne asteke dijwar di kesayetiya xwe de îsbat kiriye; xwe gihandiye wê astê ye ku taybetmendiyên pêş xistiyeweke pîvanên pêwîst e werin girtin, pêşkeşî Partîû gel bike. Wî jiyana koletiyê ku weke çarenûsekê ketiye nav jiyana gelê me di keseyatiya xwe de tasfiye kiriye; kesayetiya xwe ya bihêz, azad û dilê her kesî dibijîne*

*xwe ku di nav pêngavên şoreşgerîde afirandiye, ji bo milyonan kiriye bangawaziya azadîû sosyalîzmê. Wî bi vê qîma xwe neaniye, ji bo ku van şexsiyet û taybetmendiyan bike malê gel şerekî mezin kiriye û ev di asteke girîng de bi ser xistiye. Wî di rêza pêş a mêşa xwe gihandina bêmiriniyê ya gelê Kurdistanê ku bi çeka partî, cephe û arteşê hatiye kişandin nav şer de cihê xwe girtiye.*

*Weke havalekî, Ew di dilê me û zanebûna me de bi zindîbûna xwe ya bêdawî tacîdar bûye; di nav gel û Partiya me de weke Serokû Serdarekî hatiye cihê ku jê re layiq. Em li pêşberêbîranîna Vî lehengê lehengan bi rêzdarîû hezkirineke mezin bejna xwe ditewînin; em dizanin em ê tenê karibin dema ku em hemû wezîfeya gel di nav arteşa rizgariyê de birêxistin kirin û xistinenav şer pêk bînin, deynê xwe yê dilsoziyê bi cih bînin.*

**Heval Egîd!**

*Belê, divê em Wî nas bikin û fêm bikin. Heval Egîd şêrîn e, heval Egîd wêrek e, heval Egîd fedakar e!*

*Divê em Vî hevalê şêrîn bi bîr bînin û lê bigerin. Bi taybetîhê di roja me ya îro de jî ew mîrasê dîrokî ku mirov ji ber ve tê şermiyê weke zincîrekê di sukr û lingê gelê me de ye, bi kesayetiyeke bi vî şiklî re hev naskirin, di nav tevgera ku Wî afirandiyê de cih girtin, bûn hevalê/a Wîû xwe gihandina mezinahiya Wî, neçariyeke weke nefes dan ûstendinê ye.*

*Dijmin dibe ku ji ber Ew qetl kiriye baweriya xwe pê bîne ku ji Wîxelas  bûye û ji vê kêfxweş be. Lê kî dikare li vê bawer bike ku rastî ev e?*

*Heval Egîd hemû hebûna xwe tevli rastiya me ya berxwedêriya neteweyî kiriye û xwe di nav de helandiye. Li pêşberê vê rastiyê, dijmin çawa dikare rehet tevbigere?*

*Çeteyên mêtinger ên Tirk pir baş dizanin ku her çiqas edebiyata serkeftina erzan ku di çapemenîû ragihandinê de dike hinekê bêhna wî fireh bike jî, rastî ew e ku, ji bilî tirsa wî ji mirinê li ber çavan raxe kêrî tiştekî din nayê. Ew ê, kê, çawa bide bawerkirin ku bi qetlkirina heval Egîd serkeftin bidest xistiye?*

*Qewetek ku ji 50 hezar kesî pêk têû hawîrdor tev kiriye kêmînên xaîn, kesekî qetl dike an jî eger komek şoreşger qetl bike;ev çawa dibe serkeftin?*

*Ev dikare kîjan serkeftin û şerefê bide rêvebirên artêşa mêtinger û rayedarên dewletê?*

*Ew çawa dikarin bi vê pesna xwe bidin? Eger mirov serî li şahidiya dîroka pêşverû bide,wê her kes qebûl bike ku maneya ji aliyê 50 hezar kesî ve qetlkirina yek kesî, di rastiyê de tê maneya ji aliyê wî kesî/ê ve teslîmgirtina 50 hezar kesî an jîîmhakirina 50 hezar kesî. Qîrên serkeftinê yên piştî ji qetlkirina heval Egîd, awayê herî manedar ê*

*binkeftina dijmin e. Ev rewş, mirov dikare li ser navê wan bêje, îtirafa rewşek ku mirov pê were şermê ye. Ne xwediyên kole, ne feodalan û ne jî artêşên burjuwazî di şert û mercên bi vî şiklî nehevseng de ketine şer û serkeftinên erzan ên bi vî awayîîlan kirine. Ev rewşa rezîl û ketî ku burjuwaziya Tirk di vê bûyerê de ketiye nav, ti car ji aliyê van çînan ve nehatiye jiyîn.*

*Ev 'yek' kes temsîla çi dike; aliyê dijber ê ku bi artêşa xwe ya pêncî hezarî şer dike temsîla çi dike?*

*Di kîjan şertû mercan de çawa hatine pêşberî hev?*

*Dema şer dikirin ji çi û kîjan derfetan sûd digirtin?*

*Ev, pirsên di wê astê de zor ûzehmed in ku pêwîst e pir baş li ser van pirsan were fikirîn û bersiva wan, pir baş were dayin. Dijmin dikare îdîa bike ku hedefekî mezin aniye xarêû pê bêhna xwe derxe. Lê ew bi vê, tenê biçûkbûna xwe îsbat dike ûîtirafa derbeya mezin ku xwariye dike. Berdevkên herî dawî yên destilatdariya Tirk ên di roja me ya îro de, bi artêşa xwe ya ku weke çavê xwe diparêzin, pir baş dizanin ku çawa hatine xistin nav vî şerîû çawa di nav vî şerê ku her saeta wî ji bo wan mirin û zor û zehmetî ye de roj bi roj çawa diqedin.*

*Vaye serkeftina herî mezin ev e.*

*Di dîrokê de gelek serhildanên ku gelê Kurd pêş xistine di bin navê ku 'serhildanê hovan in' de hatine çewisandin. Xwestin ku vê hovitiya xwe bi qilifê 'moderniteyê, şaristaniyê were rewakirin. Weke realîteyeke nexweş, piraniya wan serhildanan hatin çewisandin jî. Lê li Kurdistanê di dîroka nû ku bi xwîna Heqî, Mezlûm, Xêyrî, Kêmal, Mehmedan hatiye nivîsandin de cih û derfeta vê tineye*

*Niha, dîrok ji rastiyên pir cuda re şahîdî dike. Û ev rastî, bi şiklekî herî bêrehm li ser dost û dijmin xwe ferz dike. Niha dîrok jê re şahîdî dike ûîlan dike ku li welatê me, li pêşberê pêşengên şoreşeger an jî grubeke şoreşgeran artêş bi bin dikeve.*

*Rastiya ku di kesayetiya şehîdê şehîdan de tê ziman çi ye?*

*Heq, edelet li ku derê ye?*

*Bûyera Egîd, biqasî ku ti car nebûye, bi şiklekîeşkere bersiva van pirsan dide.*

*Di vê bûyerê de, Egîd dilekî ku di nav de gelekî ji milyonan pêk tê de cih bûyî ye; dijminê ku xwediyê derfeta artêşeke ji milyonan û derfeta teknîkî pêk tê jî, bi qasî ku bi pêncî hezar kesî ve êrîşê kes an jî grubekê bike rezîl û ketî ye. Di dîroka mirovahiyê de ev cur serkeftin pir kêm in. Di dîrokê de gelek şerên ku di navbera mezlûm û zaliman de di şert û mercên bêrehm de derbasbûnehene. Dîsa gelek serkeftinên ku mezlûman di van şert û mercan de afirandine hene. Lê şer û serkeftinên dişibin yên ku di kesayetiya van qehremanên berxwedanê de Partîû gelê me jiyan kiriyeû Partîû gelê*

*me afirandiye îstisna ne. Bêyî ku em bi fikar bin, em dikarin bêjin; têvî ku ji hebûnên xwe yên herî nirxdar yek wenda kiriye bi şehadeta Heval Egîd, gelê me, di nav dîroka xwe ya berxwedanê de yek ji serkeftinên xwe yên herî mezin jiyaye. Vê bûyerê bi şiklekî herî rasterast û herî biqewet nîşanî gelê me daye ku di asta şehadetê de mirov xwe çawa digihîne zîrveya azadiyêû banga ji bo vê ragihandiye.*

*Rastiyên bi destana berxwedana heval Egîd hatine derxistin meydanêû peyamên ku vê hilgirtine, bi qasi ku li seransera hemû pêvajoya me ya rizgariya neteweyî tesîrê bike destkefteke pir mezin e.*

**Di Dîroka Berxwedana Gelan De**
**Pêvajoyên Qehremaniyê**

*Pêvajoya berxwedan û qehremaniyê çi ye?*

*Ev pêvajo kêngîû çawa derdikevin meydanê, çawa tên jiyîn?*

*Pêvajoyên tarîû ronak ên dîroka mirovahiyê bi şiklekî şidayî bi hev ve girêdayî ne. Lê mirovahiyê ti car tarîbûn weke jiyaneke asayî qebûl nekiriye, timî pê re şer kiriye. Di pêvajoyên berbangê de demên tarî tên jiyîn lê hema di pey re Roja azadiyêdest bi ronî kirina hawîrdorêdike.Vaye di heman demê de ji van deman re pêvajoyên 'qehremaniyê' tê gotin. Hem di dîrokê de û hem jî di roja me ya îro de her gel bûye şahidê pêvajoyên bi vî şiklî.*

*Di çêbûna mirovahiyê de, di derketina meydanê ya sîstema qebîle û eşîrî de berxwedêrîû lehengî, bi roleke diyarker rabûye; weke du nirxên ku tesîra wan heya roja me ya îro karîne bidin berdewam kirin di jiyana gelan de timî hatine serbilindkirin. Eger gelek demeke dûr û dirêj di nav tarîtiyê de hatibe hiştin, ji binî de jiyana xwe ya azad ji dest dayibe û axa miriyan li ser çavan hatiber reşandin, ji bo ku gelekî bi vî şiklîbikeve xeta berxwedêriyê, bi misogerî pêwîstiya wî bi qehremanan heye. Qehremanî, heya roja me ya îro hema ji ber xwe nehatiye serbilindkirin û her wiha jê re rêz nehatiye girtin; hema ji ber xwe ji bo roman, şîr û stranan nebûye mijar. Ev bi temamî bûyerek ku di dîroka pêşketinê ya mirovahiyê de derketiye meydanê ya jênerev e. Di demên cuda de hewldan hatiye nîşandan ku ev diyarde bi şiklên cur bi cur were înkarkirin an jî were berowajîkirin; bi zanîna rola gel di dîrokê de, hatiye xwestin ku girîngiya vê were paşguhkirin. Lê têzên sosyalîzma zanistî yên dîrokê yên di pratîkê de hatine îsbatkirin, rolên girseyan û kes li hemberê hev dernexistiye; berovajî, di rizgariya kes, netewe û çînan de her ku diçe eşkere nîşan daye ku di hatina rewşeke serdest de bi rolên girîng û piranî jî bi rolên diyarker rabûye.Ev, bi temamî zanistî ye û rewşek ku bivê-nevê ji aliyê têkoşînê ve tê derxistin*

*meydanê ye. Lê beşên civakan ku timî di navberê de jiyana xwe domandine, nekarîne ku derkevin astên jor, ên xizmetkar û lîberal timî ev diyarde înkar kirine, îftira avêtine ser wê, bi maskeyên zanistî dan ber rûyên xwe û heta bi xwe avêtin ber bextê sosyalîzma zanistîû hewldane ku vê rastiyê biçûk bixin. Bi sûcdarkirinên bi şiklê 'maceraperestî', 'lehengiya ferdî'û heta bi sûcdarkirinên 'terorîzma ferdî' îro jîêrîşê vê diyardeyê dikin; hewl didin her wiha ser vê lîberalîzma kirêt û teslîmkar binuxumînin.*

*Karl Marks ku ji lehengên herî mezin ê dîroka mirovahiyê ye jî, hem jî li ser navê sosyalîzma zanistî ku berhema wî ye, bi van îdîayan ûîdîayên dişibin vê hewl hatiye dayin ku were tecrîdkirin. Lê belê gelo dikare rola van lehengiyên mezin di dîroka mirovahî,jiyana netewe, gel û çînênbindest de were înkarkirin?*

*Eger di dîroka civakan de ketîbûn çiqas kûr be, lehengî jî ewqas mezin e; ev qanûnekeobjektîf e. Ya ku vê rastiyê bi şiklekî herî bihêz nîşan dide jî sosyalîzma zanistî bi xweye. Ne tesadufek e ku hê di qonaxên despêkê yên peresîn (beridîn-evrim) civaka koledar de pêvajoya destanwarî ya Yewnanî dest pê kiriye. Ev pêvajoya ku paşê mohra xwe li şiîr, edebiyat û her ku diçe li pêkhatina neteweyîû çandê daye, tesîrek kûr ku heya roja me ya îro dewam kiriye afirandiye. Eger di çêbûna mirovahiyê de hebûna cihekî girîng ê şaristaniya Yewnanî rast be, dîsa di wê astê de rast e ku di vê de rola diyarker ya lehengiya Yewnan ku hê di wê pêvajoya destpêkê ya dîrokê de derketiye meydanê ye.*

*Di giştî de di çêbûna şaristaniya feodal de bi taybetî jî di çêbûna şaristaniya Îslamiyetê de jî pêvajoyeke bi vî şiklî ya lehengiyê hatiye jiyîn. Hz. Elî, çar xelîfe û sahabe sembolên pêvajoya lêhengiya wê ne. Helbet ev bi şiklekî serasera derneketine meydanêû navên weke 'şûrê Îslamê' negirtine ser xwe. Rola pêşverû ya ku van şûran di demên xwe de girtine ser xwe, tenê bi şikênandina pûtan ne sînordar e. Bi saya wan û bi têkoşînên ku wan jê re pêşengî kirine, têkiliyên paşverû yên ku ji aliyê pûtan ve dihatin temsîlkirin jî hatine têkşikênandin. 'Darê zorê, ji her civaka ku nû çêdibe re pîriktî dike'; ev qanûneke civakî ye. Li ser esasê vêqanûnê têkoşînên civakî ku hilnehatine cihekî sînordar û bi sedan sal heya li ser roja me îro bi tesîr bûne, li gelek qadan hewl didin ku bi xwespartina mîrateyên van were meşandin û eger li qadên şer hê ji navên wan û şûrên wan alîkarî tê xwestin, evnîşan dide ku lehengiya mijara axaftinê di çêbûna şaristaniyê de bi roleke bingehîn ê çawa rabûye.*

*Burjuwaziyê jî dema ku şaristaniya xwe çêkiriye pêwîstî bi hê kêm lehengiyê nedîtiye. Ev pêvajo bû pêvajoyek ku di her qadê de qehremanî herî zêde pêş ketiye û herî zêde rol lîstiye. Ev diyarde di qadên huner, siyaset û leşkerî de hate gihandin zîrveyê. Şoreşa franse ku hawîrdora wê bi monarşiyên Ewrûpayê hatibû dorpêçkirin,*

*dema ku wê gavê seriyê monarşiya Fransî ya ku ji monaşiyên Ewrûpayê ya herî li pêş bû di giyotînê de qut dikir, dikarîbû tenê serhildana xwe ya li hemberê hemû Ewrûpayêû her wiha li hemberê hemû şaristaniya feodal, bi pêngavên şoreşgerî bidana meşandin. Bi rastî jî, vaye ji ber neçariyeke bi vî şiklîpêvajoya lehengiyê ya Şoreşa Franseyê derketibû meydanêû pêş ketibû. Şoreşa Franseyê bi xatib, wêjewan, fikirmend û leşkerên xwe, xwediyê pêvajoyeke lehengiyê ya bi heybet e.*

*Şûrê vê şoreşê Napolyon e. Eger Napolyon hê jî di dîrokê de weke yek ji fermandarên herî mezin ê hemû demên derbsasbûyî tê bibîranîn, ev bi taybetmendiya wî ya bûn şûrê şoreşa bujuwazî ve ji nêz ve têkildar e. Ji ber ber ku, ew ne di pêvajoyeke ji rêzêûli pêşiya mirovahiyê deriyê cîhaneke nû vebûye de bi roleke ku pêşengiya kesên ev deriya vekirine rabûye.*

*Belê, ji bo ku burjuwaziya berdevkiya şaristaniyê dike bê ser hikum diviyabû ev şûr bihata kişandin û şer bihata kirin.*

*Û wiha jî çêbû.*

*Dema ku pêvajoya şoreşên proletaryayê dest pê kir, vê rastiyê careke din û lê hê manedarxwe xiste meydanê. Şoreşên proletarya ku taybetmendiya girseyî ya şoreşê di teorîû pratîkê de îsbat kir, maneya qehremanîû pêvajoya qehremaniyê jî dîsa bi şiklekî herî bi hêz li ber çavan raxist. Lehengên van şoreşan neçar bûn ku ji şaristaniyên koledar, feodal û kapîtalîst cudatir, bibin kesên temsîla berxwedêrîû zanebûna girseyan dikin, kesên ku berjewendiyên girseyan di keseyatiya xwe de sembolîze dikin, her wiha hem ew bi xwe bibin girse û hem jî bibin kesên pir zêde li pêş girseyan û wan bi rêve dibin.*

*Vaye lehengên proletaryayê Marks û Engels!*

*Vaye di aliyê teorîk û siyasî de dehayê wê Lenîn!*

*Û dîsa hostayên wê yên pratîkê Stalin, Ho Chi Minh û Mao! Û gelek qehremanên neteweyîû enternasyonalîst ku bi pêşengiya van têkoşîn meşandine û dimeşînin!*

*Bi rastî jî di dîrokê de cihê vanlehengên giranbiha, ku li dijî mekanîzmayên şideta emperyalîzmê, zanabûna azadiyê ya mirovahiyê rakirine ser piyan, bi rêxistin kirine û arteşên jê re 'arteşên gel' tê gotin afirandine, mezin e.*

*Li her devera cîhanê, navê Giap weke navê fermandariya leşkerî ya berxwedana neteweyîû teorîsenî û hunermendiya gelê Vîetnamê yê leheng, ku li dijî hêza emperyalîst a herî hov a roja me ya îro yek ji şerên herî dirêj meşandiye tê zanîn. Ev nav, hemû taybetmendiyên afirînerê artêşa rizgariya neteweyek ku mêtingeh e dubare dubare derdixe pêşberê me. Ev, biqasî hêzeke mezin a fikrî hêza dil jî bi şiklekî herî hunerî dihonîne û şênber dike. Giap fermandarê artêşbûna yek ji gelên herî feqîr*

*ên cîhanê ye; ku vê artêşê li dijî hêza dijminekî pir mezin serkeftineke mucîzewî, lê misoger bi ser xistiye.*

*Helbet biqasî nan û avê, bi van qehremanan pêwîstiya gelan heye. Belê, zemîna girse û çînî şert û mercek pêş a bi wî şiklî ye ku bêyî wê nabe. Lê belê bi kesên wisa yên xwediyê qebiliyet û têgihiştîpêwîstî heye ku bi hostatiya mîmar, mendizekî/êû bi kêrhatina hunermendekê/î vê bigire dest. Vaye, ev, pêşeng û rêber in. Yanî kesên ku bêyî wan nabe, pêwîst e bi misogerî bi rola xwe rabin, pêdiviyên qurala 'bêyî wê nabe' bi cih bînin leheng in.*

**Li Kurdistanê dîroka ketîbûnêû**
**pêdîviya bi qehremaniyê**

*Ev diyarde rastiyeke dîrokêû serdema me ye ku nayê paşguhkirin; li pêşberî vê diyardeyê, gelo gelêKurdistanê ku gelêherî kevin ê serdema ye lê belê hatiye jibîrkirin û welatê wî Kurdistan e di çi rewşê de ye?*

*Divê li Kurdistanê dîroka kêtîbûnê çawa were fêmkirin û pêwîst e pêdiviya bi lehengiyê çawa were fêmkirin? Karektera ketî ya ku hatiye afirandin, weke di her mijarê de bûye, dîroka me jî berovajî dike; di roja me ya îro de pêwîstiya bi lehengiyê bi şiklê 'anarşîzm, maceraperestî' bi nav dike. Dema ku em ji çarçoveya mirov pê tê şermê ya ji aliyê vê karektera înkarker û ketî ve tê diyarkirin derkevin ûhinekê hewl bidin  bi şiklekî mirovane dîrokê şîrove bikin, em li aliyekê bi tabloya Kurdistanê ya herîbêrehm a ketîbûnê re û li aliyê din jî bi tabloya Kurdistanê ku bi timî ji bo lehengiyê bang tê kirin re rû bi rû dimînin.*

*Ti tişt biqasî xwe xapandinê ne xeter e.*

*Ji ber vê sedemê, divê mirov zanibe ku bi şiklekî rast û cesûr li rastiyên heyî binêre. Li Kurdistanê dîrok ji ber gelek sedemên cur bi cur, dîroka çûyîna serberjêr e, dîroka ketîbûn û tarîtiya çav çavan nabîne ye. Lê her çiqas ev dîrok di vê astê de rastiyeke li gorî xwe, xweser û neyînî bîne ziman jî, ev, dîsa jî dîrokek e.*

*Gelê Kurd jî ji mirovahiyê beşek e. Lê belêeşkere ye ku li gel serdema me ti têkiliyên rastiya ku ew dijî tineye. Zimanê gelê me ne li gorî ziman û telafûza serdema me ye. Hêza wî ya fikrî, aborî, civakîû çandî bi serdemê re li ser heman xetê nameşe. Piraniya kesên ku xwe pêşverû dihesibînin, ji wê jî zêdetir tevî pêşverûû paşverûyên xwe, hemû fikirmendên wê xwe nadin ber da ku wî pênase bikin an jî nikarin bikin. Baş e, ev serdem çawa li vî gelî dinêre? Her çiqas rastiya wî evçend bêrehm be jîû dîsa*

*xwediyê jiyaneke di vê astê de bejî, eger ew gel û welatê wî hebe, gelo heqê wî yê bûn netewe, serbixwe û azad jiyînê tê xwestin û ji bo wê alîkarî tê dayin? Gelo asta alîkarîû derfetên tên pêşkeşkirin çi ye? Belê, ev hemû, pirsên êş didin vî gelîû endamên wî gelî yên ku difikirin e.*

*Hêza ku îro li ser serê gelê me kirine bela, îro bi alîkariya Roma û Neronê roja me ya îro welatê me kiriye zindan û jiyan li her kesî tarî kiriye. Generalên faşîst ku taybetmendiyên despotîk ên dîrokê hemû di şaxsiyetên xwe de şênber kirine, bi alîkariyên aborî, siyasî, leşkerîû çandîyên emperyalîzmê cihê xwe yê di nav sîstemê de qeyim kirine û li dijî gelê me hemû rêbazên ji serdema navîn mane xistine dewreyê. Li aliyê din Alayên Hamîdiyê yên bi navê qorîçiyên gundan, li aliyê din yekîneyên wî yên taybet, komando, hêzên bi êlekên ji pola û bi helokopterên xwe weke toriyan êrîşê ser gel dike; dest di destê emperyalîzmê de mekanîzmayeke çewisînê ya sîstematîk pêk tîne û hewl dide tevgera rizgariyê ya gel a neteweyîû hebûna gel tine bike. Baş e, li hemberê van hemûyan gelo 'dostên gel' çi dikin? Her çiqas bi êş jî be rastiyek e ku dostên vî gelî, zor û zehmetî dikişînin ku hebûn ûtêkoşîna vî gelî jî qebûl bikin.*

*Dîvê li hemberê vê rewşe çi were kirin?*

*Pêwîstiya gelekî bi vî şiklî, çi ye?*

*Helbet mejiyên înkarker, serasera, ketî, li gel tarîbûnê ne û dilên bêrehm nikarin bersiva van pirsan bidin û tineye jî. Ji ber ku ew di nav me de weke kes bigerin jî ti tekîliyên wan bi mirovahiya hemdem re tineye. Tenê di aliyê şikil de dişibin mirovan. Dîsa her çiqas cil û bergên xwe modernîze kiribin jî, ew, şaxsiyetên herî binalet in ku tarîbûneke ji tarîbûna serdema navîn hê kûrtir dijîn.*

*Kesên bi vî şiklî, dema ku axaftinên weke 'pêwîstî bi lehengiyê heye' dibihîzin dest bi gotinên weke 'maceraperestî, provokasyon , ajantî' dikin û bi dubarakirina van gotinan aqlê xwe diavêjin. Belê, ev kes bi rastî jî fêrbûne ku di tariyê de bijîn û vê weke jiyan qebûl bikin; tiştê ku li gorî berjewendîû şexsiyeta wan e ev e û ji ber vê yekê jî pir ji ronahiyê ditirsin.*

*Lê ji vê re bersiva me misoger e!*

*Gelekî evqaş hatiye xistin, biqasî av û hewayê hewceyî qehremanan e. Gelê Kurdistanê di ti pêvajoyên dîroka xwe de, bi qasî ku niha bûye, hewceyî vê nebû. Ev rewş tê fêmkirin û hem jî pir hêsan. Ji ber ku, gelê Kurdistanê, di dîroka xwe de evqas nehatiye xistin.*

*Belê, vî gelî di dîroka xwe ya kevin de jî pêwîstî bi lehengan dîtiye û hê di wan deman de dest pê kiriye gelek lehengên weke Rustem, Behrem afirandiye. Destana Kawa ku eciqandina seriyê Dehaq ji xwe re dike mijar ne ku vala hatiye nivisîn. Di*

*dîroka me de pir mînakên dişibin vê hene. Lê em dîsa jî dibêjin divêbi taybetîev serdem bi lehengî were jiyîn.*

*Dema em tê de dijîn, demek ku ketîbûn û tarîbûn herî hatiye zêdekirine. Demên bi vî şiklî tenê dikare bi berxwedanên qehremanî werin derbaskirin. Di şert û mercên neteweyîû civakî ku rewşa wan a objektîk di vê astê de hatiye xirabkirin de ne ku tenê bi karekterên înkarker, kole û giredayî bi hin kesên din ve nekare pirsgirêk werin çareserkirin, bi şoreşgeriyeke ji rêzê jî pirsgirêk nayên çareserkirin. Kesayetiya Kurd heya ku ti bibêjî hatiye xistin, di qadên weke çand, huner û hwd. de pir hatiye biçûkirin. Gelek kêrhatin û qebîleyetên gel hatine bêkêrkirin; ji bo ku nebîne, nebihîze û nekaribe biaxife çi hewce bike ew hatiye kirin. Vaye ji ber vê sedemê li Kurdistanê pêwîst e ku hêzeke pêşeng a mezin hebe. Ev ne pêdiviyeke ji rêzê ye, pêdiviyek ku jiyana gelekî diyar dike û şert û merca 'bêyî wê nabe' weke naçariyekê dide pêş e. Tevliheviya pir mezin û tarîtiya ku civak dijî, ji bo yên ku bi wezîfeya derbaskirina vê derketine meydanê mezinbûn û mukemelbûnê ferz dike. Ev wezîfe û erk bi karekterên ku hebûn û tinebûna xwe nade hisandin, roja xwe diborîne û dema pêş nabîne nikare were serxistin. Bîryara neheq ku vê serdemê ji bo welat û gelê me dayiye, bi karektereke kole, çi hêz dibe bila bibe bi şiklekî herî erzan li gorî berjewendiyên wê xwe diguhere, ji bo berjewendiyên xwe yên ji rêzê yên rojane statûyên koletiyê rewa dike, ji bo pirsgirêkên rizgariyê yên mezin û li benda çareseriyên radîkal in, bês dibînin ku bi propagandayeke herî kêm bersiv were dayin nayê derbaskirin. Bi rastî jî ev karekter yek ji sedemên bingehîn ê koregirêkên bi her awayî ye û ji bo ku hebûna xwe ya ketîû berjewendiyên xwe xelas bike, ji dîrok berevajî nîşandanê fikaran nake.*

*Karektereke ketî ya din heye ku ya rast herî karektera ketîû xeter ev e; tenê bi înkarkeriyê qîma xwe nayne, qaşo înkarkeriyê qebûl nake lê li ber çareseriyên radîkal dibe asteng û yanî eger gotin di cih de be ji bo nexweşeke/î ku bi amaliyatê sax bibe aspîrîn pêşniyar dike. Kêsên bi vî şiklî karekterên herî bêşerm û qerebelix, herimî, pîs û ketî ne. Li Kurdistanê zêde zêde ev karekter hene. Di nav civakê de bi şiklê kesayetiyên siyasetmedar û heta welatparêzû şoreşger, xwe nîşan didin. Lêêdî derketiye holeyê ye ku ev karekter, ew kesên in ku riyên nefes stendin û rizgariya civakê asteng dikin.*

*Baş e, tevî vê rastiya me ya neyînî ya neteweyîû civakî, çawa dibe li ser van axan û hem jî mezinahiyên bêhempa were afirandin; Mezlûm, Kemal, Xêyrî, Ferhat, Memed û Egîd ji dayik bibin û mezin bin?*

*Belê, ev ji bo kesên din weke rewşeke tevlihevûbêmane were jî, encameke xwezayî ku mirov nikare xwe jê bide aliyekî ya şert û mercên ku netewe û gelê me di*

*nav de ye. Li van erdên ku kêliyekê jî ji bo bi azadî pêş bikevin derfet peyda nebûne, hema ji ber xwe pêşketin çênabin. Wê demê, bêsînor mezinbûna hêza pêşeng ferz e ûqanûneke jiyanê ye. Tiştê ku asta pêşketinê ya pîvanên hêza pêşeng diyar dike jî ev e. Ji ber ku hemû pêkhate û pêşketinên civakê yên weke îdeolojîk, çandî, siyasî, aborîû leşkerî hatine înkarkirin û çewisandin, pêwîstiyeke wiha çêbûye ku hêza pêşeng piralîû di asteke pêş de pêş bikeve. Di vê civaka ku ti pirsgirêkên wê nehatine çareserkirin de, neçar e ew bibe hêzeke çareseriyê ya rastînî. Li Kurdistanê,mezinbûna kesayetîû pêşeng, bi temamî berhema îdeolojîû siyasetek ku ji vê neçariyê pêş dikeve û ji pêdiviyên doza rizgariyê ya gel ji berjewendiyên wê çavkaniya xwe digire ye. Li welatê me, bi yên ku dijîn û yên şêhîd bûne, derketina meydanê ya pêşeng û rêberên mezin helbet ne tesedûfek e. Eger were xwestin ku bêrehmiya rastiya objektîf, înkara mezin,biryara nikare were qebûlkirin a ku paşverûtîû serdemê di derbara vî gelîû vî welatî de dayî were derbaskirin, û li ser vî esasî jiyan were domandin û di cîhana hemdem de serbilind bijîn, bi misogerî pêwîstiya me bi pêşengên û rêberên mezin ku di şaxsiyeta xwe de xeteke îdeolojîk û polîtîk a rast a şoreşgerî pêk anîbin heye. Ji bo vê yekê pêwîstî bi pêşengên ji serdemê derbas dibin û ber û aliyê wê diyar dikin heye.*

*Ev, ne înkara serdemê ye.*

*Lê di şert û mercên Kurdistanê de tenê dikarebi afirandina pêşketineke bi vî şiklî, alîkariya serdemê bigihê doza mafdar.*

*Me got di dîroka civakan de serdemên lehengiyê weke demên mucîzewî yan jî demên pîroz tênbi navkirin û tên bibîranîn. Ev serdem di jiyana gelan de bi sedsalan weke cejn û rojên pîroz ên bibîranînê tên jiyîn; pirsgirêkên nayên çareserkirin bi piranî ji van rojan îlham digirin û dixwazin derbas bikin. Helbet ev ne bêsedem an jîbêmane ye. Serdemên bi vî şiklî, di dîroka gelan de bi afirandina serkeftinên mucîzewî derbaskirina nuxteyên herî krîtîk û fetlonek îfade dike, sembolîze dike. Pîvana mezintiya ku li vir tê afirandin, helbet ne mirin an jî kuştin e.*

*...*

*Belê, me got li welatên din serdemên lehengiyên mezin û pêşengên mezin hatiye afirandin. Lê serdema lehengiyê ya li Kurdistanê hatiye afirandin û rastiya pêşeng û rêberên mezin, taybetmendiyek ku van hemûyan derbas dike pêşkêş dike. Em pir baş dizanin ku em bi van gotinan nakevin rewşa xwe mezin nîşandanê an jî li pêşberê destkeftên gelan û mirovahiyê bêrêzî kirinê. Berevajî, evqas pêşketinên hatine afirandin, îfadeya herî zelal a girdayîbûna ji bo wan e. Di vê rewşê de divêwere dîtin; em bi vê dixwazin rastiyeke cidî ya çawa bînin ziman, baş were zanîn û were fêmkirin. Di civakek ku dîrok û serdemê ji bo wê di vê astê de biryarên bêrehm dayê de, eşkere*

*ye ku ji bo ji nû ve zindîbûna civakê lehengên mezin pêwîst in. Gelên cuda ji bo qehremaniyênbi vî şiklîû berxwedanên mezin biafirînin mîratêya  ku xwe dispêrinê heye. Şoreşa Rûs xwe spartiye çandeke mezin, kêm zêde çîneke bihêz û tevgera sosyalîst, alîkariya mezin a tevgera şoreşgerî ya navneteweyî. Berxwedêriya Vîetnamê welatparêziyek ku xwediyê tecrûbaya bi bingeh û dûr û dirêj e mîrate wergirtiye ûtimî alîkariya mezin a 3. Enternasyonalê li pişta xwe dîtiye.*

*Baş e, gelo şoreşgerên Kurdistanê xwe dispêrin kîjan çanda pêşketî, kîjan dîroka berxwedêriyêû kîjan alîkariya navneteweyî? Bêyî mirov zanibe ku berxwedêriya gelan xwediyê bingeheke di vê astê de ye,lê belê li Kurdistanê bi xwe jî berxwedanên herî bi heybet ji mîrateyeke diyar bêpar hatine afirandin, ne gengaz e mirov fêm bike ku berxwedêriya li ser van axan hatiye afirandin çiqas mezin e. Her destkefta ku wêli Kurdistanê were afirandin bi tinebûn, îxanet, wahşeteke nehatiye dîtin, înkar, di şert û mercên ku lihevkirina di bin perdeya dostaniyê de tê israrkirin û teslîmiyet, bi van hemûyan re bi şerkirinê weke bedeleke mezin bi can û kedê tê afirandin: Û tenê dikare bi vî şiklî were afirandin. Dîsa dikare meşa mezin a gelê Kurdistanê ber bi mirovahiya hemdem ve jî bi vî şiklî were pênasekirin.*

*Divê mejiyên înkarker, hebûn û nebûna wan nediyar û ketî bi şiklekîbêmane rastiyên me berevajî nekin, hewl nedin me bidin bawerkirin ku eger em hê jîvan berxwedanên xwe bidomînin û gule biavêjin, em ê werin îmhakirin. Pêwîst e weke ku qetlîameke herî ketîû dij-mirovî nayê jiyîn rastiyan berevajî neke; eger bixwaze kêm jî be bigihê serbilindahiya mirovahiyê, divê zanibe; pêvajoyên bi vî şiklî xwediyêwêtaybetmendiyêne ku nokeriyê derbas dikin. Ev karektera ku dibêje bi şiklekî çekdar jî dibe bê çek jî dibe û dema ku tengav dibe weke bûkalemûn reng diguhere, divêêdî zanibe û fêm bike ku li ser gelê Kurdistanê yê ku xwe gihandiye berbanga serxwebûn û azadiyê, nikare zêde bi bandor be. Bi heman awayî divê gelê Kurdistanê jî, eger yê ji nû vê bi şiklekî azad xwe biafirîne, divê zanibe ku ev mejî serdemeke bêoxir û karektereke bi vî şiklî temsîl dike.*

*Tevî vê jî gel nîşan daye ku divê serdemeke lehengiyê were jiyîn.*

*Ew, pêşengên me yên ku lehengiya wan hatiye îsbatkirin serbilind dike û li ser navên wan destanan dinivîse. Navên wan li zarokên xwe yên ku ji bo wan hebûnên herî bi qîmat indike, vê, weke rêbazeke jiyîn û jiyandina wan dinirxîne û alîkarîû nêzîkbûnaku dixwaze nîşan bide tenê dikare bi vî şiklî nîşan bide.*

*Baş e dema em van hemûyan diyar dikin û bi cih tînin gelo dikare were gotin ku em li ser îradeyê zêde disekinin? Gelo weke ku ew kesên xwediyê wan mejiyan dibêjin ‘em îdealîst û subjektîvîstên ku roleke bêdawî didin îradeya mirov in’? Berevajî, tenê*

*dikare were gotin ku em tevgereke wiha ne ku em ew rêgeza dest jê nabe ya mirovahiyê ji bo gelê me jî weke mercekê dibîne û hewl dide ku vê bi kar bîne. Tevî hemû zehmetîû tinebûna derfetan, dîroka gelê me ku ber bi serkeftinê ve tê birin, nîşanî her kesî daye ku tevgera me tevgereke bi vî şiklî ye û di heman demê de rast û mafdar e.*

**Azadiya Li Gel PKK'ê Tê Jiyîn û Derbasbûna Ji Serdemê**

*PKK diyardeyek e ku di têkoşîna gelê Kurdistanê gihandina asta gelên hemdem a gelên cîhane de derdikeve pêşberê me û mohra xwe li vê têkoşînê dide.*

*Taybetmendiyên di çêbûna PKK'ê de xwe didin der, encamên rasterast ên çalakiya dîrokî ne û di lehengiya berxwedanê de tên dîtin. Azadiya ku wê di PKK'ê de tê jiyîn û were jiyîn jî pênase û maneya xwe ya yekane ji vê derê distîne. Pêwîst e di PKK'ê de pirsgirêka azadiyê rast were fêmkirin û di vê mijarê de ji sivikbûn, seraserabûn ûnenaskirinê dûr were sekinîn. Eger ev tişt di asteke têrê bike de neyê bicihanîn, ne serdem dikare me fêm bike û ne jî rastiya ku bi xwe li Kurdistanê tê jiyîn were fêmkirin.*

*Îro di PKK'ê de destanek tê jiyîn.*

*Lê bi paşverûû pêşverûyên xwe ve cih nade gelê Kurdistanê, temsîlkirina îradeya xwe ya serbixwe û azad ji bo vî gelî pir tê dîtin. Tê gotin ji bo ku bibe hêzeke siyasî hê jî zû ye. Paşverûtî li ser gelê me xewa mirinê, kor û lal û kerbûnê ferz dike û di heman demê de yên ku xwe weke çepger nîşan didin di mijara ku bi rastî jî pirsgirêkek gelê me ya bi vî rengî heye an na de helwesta xwe diyar nakin.*

*Helbet hêza ku di mijara azadiya xwe de biryara esasî bide, gelê me bi xwe ye. Lê rola şert û mercên derve ûbi taybetî jî rola sîstema sosyalîst nayê paşguh kirin. Ev rol bi şiklekî bicihanîn, pêvajoya rizgariyê ya wî gelî diyar bike. Her çendî rastiyek bi vî awayî hebe jî dikare di dirêj an kurtirbûn; zehmed an jî hê rehetirbûna vê pêvajoyê de tesîrên girîng bike. Lê belê ji ber ku ev bi vî şiklî ye, ti hêza şoreşger a rasteqînî nikare ji têkoşîna gelê xwe, xwe bide aliyekî. Eger xwe bigihîne pîvanên ji vê serdemê hê pêşketîtir jî, neçar e ev bi vî şiklî be. Eşkere ye ti tişt biqasî ketîbûnê ne xirab e, çawa ku ti tişt biqasî azadiyê ne binirx be, wê demê şert û mercên heyî yên derve û hindûr ve çawa dibin bila bibin, madem parçeyek ji mirovahiyê jî weke gelê Kurdistanê tê binavkirin, wê demê li îlankirina weke talîmatekê ya îradeya xwe ya azad a vî gelî jî pêşî nayê girtin.*

*Ev diyarde yek ji rastiyên herî bingehîn ên PKK'ê ye. Ji bo ku gelê me vê talîmata xwe di jiyanê de pratîze bike, pêwîstiya wî bi qehremaniyê heye. PKK'ê weke berhemeke vê pêwîstiya gelê Kurd çêbûye. Bi gotineke din PKK'ê ev pêwîstî bi xwe û bersîva herî watedar ku ji bo wê hatiye dayin e. PKK di şert û mercên bi vîşiklî de û bi roleke bi vî şiklî derketiye meydanê; ji bo ku bi rola xwe rabe, bi taybetî jî di destpêkê de di şaxsê kadroyên xwe yên herî birumet de hebûna xwe danî holê, ji vê cuda ti şansa wê ya din tinebû. Ev rastî ti car nayê paşguh kirin; di vê merhaleyê de, ti kes nikare bêyî ku zanebûn û pratîka herî biesil nîşan bide, bibe xwediyê navê lehengiyê. Ji ber vê yekê jî, bila li wir bimîne pêwîstiya bi zanebûn û pratîkê paşguh kirinê, PKK'ê bi xeta xwe, li ser her kesê ku ji xwe re dibêje ez şoreşger im weke sedemeke heyînê ferz kiriye ku bibe berdevkêîradeya milyonan.*

*Maneya rastîn a qehremaniyê jî di vê derê de ye. Qehreman ew e ku rê nîşanî milyonên nikarin îradeya xwe qeyim bikin, xwe bi rêxistin bikin û ber bi pêş ve gav biavêjin dide û wan  digihîne hedefê. Di fikirandin, îrade û çalakiya xwe de berjewendiyên wan ên jiyanî şênber dike.*

*Di dîrokê de rola ku ji bo pêşeng hatiye dayin ne bêsedem e. Bi taybetî di serdema emperyalîzmê de ne tenê bi riya siyasîû leşkerî, bi riya texrîbkirina çandî jîîradeya gelan hatiye parçekirin. Ji ber vê yekê, tenê dikare bi pêşengiyeke pir bihêz li dijî vê bêsekinîn; ev pêwîstiyeke di asta jiyanî de ye. Li Kurdistanê ev xwediyê maneyeke hê zêde kûrtir e. Li welatekîku tarîbûn û ketîbûn heya kariye hatiye berfirehkirin, neçar e ku pêşeng ji welatekî ji rêzê hê zêdetir xwediyê taybetmendiyên bijarde be û neçar e ku jiyaneke hê zêde biqehremanî pêş bixe. Ev, berhemeke xwezaya şoreşa Kurdistanê ye û taybetmendiyeke herî cuda ya wê ye. Ya ku vê taybetmendiyê diafirîne, dîroka Kurdistanê bi xwe ye. Wê demê divê em di vê nuxteyê de heya asta dawî realîst bin û li gorî van rastiyan bifikirin û biryarê bidin. PKK'ê azadiyê bi vî şiklî fêm dike û bi vî şiklî dijî. Her hêz û kesê ku dixwaze PKK'ê fêm bike, neçar e ku vê realîteyê rast û bikûrahî fêm bike.*

*PKK'ê bi azadiyê ev pênaseya daye qezenckirin; bi rastî jî bi vê xwe gihandiye pênaseya wê ya herî kûr û herî rast jî. Ji bo ku vê bi awayekî berevajî nîşan bidin hêzên cuda kêm hewl nedan. Wan, PKK, bi 'îradeperestiyê', 'îdealîzma ciwantiyê' û her ku diçe bi 'maceraperestiyê' sûcdar kirin ûîdîa kirin ku PKK'ê rewşa objektîf li ber çav nagire. Lê ji bo yên ku rast ûdurist nêzîkatî li rastiya PKK'ê dikin, ma çi nirxa vêîdîayê heye? Heta bi şiklekî objektîfew çavdêrî kirin jî,derdixe meydanê ku PKK teslîmnebûna mercên objektîf, di mezinbûna mirov de asta herî jor û nirxên şoreşgerî yên bêyî wan nabe temsîl dike.*

*PKK, di pêşxistina dîroka gelê me de, di gel rakirina berxwedanêû veguherînê de xwediyê maneyeke destjênabe ye. Pêwîst e armanca wê ya ku zehmed e bi pîvanên asayî were fêmkirin, baş were fêmkirin. Eger ew gelek tiştan ser û bin dike û statûkoya ku serdem li ser gelê me ferz dike dixe zehmetiyê, pêwîst e sedema vê di pirsgirêka azadiyê ya gelekî de were lêgerîn. Çawa ku xwezaya şoreşê ji aliyê dorhêl û mercênku wê dorpêç dike ve tê diyarkirin her wiha jîqanûna ku terza şer kirinêû awayê berxwedanê ya pêşengê wê diyar dike jî dîsa heman ew qanûn e. Ji bilî ku pêwîstiyên vê werin bicihanîn, ti tişt bi şûn de namîne. Mejiyekî hinekê difikire û wijdanekî xwediyê edelet, di mijara qebûlkirina ku rastî bi vî awayî ye de zehmetî nakişîne. Em dixwazin ku kesên bi vî şiklî ne li axaftinê, li vê berxwedanê bi xwe û li qehremanên wê yên şehîd binêrin û biryara xwe bidin; eger şaş bûyîbin vê şaşitiya xwe rast bikin. Dibe kuwere gotingelek şaşitî, nebesîû bêamadekarî dibin sedem da ku kesên cuda rastiya me bi hêsanî nas nekin; lê, dîsa jî ev rastiyek e wisa ye; neçar e divê pir baş were fêmkirin.*

*Gelo hema bêje cesetekî ku weke ji gorê rabûye ser xwe, mirov dikare jê meşeke baş hêvî bike? Ma kesa/ê ku cara yekemîn gule berdide, dikare tam li hedefê bide? Helbet wê di destpêkê de kêmasîû nebesî di asteke herî bilind de jiyan bibûna. Û ya pêk dihat jî ew bû.*

*Li welatekî ewqas ser û bin bûyî têkoşîn û rêxistineke firîştewarî çawa mimkûn dibû?*

*Ma dikare di nav xweza û civakê de mînakeke biçûk ku pêşketineke bi vî şiklî piştrast dike were nîşan dayin?*

*Wê demê, bi mentiqeke wisa êrîşî PKK'ê kirin tê çi maneyê?*

*Pêwîst e biryara derbara wê de li ber ronahiya analîzkirina rastiya heyî were dayin, pênaseya wê rast were kirin û pêşketina wê ya pişt re jî bi vî şiklî were bidestgirtin û were îzahkirin.*

**Di Çêbûna PKK'ê-ERNK'Ê HRK'ê De**
**Rola Faktora Lehengiyê**

*Ji bo pênaseya PKK'ê, rastiyek ku mohra xwe li vê diyardeyê dide veşartiye.*

*PKK'ê ne tenêji bo dîroka xwe, ji bo dîroka berxwedanê ya gelê me jî bi xwe lehengiya ku faktoreke bêyî wê nabe ye. Mercên ku wê dorpêç dikin ên dîrokîû rojane, ên ku dixwazin li Kurdistanê li gorî pîvanên mirovahiyêû hemdem bijîn, jinûve bûneke biqehremanîû dem bi berxwedanên qehremanwarî honandinê emr dike.*

*Dibêje 'hûn bêyî vê nikarin di navbera xwe û mirovahiya pêşverû de pir çêbikin, jê derbas bin.' Vaye heya roja me ya îro hêrs, zanebûn êş û kêfxweşiya pêşeng; bi kurtasî rastiya ku hemû mirovahiyê di hemû aliyan de jiyiye û bi temamî kurtebireke jiyana gel e ev e. Yên ku van rastiyan paşguh dikin hê jî israr dikin ku şaşîû nebesiyên me weke sûcên nayên efûkirin bibînin û nîşan bidin. Lê ev kes û derdor çawa dikarin înkar bikin ku gel bi xwe bi giranî jiyaneke bi şaşîû nebesiyan dorpêçkirî jiyan dibe; tevgerek ku îfadeya wî gelî ye jî,wê bêyî ku xwe bide aliyekî jê tesîr be.*

*Gelo bi sedan sal e bigire ji aliyê fikrî heya bi qada çandî di her aliyî de bi awayekî nehatiye dîtin ev gel nayê jehrdan?*

*Dîsa, gelo çewisandina hêzên herî dîn û harbûyî, jehra wan di hinava xwe de hîs nake?*

*Wê demê, ma ji rastiyeke bi vî şiklî çawa dikare destpêkeke pir bihêz û saxlem were hêvî kirin?*

*Yên dixwazin PKK'ê fêm bikin û heta wê darizînin divê dadwerane tevbigerin; wexta ku şaşîû nebesiyên wê dinirxînin tesîra girîng a rastiya objektîf bihesibînin.*

*Belê, neyîniyên zemîna objektîf û hebûna şaşî nebesiyan rastiyeke. Lê tevî van hemûyan dîsa ev jî rastiyek e; PKK'ê berxwedaneke lehengane li dar xistiye û li dar dixe. Li pêşberê van qehremaniyên di mercên êşên herî bi xof û tinebûnê de hatine afirandin de, gelo dikare ku hesabê van şaşîû nebesiyên heya asta dawiyê rewa ne jî were kirin? Taybetmendiyên lehengiyê yên di çêbûna PKK, ERNK, HRK'êde, şiklê jiyanekê tîne ziman û serdemekê bi nav dike. Yên ku tevli vê çêbûnê bûne, biqasî biesilbûna biryara ku dayine, her roj û her saet bêrehmbûna wê biryarê jî di hinava xwe de hîs dikin. Ev rastiya zelal a PKK; ERNK, HRK'ê ku ya çêbûnê wê ye, rê nade ti pênase û nirxandinê.*

*Weke ku di têkoşîna her gelê hemdem de bûye, ev çêka bi awayê sêtik (üçlü) jî ku bi çêbûna PKK, ERNK, HRK'ê bi dest xistiye divê jê re zêde neyê dîtin û were qebûlkirin ku encax li dijî evqas neyîniyan bi van çekan dikare şer were kirin. Dibe ku careke din were xwestin ku nêzîkbûnên cur be cur ên ji ber şaş fêmkirinê an jî bi xweşikî xwe formûle nekirinê pêş ketibin di ber çav re were derbaskirin, dîsa tiştên kêm were peydakirin, bi dilnizmiyeke mezin ji bo vê çêbûnê şans were dayin; dikare bangawazî were kirin da ku li pêşberî vê hêzê hê nirxdar û bi rêzdarî were tevgerîn. Dema em van tînin zimên ne ji bo biçûk dîtinê, berevajî, ji bo ku bi mezinbûn û bi pêşketinê baweriya me bêdawî ye em vê dibêjin. Lê em nikarin cezayên hêzên ji me re dibêjin 'van çekan bi kar neynin, ev, çekên xeter in û hê dema wan nehatiye', nedin. Ev bangawazîû daxwazên kirêt ji kê tên bila werin, bersîvên ku em ê bidin wan ê evqas misoger û*

*zelal bin. Di cîhana serdema me de ev çek, çekên wiha yên destjênabe ne ku divê her kesê/a ku hinekê xwe gihandiye zanebûna serdemêû xwediyê namûsêye, wê çekê bi misogerî pêşkêşî gelê xwe yê ku bi qasî av û nan pê hewce ye bike û weke mîrate ji pêşerojê re berde. Belê, dibe ku di roja me yaîro de derfet peyda nebûye ku ev çek weke ku pola were avdan bi awayekî saxlem û mukemel ji gel re nehatiye dayin. Lê ji ber ku hê ev amûr kamil nebûne, ma dikare xefleteke weke çewtkirina maneya wan a mezin jiyan bibe? Di vê nuxteyê de bi rastî jî xwediyê namûs û serbilindî bûyînpêwîst e. Em dest berdin ji gelên din ên cîhanê, tenê dema ku em li tevgera rizgariya neteweyî ya Tirk dinêrin jî, xuya ye ku ev çek çawa hatine çêkirin û çawa bi hewldaneke zêde hatine bikaranîn. Dîsa xuya ye ku Dehaqê roja me ya îro van çekan çawa bi kar tîne. Wê demê pêwîst e her kes li pêşberêrastiyan, careke din xwe di ber çavan re derbas bike û biryara xwe li gorî wê bide.*

*Ev îzah û bangawazî ji bo derveyê derdorên ku di nav şaşiyan de xeriqîne ûîflah nabin, careke din rastî dan fêmkirinê ne. Berevajî,maneyeke weke ku çekên PKK-ERNK-HRK'ê ne xwediyê hêz in dernakeve. Nirxandineke bi vî awayî dibe xefleteke mezin. Destpêkê KT'ê, gelek derdorên kunaxwazin hêz ûqeweta van çêkan daqurtînin an jî qebûl bikin, nikarin xwe xelas bikin ku li pêşberê van diyardeyên bi xwîna şehîdan hatine isbatkirin nekevin rewşên zehmed.*

*Qehremanên me yên şehîd ketine ev her sê çêk bi xwîna xwe, bi şiyara'bijî PKK-ERNK-HRK'ê' li ser çiyayên Kurdistanê nivisîne.*

*Di derbara hêz û nirxa tiştên ku bi xwînê hatine nivisîn de nîqaş nayê kirin.*

*Bi ser de jî, yên ku tovên jiyanê ne, nirxên ku wan bi xwîna xwe nivisîne pir bi esil in. Tevgerek ku serberzîû şerefeke bi vî şiklî di hinava xwe de pêş dixe pîroz e. Û ya ku di PKK'êû dîroka wê ya berxwedanê de pêş dikeve ji binî de ev e.*

*Di serdemeke hê tov nû hatibû reşandin de destana lehengên me yên destpêkê şehîd ketine, li hemû Kurdistanê bi awayê evînekê deng vedaye.*

*Şehîdketina Delîl, Heqî, Xelîl, pîrozbûnek ku di berxwedana her gel û tevgera-meyla şoreşgerî ya îdeolololojîk û polîtîk ku xwe isbatkirine de tê dîtin tîne ziman. Ev şehîdên berxwedanê yên mezin bi jiyanên xwe yên nirxdar ku di oxira azadiyê de feda kirine bingehên PKK'ê danîne. Wan bi zanebûn û bi xwesteka xwe, bêyî ku ti berjewendiyên madî bifikirin, ji bo vê armanca biesil xwe feda kirine. Dibe ku Îbrahîm, ji bo ku Îsmaîl neke qurban beranekpeyda kiribe. Lê gelê Kurdistanê ji bo vê derfet peyda nekiriye.*

*Ew gel ku neçar hatiye hiştin di şexsê PKK'ê de zarok û lehengên xwe qurban bide û jê re ji vê cudatir ti rê nehatiye naskirin.*

*Belê, ev gel û PKK'ê ji aliyê zagonên taybet ên dîrok û civakêve ji bo ku vê rastiya biêş jiyan bikin hatine mehkum kirin; lê wan jî zaniye ku bi awayekî herîbi şeref û keramet bersiva vê bidin. PKK'ê, hê dema ku şehîdên xwe yên destpêkê dayine, bi hemû hebûna xwe ve hêjiyaye. Lê di hedafa xwe ya parastin û mezinkirina şidla serxwebûn û azadiyê ku wan bi xwîna xwe şîn kiribûn û av dabûn de bi ser ketiye.*

*Lehengên me yên berxwedanadestpêkê, sembol û isbatên wê ne ku eger pêwîstî pê hebe em ê ji bo îdeolojiya xwe, xwîna xwe birijînin û em ji vê nakevin dudiliyê. Eger îdeolojiyek dikare her awayê berjewendiyên teng û şexsî red bike û berjewendiyên neteweyîû çînî bike bingeh û biqasî ku karibe ji bo serkeftinê xwînê birêjîne, bi şiklekîcesûr tevbigere, ew,îdeolojiyeke serbilind û bi rumet e ûwê karibe pêşengiya rizgariyê bike. Vaye maneya pêngava destpêkê ya PKK'êû çalakiya biesalet a lehengên wê demê ev e.*

*Eşkere yeku bi tena serê xwe isbatkirina saxlemiyaîdeolojiyê nebes e. Ji bo ku di aliyê polîtîk de gel hişyar be, pêwîst e pêvajoya qehremaniyê hê jî berbi çav be, rola wê ya ruhdayinê hê zêde bê berbiçavkirin.*

*Vaye qehremanên weke Aydin, Salih, Cuma, Delil, Mahir, Ahmed, Mehmed ku meşaleya hişyarbûneke pir mezin a polîtîk a şoreşa paşê belavî tevahî Kurdistanê bûye hilgirtine û ronahiya şoreşê li vî welatî belav kirine. Wan dayina xwîna xwe ya giranbiha tarîbûna Kurdistanê parçe kirine û tîrêjên rojê yên ku mizginiya berbangê ne pêşkeş kirine. Ev bangawaziyên ji bo gelê me ku bi girseyî tevli berxwedanê bin hatine kirin, paşê bi awayê PKK'ê derketiye meydanê, her wiha jî bi terzeke herî xurt hatiye nîşandan ku pêwîst e di pêşerojê de Kurdistaneke çawa bê avakirin.*

*Paşê pêngavên li pey hev hatine avêtin ên gelerî, nîşan didin ku gelê me bi esaleteke çawa bersiva van bangawaziyan daye. Pêşketinên li qadên weke Hîlwan, Sêwerek, Batman (Êlih) Mêrdîn, Dêrsim û qadên dinji diyardeya di zikhev de pêşketina pêşeng û gel re, ku di dîroka me de pir kêm tê dîtin şahidî kiriye. Bi vî awayî ku pêşeng li ser esasê xwe feda kirinê xwe isbat bike û gel jî bi pêşeng baweriya xwe bîne û li ser vî esasîxwe bide têkoşînê, di dîroka me de bûyerên kêm tên dîtinin. Bi ser de jî, bi rastiya gelekî ku mesafeyê di navbera wîû dîroka pêşverû de pir mezin e de di demeke kurt de bi berxwedaneke bêhempa ji bêdengiyeke pir mezin bi milyonan gel rakirin ser piyan, ji aliyê pêşeng ve dinavbera kendalên bi tirs û xof de erka xwe kirin pir bi ser xistin, destana pêşketinê ya diyarde û qehremaniyek ku her kes tê de zehmetî dikişîne da ku fêm bike ye. Bi rastî jîîlan û girseyîbûna PKK'ê xwediyê taybetmendiyeke wiha ya destanwarî ye.*

*PKK'êtevgereke kêm peyda dibe ya wiha ye ku hê dema nû derdiket, kariye li gel xwe gelê pê ve girêdayî jî rake ser piyan.*

*Li vir, ya mezin dibe ne tenê hêza pêşeng e. Pêşeng kariye şerê xwe û şerê gel di zikhev de bihonîne û bi hev re mezin be. Bi vê jî qîma xwe neaniye, nîşanî wî daye ku ew ê çawa şer bike û şer ê di kîjan pêvajoyan re derbas be. Bi rastî jî weke ERNK Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistanê, HRK'ê jî hê bi îlana Partiyê re li gel her du diyardeyên din di zikhev de pêş ketiye. Bersîva zordest bi zimanê ku ew jê fêm bike dayin, zilm û zora ku ew pêk tîne bi amûrên xelasiyê ya gel pêşwazîkirin, hê dema PKK'ê di qonaxa tov de ye ji wan re bûye sedem.*

*Tevî ku gelê me bi sedan sal e di bin çewisîneke mezin de tê ragirtin, timî di mejiyê xwe de weke volkaneke ji teqînê re amade ye serhildanê hildigire.*

*Bi awayekîbêmane jê re nabêjin gelê hêrs, kîn ûêşê.*

*Vaye, HRK navê vê hêza veşartîûîfadeya ber bi çav a îsyana ji bo lidarketinê amade û çeka ku gel bi dest xwe ve aniye. Dibe ku di aliyê hejmar de kêm be lê rastiya ku navê hêzên rizgariyê li wê dike ev e. Ma em ê çi nav liberxwedana ku di mercên herî neyînî de li dijîartêşa faşîst hewl dide li welatê me 'qanûna guran' serdest bike tê dikoşe bikin; em ê vê çeka ku gelê me bidest xwe ve aniye çawa pênase bikin? Ma ji lehengiyê cudatir ev hemû tişt bi çi navî dikare bêbinavkirin? Eşkere ye tenê dikare bi lehengiyêwere pênasekirin. Em li wê bawer dikin ku me tenê bi nav lêkirineke bi vî awayî rastiyeke azad û divêwere serbilindkirin aniye ziman.*

*Bêguman hêzên cuda yên di mercên wekhev de hatine beranberê hev serkeftinên hê mezintir bi dest xistine. Lê di ti mercên wiha yên ku hêzên tên beranberê hev di vê astê de bêhevsengî bin de û dîsa di mercên wiha bêrehm de ti serkeftin nehatine qezenckirin. Ji ber vê yekê jî, ti serkeftin bi qasî ya ku di vê qonaxê de tê biserxistin ne nirxdar û manedar e. Ya herîgirîng: qezenckirina serkeftinek ku ji serkeftinên pêşerojê re zemîn amade dike ye;serkeftinên ku hêzên wekhev in qezenc dikin, na.*

*Vaye PKK-ERNK-HRK pêkhateyek e ku serkeftinên bi vî şiklî afirandiye. Di bingeha her yekê de xwîna şehîdên mezin heye. Pêkhateya van rêxistinan, li gel hezkirin û kêfxweşiyê, di bingeha xwe de bi êş ûêşkenceyan hatine honandin.*

*Şehîdbûna her şehîdî/ê romanek e û hem jî romaneke destanwarî ye. Nefesa dawî ku wê/î daye, manîdar û biesil e; zanebûn ûîradeya di pêngava xwe ya dawî de nîşan daye, kûr û biesil e; bikurtahî ji kêliya ku gava xwe avêtiye nav azadiyê pê de heya nefesa xwe ya dawî daye, bîranîna wê/î ya berxwedanê bi heybet û pîroz e. Tiştê vê taybetmendiyê dide wê/î, ji bo gelekî ku zêde zêde mezlûm ku hema bêje hatiye wendakirin bûye sedema serbilindîyê ye. Ev yeka bû sedem ku, ew xwe bi xwe*

*bigihîne ast û pênaseya gelekî ji bo xwe şer dike û ji ber vê yekê jî xwe ji fedakirinê nade aliyekî.*

*Ev rastiya ku ji aliyê abideyên berxwedanê yên Kurdistanê ve hatiye afirandin, tenê di nav sînorên çînîû neteweyî bi cih kirin an jî tenê bi van sînordar kirin ne mumkîn e. Şerê ku wan jê re berdevkî dikir, her çiqas hedefa wê nêz rizgarkirina neteweyekêû çînên wê yên bindest be jî, hedefa wê ya demdirêj ew bû ku hemû mirovahiyê ber bi rizgariyê ve bibe û şerekî ku ji aliyê mirov û ciwanên ji netewe, mezheb û cins, çîn û tebaqayên cuda pêkhatiye dihat meşandin bû. Ev, pêkhateyek ku heya asta dawî mirovane, welatparêz û enternasyonalîstbû. Qehremanên berxwedanê ji vê çavkaniyê herikîbûn Kurdistanê. Divê taybetmendiyên wan ên her yekê/î baş were lêkolînkirin û were derxistin zanebûnê. Ev ji bo dilsoziya me ya bi wan re jî pêwîstiyek e. Ji bo ku em van yek bi yek îzah bikin dibe ku qewetû derfetên me têrê neke. Lê em dizanin ku bicihanîna pêwîstiyên bîranên wan, tenê bi hê zêde afirandina mewziyên berxwedanê dibe.*

*Ji niha de yek ji serkeftinên herî mezin ên wêdemêku pêk hatiye, bi awayekî ku layiqê lehengên me yên berxwedanê beberxwedana hêza pêşeng di destê sedhezaran de kirin alên li ba dibinû veguherandina berxwedana sed hezaran e. Dibe ku me nekaribûye ji bo heyina wan a fîzîkî gorekê jî çêbikin; lê ev jî rastiyek e ku her kes neçar e qebûl bike; me, bîranîna wan gihandiye serbilindîû rumeteke bi vî awayî. Me di aliyê xwe de ji bo ku em layikê wan bibin, me ev weke riyeke yekane nirxand û em ê di vê helwesta xwe de berdewam bin.*

*Di dîroka me de wê ji bo salên 1980'yan gelek tişt were gotin û nivîsandin: bi taybetîfaşîzma 12'yêÎlonê. Wexta ku ev şiklê herî dawî yê dîroka hegemonyaya Tirk tê lêkolînkirin, ew hêza ku wê navê wê herî zêde derbas be PKK û alên wê ERNK-HRK'ê ne.*

*Faşîzma 12'yêÎlonêwê bêyîPKK'ê, ERNK û HRK'ê neyê şîrovekirin.*

*Bêguman ji bo her du qutubên dijber wê gelek tişt were gotin. Lê ji bo şoreşgeran di vê mijarê de tenê yek encam heye ku divê xwe bigihîninê; aliyek heya tu bêjîtemsîla faşîzmekêû dîroka din jî temsîla azadîû berxwedanê dike.*

*Salên 1980'yî di heman demê de salên ku PKK'ê ji bo ji xewnereşka bi ser de girtiye xwe xelas bike, nefes bistîne û bi ser xwe ve were dest bi hicreteke biçûk kirî ye. Lê destûr nehatiye dayin ku ev bibe dîroka yên diçin û venagerin; ev bêoxiriya ku li ser tevgera me weke çarenûsekê hatiye ferzkirin, li Kurdistana 1980'yan hatiye têkbirin. Yên ku çûyîne hedefa xwe ya vegera zû bi ser xistine. Hem jî bi meşek ku pêwîstiya wê bi hezeke mezin a dil, mejîû fîzîkî heye. Ev tevger, di hedefa xwe ya*

*parçekirina dilên bi sedan sal e weke qîrê lê hatine û mejiyên weke kevir req bûne de ûazadîgihandina serê çiyan de bi ser ket. Ji ber wê yekê, meşa azadiyê ya Kurdistanê, di serî de meşa dirêj a bi nav û deng a Çînê jî di nav de, ji gelek mînakênji sedan salan vir de dewam dikin xwediyê maneyeke hê kûrtir e.*

*Ji bo ku em nekevin rewşa bitengasî ya kesên wendekirî, lê di heman demê de nebin xwarina cinewirê hov pêwîst bû em li ber xwe bidin, li ber xwe bidin û dîsa li ber xwe bidin. Neçariyek bû ku lêgera jiyanê jiderveyê wir çêbe, ev doz bibemertal.*

*Pêwîst bû xebata legal jîû xebata îlegal jî bihata meşandin; hêza xwe ragirtinêû dil û mejî bihatana rakirin serhildanê. Eşkere yeli Kurdistana salên 1980'yan wê li ser van diyardeyan, pêşketinên ku van afirandiye û lehengiyên bûne efsane wê pirî caran were nîqaşkirin. Yên bêyî kulêîxanet bikin li vî welatî dijîn, ew ê van rastiyanher ku diçe hê bihêz bînin ziman û bi misogerî pêwîstiya bîranînên wan bînin cih.*

*Faşîzma 12'yêÎlonê ji zilm, êşkence û ji amûrên şer ên herî pêşketî cudatir ne tiştekî dinbû; ji ber ku weke xewnereşkekêxwe ferz dikir, berxwedanû lehengî dîsa du çekên bihêz ku PKK'ê pê xwe amade kiriye ne. Wê, li her aliyê welat bi van çekan şer kir û pêşketinên bi heybet afirand. Bûyerên berxwedanê yên herî mezin ku dîroka me jê re şahidî kiriye, ji van beşeke mezin di vê serdemê de hatin jiyankirin. Berxwedanên mezin ên Dêlîl, Azîme, Ahmet û hwd li Dersîmê, Mêrdînêû berxwedanên mezin ên li qadên din di vê serdemê de pêş ket. Bi destana şehîdên me yên di nav dilê Rojhilata Navîn de şehîd ketine, berxwedana deh hezaran hat jiyîn.*

*Hevalê Şahîn û lehengên di bin fermandariya wî de bûn gorî û berdêlên jêneveger ên biesil ên vegera welat.*

*Pêngava 15'ê Tebaxê ku ji bo jinûve berzkirina berxwedanêû di berdêla çi de dibe bila bibe ji bo berzragirtin vê alêhatiye destpêkirin;li ser dîroka me rûpelên berxwedanê yên nû zêde kir. Ya ku ji vê bi şûn de bi hemû heybeta xwe ketiye rojeva Kurdistanê, şerê gel ê demdirêj û qehremanên wê ne. Êdî ya ku li ser erdên vî welatîpêk were, her roj û kêlî were jiyîn destana şerê me yê rizgariya neteweyîû lehengên wî/ê ye. Rastiya me ya mezin ku dibe mijara şiîr, roman, wêne û stranan û di demên pêş de jîwê bidome êdî ev e.*

*Belê, me şehîdên ku divê em li ser navê wan gelek tiştan bikin, rêxistinan ava bikin û serkeftinan qezenc bikin dan.*

*Me sond xwar, ji bo wan soza me heye.*

*Di demên borî de tiştên ku me ji bo bîranênên şehîdên xwe kiriye, em ê vê li pêşberêbîranên wan şehîdên xwe jî hîn zêdetir pêk bînin. Rêxistinên ku divê bêne*

*avakirin wêbimosogerî bên avakirin, şerên divê bêne lidarxistin wê bimisogerî bêne lidarxistin û serkeftinên divê bên qezenckirin wê bimisogerî bêne qezenckirin.*

*Vaye yek ji şehîdên me ku em di vê astê de li pêşberêWîdeyndar in jî şehîdê şehîdan heval Egîd e.*

**Heval Mehsûm (Egîd); Pêşengê Bijarde Ku Îradeya Azad A Gelekî Di Kesayetiya Wî De Temsîla Xwe Dibîne**

*Heval Mehsûm ji destpêkê heya roja dawîkariye ku ji bo hemû vê zincîra şehîdan bibe mejîû dil; kesayetiyeke mezin ku xwe gihandiye wê hêza ku bibe temsîla dil û mejiyê hemû gelî. Eger kesekî/ê xwe gihandibe taybetmendiyên Wî, dikare bibe layiqê taybetmendiyên serberzîû egîdî. Ji bo kesek ku rastiyeke wisa afirandiye behsa mirinê kirin ne tiştekî di cih de ye.*

*Ma kesekî/e ku di nav jiyaneke herî biesil û pak de xwe helandiye, bûye jiyan bi xwe dimire?*

*Eger jiyan di kêliyeke diyar de hatina gel hev a hejmarekebêdawî ya tişt û şert û mercan be, navê vê yê piştî bi kêliyeke diyar jî dikare were gotin mirin e. Lê eger jiyan wê weke pirengîbûneke bêdawî ya gerdûn û bêdawîbûna xelekên pêşketina mirovahiyêwere fêmkirin, ji bo kesekî/ê ku ev têgihîştina biesil û nijadpak di kesayetiya xwe de îsbat û mayinde kiriye behsa mirinê nayê kirin. Gelê me jî xwediyê pêşengekîku xwe gihandiye kesayetiyeke bi vî awayî ye; di kesayetiya Wî de bi rastî jî xwe gihandiye vejîn û bêmiriniyeke bi heybet.*

*Ji bo gel û Partiya me, mane û wateya heval Mehsûm ev e û di herî destpêka kesayetiyên ku di berxwedana neteweyî de partîbûn pêk anîbûn de cih digirt. Di kesayetiya Wî de bawerî, bi baweriyêjîxwe gihandin rêxistin û çalakiyê, xwe gihandibû asteke herî biesil. Weke ku di pêşerojê dedi jiyana gelê me yê azad deçi tiştê kujê re rêz were girtin û jê bê hezkirin hebe, hemû di kesayetiya Wî de pêk hatibûn û xwe dabûn der. Wî, temsîla biesilbûn ûcazîbeyeke wisa dikir ku di şert û mercên înkar û bêderfetiyabi her awayî de jîhema bêje mirov dikir bigota, ‘gelekî ku xwediyê ewladekî bi vî awayî ye û rêxistinek ku lehengekî wisa afirandiye divê bijî; divê mirovahiya pêşverû bimisogerî di nava xwe de cih bide Wî’.*

*Bi zanebûneke saxlem, bêyî ku li ber wolkanên di dil de diforin bibe asteng, bêyî ku çeka xwe ji dest xwe dayne û ji çiyayên asê were xware li dijî serdestiyeke bi hezaran sal bi qasî 7 salan domandina şer, yek ji bûyerên ku kêm tê dîtine. Wexta van hemû tiştan dike jî, bila li aliyekî bimîne tenê kêliyeke biçûk jîçavşikestîbûn, dîsa*

*her roja derbas dibemezinbûneke layiqê gelekî ku azad dibe û pêşengiyek ku pêş dikeve afirandin tiştekî kêm tê dîtine.*

*KT (TC) îlan kiriye, Ew 'celadê PKK'ê ye'. Ev tê wateyê ku dijmin bi xwe qebûl dike, gelê Kurdistanê di şexsa Wî de xwediyê şûrekî tuj ê çawa ye. Di jiyana mirov de timî mimkûn e mirov di aliyê fîzîkî de îmha bibe. Lê eger kesek bi îradeya gel re bûyîbe yek û xwe gihandibe wê hêzaku vêîradeyê di her şert û mercê de serwer bike, ew îmha kirin ti car ne mimkûn e.*

*Birastî jî, eger Zilfikara di destê Hz. Elî de çi be, heval Mehsûm jî ji bo gelê me tê wê maneyê.*

*Ev şûr carekê bi dest me ketiye.*

*Ji ber ku Ew xistiye erdê, dibe ku dijmin bifikire û bêje 'min serkeftineke mezin bi dest xistiye'. Lê weke timî bûye, beriya ku dem di ser re derbas bibe wê fêm bike ku xwe xapandineke mezin dijî.*

*Çeka me di destê me de ye, hem jî bi hemû şewqa xwe, bi hemû hêz û bedewiya xwe!*

*Em, weke doh wisa bûye îro jî bi vê çekê şer dikin û derbeyên mirinê didin dijmin. Lê ev şûr wê derbeyên xwe yên mirinê yên esasî ji ve bi şûn de lê bide.*

*Ew ewladêPartî û gelê me, pêşengekî wisa bû ku kariye di heman demê de, welatparêzîû enternasyonalîzmê, rêz û hezkirin, kemalet û çalakbûn, dilnizmîû serberziyêbigihîne hev. Afirandina nirxeke wisa, ji bo gel û Partiya me serkeftineke mezin e.*

*PKK'êû gelê me bi hebûnaWî serbilind e.*

*Em ê bi pêşxistina nirxandinên bi vî awayîwateya Wî ya ji bo me sînordar nekin;'sala destpêkê ew tişt kiribûnû sala dawî jî ev kirin'. Weke yek ji pêşengên tevgera rizgariya gelê Kurd heft salên Wîjiyan kirine, di dîroka berxwedanê ya gel û Partiya me de jiyaneke bedelê heft sed salan e. Wîkesayetiya xwe, ku di encama êş û hewildan, fedakariyên pir mezin û wêrekiyeke mezin de xwe gihandiyê, wekî mînaka herî mezin a nîşaneya girêdana xwe ya bi Partîû hevaltiyê re pêşkeş kiriye. Eger hevalên Wî jî, mane û nirxa vê têra xwe fêm bikin, ji bo ku ev bi şiklekî din neyê pênasekirin û bi ti awayî paşde veger neyê qebûlkirin hewldana pêwîst dike nîşan bidin, misoger e ku ev kesayetî wê bi vî awayî bêhilgirtin salên li pêş meûbandoreke bi vî awayîbike. Salên xwe yên di nava têkoşînê de çawa jiyan kirin, tev bi pêşketinên çawa ev sal borandin, em êzêde van jî venebêjin.*

*Ew, yek ji wan şitlan bû; ji zûka li ser axa têkoşînê ya PKK'ê gihiştibû, herî bi tendirustîû herî berhemdar bû. Di sala 1979'an de dest bi têkoşînê kir.*

*Di sala 1980'î de jî, vê şitlê rayên xwe berdan kûraniya erdêû dest bi êrîşên xwe yên li ser dijmin kir. Di van salan de li Êlihêû li cihên nêzî wê li dijî feodalên li herî pêş cihê xwe digirt. Biqasî ku li dijî milîsên MHP'yî bûye, li dijî zilma cenderme û polîs jî bêyî ku bikeve dudiliyê rasterast dest bi êrîşên xwe kirin. Ji bo ku vê rewşê ji herêmîbûnê derxeû weke pêngaveke neteweyî lê bike, bi hewldaneke bêdawî xebitî. Dîsa xebata xwe ya derketina derveyê welat jî; bi nîşandana keda mirov a herî biesil, bêyî ku zêde yan jî kêm ecz bibe, dîsa bêyî ku nîşaneke herî biçûk a bêbaweriyê raber bike û bi jiyîna hêviyeke mezin ji bo vegereke hê xurt a welêt pêk anî.*

*Di pêngava 'vegera li Peresgehê' de jî li herî pêş bû.*

*Wî, bi rihekîlehengiyê yê biesilû bi fedekariyek ku tenê li gel hewariyan peyda dibe ev yek kir.*

*Ma mirov di qonaxeke bi vî awayî de dikare çi navîlipêngava ku ji nû ve vegera welat bi evqas mejîû dilekî mezin pêşwazî dike, bike? Di encameke zêde bi tengasî û êş de di bedelê pêşberê îxanet û êrîşan de Pêngava ku heval Mehsûm jî di destpêkê de tê de cihê xwe girtiye ya ji nû ve veger ûbilindkirinaberxwedana şoreşgerî bi serkeftî hate avêtin. BelêWî, li gel grubeke hevalên xwe ew meşa xwe ya bi heybet a tê zanîn ku kêm kesan cesaret kiriye, bi serkeftî temam kir.*

*Êdî, nebiza welat û gel hatibû bidestxistin. Lê belê xuya bûhê jî zilm û zora dijmin a bêsînor, îxanet û bêwijdaniya ku bi navê dostaniyêberdewam dikir, ev nebiz qederekê lewaz xistibû. Ew, endamekî tevgereke wisa bû ku vê tevgerêpir baş pênase kiribû da ku dermanê vî gelî ji nû ve bizivirîne jiyanê çi ye û divê ev derman ji kîjan çavkaniyê were stendin; Wî êdî, ev, pir baş dizanî.*

*Wexta ku Partiya me pêngava 15'ê Tebaxa 1984'an ku li azmanên Kurdistanê weke bruskekê lê dabû li dar xistibû, Ew, dîsa li herî pêş bû.*

*Hewldanên ku heya wê rojê hatibûn domandin,weke tovê artêşa gel bi şiklêweke HRK'ê derketibû meydanê. Ew di van hewldanan de û di şênberkirin ûmayîndekirina vê de bi rolên diyarker rabû. Bi vê pêngavê re pêvajoyeke nû ya lehengiyê dest pê kir. Wî bi rola xwe ya şoreşgerîû pratîka xwe ve hema bêje mohra xwe li vê pêvajo û li HRK'ê da.*

*Ew, bi yên ku jiyan dikin û şehîdên xwe ve berdevk û pêşengê bênîqaş yê vê pêvajoyê bû.*

*Dîroka Kurdistanê di demeke kurt de hatibû nûkirin. Ev rastiyek ku girêdaye bi pêşketina hêza fikri ve ye; Wî ev rewş bi kûrahî fêm kiribûûdi kesayetiya xwe de kûrbûneke mezin afirandibû ku her kes lê heyirî bima. Ne bi awayekî ji rêzê fikirîn û*

*nivisîn, ji bo ku bê çareserkirin li ser mijarên herî bingehînû herîtevlihevên têkoşînê fikirîn û nivîsîn, nêzîkbûnek ku bi kûrbûn û kedeke mezin bê pêkanîn nîşan dida.*

*Ew nirxeke wisa bûku nîşan dida, li welatê me jiyana serbixwe û azad, jiyana yekane ya jêneveger e;û ev rastîjîli welêt di asta qanûnekê de pêk anî; li dijî provokasyon ûîxanetê helwesta herî bêrehm raberkir.*

*Penabertî ji aliyê gelek hêzan ve hema bêje weke tiştekî baş ê dîroka me têdîtin. Ew li dijî vêbi çi dibe mal bila bibe, bibû kesê herî zêdeparazvaniya pratîka li welêt bicihbûnê dike. Di dîroka Kurdistanê de gelek caran piştî berxwedaneke diyar, pêşengên wan serhildanan ketine ser riya penaberiyê; Wî ev rewşbi êş û hêrs pêşwazî kiriye, ji bo rewşên bi vî awayî pêş nekevin, bi israr parazvaniya fikra ku pêwîst e ti car terka axa welêt neyê kirin dikir. Ev, di heman demê de rêgezeke têkoşînê ya partiya me ye û Ew ji kesên sereke yek bû ku ev rêgez bi awayekî rast ûdurist di jiyanê de pêk dianî. Tevî ku Ew bi caran derketibû derveyê welêt, Wî timî xwestiye têkoşîna azadiyê li ser axa welêt bide destpêkirin û ev hesreta dilê xwe bi kûrtirkirina têkoşîna xwe ya li çiyayên Kurdistanêderbas kiriye û di vê mijarê de mînakeke biesil pêşkeş kiriye. Wî bi vî awayî, bi pratîkaxwe pir baş nîşan daye ku li Kurdistanê pîvanên welatparêzîû şoreşgeriyê çi ne û vegera ji asta hatiye girtin a têkoşînê yan jî bi vê fikirîn îxanet e ûji bo yên vê helwestêpêş dixin nikare heqê jiyanêbê dayin.*

*Heval Mehsûm ji bo ku feraset û taktîka Partiyê di jiyanê de bê pêkanîn, şervanêkî herî bijarde û xwe bi şunde nade yê partîbûnê bû.*

*Kesê kudi vê mijarê de , hewldanahêrîafirîner, herîbiryardar ûberhemdar raber dikir Ew bû.*

*Ne ji baweriya bi xeta Partiyê, hewldana afirîner û biryardar a ji vê baweriyê çavkaniya xwe distîne bûya, ku Wî temsîla vêxetêdikir,di jiyanê de pêkanîna vê xetêû hê jî pêştir pêşketina wê gengaz nedibû.*

*Wî,di jiyanê deli dijîferaset, helwest û hewldanên weke demogoji, di amatoriyê de bi israrbûn, nêzîkbûnên rastger û xet ber bi sîstemê ve kişandintimî têkoşîn dimeşand. Bi vê helwesta xwe ya ku ti car xwe paşve nade, ti car fersend neda ku pêşketina Partiyê asteng bibe. Bi taybetî di asta rêvebiriyên Partiyê de hin ferasetên di asta hin kadroyan de derketine holê yên weke; li şûna pirsgirêk çareserkirinê polemîk pêş xistin, li şûna meşandina pirsgirêkeke zindîû şênber ji bo tiştan îzah pêş xistin, di formûl û qaliban de bi israrbûn heya dawiyê red û mehkum kir. Di çi astê de dibe bila bibe, li dijî ferasetên weke, karên Partiyê pêş nexistin, şer nekirin, li ber pêşketina Partiyê bûn asteng şervantiyeke biesl a Partiyê meşand. Li dijî kesên ku di rewşa pêkneanîna xeta Partiyêde jiyan dikirin, bi sekneke pêşeng ku di berxwedana*

*pratîkî ya Partiyê de israr dikir,karîbûpêşveçûnanbigihîne wê astê ku her berdewam bikin.*

*Di pêvajoyeke pir girîng a pêşketinê ya Partiyê de bi hin kadroyên berpirsiyar re hin meylên weke seraserabûn, qalibçitîû meylên burokratîk pêş ketin û van meylan jî hin xetere afarandin. Wî bi baldarîû hişyariyeke mezin berê xwe da van xetereyan û ji bo çareserkirina van hewldaneke zêde nîşan da. Bi rastî jîbi taybetî di vê pêvajoyê de, ev,weke sûc û tewanbariyeke herî mezin ku li dijî feraset, ruh û nirxên partiyê hatiye kirin şîrove kiriye. Li dijî pratîkên weke, karên heyî nebaş meşandin û şervantiya bêkêr, di rêvebiriyê de bi afirandina hostatiya taktîkîû kûrbûnek ku tê xwestin karîbû bikeve ser riyeke herî watedar a pêşketinê.*

*Yê ku ji bo banga Seroktiya Partiyêya bi awayê 'navendîbûneke bihêz' bersîveke herî di cih de û têrê dike daye jî, dîsa Ew bû. Pratîka Wî ji bo pirsa 'navendîbûneke bihêz çawa tê pêşxistin?' bersiva pêwîst dike daye û riya çareseriyê nîşan daye. Ev, helwest û pîvana yekane ye ku kesên hê jî hewldaneke wiha raber dikin karibin ji xwe re weke mînak bigirin.*

*Wî, ne bi axaftinê lê bi rakirina bar alîkariya ji bo Seroktiya Partiyê bi cih aniye; isbat kiriye ku Ew xwediyê kar û berpirsiyariyên xwe ye.*

*Bi şexsiyeta xwe ya ku timî hêz ûqewet dida Partiyê, dihêla ku Partî nefesê bistîne, bûye tîpêmilîtanê ku tê xwestin di nava Partiyê de were afirandin. Wî kariye pîvanên pêwîst e hemûmilîtan xwe bigihîninê, veguherîne jiyanê. Heval Mehsûm, jiyaneke têkoşînê ya wiha pêş me kiriye ku her hevalêdi aliyê temsîla Partiyê de xwediyêîdîa, karibe ji xwe re mînak bigire. Li beranberê hevalên xwe timî birêz û alîkar bûye, ligel lihevnekirin û biryardariyê, Wî, helwestek mînak ku di têkoşîna li dijî şaşîû nebesiyan de zemînê nade, dûrî sekterbûnê, heya asta dawiyê kamil û erênî ye pêşkeş kiriye. Di mercên herî zehmed de jî, jiyana Partiyê gihandiyê dewlemendîû coşê, kesayetiya Wî ya di aliyê pêşketinê de bêsînor bû, valabûna bi her awayê teoriyên aloziyêû kes û saziyên temsîla vê dikin raxistibû ber çavan. Vê şexsiyetê, isbat kiriye ku taybetmendiya biryardarî, kêrhatin û hêza navxweyî li gel me dikare heya astên bêdawî pêş bikeve.*

*Rast û bi hostayî bikaranîna xeta Partiyê, dayika bi her awayê serkeftinê ye.*

*Serkeftinên heval Mehsûm yên di qada leşkerî de isbata vê ya herî rasterast e.*

*Weke di her qada têkoşînê debûye, destwerdana Wî ya vêqadê jî, li ser esasêfêmkirineke kûr ûkedeke biesil çêbûye. Ji bo qada me ya leşkerî hewldanên Wî yên teorîk, rêxistinîû çalakvaniyê, bi pêngava 15'ê Tebaxêû herî dawî jî bi pêngava*

*1986'an gihaye zîrveyê. Xeta leşkerîû hunera leşkerî bi awayekî kûr fêm kir û pêk anîû bi heman awayî da pêkanîn.*

*Bêguman divê jiyaneke bi vî awayî weke zîrveya serkeftina PKK'ê, pîvaneke wê ya bingehîn bê dîtin û weke talîmatekê bê pêkanîn. Eger mirov bixwaze li ser PKK'ê kûr bibe, divê ev taybetmendiyên Wî weke tê xwestin bê fêmkirin û bê pêkanîn.*

*Bi serê xwe bûn xwediyê lehengekî bi vî awayî nirxek e.*

*Di demên pêş de wêli ser vê mijarê hê zêdetir tişt were gotin, weke şehîdên me yên berxwedanê; Ev şehîdê me jî,wê cihê xwe bigire. Lê dema ku tenê xetên wê yên esasî tên diyarkirin jî, tê dîtin heval Mehsûm di pêşketina teorîk û pratîk a Partiyê de ne tenêstûnek e, ew hêz nîşan daye ku di heman demê de bûyê çend stûnan. Dîroka Partîû dîroka berxwedana neteweyî bi her pêngavê gihandiye qonaxeke girîng. Dema ku ev dikir jî kesayetiyeke mezin a bi wî awayî bû ku hemûtaybetmendiyên jiyana Partiya me di kesayetiya xwe de temsîl dikir. Her kesên ku dixwazin bi PKK'ê re bimeşe û pê xwe mezin bike, divê bi misogerî Wî di hinava xwe de hîs bikin û bi hemû hebûna xwe li gel Wî bibin yek.*

*Wexta ku em van hemû tiştan dibêjin bila kes xwe nexapîne û nebêje 'vaye pir zêde rol û mane didin kesayetiyekê'. Ev kesayetiya Wî ya giranbiha bi çalakiya Wî ya herî mezin şikil girtiye û bûye dîroka me ya berxwedanê. Bêguman ev ne ji ber kêrhatinek wî ya ku ji aliyê Xweda ve yan jî ji aliyê destekî ji xeyibiyê ve hatiye dayine. Ew, berhema xeteke rast a siyasîû pratîkek berxwedêr e ku Ew ji vê pratîka berxwedêr re pêşengî dike. Tiştê ku li ser niqaş dibe, ji kesayetiyeke awarte yan jî ji taybetmendiyên awarte zêdetir, bi şîroveya rast a xeta Partîû xeta rast a Partî gavek hatiye avêtin ûhebûneke  ji pola hatiye afirandin.*

*Belê, me got di nava PKK'de kesayetiyên ku xwe isbat kirine yên cuda jî hene. Hevalê**Sabrî Gözübüyük**[1] ku me di 21'ê Gulana 1985'an de wenda kiribû jî yek ji van lehengan e.*

[1]**Sebrî Gözübüyük (Heci): Semsûr, 1956. Grubek, ku heval Sebrî di nav de ye ji bo ku li herêmên çiyayî yên li derdora Semsûrê, xebatên bicihbûnê( üslenme )bimeşîne tê wezîfedarkirin. Ev gruba ku diçû wê qadê di dîroka 26'ê Gulana 1985'an de di encama îxbara xaînekî de li qada çoltereya Bozovayê ji aliyê hêzên artêşa Tirk ve tê dorpêçkirin. Li pêşberê banga 'teslîm bin' bi guleyên keleşên xwe bersiva dijmin didin. Di navbera gruba gerîla û leşkerên dijmin de bi saetan pevçûn berdewam dike. Heval Sebrî Gözübüyük, Mehmet Yeşiller (Hıdır), Ali Kamber**

**Demir (Bawer) I.!!!!!! Hüseyin Coşkun (Mehmet), Hacı Ahmet Yapıcı (Faik)tevî nebûna derfetan heya bi guleya xwe ya dawî şer dikin, derbeyên mezin didin dijmin û bi qehremanî şehîd dikevin.**

*Me dema ewşehîd da, rojnameyeke Yewnanî di derbara wîde wiha nivîsandibû;* 'ew kesê ku gelê xwe di nava dilê xwe yê biçûk de bi cih kiriye'. *Ev çavdêrî, beriya ji demekê rojnamevanekî/êdi hevdîtineke pir kurt de kiribûn. Hevdîtineke biçûk lê pênaseyeke têr û tije!.. Vaye rastiya kesayetiyên mezin ku di nava PKK'ê de çêdibûn ev bû.*

*Meha Gulanê meheke wisa ye ku van kesayetiyan axên Kurdistanê seransera bi xwîna xwe av dane, hêjandinên diyardeya PKK'ê ku bûne destpêka serdeman, dengê xwe gihandine her çar alî. Meha gulanê meha berxwedêrên mezin, meha şehîdên mezin e.*

*Kesên ku dîrok, rastiya civakî, têkoşîna hatiye dan û tiştê niha tê jiyankirin baş dizanin û fêm dikin di heman demê de dizanin di vê mehê de pêşketinên pir manîdar û dîrokî hatine jiyîn, wendahiyên ku pêwîst e bi serkeftinên mezin bên pêşwazîkirin hatine dayin, eşên mezin hatine kişandin; lê kîn û hêrsê jî erd û ezman kiriye weke wolkan. Ji 1977'ê vir de PKK'êû gelê Kurdistanê biharêûbi taybetîjî Gulanê bi vî awayî jiyan dike.*

*Di dîroka berxwedanê ya Partiya me de li beranberê zehmetiyên pir mezin, şer hate meşandin. Me di 1977'an de ji bo ku em ji pêkhateyake îdeolojîk re bikin pêngaveke pratîkî ya mayende di têkoşînek ku pir zor û zehmed e de heval Heqî şehîd da. Tevgera me ji bo bîranîna heval Heqî nede jibîrkirin û navê wî li ser tevgera girseyî bi bandor be tevî hezar zor û zehmetiyan li ber xwe daye, şehîdê xwe yê din ê mezin di Gulana 1978'ê de da. Belê hevalê Xelîl Çavgûn di vê têkoşînê de şehîd hate xistin. Lê baş tê zanîn ku bîranîna wî jî paşê biafirandina berxwedana Hîlvan-Sîwerekê hate pêşwazîkirin. Di pêvajoya berxwedana Hîlwan-Sîwerekê de gelek ewladên hilbijarde yên gelê me, hema li pey hev şehîd bûn. Lê xwîna ku wan rijandiye li ser axa welêt, şidla azadiyê ku li Kurdistanê mezin dibe hê jî mezintir û geştir kir.*

*Berxwedanên Gap û Bloka ku li dijî faşîzma 12'êÎlonê hatibûn meşandin û lêhengên ew afirandine,îsbat kirineku tenê dikare dîroka me bi berxwedanê bi pêş de biçe û her wiha derbeyên mirinê li teslîmiyet ûîxanetê xistin. Di destpêka 1980'an de di pêvajoya ku emperyalîzmê giranî da êrîşên xwe yên li ser herêmê, weke bedela israra di şoreş û jiyana şoreşgerî de jîme dîsa gelek hevalên xwe şehîd dan. Ji bo ku li*

*derveyê welat em nekevin rewşa komeke ketî ya penaber, berevajiya vê her ku diçe em di aliyê şoreşgertiyê de bi pêş bikevin, weke bedelên jênerev van şehîdên me xwe feda kirine. Lê di heman demê de ew ji bo ku Partiya me di qada navneteweyî de weke partiyeke şoreşger were naskirin jî bûn parametreyeke nû ya esasî.*

*Di vê pêvajoya ku dijmin ji derve û li hindur hewl daye têkoşîna me bixeniqîne û bêbandor bike de, şehîdên me yên berxwedêriya zindanê ku bi berxwedanên bi heybet ên pêş xistine ev hewldanên wî vala derxistine, pevajo veguharandina berevajiya bendewariyên dijminûqonaxeke nû ya ku têkoşîna me ya berxwedanê hê jî bilindtir bûye dane despêkirin. Lehengên herî mezin ên dîroka me ya berxwedanê di nav vê berxwedana zor ûzehmed a zindanê de xwe afirandin û beşeke girîng û hêja ya kadro û pêşengên Partiya me di nav van berxwedanan de şehîd ketin.*

*Partiya me, li ser bîranîna wan şehîdan, weke ku careke din neyê têkbirin, li welêt têkoşîn bi cih kiriye, di salên 1983-1984'an de û paşê jî hin pêngav pêş xistine.*

*Eger doza gel bi bîryardarî hatiba meşandin ûhatiba gihandin encama wê ya xwezayî, ji bo ku rejîmeke weke faşîzma 12'êÎlonê derfet peyda neke ku bêje 'min xwe bi cih kir û ez bi hêz bûm, min bi awayekî bi ser keftî vegera li demokrasiyê pêk anî', faşîzm rewa nebe û bi rehetî venekişe, diviyabû destûr nehata dayin.*

*Vaye; pêngava 15'ê Tebaxê, ji bo ku ji vê rewşê re bê gotin 'êdî bes e' li ser serê faşîzma dagirker weke bombeyekê teqiya. Êdî pêvajoyeke nû vebibû. Lê ev berxwedanên mezin, helbet di encama têkoşîna bi bêderfetiyên mezin de û bi wendahiyên mezin dayinê dihatin lidarxistin.*

*Di zivistana bêbext a 1985'an de û paşê jî gelek bedel hatin dayin. Ji Agiriyê heya bi Dêrsimê, ji Semsûrê heya bi Colemergê li hemû qadên welatê me berxwedanên mezin hatin pêşxistin û mînakên herî bijarde yên qehremaniyê hatin afirandin. Tevî van hemûyan Partiya me pê kariye ku bi îlana Eniya Rizgariya Neteweyî ku je re pêşengî dike, ev êş û wendahiyên mezin weke al û çekeke rizgariyê bide destê gelê Kurdistanê.*

*Diviyabû navber neketana van pêşketinên hatine çêkirin. Ev pir girîng bû. Hêviya dijmin jê hebû ku pêngava hatiye destpêkirin ênikaribe bê berdewamkirin; ji bo demekê zûtir encam bistîne kêmînên bêbext pêş dixist; hewl dida ku pêşengên van serhildanên pêşdikevin di van kêmînan de îmha bike. Lê vê tevger û berdevkên wê dizanîn; her pêvajoyê bibin serîû her kêliya zor ûzehmed veguherînin kêliyeke pêşketinê. Pêkarîbûn ew hemû salên bi têkoşîneke pir giran derbas bibûn, bikin salên her ku diçe rêxistin dibe hêz û dibe hêzeke rêxistinî, bêyî ku navber bikevê berdewam*

*dike. Di pêngava bihara 1986'êû çalakiya bi heybet a dawî ya hevalê Egîd de careke din ev rastî hate ziman.*

*Pêngava 1986'an pêngaveke wisa bu ku di berxwedana neteweyîû partîbûnê de domdarî afirandiye û hemûûhêvî planên dijmin vala derxistiye. PKK'ê ya ku ev kiriye; PKK'yeke ku êdî gel heya dawî piştgirî daye wêû serkeftin xistiye bin ewlehiyê ye. Di riya rizgariyê de êdî zemînek ku ti hêz bi ti sedeman pê nikaribin,çêbûye. Girseyên hê berfireh tevli têkoşînê hatine kirin, bi van pêngavên qeyim ên hatine avêtin di vê riyê de qonaxên girîng hatine derbaskirin. Dijmin ji bo ku pêşî li vê meşê bigire tewdîrên mezin wergirtin. Di vî şerîîmhayê ku li dijî Partiya me dimeşîne de nêzî sed hevalên me şehîd xist û beşek jî dîl girt. Di asteke pir bilind de milîstî pêş xist û ji bo ku gelê Kurdistanê bi hev bide qirkirin bi her awayê şerê taybet bi kar anî. Dîsa li derveyê welêt û li parçeyên din ên welêt, heya dawiyê bi her awayê lîstok û entrîka pêş xist. Tevî hemû hewldanên ji bo ku pêngava 1986'an neyê lidarxistin jî, bi hewldanek ku heval Egîd jê re pêşengî kiriye di salvegera yekem a EniyaRizgariya Neteweyî de weke ku layiqê navê xwe be hate pêkanîn.*

*Ji niha de Newroza 1986'an di dîroka me de bûye xwediyê cihekî cuda. Jê guman nabe ku ev pêngav di têkoşîna me ya serxwebûnê de bûye parametreyeke girîng.*

*Partiya me, pêkhatina tiştê ku dijmin ji seferên xwe yên îmhayê hêvî dikirbila li aliyekî bimîne hê di destpêkê de bi raboriya xwe û dîroka xwe ya berxwedanê nîşanî dost û dijmin daye ku agirê berxwedanê hê şidiyayî belavî qadeke hê berfireh dike. Pêşketinên ji rojaku dagirkeran îlan kiriye li heval Egîd dane vir de jî, vî aliyê rastiyê bi awayekî zelal dadixîne holê. Hê xwîna şehîdê me yê berxwedanê li erdê bû ku ji Dêrsimê heya Semsûr, ji Sasonê heya Mereşêû her ku diçe heya bi jiderveyê welêt, li çar aliyê welatê me pêngavên berxwedanê yên dawî lê nayên, hatin avêtin. Bêguman ev pêşketin di aliyê naverokû çarçoveyê de zêde zêde li pêngava 15 'ê Tebaxê derbas dike.*

*Zêdehiya çalakiyan ji 28'ê Adarê heya bi 28'ê Nîsanê ku demeke bi qasî mehekê ye, mezinahiya wan û bi wendahiyeke herî biçûk pêkanîna wan, pir eşkere nîşan daye ku êdî pêşengên herî bijarde yên dîroka me ya berxwedêriyê em wenda bikin jî têkoşîna me ya neteweyî berdewam dike û berevajî hê jî gurtir dibe.*

*Bêguman, di pêkhatina bi vî awayî ya dîroka me de hewldan û rola heval Egîd di asteke diyarker de bûye. Di maneya fîzîkî de wenda kirina Wî ji bo Partiya me û gelê me wendahiyeke mezin e; lê destkeftên ku Wî bi Partîû gelê me daye qezenckirin, Ew ji mêj de ji bûn hebûneke madîû fîzîkî derxistiye, kiriye parçeyekî jiyana me ya zindî ku*

*dijî ya Partîû gel. Biqasî ku çalakiya Wî bi xwe delîla vê rastiyê ya rasterast e, Kurdistana ku li ser navê Wî li berxwe dide jî delîla vê rastiyê ya herî rasterast e.*

*Wê demê dikare ji vê bi şûn de çi bê gotin?*

**Partî Û Gel Wê Heval Egîd Timî Bi Rêz Û Bi Hezkirin Bi Bîr Bîne; Dilsoziya Xwe Ya Bi Wî Re Wê Bi Egîdbûnê Nîşan Bide**

*Gelê me pir ji zarokên xwe hez dike û xwe goriyê wan dike. Malbat, saziya herî derbasdar a civakê ye û hema bêje weke ku bi ser zorakên xwe de direcife. Bi pêkhateyeke paşketî ya neteweyîû civakî ku pir kêm derfetan pêşkeşî wê dike, gelê me bi dîtineketêkiliya yekane ku wan li pêşerojê girê dide li zarokên xwe dinêre. Ji ber vê yekê jî dixwaze bi awayekî baş wan mezin bike. Çi dibe bila bibe ji bo zarokên xwe tiştên baş kirin, weke ku armanca yekane ya gelê me ye. Pêwîst e mirov vê rewşê fêm bike û bi rêz pêşwazî bike; lê ti car vê bes nebîne. Divê gelê me zarokên xwe bixwedî bike û mezin bike, wan bi hezkirin û bi rêzê bikemilîne. Lêdivêti car bi vê qîma xwe neyne.*

*Welatê me, mehşera pêvajoyeke dîrokîû şoreşeke mezin dijî. Pêwîst e, li vir, nirxên me bi qasî ku pêdiviyên vê rewşa mahşerî pêşwazî bikin her mezin bin. Gelê me niha bi ewladên nû re rû bi rû ye. Ev ewlad ne tenê yên malbatekê ne, yên gel û neteweyekê ne; her ku diçe dibin yên mirovahiya pêşverû. Divê gelê me van zarokên xwe yên nû baş nas bike û fêm bike; divê, ji zarokên xwe jî hê zêdetir wan hembêz bike. Pewîst e ji bo ku zarokên xwe tevli wan bike, bi fikar tevnegere. Divêkaribe feraseta kevin a 'zarokan' ku têrê nake, bi misogerî veguherîne vê serbilindî, zanebûn û fêmkirinê. Van ewladên nû yên gelê me, girêdana xwe ya ji bo gelê me bi şehadeta xwe îsbatkirine. Pêwîst e gelê me, hezkirina xwe ya herî mezin bide van zarokên xwe. Divê şiîr û helbestên ji vê bi şûn de ji bo wan bîne ziman, navên wan bide zarokên xwe yên nû ji dayik dibinû wan di pêşerojê de bide jiyankirin. Divê bi dîsîplîna dibistanekê hemû taybetmendîû kesayetiyên wan bide nifşên nû gihaştî. Êdî ji vê pê de hemû welatparêz wê ji van dibistanên ku wan nav û kesayetiya xwe tevli kiriye derkevin. Li ser vî esasî wê keç û kûrên Kurdistanê zanibin ku bibin dil û mejiyê milyonan. Gelê me wê ji vê bi şûn de zanibe; ne ku êşa zarokên xwe yên ji bo çend quruşan wenda kiriye bikişîne; bi bûn xwediyêewladên bi esil ên her roja derbas dibe hê zêdetir mezin dibinserbilind be.*

*Belê ew êzarokên xwe bixe ser riya pêşketineke bi vî awayîû bi misogerî deynê xwe yê dilsoziya bi şehîdan re bide. Ma ji bo vê yekê 'darê zorê' çi gotine'? Pêwîst e ew bi jidilbûneke mezin vê bike. Ma eger ne bi vî şiklî be wê çawa karibe ji şerma bi*

*sedan sal xwe xelas bike û di nav malbata mezin a mirovahiyê de bibe xwediyê rumet?*

*Gelê me di wê zanebûnê de ye; ew ewladên wîyên leheng ji bo wî kîjan xizmetên mezin kirine. Dibîne û dizane ku ew nirxên layiqê wan in, jiyana wan lehengan jiyana wan bi xwe ye, exlaqa ew leheng pê rabûne exlaqa wan bi xwe ye.*

*Êdî tihêz nikare ji destê gelê me van nirxan derxe.*

*Gelê me bi van şehîdên berxwedanê, rastiya gelekî ku her roja derbas dibe xwe nû dike dijî.*

*Ji ber vê yekê, gelê me, dema ku pêşeng bi wî ve diçin, weke ku berdevkên exlaq û jiyana nû bin,wan lehengan hembêz dike û bi şik û guman li vê nanêre û wê nenêre jî.*

*Dijmin hewl dide gelê me ji pêşengên wî dûr bixe; ji bo ku ew dengê pêşengên xwe nebihîze, bang û talîmatên wan guhdar neke serî li her rêbazê dide. Lê, na! Eger gelê me bibe hezar parçe jî wê vê elçaxtiyê qebûl neke; wê vê banga şehîdên azadiyê weke talîmat pêk bîne. Ji ber ku wê tenê karibe dema ku xwe bisipêre bîranînên şehîdanû di ser pira wan çêkiriye re derbas be xwe bigihîne pêşeroja ronak.*

**Ewladên Partiya me, milîtanên wê yên hêja!**

*Divê bîranînên şehîdên me, hemû taybetmendiyên wan, helwest û axaftinên wan, ji aliyê hemû endamên Partiya me ve weke talîmat were fêmkirin ûwere pratîzekirin.*

*Ev pêşketina bi êşlê biesil a ji roja destpêkê pê de li ser milê şehîdên me yên lehengiyê mezin bûye, bi hevalê Egîd re gihîştiye zirveyê. Ev di heman demê de tê maneya pişrastkirina jiyan û exlaqa Partiyê bi xwe, piştrastkirina yekane şikilû pratîzebûna wêya tê qebûlkirin, piştrastkirina îdeolojîû pratîka wê. Îro yekane jiyana ku ji bo Partiyêwere ferzkirin, jiyana şehîdên berxwedanêye ku stûnên têkoşînû pêkhateya Partiya mepêktînin.*

*Xelekên esasî ku çêbûna PKK'êû yekitiya teorîk û pratîk a PKK'ê di zikhev de dihone, vaye ev nirx in.*

*PKK ne pêşketineke ji rêzê, lê pêşketinek ku bi xwînê pêk tê esas digire.*

*Ew ji girêdayîbûna bi bîranîna şehîdan vê fêm dike: jiyaneke hê pêşketî pêşkeşkirina pêşeng û bi xwe re pêşketin çêkirina pêşeng. Ev nirx bi awayekî rast an jî bi awayekî çep fêmkirin, bi awayekî nebes an jî şaş şîrovekirin, tê wateya pêşketin û jiyanekeherî bêesil tê hilgirtin nava Partiyê. Ji ber vê yekê neçar e; divê yên di nav refên pêşengiyê de ne xwe bikin sentezeke nirxên şoreşgerî yên şehîdan. Li gorî*

*demên derbasbûyî, wezîfe û erkên pêşeng ên pêwîst e li pêşberî şehîdan bînin cihzêde bûne. Lê ji ber destkeftên ku qehremanên berxwedanê, zêmîna xwe spartinê jî li gorî demên derbas bûyî, bi qasî ku li gel raboriyê ve neyê pêşberî hevkirin bihêz bûye. Ji van nirxan her yek, riya me ronî dikeû bûye meşale. Kesên ku dibin xwediyê van nirxan û dixwazin pê bimeşin, ji bo wan êdî  rê heya asta dawî ronî bûye, hêsan bûye. Lê yên dikevin li ser riya serxwebûn û azadiyê, divê bimeşin, hem jî bi terzeke herî şoreşgeranê bimeşin. Domdariya tevgerê pêkanîn û ji bo ku ew weremezinkirin, pêwîst e bi misogerî ji asta ku hatiyê girtin paşve ketin çênebe.*

*Ji bo ku taybetmendiyên milîtanî yên Partiya me bên pêşxistin, îro di nava Partiya me de şerekî mezin tê meşandin. Yek ji pirsgirêkên me yên herî acîl ev e:Gelek asteng hene ku ji ber vê yekê kadroû milîtanên me nikarin bibin fermandarên taktîkî. Pêwîstiya gelê me bi navendeke fermandariyê ku biryarên rast digire, pêk tîne û tîmî dixebite bi awayekîêşkere li holê ye. Tevî ku ev rastî, ji aliyêSerokatiya Partiyê ve bi hemû aliyên xwe ve weke neçariyekê hatibû daxistin hole ûPartiya me ev kiriye biryar jî, hin kesên di nav Partiyê de ku ji hin bingehên cuda yên çînî tên, xwediyê asteke cuda ya îdeolojîk û polîtîk in, bi helwestên ku nîşan dane bi zanebûn an jî nebizanebûn vê bi zehmed dixin. Lê di nav tevgerek ku ev qas mezin û biesil de jiyan kirina van û bi wê wêrîn jî têrê dike da ku kesek bikeve nav rewşên pir zehmed. Wê demê, neketina nav van rewşan û rewşa ketinê çêbe jî dawî lê anîn, layiqê şehîdan bûn talîmatek e.*

*Partiya me bi armanca ku ji bo pêvajoya li pêşme amadekarî bike, li derve û hindur pir zêde hewl dide. Bi taybetîdi nava Partiya me de em hewl didin ku raboriyê di asteke herî li pêş binirxînin, şaşiyan, xêran, tiştên hatine qezenckirin û tiştên hatine wendakirin careke din hewl didin ku hê baştir were fêmkirin. Gava ku di demên pêş de têra xwe hate derxistin wê hê baştir were dîtin ku ev raboriya bi zêde danayan (veri) dagirtiye, temînata pêşeroja me ye.*

*Û tenê dikare bi xwespartina bîranînên şehîdên me, em xwe bigihînin pêşaroja em divên.*

*Partiya me di pêvajoyên pêş me de bi biryarên konferans û kongreyan, wêvan weke rêgezên jiyanê, weke zagonên Partiyê be lêbike; jiyana şehîdên me, berxwedanên wan ûbîranînên wan, di her qada têkoşînê de wê bibe yekane hêz û pîvana ku pêşdixe û pêşketina xwe didomîne.*

*Weke jiyana şehîdên me yên din, jiyan û têkoşîna heval Mehsûm jî, ku yek ji pêşengên vê pêvajoya berxwedana ku em di nav de ne, di vê mijarê de bi dersên jiyanî dagirtiye. Ji bo ku em karibin berxwedana me ya 1980'îbi taybetî jî ya piştî15'ê*

*Tebaxê têra wêû bi awayekî rast şîrove bikin, bi heman awayîji bo ku em karibin çavkaniyên xwe yên hêzêûpêşaroja xwe bi awayekî bi tenduristî diyar bikin,em neçar in divê beriya her tiştî nirxên ku di pratîkê de xwe îsbatkirine, şehîdên xwe bi awayekî rast û di astek ku têrê dike de fêm bikin û şîrove bikin. Eşkere ye, heval Mehsum jî di destpêkê kesên ku pêwîst e em baş fêm bikin de bi cih bûye.*

*Wê demê tiştê ku di kesayetiya heval Egîd de xwe daye der û şênbêr bûye çi ye?*

*Beriya ji her tiştî Ew yek ji pêşeng û fermandarên herî li pêş ên berxwedana me ya çekdarî bû. Ev xebatên Wî yên li vê qadê,di destpêka hemû xebatên Wî yên şoreşgerî ku heya bi kêliya dawî ya jiyana xwe hewl dabû pêş bixe de tên. Heval Egîd fermandariya grubeke bi qasî 50 kesî ku di çarçoveya avakirin û pêşxistina hêzên çekdarî yên Partiyê de hatibûn birêxistin jî dikir. Di mehên dawî de hewl dide di nav şerekî timî de vê grubê pêş bixe. Bi vê,armanca Wî ew bû ku pratîka şerê çekdarî kûrtir bîke. Pêşketinên derketine holêû destkeftên hatine bidestxistin, hêz û rastiya vê pratîkê pişrast kiriye. Tiştên pêwîst e jê pê de bên kirin, ji aliyê vê pratîka ku hatiye pişrastkirin vetê diyarkirin; neçar e ku êdî li Kurdistanê bi yekineyên partîzananên di asta bolukê de ku hejmara wan li 50'yî derbas dibin, şerê şoreşgerî gav bi gav bê pêşxistin û bê berbalavkirin. Em şerekî şoreşgerî dimeşînin. Ev jî rastiyeke e ku şerê şoreşgerî yê em dimeşîninli ser me ferz dike; bi qasî vê, talîmata heval Egîd û pêwîstiya dilsoziya li gel heval Egîd e. Bi awayekî din bersiva bîranîna peşengekî di jiyan û pratîka xwe de ev pêk aniye nayêdayin.*

*Ya duyemîn, Wî, karibûye zor û zehmetîû bêderfetiyên di nav şer de derdikevin holê ji bo wêrekîû moralê bi temamî bike çavkaniyeke berhemdar a bêdawî. Ev terzê wî yê şer ku di pratîka xwe de hêz û taybetmendiya xwe ya pêş dixe îsbat kiribû, ji bo hemû kadroyên şoreşger ku xwediyêîdîaya pêşengiyê ne, pir zêde girîng e; divê bi misogerî bibin xwediyê vê terza dide qezenckirin. Pêşengiyek ku timîcesaret û moral dide hevalên xwe, ji wan hez dike û ji wan re rêz digire, sedema herî mezin a pêşxîner e. Wê demêbîranîna heval Egîd kujiyana şoreşgerî di kesayetiya xwe de kiribû navendeke xwe lê ragirtinê, pêwîst e di vê mijarê de jî weke talîmatek ku bi misogerîbêpêkanîn were fêmkirin.*

*Ya seyemîn jî heval Egîd karibûye teoriyê li gorî rastiya jiyanê şîrove bike û veguherîne awayên afirîner.*

*Weke ku di nivîsên Wî yên dawî de xuya ye, Wî, li gorî pêşketinên şoreşa Kurdistanê pêşketina xwe jî gav bi gav afirandiye û asta ku diviyabû bigire bi dest xistiye. Bi gotineke din ew berdevkekî bijarde yê rêbertiya ku kariye teorîû pratîkê bi awayekî herî manedar bigihîne hev e.*

*Ji taybetmendiyên herî bingehînku divê kesên îdîaya rêbertiyê dikin di kesayetiya Wî de bibînin û di xwe de pêk bînin yek jî ev e; Teorîû pratîk bi awayekî rast gihandin hev, di nav hev de helandin, ew ji şîroveyên rast û çep xelas kirin û bêyî ku li ser van kûrbûn çêbe, xwe gihandin şoreşgertiyê, taybetmendiyên pêşengîû kar û xebatên serkeftî, ne mimkun e. Ji ber vê yekê, neçar e hemû endamên Partiyê ev taybetmendî li gel xwe afirandinêû xwe gihandinê weke talîmatê fêm bikin.*

*Ya çaremîn, Wî di mijarên weke parastina Partiyê, helwestên li dijî hewldanên provokatîf û tasfiyeger de jî, dîsa pratîkeke herî biryardar, bibandor û encamgir şopandiye. Hevalê Egîd di kîjan zemînê de û di astê de derdikeve bila derkeve, li dijî xebatên xirakirinê di cih de helwest nîşan daye û di vê de jî ti car du dil nebûye; ev bi biryardarî pêk aniye. Helbet divê hemû kadroyen Partiya me jî, bi van taybetmendiyan şer bikin, karibin biryardarîû gihiştibûna ku Wî temsîl dikir, pêli dijî dijmin, hewldanên xirakirinê têkoşîn dikir û encam digirt karibin li gel xwe biafirînin.*

*Taybetmendiyeke din ku li gel heval Egîd xwe dida der jî welatparêziya mezin ya ku ji taybetmendiyên herî girîng yek e ûpêwîst e di mercên Kurdistanê de hewce dike di maneya rastîn de hebe, were kûrkirin û mezinkirin e.*

*Nivîsa ku Wî di Newroza 1985'an de nivîsandibû, vî aliyê Wî bi awayekî herî bi bandor tîne ziman.*

*Welatparêziya wî ya kûr û biesil herî zêde jî, dema dikeve li ser singa Kurdistanêû di hembêza gelê me de cihê xwe digire nîşan daye. Fotoxrafên wî yên ku celadên dagirker bi armanca pişrastkirina mirina Wî weşandine, germahiya Wî di hembezkirina axên Kurdistanê yên pîroz de îsbat dike, bangawaziya herî manedar a şehadeta ji bo welat û gel dike.*

*Belê, her kesê di nav refên mede cihê xwe digire, pêwîst e, weke 'Wî ji welat û gelê me hez bike û weke Wî bi nirxême re girêdayî be. Ev, merca herî bingehîn a girêdayîbûna bi dilsoziya Wî re ye.*

*Hemû endamên Partiyê deyndarê şehîdên me yên berxwedanê ne; ev, dilsoziya bi şehîdan re ye û deynekî pir mezin e.*

*Em îro xwediyê hêzeke berxwedanê ne ku bi saya hewldan, fedekarîûwêrekiya şehîdan me xwe gihandiyê. Gelê me pengaveke mezin û pêşketineke mezin çêkiriye. Wê demê divê em nirxa van destkeftan baş zanibin. Em ê van ewladên herî bijarde yên mala me ya Mezin Partiya me di nav dilên xwe de bi cih bikin û di zanabûna xwe ya ronak de timî zindî bigirin.*

*Em ê bi wan re bifikirin û bi wan re bibîzin.*

*Her wiha em ê di her kêliyê de, her saet di nav têkoşîn û pêşeroja xwe de wan bidin jiyîn. Îro şerê me yê berxwedanê hatiye ber deriyên xeta taktîkî. Ku hedefa wê "gel di nav cepheyê de birêxistin kirin û di nav artêşa gerîla de şer dan kirin e". Berpirsiyariya me ew e ku em weke pêwîstiyeke girêdana bi welat, gel û şoreşê re jî vê wezîfeyê pêk bînin.*

*Amadekariyên bi vê zanebûnê tên meşandin, ji bo afirandina rêxistinbûna artêşê bi lêz pêş dikeve; ji bo ku gelê me bi rêxistina xwe ya cewherî re bibe yek, tewdîrên derxistina qanûna leşkeriyê jî di nav de, amûr û rêbazên pêwîstî bi wan heye tên pêşxistin. Partiya me afirandina artêşa gerîla ji xwe re kiriye hedef. Em ê vê jî bi honandina cepheyekî neteweyî li derdora kadroyên bijarde yên Partiyê re di zikhev de çêbikin. Partiya me ji bo pêkanîna van hedefan xebata xwe kûr û giran kiriye. Hemû endamên Partiyê di heman demê de ev erka ku di heman demê de bicihanîna wesiyetên şehîdên me yên mezin e jî wê bi misogerî bînin cih û bi zanebûn û berpirsiyariya vê bi awayekî watedar bijîn.*

*Di dema pêş mede wê kongre û konferansên Partiya me bên lidarxistin. Partiya me wê di van xebatan de ji bo ku aliyê rêxistinî yê avabûna Eniya Rizgariya Neteweyî were mezinkirin xebatên pêwîstî bi wan heye li dar bixe û tewdîrên bisazîbûnê pêş bixe. Dema li pêş me, ji bo ku em bi van erk û wezîfeyên xwe rabin wê bi awayê herî herî berhemdar were nirxandin.*

*Dîsa di vê çarçoveyê de ji bo rêxistinbûn û perwerdeyeke hê li pêş wê plansaziyên pêwîst bikin bên lidarxistin; ji bo pratîkeke rast û têrê dike wê amûrên pêwîst ji niha de bên amadekirin.*

*Kar û xebata Partiyê li ser van bingehên girîng pêş dikeve û wê di mijara tifaqan de pêşketinên erênîû girîng bên jiyîn. Di pêvajoya pêş me de weke em li bendê ne, li hindur tifaqên li ser bingeha eniyê pêş bikevin û li derve jîdi mercên ji yên timî zêdetir çêkirin û kûrkirinatêkiliyên dostane wê bên domandin. Ji ber berxwedanê, şehîdên me yên berxwedanê çêdibin. Pêwîst e ev wendahî bên pêşwazîkirin. Ji bo vê divê em hê zêde kadroyên nû perwerde bikin;kadroyên ku karibin di astên li pêş de têkoşînê bimeşînin, endamên kadro yên nû biafirînin û amade bikin. Partiya me, bi vî awayî, wê avabûna xwe ya rêxistinî bi lez pêşdebirinê bidomîne; wê vê jî li ser esasa têkoşîna li dijî bi her awayî jirêderketinên rast û çep pêk bîne, rêxistinkirina xetê bi kontrol û pratîkeke xurt hê bihêztir bike û bimeşîne.*

*Rola partiya me ya ji rizgariya neteweyî re pêşengî kirinê, ji aliyê piraniya gel ve tê pejirandin. Ev rol ji her demê hê zêdetir îro derketiye pêş. Partiya me, karê teşhîr û*

*tecrîdkirina rêxistinên noker-reformîst hê jî pêş bixe û ji bo yên ji karê şoreşgerî re nêzîkatî raber dikin tevli refên berxwedanê bike wê hemûtewdîran wergire.*

*Emê, bi qasî ku mimkûn dibe ji helwestên zêdegavî xwe bidin aliyekî; lê em ê xeteke pratîk ku ne ji xeta pêşketina pratîk a niha ya Partiya me paşketîtir e, ku xwe pê re dike yek û di nava Partiyê de tîne rewşeke serwer, esas bigirin.*

*Vaye êdî bi temamî misoger bûye ku tenê dikare dema guherîn û veguherînên bi vî awayî bên pêkanîn û dan axaftina bi awayekî herî xurt a çekên PKK-ERNK-HRK'ê bersiva bîranînên şehîdan bê dayin. Hemû endamên Partî yên ku bi zanebûn ûberpirsiyariyeke kûr tevger dikin, wê erk û wezîfeyên girtine ser milên xwe bi misogerî bi serkeftinê bînin cih ûjiyanên şehîdên me yên berxwedanê di jiyan û pratîkên xwe de weke talîmatekê pêk bînin.*

*Di herî destpêkê de Seroktiya me ya Partiyê, hemû Partî, em soza xwe nû kirinê weke girêdayîbûna bi dilsoziya di serî de heval Egîd, hemû şehîdên me yên berxwedanê dibînin; em êvan taybetmendiyên talîmatwarî ku di kesayetiya heval Egîd de xwe dane der di seransera hemû Partiyê de serwer bikin, vê bi enîû artêşê bikin malê hemû gel û ji bo ku em vê doza xwe ya rizgariya neteweyî ku şehîdên me di oxira wê de jiyanên xwe yên giranbiha feda kirine, bi çi dibe mal bila bibe mal bi serkeftinê bi encam bikin em ê ji ti astengan xwe nedin aliyekî.*

*Heval Mehsûm di 1982'ê de soza girêdayîbûnê ku me li pêşberê bîranîna heval Mezlûm da bû esas girt; bi wê pratîka xwe ya bi heybet, bi berxwedana xwe bersiv da û di Newroza 1986'an de ev helwesta xwe gihand zîrveyê. Em soz didin heval Egîd ku em ê jî dîsa bi ruhê wê sondê tevbigerin û pêwîstiyên bîranîna Wîweke talîmat qebûl bikin bînin cih.*

*Ew êtimî weke sembola pêvajoya lehengiya têkoşîna me ya rizgariya neteweyîwerebibîranîn!*

***Gulana 1986'an***

**Û Egîd**

**Mehsûm Korkmaz**

Fermandar Egîd; di seranserê têkoşîna berxwedana rizgariya Kurdistanê de, li dijî dagirkerîû feodalîzmê, berxwedana şoreşgerî ku bi pêşengiya PKK'ê pêş ketiye di astên cur bi cur de temsîl kiriye; di refên herî pêş ên berxwedanê de meşiyaye,li beranberê bi her awayêêrîşên li dijî gelê me bi biryardarî sekiniye, gelek êrîşên li dijî tevgerê vala derxistiye û bi pratîka xwe gelek caran isbat kiriye ku fermandar û

kesayetiyekî mezin e. Fermandar Egîd tevî ku ji Ferqînê bû ji ber ku malbat di temena Wî ya ciwan de li Êlihêbi cih bibû, li vir mezin bibûû li vir tevli xebatên xwe yên destpêkê yên şoreşgerî bûye. Di encama hewldanên rêberê mezin heval Mezlûm Doğan de, Egîd, bûye yek ji kesên destpêkê yên ku li gel Partîtêkilî daniye; di wê pêvajoyê de mercên siyasî yên Ferqînê, sedem û awayên Wî yên li gel Partîtêkilî çêkirinê, di raporek ku pêşkeşî partiyê kiriye de bi kurtahî bi vî awayî tîne ziman:

*"Ji herêmek ku hizrên welatparêziyê li pêş û berbelav e (Ferqîn) bûna min, tesîra tevgera şoreşgerî ya Tirkiyeyê, xwediyê hestên mirovhezbûna minû li gel ciwanên rewşenbîr ên pêşverûhebûna girêdana min di bûna min a şoreşger de rol lîst… Dest bi jiyana şoreşgerî kirina min bi rêxistina me re dest pê kir. Beriya wê jî ji bo şoreşgeriyê hezkirina min hebû, lê li gel ti rêxistinên şoreşgerîtêkiliyên min çênebûn… Têkiliyên min ên bi Rêxistina me re, di sala 1977'an de dest pê kirin. Ciwanên rewşenbîr ku di çarçoveya komalan de li yek kom dibûn, ji hev cuda dibûn û grubên siyasî pêk dianîn, elaqaya min a ji bo pêkhateya şoreşger a têvgera me û helwesta piraniya hevalên min ku heman fikir parve dikirin, bû sedem ku ez li dijî grubên din ên reformîst û sosyal şoven li gel tevgera me cih bistînim. Min, paşê ev pêngava xwe bi lêkolîn û bi zanebûn berdewam kir."*

Fermandar Egîd, di mercên ku li dijî Têkoşîna Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanêêrîşên pir zêde hebûn de gava xwe ya destpêkê ya şoreşgerî avêt. Ji ber vê yekê, ji dayikbûna şoreşgerî ya fermandar Egîd, jidayikbûneke di ve astê de biesl e. Ew, di hemû têkoşîna xwe ya ji vê bi şûn de de timî bû pêşengê berxwedanê, her ku diçe bû kesayetiyeke hê biqewet.

Fermandar Egîd,li Êliha(Batman) ku ji dayikbûna xwe ya şoreşgerî pêk anîbûdest bi xebatên xwe kiribû. Wî, bi îlana şer li dijî hemû astengiyên cihêlêhatiyê dinêpêşketinên mezin çêkirin. Beriya her tiştî di pêvajoya 1977-1978'an de li dijî sosyal-şovenîzm û reformîzma neteweperestiya burjuwaziya biçûk şerekî mirin û mayinê meşand, bi kar û barê daxistina maskeyê li ser çavên van hêzan di serî de ciwan ji bo ku gel li pey van hêzan neçe hewl da. Wî, hê bi vê çalakiya xwe nîşan dabû ku pêşengekî mezin ê gel e. Ji bo ku gel li derdora doza serxwebûn û azadiyê kom bibe hewldaneke mezin nîşan dabû.

Di sala 1979'an de çîna karker a Êlihê ku hejmara wê li 10 hezarî derbas dibû, li dijî dewletê bi rêxistin kir û ji bo ku daxwazên aborî yên karkeran bi cih werin ked dabû. Salane girtina karkerên ku hejmara wan li sedî derbas dibû, xistiye bin înisiyatîfa komîteyên karkerên şoreşger. Di nav TPAO (Şirîkatiya Lêgerîna Petrol Ya Tirk) ya ku saziyeke dewletê ye de serweriya karkeran pêk anîbû. Dîsa ber bi dawiya

vê salê ve di hilbijartina şaredariyê ku hatiye lidarxistin de xebateke çalak meşandiye, tevî ku çepger û rastger jî li dijî derdiketin, di qezenckirina Edîp Solmaz bi roleke mezin rabûye û piştgiriya bi deh hezaran mirovîwergirtiye.

Mêtinger û paşverûyên herêmîyên ku nekaribûn vê pêşketina pir mezin ku Partiya me di bin pêşengiya fermandar Egîd de çêkiriye daqurtînin, wexta ku partiya me wekî ku piştgiriya çîna karker stendibû her wiha jî piştgiriya hemû gelî girtibûû hilbijartinên şaredariyê jî wergirtibû, bi komployeke şirîk bersiv dan vêû heval Edîp qetl kirin. Di dîroka berxwedanê ya Êlihê (Batmanê) de ev bûyer jî, xwediyê cihekî girîng e. Hêzên mêtinger û paşverû yên herêmî, li dijîîradeya azad a ku gelê me belkî jî di dîroka xwe de cara destpêkê bi kar aniye, gule berdaneû xwestine pê pêşketina şoreşgerî bisekinînin. Di vê mijarê de jî wezîfeyên mezin diketin li ser milê fermandarê mezin Egîd. Wî, wekî ku nêzî her erk û wezîfeyê bûye, bi rihekî mezin ê berpirsiyariyê nêzî van erk û wezîfeyên xwe jî bûye. Kir ku kujerên heval Edîp Solmaz di demeke kurt a bi qasî 9 rojan de bên cezakirin. Li ser vî esasî, li dijî axayên Ramanê ( Faxro Axa) berxwedaneke bi heybet daye destpêkirin û otorîteya vê çeteyê aniye sifirê; di bêbandorkirina vê çeteyê ku ji demeke dirêj e vir de li serê gel bûye bela de mînakên fermandariyeke mezin pêşkeş kiriye û gel ji vê belayê xelas kiriye.

Pêngaveke girîng a di vê demê de ya Fermandar Egîd jî, li derdora vê berxwedanê, di têkoşîn bi awayê xwe yê çekdarî hilgirtina çiya de bi roleke çalak rabûyin bûye. Her çendî têkoşîn hilgirtina çiya bi awayê mînakên destpêkê jî be, ji berxwedana ku îro li çiyan gihaye asteke bi heybet, wateya berxwedana wê demê hê baştir tê fêmkirin.

Fermandar Egîd, piştî van pêşketinan ji bo ku di riya şerê gel de pêngavên hê mezintir biavêje, li ser esasê ku di serî de di qada îdeolojîk û polîtîk de û di hemûqadan de hê baştir xwe amade bike, li ser banga Partiyê di Çileya 1980’an de çû kampên Filîstînê ku li Lubnanê bûn. Piştî pêvajoyeke perwerdeyê ya bi qasî heft mehan, dubare bi hêviyên mezin, bi hestên berpirsiyariyeke mezin vegeriya li welêt. Dema ku ew vegeriyabû, di asteke li pêş de berxwedanli vê qadê dihate domandin. Lê belê wekî li her derê bûye, li herêma Êlîhê ku berpirsariya wê heval Egîd girtibû ser milê xwe, krîzeke rêxistinî ya kûr dihate jiyîn. Ev qonax, di heman demê de qonaxek ku beriya ji rejîma faşîst a 12 Îlonê bihata ser kar bû. Egîd bi zanebûna vê,dest bi xebatên giranbiha kiriye û bi xebat di qadeke berfireh de meşandinê, kariye di asteke diyar de ji bo rêxistinê derfet biafirîne. Ev pêvajo di heman demêde ji bo Partiya me pêvajoya ku berê xwe dabû taktîka paşve kişînê bû. Wî, di vê pêvajoyê de di parastinûveguhestina wan a ji derveyê welat, di pêkanîna ewlekariya wan de bi

erkên girîng bi ser xistinê, di şert û mercên cuntayê de jî heya bi Konferansa 1. a Partiyê ya 1981'an di hindurê welêt de pêşengiya berxwedanê kiriye. Di vê pêvajoyê de her çendî bi gelek xetereyan re rû bi rû mayîbe jî kariye ku van xeterayan yekoyeko derbas bike. Ji van xetereya yek jî bûyera hatin girtina heval Kemal Pir bû. Fermandar Egîd, dema bi heval Kemal Pir re ji herêmekê diçû herêmêkê, dema rastî leşkerên dijmin tên bi wan re dikeve şer û gava ku ji erebeyê xwe diavêje erdê tevî ku milê Wîû Destê Wî dişikêbi leşkerên dijmin re şer kiriye û kariye xwe rizgar bike.

Fermandar Egîd demeke dirêj li hindûr berpirsiyariya xebatê meşand. Paşê ji bo ku tevli Konferansa 1. a Partiyê bibe, cara duyemîn derket derveyê welêt. Di vê Konferansê de raporek pêşkeşî Partiyê kir. Di vê raporê de li serpêşketinên şoreşgerî ku ji destpêkê pê de hatine jiyîn şîroveyek pêşkeş kir. Bi vê, çawa ku rastî ji bo Partî ronî kir, her wiha jî ji bo çareseriya pirsgirêkên Partî bi kedeke mezin tevli xebatê bû. Di pêvajoyeke dema kurt ku li vê derê mayî de tevli perwerdeya kadro bû. Fermandar Egîd tevli perwerdeya kadroyan a siyasîû leşkerî bû; broşureke bi navê 'li ser şer, artêş û serhildanê'jî amade kir û di kûrtirbûna perwerdeya kadroyan de bû xwediyê ked û hewldan. Fermandar Egîd ku di wê pêvajoyê de li dijî tasfiyegeriya ku dest pê kiribû xwe bide der jî têkoşîn meşand, di encama hewldanên xwe yên giranbiha de karîbû kadroyan ji vê xetereyê biparêze; di heman pêvajoyê de bû endamê Komîteya Navendî ya Partiyêû ji bo ku kadro li ser esasê şaşiyên wan bên perwerde kirin, li dijî jirêderketinên bi her awayîyên çep û rast xizmetên mezin raber dike. Fermandar Egîd, piştî Konferansê demekê li Lubnane ma û paşê ji aliyê Partiyê ve hate şandinBaşûrê Kurdistanê; li wir dest bi amadekariyên vegera li welêt kir ûbi coşeke mezin, her berpirsiyariya hemûwezîfe û erkên şoreşgerî yên li Kurdistana Başûr û Kurdistana Rojhilat girte ser milê xwe. Ji ber xebatên meşandine di demeke kurt de di aliyê polîtîk, rêxistinî, teknîkî de gelek destkeft bi destê xwe ve anîn bingehên amadekariyên pratîkî danîn. Divê mijarê de jî bi fekadariyeke mezin tevli xebata perwerdeyê ya kadroyan bû. Li aliyekî bi gelek hêzên derdorê yên cur bi cur re têkilî pêş xistin û li aliyê din jî ji bo Partiya me mewziyên derveyê şer afirand. Dîsa, li dijî tasfiyegeriya ku di şexsiyeta provokatorêSilêman dehê di wê demê de xwe dida dest, di kadroyan de dibû sedema texrîbata zêhnî, kaos, têkçûna moralê, sekinîû li aliyê din li dijî rewşa şelo ku ji aliyê lîberalîzma burjuwaziya biçûk ve hatibû afirandin, têkoşîneke çalak meşand. Her wiha, Wî dinavbera Başûr û Kurdistana Bakûr de girêdaneke xurt çêkir, bû sedem ku pêşketineke girîng derkeve holê. Di vê navberê de ji bo perwerdeya kadroyan jîhewl da û ked raber kir; broşûra bi navê "di xebatên şoreşgerî de rexneya li ser ferasetên çewt" nivîsand.

Ji aliyê Partiyê ve ber bi dawiya sala 1982 ûbi taybetîjî di bihara 1983'an de kar û xebata ji bo vegera welat hate destpêkirin. Fermandar Egîd tevli xebata amadekirina van gruban jî bûûji bo cihên pêwîst ên Kurdistanêdi gihandina gelek grubên pêşeng ên şoreşger de bi roleke çalak rabû. Wî, di vê navberê de bang li hêzên li Başûr dikir ku " êrîşa Tirkan bi şerekî berfireh ê gerîla bê pêşwazîkirin" û di heman wextê de derbasî Bakur bû, ji bo ku eşîrên li ser sînor di bin ala PKK'ê de tevli şerekî bi vî awayî bike,têkilîû temasên zêde pêş xistin. Lê belê hem helwestên teslîmkar-lihevkirinê yên hêzên Başûrê Kurdistanêû hem jî bi awayekî ku poşman bûye paşve kişîna artêşa Tirk pêşiya pêşketineke bi vî awayî girtiye.

Fermandar Egîd ji vê dirokê bi şûnde li Bakurê Kurdistanê berpirsiyariya van grubên pêşeng digire ser milê xwe, kar û xebata xwe li vir didomîne. Ev pêvajo pêvajoyek ku ji nû ve vegera li welêt tê çêkirin û li welêt avabûna rêxistinî destpêkirî ye. Herêma Botan kufermandar Egîd berpirsiyariya wê rakiriye ser milên xwe, di şerê rizgariya neteweyî de herêmek ku bi roleke heya di asta dawî de girîng e rabûya bû. Jixwe şerê şoreşgerî yê ku heya îro hatiye domandin, pişrast kiriye ku ev bi vî awayî ye.

Herêma Botan tevî ku di dîroka şer ê Kurdistanê de xwediyê cihekî pir girîng e, di aliyê pêşxistina şer de di hinava xwe de gelek taybetmendiyên ne erênî jî dihewand. Beriya ji her tiştî ev herêm cihê herî paşde mayî yê Kurdistanê bû.

Fermandar Egîd ji bo ku li Botan derbasbûna şerê çekdarî çêbe û li ser vî esasî di şerê gel de pêşveçûn çêbibe, berpirsiyariya pêşengiya berxwedanê digire ser milê xwe; di serî de li qadên cur bi cur ê Botanê de, ji bo ku li gelek cihên welêt yekîneyên pêşeng werin bicihkirin bi roleke çalak rabûye, di aliyê pratîkê de berê wan diyar kiriye û di vî aliyî de serkeftinên girîng bidest xistiye. Di xebatên şoreşgerî ku di van şert û mercan de tên meşandin de di demeke kurt de zanebûneke diyar ji bo gel hatiye dan. Di propanda û ajitasyonê de tenê bi derdorên sînordar têng mayin çênebûye, girseyên berfireh hatine şiyarkirin. Ji gel alîkariyeke mezin hatiye wergirtin û di asteke diyar de rêxistinbûn hatiye pêşxistin, di aliyê amadehiyên teknîkî yên weke keşîf, îstîxbarat û hwd. de pêşketineke girîng hatiye çêkirin, xebatên rêxistinî yên cuda di nava xwe de hatiye gihandin asteke yekpare; ji bo destpêkirina pevajoyake çalak amadekarî hatibûn temamkirin.

Fermandar Egîd, di pêkanîna van hemû erk û wezîfeyan de ne tenê di aliyê fikrî de bi diyarkirina aliyê pêşketinan qîma xwe aniye: Her roj bi xwe çend çiyayên bi qasî 4000 metro meşiyaye, bi xwe tevli pratîkê bûye û pêşengî kiriye, pîvanên pêşengiya şoreşgerî bi pratîka xwe daniye holê.

Fermandar Egîd ji vê pêvajoyê, ku çend salan berdewam kiriye encamên girîng derxistiye. Amadekarî jî hema hema têrê dikirin û bi vî awayî nedikarî ku şoreş bi pêşve bihatana birin. Diviyabû ku rêbazeke xebatê ya bi şoreşê gav bide avêtin bihata pêşxistin. Bi rêbazên ji beriya vê, wê nekariya xetimîna rêxistinîwere derbaskirin. Karên bi vê rêbazê bihatana kirin hema bêje hatibûn kirin, encamên diviyabû bên wergirtin hatibûn stendin. Dibe ku bi awayê çekdarî dest li têkoşînênehatibana werdanû wisa  berdewam bikirina, lê wêbi vî awayî nekaribûya milîmekê jî pêşde biçe û pêşketina şoreşgerî bihatana çêkirin. Berevajî, Wê rizîn, xirabûn û oportînîzm pêş biketa. Û jixwe destpêka pêşketineke wiha jî, di kesayetiya burjuwayên biçûk ên di nava rêxistinê de xwe dida der. PKK'ê bi pêşbîniya vê xetereyêû bi pêwîstiya pêngavekê tevgeriyaye, di bihara 1984'an de civînek ku beşeke kadroyên xwe yên di nava pratîkê de tevlibûne li dar xistiye, encamên xebatê nirxandineû taybetmendîû terza xebatê ya pêvajoya nû ku wê bihatana pêşxistin bi kadroyan daye fêm kirin.

Di vê civînê de, fermandar Egîd, bi awayê ku heye pratîk xurt nirxandiye, ji Partiyê re pêşniyara “avêtina pêngaveke aktîf kiriye. Sedemên pêşniyara xwe bi awayekî berfireh îzah dike xuya dike ku ev pêvajo neçar e bibe pêvajoyê gavavêtinê, pêvajoyeke xurt a şerekî gel û ji bo ku di biryardariya pêngava 15'ê Tebaxê de, jiberiya vê pêvajoyê biryardariyê, ked û hewldan nîşan dide...

Piştî ku aliyê amadekariyên ji derve bi vî awayî hate diyarkirin, Fermandar Egîd zivirî Botan û amadekariyên 15'êTebaxê li hindur domandin, di demeke kurt a sê mehan de wezîfe û karên weke, ji nû ve kombûna milîsan, têkiliyên rêxistinî bi awayekî hê xurtir rêkûpêkirin, pêkanîna navendîbûna kar û barên rêxistinî, bi lez kirina amadekariyên teknîkî, li ser hev komkirina şervanên çalakvan, hêza milîsan li ser hev komkirin ûanîn şiklekî amade, li pey hev derbe li pekhateya ajan-muxbîr dan û ewhêz paşxistin û li gel hemû van amadekariyan, xwe gihandin plansaziyeke çalakiyan bi ser xistin; ji bo ku rêxistina Botan ji bo şer were rewşeke amade bi roleke girîng rabû.

Fermandar Egîd ku demeke kurt ji beriya 15'ê Tebaxê ji bo endamtiya konseya navendî ya PKK'ê hatibû hilbijartin, di vê navê de ji bo Konseya Navendî ya HRK'ê jî hatibû hilbijartin.'Taxima 14'ê Tîrmehê ya Propagandaya Çekdarî ku ji yekîneyên destêpêkê yek bû, çalakiya xwe ya despêkê, bi serdegirtina Dihê ku çalakiya herî bi hêz a pêngava 15'ê Tebaxê bû pêk anî.

Hema piştî 15'êTebaxê fermandar Egîd li aliyekî, li Bêşabebê yüzbaşi jî di nav de, yekîneyeke leşkerî tevî erebeyê tine kir, êrîşî yêkîneya cenderme ya li Şirnexê kir û

piraniya wan kuşt an jî birîndar kir, li Qilabanê ajan-muxbîr ceza kirin, bi çalakiya ku pêli Dihêderbeyeke mezin li pêkhateya milîsan daye, plansazîû rêxistin dikir; li aliyê din jîweke berpirsê grubên çekdar dest bi kar û xebata, ji bo ku mercên ku 15’ê Tebaxêafirandine ûbi propaganda û ajîtasyona ew dimeşîne bibêrêxistin,bi girseyên gel,mane û girîngiya 15’ê Tebaxêdane fêm kirin û ew kirin xwediyê zanebûn, li ser vê zemînê di nav gel de eniyeke xurt a piştgiriyê ava bike, ji bo ku hêza rêxistinê mezin bibe endamên nû yênşervan û kadro tevli bike, yekîneyên çekdarî li gorî destkeftan û guherînên pêk bên perwerde bikeû jixwe bi pêkhateyeke bi qewettêkoşîna çekdarî bimeşîne.

Fermandar Egîd van hemû xebatan bi serkeftî dimeşîne û lê dike ku girseyeke berfireh bibe xwediyê zanebûn û were bi rêxistinkirin, li derdora têkoşînê mil bidin hevdu û her ku diçe bi awayekî çalaktir piştgirî bidin têkoşînê. Di encam de; Wî, weke berhemên vê piştgiriyê, tevî şervanên piraniya wan ji nava girseyê hatine, ew çalakiya serdegirtinê ya Gundikê Melêyêgirêdayî bi Şirnexêve ku bi xwe hem plan kiriye hem bi rêxistiye û hem jîweke kes tevli bûye li dar dixe. Tevî ku li qereqolê zêdetirî 150 leşker û 15 kesên ku li cihên cuda mewzî girtine hebûn, derbeyeke mezin li dijmin daye, ji wan yek subay 5 leşker hatine kuştin, 15 leşker birîndar bûne, çekên gelek leşkeran hatine desteserkirin û gelek cihên qereqolê hatiye hilweşandin.

Her wiha bi vî awayî Fermandar Egîd di vê qonaxê de bi pratîka xwe isbat kiriye ku bêyî jê guman bibebi giştî ji bo pêkanîna xeta Partiyêûbi taybetîjî di qada siyasî, leşkerî, rêxistinîûdi hemû qadan de ji bo pêkanîna xeta Partiyê ya pratîkî xwediyê kesayetiyeke pispor e.

Piştî van pêşketinan hemûyan, êdî demsala havînê xelas bûye. Tevgera Partiya me ya ‘li dijî terora faşîst,pêşxistina berxwedana şoreşgerî bi dawî bûye, li ser bingehê ku ji bo berxwedaneke nû amadekarî bike dest bi pêvajoyeke giran a zivistanê bûye.

Fermandar Egîd bi zanebûna ku di zivistanê de têkoşîna şoreşgerî berfireh kirin û çalakvaniya şoreşgerî berbalevkirin û domandin xetereyan li gel xwe hildigire tevgeriyaye û tehlîleke bi vî awayî pêş xistiye: “pêwîst e di vê pêvajoyê de tecrûbeyên şoreşgerî bên fêmkirin, perwerdeya kadroyan li ser vî esasîwere kûrkirin û hemû destkeftên şoreşgerî bên parastin û bibin hêza rêxistinî”. Ji bo ku plansaziyeke di vî aliyî de pêş bikeve bi roleke çalak radibe. Fermandar Egîd piştî ku yekîneyên leşkerî li ser vî esasî digihîne rêkûpêkiyeke rêxistinî tevli civîna zivistanê ya Komîteya Navendî ya Partiyê dibe.

Fermandar Egîd di vê civîna di navbera 20-24’êKanûna 1984’an([1]) de hatiye lidarxistin de ku piraniya nîqaşan li ser vê mijarê bûn, xwe digihîne hin analîzan û li ser vî esasî jî, hin pêşniyaran pêşkeşê partiyê dike:kûrkirina şerê çekdarîbi pêngavên nû yên şoreşgerî,pirsgirêkên têkoşîna şoreşgerîû riyên çareseriyê, avakirina rêxistinên çekdarîû yekîneyên çekdarî yên mezin, pirsgirêkên wan ên vesazîû rêveberiyê,peydakirina amûran, amadekirina planên leşkerî, kûrbûn û berferehbûna di taktîkên çalakiyan de. Di encam de Wî bi serenavê ‘li ser pêşxistina şerê şoreşgerî’raporek ku xwediyê naveroka planekê yejî pêşkeşê civînê kiribû, bi vî awayîpirsgirêkên heyî di asteke têrê dike de bi îzahkirinekepisporanemînakeke xurt a berpirsiyariya şoreşgerî careke din jî li ber çavan raxistibû.

Piştî civînê ji bo ku rapor û biryarên di civînê de hatine wergirtin pêşkeş bike û talîmatên pêwîst bistîne, Fermandar Egîd li ser esasê ku bi Serokatiya Partiyê re hevdîtinan çêbike wezîfe stend; çend mehan ji herêmê qut bû, dema ku li gel grubeke hevalên xwe vedigeriya Botan di Nîsana 1985’an de li Başûrê Kurdistanêket kêmîna ku ji aliyê hêzên sosyal şowen PKI’yê (Partiya Komînîst A Iraqê) ve hatiye vedan. Fermandar Egîd karîbû vê kêmînê têkbişkîne û di Gulana 1985’an de xwe bigihîneherêma Botan, û careke din berpirsariya berxwedanêbigire ser milê xwe.

[1]Komîteya Navendî ya Partiyê di Kanûna 1984’an de bi awayekî berfireh û kûranî pêşketinên heyî dinirxîne. Hemû pirsgirêkên xebata pratîkî tîne rojevê, hewl dide ji bo pirsgirêkên herî biçûk jî çareseriyên mayende pêş bixe. Sekretarya giştî ya Partiyê di rapora xwe ya berfireh ku pêşkeşî civînê kiriye de pêşketin û rewşa siyasî ya heyî di aliyê siyasî, rêxistinîû çalakvaniyê de bi awayekî kûrahî analîz dike. Diyar dike ku pêşketinên çêdibin di wê astê de ne bi qasî ku di dîroka gelê me ya têkoşîna rizgariyê de serdemeke nû pêk bîne mezin û dîrokî ne; wê ji vê bi şûn de pêşketin di asta ku di gotinên ‘serhildana Kurd’ û ‘gerîlayên Kurd’ de tê ziman be. Yanî dide zanîn ku pêwîst e plansazîû rêxistinbûn di vê astê de pêş bikeve; weke erkeke dereng mayî, bêyî ku hê jî dereng bimîne Eniya Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanêwereîlankirin. Rapor ji bo hemû pirsgirêkên esasî yên têkoşîna şoreşgerî çareseriyên eşkere datîne holêû aliyê rast ê pêşketinan nîşan dide. Li gorî hedefên ji aliyê rapora Sekreteryaya Giştî ya Partiyê ve hatiye diyar kirin,plansaziyên pratîkî tên pêşxistin.

Piştî ku li ser alaya Şirnex û hêzên dijmin yên li cihên cuda mewzî girtine çalakî hatin pêkanîn, ji bo ku hêz bide vê pêvajoya Eniya Rizgariya Neteweyî ku li 21’ê Adarê hatiye îlankirin ûîlana ERNK’ê bê gihandin cihê herî dûr ê welêt, dest bi civînên

berfireh kir. Bi tevlibûna yekîneyên HRK'ê yên di asta taximê de di bin ala ERNK'ê de û bi megafonan xîtabê gel hatiye kirin. Di encama van civînên di hejmareke zêde de hatine lidarxistin de destkeftên girîng hatine bidestxistin. Bi gelek gundiyên di wê demê de di mercên çewisandina zêde de çek wergirtineû bûne çeteyên milîs, çêk dane berdan. Derfet hatine amadekirin da ku di bin ala ERNK'ê de mil bidin milê hev û du. Li gorî vê, li Kurdistana Navîn, şerekî ku wê bi lez veguhere gerîla, bê meşandinû li qadên ku pêşketin bi xwe re çêkirine serhildanên çêkdarî yên herêmî bên lidarxistin. Wê çalakvaniya 15'ê Tebaxê belavî her devera destdayî ya welêt bibe. Girêdayî bi têkoşîna li Kurdistana Navîn, wê li Bakûr û Rojava propagandayeke çekdarî ya zêde zêde ku her diçe dibe gerîla were meşandin. Rêxistinîûrêvebiriya pratîkî wê li gorî van erkan bi awayekî destdayî were rêxistinkirin, wê ji bo eyalet, rêxistinbûna li herêman ûrêxistinan karbeşî were pêşxistin. Di dîroka me ya demdirêj de 21'ê Adarê xwediyê cihekî xweser e. Wê di vê rojê de îlana Eniyê were lidarxistin, wê ji vê dîrokê pê de bi pêngavên di cih de were pêkanîn were pêşxistin; di pey pêngava 21'ê Adarê di meha Gulanê de 'hewldana jiyandina bîranîna şehîdên şoreşê', di mehên Tîrmeh ûÎlonê de 'tevgera berxwedana sor', di meha Mijdarê de 'tevgera bihêzkirina Partiyê' wê bê meşandin. Wê piştî meha Tebaxê serhildanên herêmî werin lidarxistin.

(*devam  sayfanin başına gelmeyecek, dipnotun devamı olarak karşı ya da arka sayfanın dipnotu olacak)Pirsgirêkên hê cuda yên plansaziyeke bi vî awayî, bi nîqaşê jê re çareserî tên peyda kirin. Navê Eniyê tê diyarkirin. Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistanê (ERNK): Daxwuyaniya avakirina Eniyê tê amadekirin. Xebatên weke ji nû ve sererastkirina rêxistina Partiyê, rêvebirî,yekîne, grub û wezîfedarên li qadên cuda têdiyarkirin. Ji boku pirsgirêkên pratîkeke xebata demdirêj û giran were çareserkirin, qederekê daketine nav detayan çêdibe û amadekariyeke qederekê pêşketî tê lidarxistin. Eger ev amadekarî çiqas bi awayekî serkeftî pratîze bibin êdî wêji aliyê vê ve pêşeroj were diyarkirin. (serxwebûn, hejmara taybet a 10. 1'ê Tebaxa 1986'an)

Ji van xwepêşandanan a herî mezin, taxima ku Egîd fermandarê wê bû ya bi navê 'taxima 14'ê Tîrmeha 1982'an' ku di vê rojê de hevalê Xêyrî Durmuş û Kemal Pîr li zindana Amedê dest bi berxwedaneke mezin kiribû, di salvegera vê rojê de yanî di şeva 14'ê Tirmêhê de li navçeya ÇataxaWanêçalakiyek mezin hate lidarxistin. Li

navçeyê hemû hêza dijmin ku li wir amade ye hate bêtesîrkirin. Paşê ji bo gel bi saetan axaftin çêbûye; di encam de nobedarek birîndar bûye, çekên çend nobedaran hatiye desteserkirin û çalakî bi serkeftineke mezin hatiye temamkirin û paşde kişandin çêbûye.

Ev çalakî, bû çalakiya dawî yaçalakiyên bi vî awayî ku bi armanca propagandayêji bo gel dihatin li darxistin. Ji vê bi şûn de, fermandar Egîd êrîş bir li ser taxima milîs-çeteyên ku dîsa li vêherêmê hevalên Seyfedin Ozen, Ehmed Çalışkan û Hasan Bulut[1] şehîd xistbûn. Bi vê armancê koordîne û rêvebiriya gelek çalakiyên bi vî awayî kiribû, di encam de ji vê taxima çeteyan 18 kes kuştine û bi qasî du qatên van jî birîndar kirine. Bi giştî li derdora Wanê derbeyeke mezin li çetetiyêhatiye dayin û çetetî hatiye eciqandin, giregirên wan hatine radestgirtin, bi vî awayî hemû hewldanên dijmin ên ji demeke dirêj e vir de ji bo vê qadêdidomîne vala hatiye derxistin.

Di civînek ku di wê pêvajoyê de tê lidarxistin de li ser rewşa hêzên ajan-milîs jî, ku dijmin hewl dida van weke asteng dayne li ber têkoşîna berxwedanê nîqaş dibe. Fermandar Egîd di wê civînê de li ser hêzên ajan-milîs wiha dibêje;

*“Di aliyê têkoşîna berxwedanê ya gelê me de ev pirsgirêk, pirsgirêkeke girîng e. Pêkhateya bi navê ajan-milîs ji hêzên herêmî yên paşverûû bi giştî ji sîstema axatiyê çavkaniya xwe distîne. Bi armanca dan qebûlkirina çetetiya ajan-milîsan, ji aliyê hêzên faşîst ên artêşê ve zilmeke pir zêde li ser gel tê meşandin. Li ser esasê ku li dijîApo’çîtiyê şer bike, ji mehkumên li herêmê re af tê derxistin.*

[1]Dewleta Tirk li derdora Wanê, hin eşîr xistine tevgerêû ‘taxima reîsan’ weke giregirên ajan-milîs bi rêxistiye û berê xwe daye ji nû ve pêşxistina eşîrperestîû qebileperestiyaku ber bi belavbûnê ve diçû. Ji ber vê yekê; di zivistan û bihara 1984-85’an de hejmara civînên xwe yên li gel ‘taxima reîsan’ zêde dike. Di bin sêwana rêvebiriya Daîreya Şerê Taybet de, Enqere û Wan ji civînên heftane re malovanî dike. Di vê xebatê de qederekê rola xizmetkarên harbûyîyên weke Hecî Durbaşê bidil ê ku leşkerê Kenan Evren e jî çêdibe. Û ev hemû hewldanbi biryara ku ‘wê her eşîr hejmareke diyar a çeteyan bi xwedî bike’ bi encam dibe. Dagirkeriya faşîst dixwaze, bi vê, qadên ku bi artêşa wî nikare kontrol bike bi van kontrol bike, pêşî lê bigire ku gel tevli şoreşê nebe û li ber pêşketinên şoreşgerî asteng dayne.

Xebatên 1983’an li ser esasê ku ev lîstok vala bê derxistin, rêxistinbûna ajan-milîs ya çete were belavkirin û kêmasiyên di terza xebatê de werinderbaskirin tên plankirin. Ji ber vê yekê li dijî lîstokên dijmin xebata şoreşgerî tê zêdekirin. Aloziya

heyî qederekê zêde dibe. Dijmin ji bo ku karibe derbe li xebatên şoreşgerî bide, zorê dide li ser ajanên xwe û wan tengav dike. Destpêkê çeteyên ajan-milîs ku ji giregirên eşîrên Ala û Yezdînan pêk dihatin li dijî hêzên şoreşger ketin nav liv û tevgerê. Bi îxbar û tevlîbûna van hêzan li herêmên çolterê yên Çataxê di navbera grubeke şoreşger û hêzên artêşê de pevçûn dest pê kiriye. Di pevçûna ku du rojan berdewam kiriye de gelek leşker, subay û ajan-milîs tên kuştin. Tevî ku di rewşeke ne erênî de ketibûn şer, hevalên Ahmet Çalışkan (Îsa ), Seyfetîn Özen (Hamid) û Hesen Bulut (Şerîf) du rojan bi qehremanî şer dikin û şehîd dikevin. Di pey vê berxwedana bi lehengî de, têkoşîn hê jî tê kûrkirin. Di navendênÇatax û Başkale de çalakiyên bi ser de girtinê tên lidarxistin. Tavilê çalakiyên bersivdanê tên lidarxistin ûderbeyên giran li hêzên çete ku heval îxbar kiribûn û tevli şer bibûn tên xistin. Heval… ..(di wergera Tirkî de peyva li vir nayê xwendin) ku di nava şerekî wiha de tevli çalakiyan bûye şehîd tê dayin. (hejmara taybet 101 Tebax 1986 Serxwebûn)

*Divê em jiber vê yekê di çûne ser Eşîran de heya asta dawî bi nazenînî tevbigerin. Pêwîst e em li dijî axayan helwestên pir zêde ne di cih de nîşan nedin. Ev hêz, li gorî hin pîvanan ji hevcuda kirin û li gorî wê nêzîkatî nîşandan ya herî rastir e. Pêwîst e polîtîkaya li hemberê van tê pêşxistin, ne tenê şidet be. Pêwîste li dijî yên ku rewşa wan şidetê divê, heya bi asta dawî şidet were bikaranîn û li pêşberê yên din jî polîtîkaya esnek û nerm ku nahêle ew bên lîstoken dijmin bên bikaranîn. Li vir tiştê girîng ew e ku bêyî ku ti car perspektîfa çînî were jibîrkirin pêşxistina polîtîkayek ku bi nazenînîî nêzî faktora cih û demê dibe ye. Bi giştî li herêma Botan merc dest dayîne ku gelek polîtîkayên ji aliyê Partiya me ve di berjewendiya şoreşê de tên dîtin bênbikaranîn. Ya girîng ew e ku timî rêû rêbazên destdayî bên peydakirin û di pratîkê de bên pêkanîn.”*

Fermandar Egîd, hema piştî civîna mijara axaftinê, ji bo ku di pratîkê de pêk bîne biryarên ku di wergirtina wan de tevlîbûn û piştigiriyeke mezin dabû, li ser esasê ku ji van a herî mezin a pêngavapayizê pêk bîne dest bi liv û tevgerê kir. Di seranserê vê pêvajoyê de ev çalakî hatin lidarxistin: li gundê(Dedeuğra) yê Şirnexêîmhakirina yekîneyekî leşkerîû şewitandina du dozeran, li Şirnexê bi serdagirtina kana komîrêûîmhakirina panzerekêû kuştina du subay û hemû leşkerên tê de, di çalakiya biserdegirtina mala Elîxan Tatar de îmhakirina komeke milîsan (qorîçî), çalakiya biserdegirtina Qilaban, li ser sînor îmhakirina panzereke duyemîn û kuştina hemû wezîfedarên di nav de û herî dawî di Cotmeha 1985’an de li Çelêêrîşa li ser qerekolekî leşkerîû di vê çalakiyê de kuştina 11 leşker, rakirina 2 çekên agiravêj, 1

MG-3, 6 G-3, 2 tebanca, bêsîm û di mîqtareke zêde de bi destxistina cebilxane û gelek belgeyên ku li ser wan mohra 'belgeyên sirî' hene.

Fermandar Egîd ji van çalakiyan hinekan redi asta plankirin ûrêvebiriyê de, ji yên herî mezin re hem di asta plankirin ûrêvebiriyê de û hem jî da asta pêkanînê de tevlibûna xwe çêkiriye; her wiha bi şoreşa Kurdistanê pêngaveke nû da avêtin. Bi vî awayî pêvajoya zivistaneke nû dest pê kir. Piştî ku pêngava payizê hat bidawîkirin, hêzên gerîla yên ji qonaxeke giran a têkoşînê derketine ji bo bi encamên ji pratîkê hatine wergirtin re xwe bikin yek, amadekariyên zivistanê werin zêdekirin û li ser esasê ku ji pêngaveke nû re amadekarî bikin hatine vesazkirin. Ev xebat hemû jîbi awayêraporeke weke'pirsgirêkên me yên têkoşînê' hatine rêkûpêkirin û ji Serok APO re hatiye şandin. Di vêrapora ku di 11'ê Mijdara 1985'an de hatibû şandin û dihate maneya banga bi temamî ketin nav pirsgirêkên şoreşêû çareserkirinê,ev tişt dihatin ziman:

*"Li Kurdistanê têkoşîna şoreşgerî hatiye li ber gavavêtineke nû. Û bi piranî ji ber sedemên li gel pêşeng hene, ev gav nikare di demê de were avêtin. Em bi pirsgirêkên mezinbûn û pêşdeçûnê re rû bi rû ne. Di mijara zagonên azad ên şerê şoreşgerî bi rastiya Kurdistanê re yekirinêde êş û ecziyên me hene. Pêwîst e di vê platformê de lêgerên çareseriyê yên ji bo pirsgirêkên têkoşînê werin bidestgirtin.*

*Rewşa welatê me, li ber ronahiya zanista Marksîst-Lenînîst hatiye ronîkirin, li ser vî esasî stratejîû taktîka şoreşê rast hatiye tesbîtkirin. Di vî aliyî de şik û guman nabin. Nebesî, nayên spartin faktorên objektîf. Di mijara rêxistinkirin û şer de têra xwe polîtîkaya rast a şoreşgerî nayê bikaranîn. Divê em sedemên vê peyda bikin û bi awayekî, îzaha wê bikin. Gelek sedemên wê hene lê di navenda wan de rêvebiriya pratîkî heye.Ne tenê ji ber perspektîfa rêgezî; ji ber hêza ku mohra xwe li pêşketina pratîkî daye, taktîkên tevgerkirin û çalakiyê diyar kiriye analîzeke bi vî awayî hatiye pêşxistin.*

*Polîtîkaya şoreşgerî ya rast a Partiya me, li her qadêji bo pêkhateyên ji xwe re statuyek qezenckirine tesîreke tengavkirin û belavkirinê dike. Bi fikra Kemalîst ku di salên 1940'an de li Kurdistanê hatibû pêşxistin û bi kapîtalîzma dagirker ku di 1960'an de hatibû destpêkirin, hewl hatiye dayin ku civakbibe parçeyeke xwezayî ji netewebûna Tirkan; di qada civakîû çandî de jîpêkhateyeke berfireh a noker hatiye avakirin, civaka Kurd hatiye xistin xeta ji hebûna xwe dûrketinê. Li derdorek ku gavên piralîû girîng hatine avêtin, tevgera me dest bi destwerdaneke şoreşgerî kiriye, li ser pêvajoyeke pêşketinê ya dîrokî bi roleke guherînê rabûye. Rola şoreşgerî, li gorî pêvajoyanguheriye, ji 1984'an pê ve xwe gihandiye hêzeke xwediyê şideta pir zêde ya*

*pratîkîû guherîneke esasî derbas kiriye. Dagirkeriya Tirk piştî 1980'yîhewl daye bi awayê faşîzm xwe ji nû ve bisazî bike. Lê Partiya me li ber armancên wê bûye astenga herî cidî. Piştî ku Partiya me, vê astenga herî cidî, hêza xwe ya polîtîk xistiye pratîkêû ketiyeli ser riya encam girtinê, eniya faşîst de derbeyên girîng xwarine û rizîbûna di rêvebiriya dagirker de derketiye meydanê. Di heman demê de ji aliyê her kesî ve hatiye dîtin ku eger bi destwerdana şoreşgerî re rû bi rû bimîne, nikare hêza jiyanêû pêşketinê nîşan bide. Cewher û naveroka artêş û saziyên siyasî hatiye ceribandin, sazîbûna hewl tê dayin li ser krîza ku nayê derbaskirin a ekonomiya kapîtalîst were avakirin, bi pêşketinên bi zanebûn ku ji aliyê me ve tên lidarxistin ketiye rewşeke jêneder û hêjandinên mezin derbas kiriye. Di pêvajoya 1985'an de dijmin bi şideta sotîner a berxwedana me re rû bi rû maye, ew şans nehatiye naskirin ku tevgera çekdarîwere tasfiyekirin, li pêşberêêrîşên pir dijwar ên nehatine dîtin û lîstokan, tevgera me ya çekdarî kariye hebûn û pêşketina xwe bidomîne.*

*Pêşketinên siyasîû destkeft, di sala 1985'an de bi qasî ku têrê bike nebûne hêzeke madîû pêngava ku diviyabû were avêtin nekariye bê avêtin. Îro, çawa ku me nekariye xwe bigihînin hedefên hatine diyarkirin û her wiha jî di asteke diyar de wendahiyên me jî çêbûn. Di rewşa ku em di nav de ne, em nikarin faktorên bûne sedema pêşketina vê rewşê teng bigirin dest. Ev, bi tena serê xwe ne dikare bi asta hêza dijmin û ne jî dikare bi îradî tevgerkirina me ve bê girêdan. Rewş dikare bi vî awayî wereîzahkirin; me nekariye ku em berê xwe bidin xebat û tevgereke leşkerî ya ku hêza meya îradî li gel taktîkên şoreşgerî yên rast yek dike û astenêngên dijmin danîne, paşverûtiya di nav girseyê de derbas dike.*

*Eger em sedemên ku pêngava bihara 1985'an di asteke diyar de xetimandine bi vî awayî bînin ziman;*

*1- Birêxistinbûn: Îro li ber çavan e ku em di aliyê birêxistinbûnê de di nava girseyên gel de rastiya rêxistineke zeîf dijîn. Wexta ku em bûyera birêxistinbûnê bi asta têkoşîna ku hatiye afirandin bigirin dest, tê dîtin ku rewşeke nakok li holê ye. Pêdiviya ku şer bi rêxistinbûnê dibîne eşkere ye. Ji ber pratîka ku em her roj dijîn û hê bi rehetî tê fêmkirin, bêyî ku birêxistinbûneke di asteke diyar de were pêkanîn, zêde ne mumkîn e ku şer were pêşxistin. Lê belê hê jî nikare were gotin ku di vê mijarê de me xwe gihandiye asteke têrê dike ya terzeke çareserker a pratîkî.*

*Analîzeke bi vî awayî rast e, ku wê birêxistinbûn li derdora propagandaya çekdarî pêş bikeve û ji derveyê vê rêbazê li Kurdistanê li derfeteke bingehîn gerîn xeyalperestî ye. Jixwe hemû pêşketinên heya niha, di asta ku serî lêdana vê amûrê (têkoşîna çekdarî) pêk hatiye de çêbûne. Lê belê pirsgirêk tenê bi bikaranîna propagandaya*

*çekdarî naqede, ya girîng ew e, ji bo ku tesîra wê pêşbikeve rêbazên rast ên siyasîû leşkerî bên pêşxistin û berhemên wê were parastin. Tiştê ku li gel me jî bi awayekî têrê bike nayê kirin jî ev e. Eger em weke bibe mînak Botan nîşan bidin; nikare were gotin li vê herêmê propagandaya çekdarî kêm hatiye meşandin. Pirsgirêkên vê pêvajoyê,ji 1983'an heya bi Tebaxa 1984'an, beriya ku propagandaya çekdarî bi terzek ku taybetmendiyên civakîû siyasî ferz dikin were pêkanîn xwe dane der û ji ber vê yekê, nekariye birêxistinbûn pêş bikeve. Di pêvajoya 1985'an de, birêxistinbûnê naverok û awayekî nû qezenc kir. Pirsgirêkê, çarçoveya propagandaya çekdarî derbas kir. Diviyabû potansiyela siyasî ya ku derketiye holê bihata kişandin nava şer û li beranberê şerê li her deverê hatiye belavkirin ê dijmin, bi rûnîşkandina şerê gel li ser zemîna gel di asteke têre dike de bersiv bihata dayin. Pêwîst dikir ku şer bibûna malê gel û em bi hêza gel derketana pêşberê dijmin. Eger pirsgirêk di asta niyetê de were bidestgirtin, di vê mijarê de em hemû hemfikir in. Di mercên zexta giran a dijmin de rêxistinbûn li gel pirsgirêkên şerdi zikhev de pêş ketiye. Gihana wê ya asteke berfireh a mayende, bi tenêbi awayekî pir baş şer kirinêmimkun e. Eşkere ye ku li ser zemîna pêkhateyeke heya asta dawî paşde mayî, bi terza birêxistinkirinê ya bolşewîk zêde encam nayê wergirtinû wêbi gelek zehmetiyan re rû bi rû mayin çêbibe. Divê li van qadan, birêxistin bi terza xebata eniyê were bidestgirtin. Pêwîst e ji grêdayî mayina rewşekewekî şema dûr were sekinîn.*

*Li herêmên çiyayî, bêyî ku di nava girseyên gel de tevgereke otorîteyê were çêkirin, ti kes li gel xwe ragirtin zêde ne gengaz e. Otorîteya eşîrî ku li pêşberî otorîteya dewletê, bejna xwe ditewîne bi lez dikeve li ser riya dij-şoreşêû bi hest û ajoyan çînî dîn û har dibe. Îro pêkhateya ku li dijî birêxistinbûnê dibe astenga herî mezin jî ev tebeqe ye.*

*Di derbarê têkoşîn meşandinê de fikra ku hê jî, di nav Kurdan de hakim serhildan e. Ji bo ku demdirêj fedakarî were kirin zehmetî tê kişandin(girseyên gel). Li van herêman kevneşopiya berxwedanê ya hakim, li dijî dijmin di eniyekê de, di sengerê de şerkirin e. Fikra ku hakim e, fikra şerê parastinê ye.*

*Tevî van faktorên neyinî, kêmasiyên kadroyan ên di terza nêzîkbûna mijarê de jîeşkere ye.*

*Rêgeza ku 'rêxistinbûn ji kombûna wezîfe ûtêkiliyên pratîkî pêk tê' nayê pêkanîn: helwestek ku nikare balkêş bibe û lêgera mekanîzmeyeke îdeal heye. Di terza xebatê de kêmasiyên weke; pirsgirêk di xelekên wê de girtine dest, hişyariya li gorî pêkhateya xweser polîtîka diyarkirin û nazikiya encam girtinê di asteke têrê dike de nîşan nedayinê hene… lê berevajiya vê, bûyera birêxistinkirinê ya li Çiyan, xwe dispêre*

*hêz û otorîteyê. Ev, ne tenê rastiya me ye. Li Çîn û Kubayê jî ev hatiye pêkanîn, bi rola ji serkeftina destpêkê re bûn kilît rabûye.*

*2- Têkoşîna Çekdarî: Di têkoşîna me ya çekdarîde rewşeke pasîf tê jiyîn. Şer li gorî zagonên xwe her bilin dibe, lê belê di mijara li gorî wê tevgerkirinê de ecemîtî heye. Di pêşxistina tevgera ku xwe dispêre faktorên bingehînên şer de nebesî heye. Ji aliyê gelekan ve pirsgirêk di asta niyetê de tê dîtin, di mijara rêbaz û taktîkê de gelek dikevin amatoriyê. Eger mirov karibe di şer de behsa taybetmendiyeke me ya erênî bike, ew jî xwestek û bibiryarbûna me ye. Tevî ku heya îro jî me nekariya di astek ku daxwaza me ye de em tevgereke şer pêş bixin, divê ji pêwîstiya bi vê gumanên ti kesî nebin. Eger em bixwazin jî, em nikarin çarçoveya şer teng bikin. Îro pirsgirêkên têkoşînê yên li gelek herêman, pirsgirêka şerê gerîla ye. Û rêgeza stratejîk a esasî ya gerîla timî lêdan e. Ev zagon pir bi awayekîeşkerexwe ferz dike. Wekî me li jor jî bal kişandiye li ser esasê parastina destkeftên siyasî, rêxistin jî ava dibe û şerê pêşketî jî çêdibe. Civaka Kurdistanê, tevî hemû taybetmendiya xwe ya paşde mayî, di mercên bi ewle yên siyasî de bi rastî jî xwediyê potansiyela serhildanê ye. Ev, ne bi ser de zêdekirinek e; ez bi xwe hezar carî jê re bûme şahid. Dijmin ev rastiya baş ferq kiriye. Ji ber vê yekê, ji bo ku van mercên siyasî têkbibe, her tiştê ji dest tê pêk tîne; artêşa xwe ya bi sed hezaran diajo ser gel û hewl dide,gel bênefes bihêle. Ji ber vê yekê propagandaya çekdarî têrê nake. Di rewşa ku em hatinê de, ji propagandayê zêdetir gel bala xwe dide ser aliyê leşkerî yê çalakiyê, pîvan û encaman dinirxîne. Yanî di her aliyî de êdî şerê gerîla bûye neçariyekê. Lê belê tevî ku ev aliyê pirsgirêkê tê fêmkirin, li gorî asta ku gerîla gihîştiyê, pratîkek nayê pêşxistin. Çi biçûk û çi mezin bi sedan çalakiyê me hene, tevgereke me ya berfireh heye. Lê belê di astek ku têrê dike de encameke bi naverok nehatiye bidestxistin.*

*3- …. …*

*4- Pirsgirêkên rêvebirîûkadro: Rewşa nebesiyê ku rêvebiriya pratîkî tê de ye nayêînkarkirin; di gelek pêşketinan de çavdêrî kirin mimkun e ku asta pêşketinên hindur û derve nehatiye girtin. Rastiya ku hêzên me yên heyî weke tê xwestin nayê birêvebirin. Rewşa pêkhateyî ya yekeya rêvebiriyê heye. Piraniya endamên wê xwediyê wê pêkhateyê ne ku asta wan a heyî têrê nake, di aliyê fikrî de kûr bin;ev heval dibe ku di asta milîtaniyê de bi rola xwe radibin lêji derveyê zora xwe dane li ser îradeya xwe, xwe di ber çavan re derbas nakin û xwe naxin ber lêpirsînê. Pratîka ku hin di nav de ne, tevî ku qada hewldana fikrî teng dikin tenê nikare rewş bi vê were îzahkirin. Hin kêmasiyên weke, perwerdeya teorîk li gorî asta pêşketinan nedomandin ûdi pisporbûnahunera polîtîkaya pratîkî de nebes mayinê hene.*

*Li gel vê rewşa ku bi piranî tê dîtin, li gel hinekan fêrbûnên helwestên şexsîû bandorên giran ên subjejtîvîzmê jî tên dîtin. Û ev li gel hin kesan dizivire taybetmendiyeke zêde req û hişk.*

*Zeîfiya koordîneya navxweyî, nebesiya têkiliyên bi hezên heyî reû nebesiya amûra kontrola nêzîk, dibe sedema pirsgirêkên girîng. Di destpêka mijarên herî girîng ku pêwîst e were bihêzkirin de ev tê. Tevî ku di aliyê terza nêzîkbûnêde ji bo pirsgirêkên cuda cuda yên pratîkê, sererastbûneke qismî heye jîme nekariye em li ser pêkhate û rewşên xweser, di asteke têrê dike de rêveberiya pisporiyê pêşbixin. Tehlîl û analîz, timî nekare bên gihandin asta plansaziya şênber.*

*Pirsgirêkên me yên kadro, di asteke girîng de çarçoveya xwe ya kevin derbas kiriye, helwesta berxwedanê serwer e. Derdoreke sînordar a xwediyê feraseta xebatê ya rastger e heye û ev kesên ku hin ji wan di rêveberiyê de cihê xwe distînin, rola wan a pêşnexistinê derketiyê holêû hatine fêmkirin. Ji ber vê yekê jî, di asteke diyar de pêwîstiya wan bi perwerde ûîstirehetê heye.”*

Weke ku bi hêsanî di rapora fermandar Egîd de jî tê dîtin; Wîdi vê pevajoyê de jî, mercênheyîrastû di cih de nirxandin, pirsgirêkên Partîû têkoşîna me ku pêwîstiya wan bi lêzgînî bi çareserkirinê heye tesbît kiriye û hema piştî bi pêngava payizê diyar kiriye ku ji bo têkoşîn were pêşxistinû ti car qut nebe, beriya her tiştî pêwîstî bi pêngavên nû heye. Ji bo ku ezmûn û encamên berxwedana 1985’an were fêmkirin û were veguherandin pêngaveke bihêz, bal kişandiye ku pêwîst e kadro û şervan di sezona zivistanê de bi awayekî destdayî bên bicihkirin û perwerde bibînin, demekê bêhna xwe vedin, ji bo vê hin plan pêşxistine û herêmên bi ewle tesbît kirine ji bo kadro li vir bên komkirin bi roleke çalak rabûye, derfetên perwerdeyê pêş xistine, ji bo vê yekê ji bo karibe bi her awayî amûr peyda bike pêşengî kiriye, ewlehiya kadroyan pêk aniye û tevî van hemû hewldanên xwe, li aliyê din jî bi ser dijmin de çûye, mecal nedaye ku di berxwedanê de valahî derkeve, di mercên zivastanê de jî ala berxwedanê nêxistiye xwarê. Xebata nava gel hê jî kûr kiriye û di encam de jî kariye pêngava bihara 1986’an bi ser bixe.

Wexta ku berfa sar a zivistanê hêdî hêdî destpêkiriye bihele, biharê bi hemû bedewiya xwe, dest pê kiriye wan çiyayên bedew ên Kurdistanê bixemilîne, ûdi dema ku sembola serxwebûn azadiyê ya gelê me Newroz û salvegera avakirina ERNK’ê hêdî hêdî nêz bûye de fermandar Egîd ew bandora eczkar a zivistanê daniye milekî,ji bo ku di dîroka Kurdistanê de rûpeleke nû veke bi armanca ku pêngava biharê bide despêkirin bi hemû hêza xwe hewl daye ku berxwedana şoreşgerî bilind bike. Wî, weke baû baranê ji milekî Botan dest pê kiriye, çiyayên Kêla Memê, Herekol û Çirav

derbas kiriye, li Qilaban, Dihêû Perwarî çendek çalakî li dar xistiye ûji milê din ê Botan ve derketiye,hemû propagandayên derewîn ku dijmin hewl daye di seranserê zivistanê de pêk bîne vala derxistiye. Dagirkerên Tirk ên faşîst bi hemû saziyên xwe yên çapemenîû ragihandinê, ji vê pêngavê ku berpirsiyarê wê heval Egîd bûye re 'Êrîşa PKK'ê ya biharê' gotin.

Belê, bi rastî jî ev êrîşek bû, bi serde jî di pêvajoya Newrozê de hestên gelê me yên serhildanê li dijî her awayê paşverûtiyê radibin serhildanê de ku Partiya me jî bi zanebûna ve ya kûr ev êrîş daye destpêkirin. Ev di heman demê de di aliyê dijmin de jîêrîşeke pir girîng bû. Hemû komplo û planên artêşa Tirk ku hewl daye di seranserê zivistanê de pêş bixe, vala derxistiye, careke din wekî ku her kes bibîne ecziya artêşa Tirk li ber çavan raxistiye. Dijmin dîtibû ku hemû tedbîrên pêşxistine vala derketine, bi tirsa mezin a ku ji vê binkeftinê girtiye di nava xwe de bi hev ketiye, careke din pêwîstî pê derketiye holê ye ku Kenan Evren seredanên xwe yên bi navê 'ger û geştên rojhilat' nû bike û li ber gel bigere, hikûmeta Özal neçar maye di seranserê zivistanê de sozên dane ji bîr bike, û heta ji ber vê pêngavê wiha lê hatiye ku hikûmet hatiye li ber ketinê.

Pêngava 1986'ê di dîroka me ya şer de xwediyê cihekî di asta herî dawî de girîng e. Ew beriya her tiştî tê maneya bi Rêbertiya Serokatiya Partiyêû di bin siya ala Eniya Rizgariya Neteweyî de têkoşîna berxwedanê, gihandina şiklekî bi berdewamî. Dagirkeriya faşîst a Tirk, ji du salan pê de bi her awayê lîstokên ku karibe li dijî têkoşîna me bimeşîne bi rêve biriye, hemû derfetên di destê xwe de xistiye dewrê; ji bo ku di qada neteweyîû navneteweyî de berxwedana me bêpiştgirî bihêle, hemû emperyalîzm û paşverûtiya bi her awayî jî bi hewara xwe de xwestiye, gelek manewreyên siyasî pêşxistine, di hindur de şovenîzm derxistiye asta herî bilind, hewldaye di bin ala 'yekîtiya milî'de bi çep û rasta wê ve hemû muxelefeta burjuwazî li ser hev kom bike. Bi heman armancê, şovenîzm empozeyî gelê Tirk ê ku dagirkerîû çewisîneke bêsînor li ser pêk tîne  kiriye. Kontrola çepa 'derîqanûnî' xistiye destê xwe, di serî de li dijî tevgera me, roleke tasfiyekar daye lîstin. Ji vê jî zêdetir, gelek hêzên li herêmê yên oportonîst, sosyal şovenîst û reformîst jî girtine gel xwe ûêrîş aniye ser berxwedana me, li Kurdistanê ji hêzên neteweperestên seretayî bigir heya bi hêzên reformîst ên burjuwaziyên biçûk li ser esasê kuêrîşî tevgera me bikin xistine tevgerê, di nava dilê civaka Kurdistanê de ji sîstema axatiyê heya bi faktorên dînî, hemû kes û saziyên paşverû an bi darê zorê an jî bidil li dijî berxwedana me derxistiye. Li gel van hemûyan, hemû sazîû dezgehên xwe yên leşkerî, siyasi, ekonomîk û hwd. kişî ser şerê me kiriye. Lê tevî van hemû hewldanan, bi temamî

encameke vala bidest xistiye. Berevajiya van hemûyan, pengava bihara 1986'ê, di qada navneteweyî de gelê Kurdistan û hêza wê ya pêşeng Partiya me bi awayekîêdî dest jê nabe bi dost û dijminê xwe daye nasandin, ew li cihê jê re layiq daye rûnîşkandin, bi gelê Kurd daye fêmkirin ku wê ji bo dostên xwe dostaniyeke çawa û ji bo dijminê xwe jî dijminahiyeke çawa bike, neçar hiştiye ku her kes di mijara Kurdistanê de rasteqînî be. Ji vê zêdetir, dorpêça emperyalîzmê, hemû dorpêça ku serkêşiya wê sosyal demokrasî dike qetandiye, li herêmê, li Tirkiyêû li Kurdistanê hemûêrîşên li dijî rizgariya neteweyîku li ser navê oportonîzm, sosyal şovenîzm û reformîzmê li dar dixe vala derxistiye, ev hêz hemû teşhîr û tecrîd kirine ûew li cihê wan ê rastîn dane rûnîşkandin. Dîsa mercên pasîfîkasyonêku hewl daye bi pêkanînên dûrî aqil pêş bixe, bi awayekî misoger hatiye şikênandin, berxwedan bi çend herêman sînordar nemaye li hemû Kurdistanê hatiye berfireh kirin. Îro êdî şer bûye mijulahiyeke rojane ya gelê Kurdistanê. Jê guman nabe ku ev asteke bilind e. Di encama van hemûyan de, di serî de artêşa Tirk, dewleta Tirk bi hemû aliyên xwe, ketiye nava rewşeke jêneder û tev bi eczî.

Vaye, wexta ku Partiya me ev pêngava biharê ku di dîroka Partiya me û şerê me de di vê astê de manedar e diavêt, ji pêşengên mezin yek ê şerê me, fermandarê mezin êBerxwedana Botanê Mehsûm Korkmaz, roja 28'ê Adara 1986'ê di pêvçûnek mezin ku bi artêşa Tirk re qewmiye de, piştî ku lehengiyên mezin nîşan dan şehîd ket. Jê guman nabe ku şehadeta heval Egîd ji xelekên şehadetê yên herî girîng ên Kurdistanê yek e û ji gelê me û ji bo hêzên pêşverû yên cîhanê bûyereke heya asta dawî xemgîn e.

Dagirkeriya Tirk kariye ku bi qetlkirina heval Egîd yek ji pêşengên mêrxas ên gelê me di aliyê fîzîkî de tine bike. Lê divê em vê ti car ji bîr nekin ku weke her hevalê/a me ya şehîd, fermandar Egîd ku yek ji yên herî mezin e ne tenê hebûneke fîzîkî ye. Ew di heman demê de fermandarekî manewî ye ku kes nikare ji dilê gelê Kurdistanê hilke biavêje jî. Ji ber vê yekê ji bo fermandar Egîd bûyereke ku navê wê 'mirin' e tineye. PKK'ê ti car bûyereke bi navê mirinê nas nekir û wê heya dawî jî nas neke. PKK'ê Partiya kesên ku ji mirinê, jiyanê diafirînin e. Ji ber vê yekê fermandar Egîd gihişt asta bêmiriniyê.

Ew serfermandarê Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê ye. Ji vê bi şûn de gelê Kurdistanê wêdi binfermandariya manewî ya Wî fermandarê xwe de şer bike û zanibe ku bi misogerî bi ser bikeve.)

Foto: Syf 242

**“Fermandar Egîd Talîmat Dide: Her Bi Pêş De!”**

*“Li gundekî girêdayî Şirnexê gundiyekîîro temenê wî digihe 65’êûev 20 sal in mixtariya gundê xwe dike, di pêvajoya 15’ê Tebaxê de bi hevalê Egîd re dîaloxê wî çêbûyîbû. Ev gundiyê welatparêz li ser şehadeta heval Egîd van bîranên xwe ji rojnameya Serxwebûnê re dişîne:*

*“Min li gundekî Şirnexê 20 salan mixtarî kir. Berê, têkiliyên dewleta Tirk li gel me biqasî were gotin nebûn, kêm bûn. Piştî Tebaxa 1984’an di bin kontrola artêşê de bi hemû mixtar û giregirên herêmê re civînek li dar xistin. Di vê civînê de bi israr dan diyarkirin ku em alîkarî nedin şoreşgeran, dema partîzan, hatin gund em wan agahdar bikin. Di wê pêvajoyê de ji bo çalakiyan hezkirina me di dilême de velaşartî bû. Lê ji xeta Partiyê zêde agahiyên me nebûn. Birastî jî heya bihara 1985’ê ez rastî hevalan nehatim. Lê çalakî li pey hevdu pêş diketin. Zilm û zora li ser gundên me her diçû zêde dibû. Her ku çalakî zêde bûn, her wiha jîcivînên mixtaran jî hê zêde dihatin lidarxistin. Di van civînan de xwestin ku em navên kesên karibin qorîçitî bikin bidin wan. Li pêşberî van israran gelek mixtar an bêdeng diman an jî sedemên cuda cuda didan pêş.*

*Her ku çalakî zêde bûn, dest pê kir leşkerên payeberz tevli civînan bibin. Dema ku van subay û albayên faşîst encam nedigirtin digotin ku ew ê derbarê hemû mixtaran de agahî kom bikin û qeydên wan bigirin, kesên ku qorîcitî nakin ew ê gundên wan xira bikin û mixtar jî wê bên girtin. Li ser vê yekê, li hin gundan çek belav kirin. Ji ber vê yekê jî, partîzanan gelek çete kûştin, dest danîn ser çekên hin kesan û ew serbest berdan. Gelek mixtar û otorîteyên herêmî yên ku ji bo karê ajantiyê destdayî, neçar man paş de gav biavêjin.*

*Li aliyê din gel jî pir bêriya şoreşgeran kiribûû pejna wan dikir. Daxwaza bi hev re têkoşîn pêşxistinê di van mercên bi pevçûn de hê jî pêş diket. Lê belê ji ber ku ji kesên ajantî dikirin ditirsîn, hewl didan vê nedin der. Heya bi bihara 1985’ê ji xebata ku partîzanan li gundê me bi rêve dibir heya min nebû. Di mehên zivistana 1985’ê de ji gundê me du ciwanan got em diçin Edenê bixebitin û bi yek carê wenda bûn. Lê piştî sêbi mehan grûbek deh kesî ku yek jî ji gundê me bû daketin gund. Me dît ku ciwanê ji gundê me jî, bi gule û bombeyan xwe xemilandibû. Wê kêliyê, min hê baştir fêm kir ku çima dewleta Tirk ji PKK’ê ditirse. Min kêliya herî bextewar û serbilind a jiyana xwe di wê demê de jiyan kir. Ji 20 salan e vir de min mixtarî dikir: dema min fêm kir ku ji bo çi û ji bo kê ye, min ji mixtariya xwe fedî kir. Niha li pêşberê me ciwanên me*

*hebûn, ku xwe fedayê dozekê kiribûn dihate maneya rizgariya me jî, me pir ji wan hez kir û çi xwestin me negot 'na'. Me hemû gundî civandin gel yek du; ew bi gundiyan re axifîn. Her ku ew axifîn, dilê me hênik kirin. Em hemû kêfxweş bûn. Dema şerê me yê serxwebûn û azadiyê dest bi pêşketinê kiribû, dijmin bêçare mabûû dîn û har bibe. Partîzanan sedema vê yekê bi hemû aliyên wê ve eşkere danîn holê. Soza riyeke rehet û hêsan nedidan gel.*

*Partîzanên me ji wê rojê bi şûn de jî, ji hefteyê carekê riya xwe bi gund diexistin û heta hin caran hê zêde dihatin. Dewletê, terora xwe bi awayekî hovitî dimeşand; êrîşî nirxên gel ên herî pîroz dikir û jin li nîvinga gund bi şiklekî tazî kom dikirin. Di van mercên zilm û zorê de tenê li gundê ku min lê mixtarî dikir û mezrayên girêdayî wî gundî zêdetirî 20 kes tevli nav refên HRK'ê bibûn. Ji ber vê yekê her roj li min êşkence dikirin û ez di lêpirsînê re derbas dikirim. Ji gund tenê yek kesî jî çek wernegirtibû. Ev dibû sedem ku subayên dijmin dîn û har bin. Di lêpirsînê de sûcê ez pê dihatim tevanbar kirin li herêma mixtariyeta min tevli nava refên HRK'ê bûna 20 ciwanan û li gundê me pêkneanîna qorîcîtiyê bû.*

*Mixtarekî din ê weke min anîbûn Diyarbekirê. Li wî, hê zêde heqeret dikirin. Demekê min firsenda wê dît û min ji leşkerê nobedar pirsî: li gundê vî mixtarî çend kes tevli Apociyan bûne, hûn ew qes pê re mijûl dibin? Ji bo bersiva ku leşker daye ez nemam heyirî. Wî leşkerî got; "tevî zarokên mixtêr ji gundê wî 50 kes wenda ye" . Her çendî mixtêr gotiye zarokên min çûn rojava jî, subay ûkesên êşkencekar pir baş dizanîn ku tevlîbûna nav refên HRK'ê ya 50 kesî tê çi maneyê.*

*Di nava salekê de 5 caran ez birim Diyarbekirê. Destpêkê, ji ber ku rewşa min a aborî pir baş bû, min bi bertîleke zêde xwe xelas dikir. Lê belê bi bertîl dayinê her ku diçe di destê min de tişt nema. Ji bo ez karibim bertîla tê xwestin bînim ser hev, min ji miyên xwe piranî firotibûn.*

*Di bihara 1986'an de hêjmara grubên şervanên me pir zêde bû. Grubên ku berê ji 10 an jî 15 kesan pêk dihatin, bûn grubên 100 an jî 150 kesî; di nav wan de gelek jin jî hebûn. Nanê ku me ji bo wan amade dikir li kîsek ardî derbas dibû. Carekê ji gundê me, me 5 malbatan nanî çêdikir. Her malbatê 4-5 teşt hevîr amade kiribû. Lê belê ji beriya ku nan xelas be leşkerên dagirker bi ser gund de girtin. Her çendî me hin teştên hevîr veşartin jî me nekariyabû hemûyê veşerin û ji ber vê yekê li qereqolê li min êşkence kirin.*

*Dewleta Tirk bi pêşketinan dizanî. Giraniya xwe dabû qoricitiya li gundan û çeteyên milîs, hedef dikir ku bi navbeynkariya van, pêşketinan bisekinîne eger ne mimkûn be–jixwe ev çênebû- dereng bixe. Di civînên li dar dixistin bi awayekîeşkere*

*digotin ku ji bo serê her şervanê/a ji wan re bînin wê 2 milyon bidin û di vê mijarê de pêşbirk vekirine. Bi rastî jî ev neçîrvanên mirovan, çeteyên milîs dîn û har bibûn. Çeteyên milîs ên gerok ( gel ji bo van dibêje neçîrvanên mirovan) grubeke ji 10 kesî pêk dihatin hatin gundê me. Banî min kirin, nan û av xwestin, me ne av û ne jî nan da wan. Lê belê hatin mala min û bi darê zorê li hindur rûnîştin. Di wê navê de gundiyekî ez banî derve kirim: got grubeke partîzanan a biqasî 15 kesîhatiye gund. Min partîzan dîtin û rewşa heyî ji wan re vegot. Wan fikra min pirsîn. Min got ez alîgirê wê me ku çete werin îmhakirin; lê pevçûnek ku li gund biqewime wê zererê bide gundiyan. Partîzanan rewş nirxandin û gotin ku ew rewşa gundê welatparêz ji bo demeke dirêj difikirinû ji gund derketin. Min çeteyên milîs ji gund qewitandin. Ji ber vê yekê ez îxbar kirim. Mehekê, li min êşkence kirin. Piştî ku ez berdam, partîzanan riya xwe bi gundê me xistin. Wan ew gruba çeteyan ji binî de îmha kiribûn. Kesekî/e ku ji destêîxbarkar, subay û leşkeran pir dîtiye, dimîne heyirî da ku çawa bersiva vê bide. Tevî ku ti halê min nebû, ez rabim ser piya, min hemûêşkence wê gavê ji bîr kirin. Ne mimkun bû ku mirov bi her aliyî xwe ve partîzanên me pîroz neke.*

*Rojekê grubeke şervanan,hevalekî/ê birîndar anîn: ji ber bi ser de gêrbûna berekî mezin ew ji guzeka lingê xwe birîndar bibû. Lingê wî/ê hem şikestibûû hem jîparçe parçe bibû. Me birîna wî pêçand: hevalan ew bir. Tevî ku birîna wî/ê giran bû, biqasî ku mirov lê bimîne heyirîû pê serbilind be ew xwediyê cesaret bû.*

*Hemû bûyer û jiyana partîzanan di vê nivîsê de bi cihkirin ne mimkûn e lê dixwazim bi bûyerekê vê nivîsêbi dawîbikim. Di êvara biharekê de hevalekê/î, li gund, riya xwe bi gel me xist; ji min xwest ez jê re quryetî bikim û tevî wî biçim qada ku ew biçê. Ji bo bala ti kesî nekêşe me çifte li gel xwe girt û bi qasî sê seatan bi rê çûn. Li herêma ku em çûnê, ji nişka ve em bi hîşyariya 'bisekinin' re rû bi rû man:parola pirsîn û hevalê li gel min parola da. Em ji wir girtin û birin. Li ser sixinaqekê, fermandar Egîd em pêşwazî kirin. Destpêkê merhaba da min û destê min guvaşt. Min di wê kêliyê de weke ez hê biqewet bûme xwe hîs kir. Destê hevalê xwe yê/ya din hê şidayî guvaşt, piştî ku rewşa me pirsî bi hevalê/a ku li gel min hatiye re ji gel me çû. Şervanên din dest pê kirin bi min re eleqadar bibin. Ji min pirsîn ku gel çi eleqa nîşanî têkoşîna pêş dikeve dide, têkoşînê çawa dinirxîne û xebatên dijmin ên li ser gel dimeşîne çine. Tevî ku rewş ji min baştir dizanîn dîsa jî sohbeta me qederekê beredewam kir. Fermandarê mezin Egîd beriya ku min bi rê bike, ji min re wiha got; dijminwêvêêvarê bi ser gundê we de bigire, "te karekî ev qas xeter çawa pêk anî?" Min jî ew wihabersivand, ez jî Kurd im, ji bo xelasiya vî welatî ez jî neçar im şer bikim, ez ê heya bi guleya xwe ya dawî şer bikim. Wî fermandarê mezin ez hembêz kirim û ev gotinên ez ê ti car ji bîr*

*nekim û ez hestiyar kirime, ji min re kirin: "madem gelê me bi bawerîû cesaretê li doza xwe xwedî derdikeve, ne dûr e ku pêşaroja xwe bi destên xwe biafirîne jî." Paşê dû-sê şervanan ez heya bi gundê me anîm. Pişt re min careke din fermandar Egîd dît. Ji min re qala Alîxan Tatar kir. Ev ajan ji bo dewleta Tirk bi çi rolê radibe ji min re behsa wê kir. Diyar kir kuev ajanên bi vî awayî ji holê rakirin, di nav hedefên girîngên Hêzên gel de ye.*

*Êvara 28'ê Adara 1986'an grubeke partîzanan hatibû gundê me. Heya demeke dereng a êvarê li benda grubeke din sekinîn. Her ku saet derbas bûn û dereng bû, hevalan dest pê kir ecz bin: digotin, "eger tiştek çênebûna ne mimkûn e ku heval heya niha bimana." Saet û deqe pir hêdî derbas dibin; tu dibêjî qey bi tonan bar li xulekjimêrê girê dabûn, dem derbas nedibû. Partîzanan di nava xwe de rewş nirxandin û beriya bibe sibê gund terikandin. Ji minjî xwestin ku ez sibê biçim qereqolêû lê binêrim ka tiştek qewimiye an na. Ji ber heval li ser gruba ku bihata pir zêde disekinîn ez jî ecz kiribûm; heya bi sibê bi hêviya ku wê bên guhên min li ser dengê lingên wan bû. Lê berbang bû, tav derket, dîsa jî kes nehat. Ez fikirîm ku eger ez sibê zû biçim qereqolê wê bal bikişîne, bi mereqeke mezin li hêviya derketina tavê mam. Lêhê nû tav ji navsera çiyayê Gabarê hildihat; tu dibêjê qey çiyayên Gabarê ew qefalltibûû nedixwest tav jê dûr bikeve, pir hêdî bilind dibû. Min xwe nêzî qereqolê kiribû ku ji nişka ve dengê helîkopterê her dever girt. Îhtimala ku heval li ser sekinîbûn rast derdiket. Di çongên min de teqet nemabû, wisa giran bibûn êdî ranedibûn. Helîkopterê li ber qereqolê danî. Li qereqolê tirs ûtevliheviyek serwer bû. Termek ji helîkopterê danîn xwarê. Ji ber ku ez mixtar bûm nîşanî min jî dan, pirsîn ku ez nas dikim an na. Ez lal bibûm lê min karîbû bêjim 'na'. Wexta ez paş de vegeriyam ti dibêjî qey kuç û kevir bi ser min de dibarîn û çiya bi ser min de hildiweşiyan. Her Egîd li ber çavên min digeriya, gotinên Wî yekoyeko dihatin bîra min…*

*Dema ku min xeber da hevalan hevalên grûbê hemû yek car bêdeng bûn û paşê ji nişka ve hemû bi hev re rabûn ser piyan; çekên xwe rakirin banîû ji bo şehîd Egîd rêz girtin. Di pey re sond xwarin.*

*Min ji wan re got ez dixwazim tevli we bibim, qebûl nekirin. Tiştek nikare bibe asteng da ku ez li gel wan şer bikim. Emrê min 65 e lê fermandar Egîd talîmat dide: her bi pêş de!"*

*21'ê Hezîrana 1986'an*

**Gotina DawîYa Çapa Tirkî Ya Vê Pirtûkê**

Mehsûm Kormaz di 28’ê Adara 1986’an de şehîd ket. Wexta ku jiyan dikir hewl da planeke bi rêxistinbûnê ya bi awayê komîteyên li bajar, navçe û gundan pratîze bike. Ji bo ku yekîneyên biçûk her ku diçe xwe bigihînin artêşbûnekê, pê bawer kir ku pêwîstiya bi çalakvaniyê heye. Ji bo ku baregahên (üss) gerîla li her derê bên bicihkirin hewl da. Hesreta Wî bû ku şerekî ti car nesekine û her mezin bibe were pêşxistin.

Piştî Ew şehîd ket ev xwestekên Wî yek bi yek pêk hatin. Gelê Kurdistanê bi awayekî aktîf di nav têkoşînê de cihê xwe girt. Yekîneyên biçûk ên lêşkerî qat bi qat zêde bûn û ARGK’ê pêk anîn. Şer di aliyê naverok de gihîşt asteke diyar û dijmin hat li ber binkeftinê.

Ji Wî bi şûn de bi hezaran Kurd navê Mehsûm an jî ‘Egîd’ li zarokên xwe kir. Li ser navê Wî dibistana herî girîng a Kurdistanê ‘Akademiya Mehsûm Korkmaz’ hate avakirin. Bi dehan hezarxwendevan di vê dibistanê de perwerdeya xwe temam kirin û cihê xwe di têkoşînê de girtin.

Bi kurtahî gelek nirxên ku Wî di oxira wan de têkoşîn meşandibû hate afirandin, hate pêşxistin û bêmirin bûn.

Ked û hewldana Wî vala neçû. TovênWî reşandine belavî çar aliyên welêt bûn.

Eger bidîta ku ev pêşketinên bêhempa çêbûne, îro şer hatiyêvê astêûSerokatiyêêdî sînorên neteweyîderbas kiriye û bûye gerdûnîBêguman e ku wê bigota ‘êdî ez bimirim jî ne xem e’.

Jê guman nabe ku zêde tiştekî em derbara kesayetîû şoreşgeriya ku mirovê bêhempa fermandar Egîd pêşkeş kiriye de bêjin wê nebe. Tevî ku em ji niha de qebûl dikin ku qeweta me têrê nake em kesayetiya Wî- exlaqa Wîû şoreşgeriya Wîû milîtaniya Wî ya PKK’êîzah bikin, me hewl da em bi vê pirtûkê hin tiştan dewrî nifşên pêşerojê bikin.

R: 1, 2,3